






Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ



- ▶ Ev rejîm kirasê xwe li herkesî dike **Süleyman Çevik**
- ▶ Di Kurdî de fîlên transîtîv û ... **Abdullah İncekan**
- ▶ Bê xêlî **Rojen Barnas**
- ▶ Delîlên ku nabin delîl **Selman Dilovan**
- ▶ Bi giştî weşangêriya Kurdî ya li Stenbolê **Azîz Samûr**
- ▶ Hêviya di eyneya huznê de: Sabah Kara **Berken Bereh**
- ▶ Berhevdana kultura devkî û sosyolojiya dengbêjiyê **Abdulkadîr Gok**
- ▶ Zerê zer bû **Hatîce Mollakendî**
- ▶ Ji yana Bedîuzzeman **Abdulkadir Kurşun**
- ▶ başûrgerî **sidîq gorîcan**
- ▶ Şerefname de Mîreyê Suweydiyan **Wisif Zozanî**
- ▶ Li Kopa rengîn, dersa Kurdî... **Nevzat Eminoglu**
- ▶ Eşîrên Herêma Botan III **M. Munir Timurtaş**
- ▶ Qedrîcan û helbestên wî yên Hawarê **M. Zahir Ertekin**
- ▶ Biro **Rahmetullah Karakaya**
- ▶ Bûyerên dawîn û rewşa me **Murad Celalî**
- ▶ Kalamast **Kenanê Nado**
- ▶ Berve nenasîyê rêwîtiya mamostekê **Ali Karadeniz**





Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ

(KÜLTÜR SANAT EDEBİYAT DERGİSİ)

Büyük Reşit Paşa Cad. Yumni İş Merkezi No: 22/29

Vezneciler/Beyazıt - İstanbul

Tel&Fax: (0212) 519 00 09

www.nubihar.com • nubihar@gmail.com

Navnîşana Name û Nivîsan

P.K. 80 Fatih - İstanbul

•

Li ser navê Pak Ajans Yayıncılık Ltd. şti. (adına)

Xwedî û berpirsiyarê Nivîsaran (Sahibi ve Yazı İşleri Müdürü)

Süleyman Çevik

•

Nûnertiya Almanya

Burhan Kaya

kizilkaya_burhan@yahoo.de

Tel: 0234 - 7922968

•

Kovara Nûbihar ji 3 mehan carekê;

Payız, Zivistan, Bihar û Havînê tê weşandin

•

Berg û rûpelsazî

Dawud Rêbiwar

semalmedya@gmail.com

•

Çapxane

Kilim Mat. Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti

Orta Mh. Fatin Rüstü Sk. No: 1-3/A

Bayrampaşa/İSTANBUL

Tel: 212 612 95 59

•

Yayın Türü:

Yerel Süreli

•

Mesûliyeta ramanên nivîsaran aîdê nivîskaran e.

Berhemên hatine şandin bi şûn de nayên veğerandin

•

Berdêla abonetiya salane:

Türkiye: 25 YTL

Welatên din: 25 EURO, 30 \$

•

Jimareyên Hesaban:

Hundir Türkiye: Postgiro (Posta Çeki H.) Süleyman Çevik: 658265

Süleyman Çevik, İş Bankası Laleli Şubesi: 1084-0363459

Derveyî Türkiye: Süleyman Çevik,

İşbankası Yavuz Selim şubesi: 1079-30100-3118770

Ev rejîm kirasê xwe li herkesî dike Süleyman Çevik	5	başûrgerî sidîq gorîcan	40
'Eşqa Yezdan Hêsarek Pirr Muhkem e Mewlana Celaleddînê Rûmî Ji Farsî: Hayrullah Acar	7	Vajeya Siftekêni Bediuzzeman Seîdê Nursî Açarnok: Şaban Şenates-Meymandar	41
Di Kurdî de fiîlên transîtîv û ergatîv Abdullah İncekan	7	Ji kaniyê çend qurt av Dilazad ART	43
Bê xêlî Rojen Barnas	11	Delal Ergül Mercan	45
Delîlên ku nabin delîl Selman Dilovan	12	Dewrêşê delodîn Xezal Meral Dêrikî	47
Bi giştî weşangêriya Kurdî ya li Stenbolê Azîz Samûr	14	Umrekî ji şîrî heta pîrî di rêya ilmê de: Mela Hakimê Qoraxî [1939-2010] Veli Vural	48
Helbesta Helbestê Mesud Serfiraz	20	Seydayê Nemir Yusif Xemgîn	51
Hêviya di eyneya huznê de: Sabah Kara Berken Bereh	21	Şerefname de Mîreyê Suweydiyan Wisif Zozanî	52
evînistan mehmet ali aluç	24	Bûka pepûk Kasım Buğurcu	57
Berhevdana kultura devkî û sosoyolojiya dengbêjiyê Abdulkadîr Gok	25	Li Kopa rengîn, dersa Kurdî ya pêşîn Nevzat Eminoglu	58
Zerê zer bû Hatîce Mollakendî	28	Dîmoqrasî Langstone Hughes Ji Îngilîzî: Azad Rêbiwar	61
Evîn Yılmaz Yalçın	31	Eşîrên Herêma Botan III Şilêd: Batuwa M. Munir Timurtaş	62
Seydayê min Mehmet Bozkoyun	32	Qedrîcan û helbestên wî yên Hawarê M. Zahir Ertekin	67
Jiyana Bediuzzeman Abdulkadir Kurşun	34		

Biro	
Rahmetullah Karakaya	72
Girtî me	
Kamran Simo Hedilî	74
Bûyerên dawîn û rewşa me	
Murad Celalî	75
Paşeroja Rojhilata Navîn	
ber bi ku ve diçe?	
Mela Mûhemmedê Bêrkevanî	77
Baro giran	
W.K Merdimîn	80
Şîretên pîrka min	
Xelîl Îbrahîm Banûkî	81

Evîn	
Hadi Kuranlıoğlu	82
Kalamast	
Kenanê Nado	83
Mistoyê Tofan	
Şemoyê Memê	85
Bacoya Alanqozî	
Recep Yigitbay	88
Berve nenasîyê rêwîtiya mamostekê	
Ali Karadeniz	89
Pîvan û kîlo	
Seyda Ronahî	92

Ev rejîm kirasê xwe li herkesî dike

Süleyman Çevik

Rejîma resmî, her fikr û dîtina ku îdeolojiya hakim qebûl nake û nakeve bin siya wê ji xwe re dijmin dibîne.

Dema meriv bipirse, gelo li vî welatî çî serbest e û ji çî tê hezkirin, çî jî di çavê rejîmê de bi tehlike ye û neyar e, em tev jî bi rehetî dikarin bersiva vê pirsê bidin.

Ji bo vê rejîmê tiştên muqeddes hene. Ev rejîm ji bo parastina muqeddesên xwe dikare her tiştî bi şiddet ceza bike. Lewra ji dîroka vê rejîmê aşîkar e ku heta niha di her fîrsetê de muxalifên xwe mexdûr kirine. Van mexdûran, bi taybetî jî Kurdan, di merheleya heştê salên vê dewletê de li hemberî vê zilmê mucadele kiriye û bedelên mezin jî dane.

Herçiqas di qanûnan de, di platformên siyasî de û li her derê ji hêla rayedaran ve behsa wekhevîyê bête kirin jî ev tişt çîrokek vala ye; tenê di gotinê de heye. Bifikirin, li vî welatî hîna jî Kurd, Elewî û Xeyrîmislim nikarin bi nasnama xwe bibin xwedî mewkî û wezîfeyan.

Eger her sibê zarokên Kurdan bibêjin “xwezî bi wî kesî ku dibêje ez Tirk im” û ev zarok xwe qurbana “Tirkan” bikin ma li wê derê behsa wekhevîyê dibe?

Li cihê ku rejîm Sunnîtî û Hanefîyê bike, mezheb û meşrebên din nebîne û deriyên wan bigre

gelo meriv dikare behsa wekhevîyê bike?

Dema meriv dibêje hundirê vê wekhevîyê dagrin, ka bila ev derewa we vegere rastiye, hûn dibînin ev meriv çawa har dibin.

Ev rejîm dixwaze herkes fiilen “xwedîtî” û “efendîtiya” Tirkan qebûl bike û nahêle kesek li hemberê vî fikrî derkeve.

Çawa axayê gundekî tu carî razî nabe ku di îdareya gund de gotinên rençberê wî jî derbas bibin, ev zihniyeta hakim jî Kurdan weke rençberê xwe dibîne û naxwaze Kurd di îdara dewletê de jê re bibin şîrîk.

Li rûyê erdê tu kes ji vê rewşê re nabêje wekhevî...

Helbet hem em, hem jî ew dizanin ku li vî welatî wekhevî tune. Ji bo ku em derkevin derewa wan, divê bi her tiştê xwe em bibin wekî wan. Meseleya me, em dixwazin wekî xwe bimînin û bi wî şiklî “wekehev” bêne dîtin. Lê ew muameleya “efendîtî” û “xulamtiyê” bi me re dikin, îtiraza me jî li vê rewşê ye...

Ez dizanim, ev tiştê em daxwaz dikin li dijî şert û mercên dunyayê ne. Lewra hevaltî, şîrîkatî, rabûn û rûniştin di navbera merivên wekhev/deng de mumkin e. Ji me re dibêjin, heta hûn neyên di bin konê Tirkan de cihê xwe negrin doza wekhevîyê nekin. Derdê me jî vê

Ev rejîm ji bo parastina muqeddesên xwe dikare her tiştî bi şiddet ceza bike. Lewra ji dîroka vê rejîmê aşîkar e ku heta niha di her fîrsetê de muxalifên xwe mexdûr kirine.

'Eşqa Yezdan hêsarek pîrr muhkem e¹

Mewlana Celaleddînê Rûmî
Ji Farisî: Hayrullah Acar

Her roj ji nû ve ez barek dikêşim
Van belana ji bo karek dikêşim

Zehmeta sermê'w berfa zivistanê
Tev bo 'eşqa şehriyarek dikêşim

'Eşqa Yezdan hêsarek pîrr muhkem e
Barê can ber bi hêsarek dikêşim

Bona herdu nêrgizên mexmûrê wê
Wek meyxoran ez xûmarek dikêşim

Dil şikeft û Şemsê Tebrîz bo wê yar
Bona yar zahmeta jahrek dikêşim

1 Mewlana Celaleddîn-i Rûmî, *Kulliyat-i Dîwan-i Şems*, (Neşr-i Bediuzzaman Fruzanfer), İntişarat-i Behzad, cild, IV/1663, Tehran, 1329.

bi zihniyetê re ye û em dixwazin ev zihniyet bête guhertin...

Dema Kurd heqekî bi dest dixin, dibêjin, me ew maf daye wan û wî jî ji me re dikin mînet û serhevde. Lêbelê tehemula van rayedarên bi îmtiyaz tune ye ku tişteki bi Kurdan re parve bikin.

Wekî din, di dayina van mafan de semîmîyet jî tune ye. Wekî mînak, TRT6 saziyeke dewletê ye, 24 seetan bi Kurdî weşanê dike. Lê di saziyeke din ya dewletê de Kurdî nas nakin. Ji ber van nakokiyên Kurd bi gavên ku tene avêtin baweriyê naynin. Van tiştên tene meydanê jî ji ber ku zemîneke wan î qanûnî tune ye, zihniyeta îdarekar xwe wekî kefilî van karan dibîne. Lêbelê tu xerentiya vê kefilîyê jî tune ye; lewra dema sibê hikûmeteke din bête serkar, tu maneya kefilîyê jî namîne.

Wekî din mezhebê resmî yê vî welatî Hanefîti ye.

Heta niha vê rejîmê bi dînê Îslamê û bi dîndarên semîmî re jî şer kiriye. Dîn ji jiyana rojane derxistiye û di wîjdanan de hepis kiriye.

Li hemberî van kirinên rejîmê Misilmanên vî welatî ketine endîşa parastina baweriyaya xwe û mucadeleyên mezin kirine.

Dema rejîmê nekariye dengên wan muxalîfan bi birre, îjar bi dek, dolab û hîleyan ketiye nava van kesa û çî dengên muxalîf hene tev şibihandine xwe, li ser fikr û baweriyaya wan tesîr kiriye û îstîqameta wan guhertiye.... Kirasê Kemalîzmê li van dengên muxalîf kiriye û Kurdên xwe, Misilmanên xwe, Qominîstên xwe, Elewiyên xwe û çepgirên xwe çekirine.

Gerçî bi derbasbûna zeman û bi mucadeleya kesên muxalîf îro siyaseten rehetiyek çêbûye, lêbelê îjar dînekî nû hatiye meydanê. Piştî heştê salan em dibînin ku rejîma Tirkîyê li gor xwe "Îslameke" nû çekiriye. Dînekî di xizmeta rejîmê de û jê re sadiq, li ser mezhebê Henefîtiyê û nijadperest ava bûye... Yekê nebêje Îslam li Anatolyê nazil bûye, jê re jî dibêjin, "Îslama Anatolyê".

Di destpêkê de ew dîn jê re tehlîke bû, lê îro jî dîn re li gor xwe zemînek daniye û gelek Misilman bi xwe girêdane; bi vî awayî ew Misilmanên doh li hemberî rejîmê bûn, îro bûne muhafîzên wê...

Îro xelkê vî welatî muqeddesên vê rejîmê wekî dîn diparêzin. Di mijara dîn de ev rejîm gihaştîye serkeftineke bi vî hawî...

Lê ev rejîm di meseleya Kurdan de bi ser neketiye.

Weke min li jor jî got, ev rejîm bi gelek pirsgrêkan re rûbirû ye. Di navbera rejîma Tirkîyê û Însanên wê de cihê cihê mesele hene. Zaten evê rejîmê hîmê xwe jî bi giranî li ser înkara milletan û li ser redda dînê Îslamê daniye. Bêyî Tirkan milletên din, bi gelemperî jî Kurd înkâr kirine; navê wan, zimanê wan qedexa kirine. Kurdan tenê rûyê lêdanê, zilmê, kuştin û sirgûnê dîtîye... Bi vî awayî Kurd tehqîr kirine, asimîle kirine, kirine ku Kurd ji xwe fedî bikin. Hetanî çend sal berê jî ji bo Kurdan zemîna xwe îfadekirinê bila li alîkî bisekine, Kurd hatine înkarkirin.

Helbet bi mucadeleya Kurdan û qonjuktora dunyayê re li Tirkîyê jî li gor berê rewşa Kurdan, şertên xebatên wan musbet hatiye guhertin. Lê zihniyeta ku Tirkîyê îdare dike, bi gelemperî jî pira-niya xelkê Tirkîyê, ji çepgirên bigre hetanî cemeat û terîqetan, hê jî payeyekê nadîne Kurdan. Dema tişteki bidin jî minetê dikin... ❁

Di Kurdî de fiîlên transîtîv û ergatîv

Abdullah İncekan

aincekan@gmail.com

1. Destpêk

Wekî ku min di pêşgotina “Ez Kurdî Hîn Dibim – Pratik Kürtçe Dersleri” de jî nivîsiye, ji bo analîzkirina Kurdî, em muhtacê peyv û gotinan in ku di zimanên din ên coxrafyaya me de nayên bikaranîn. Lewra hin mefhûm û taybetiyên Kurdî hene ku di zimanên derûdora me de tunin û loma jî di wan zimanan de îhtiyacî bi van gotinan nebûye. Gotina **Ergatîv** jî yek ji van gotinan e ku ji bo tehlîlkirina Kurdî tê bikaranîn, lê ji bo zimanên wek Erebi, Tirkî û Farişî îhtiyacî pê çênebûye, ji ber ku di van zimanan de mefhûma ku bi vê peyvê tê binavkirin, tune.

Di vê nivîsê de ezê li ser **Ergatîvê** bisekinim. Ezê bi çend diyalogên di navbera me û zarokan de derbas dibin, dest pê bikim.

Çend diyalog

I:

Bav: Baran, te çi got?

Baran: Bavo, ez gotim, ji min re bisîkletekê bikire.

II:

Dê: Hemze, te xwarin xwar?

Hemze: Na, dayê. Ez xwarin nexwarim. Ez ne birçî me, ez têr im.

III:

Bav: Zarokno, we bi hev re lîst?

Zarok: Na, bavo. Em bi hev re nelîstin. Em ji hev hez nakin.

Li vir em çend qisedanên kin ên di nav me û zarokên me de dikarin derbas bibin, dibînin. Di van mîsalan de çi heye?

Herkesê ku bi Kurdî dizane, ferq dike ku di hersê diyalogan de çend fiîl (lêker/fiîl/verb) şaş hatine bikaranîn. Fiîlên ku xelet hatine bikaranîn ev in:

Bavo, ez **gotim**...

Ez xwarin **nexwarim**...

Em bi hev re **nelîstin**...

Em cardin werin ser pirsê **ewil**: Belê, di van mîsalan de çi heye? Zarokan di vir de çi kiriye û çima wiha kirine?

Berî her tiştî divê bê gotin ku zarokên bi navê Baran û Hemze bi van mîsalan nîşan didin ku ew hin qaîdeyên zimanê Kurdî baş hîn bûne. Herdu zarokan jî fehm kiriye ku

1. Fiîl li gorî kesan tèn tewandin.

Hin mefhûm û taybetiyên Kurdî hene ku di zimanên derûdora me de tunin û loma jî di wan zimanan de îhtiyacî bi van gotinan nebûye. Gotina Ergatîv jî yek ji van gotinan e ku ji bo tehlîlkirina Kurdî tê bikaranîn

2. Ji bo kesê ewil û tenê, yanê ji bo cînava “ez”, paşpirtika fiilê (sonek/suffix) **-im** e.

3. Her fiil xwediye kokekê ye û kokên fiilan yên dema derbasbûyî ev in:

gotin => -got-

xwarin => -xwar-

lîstin => -lîst-

Ev zarok kîjan qaîdeya mûhîm ya zimanê Kurdî hîn nebûne? Îcar ev mijara Ergatîvê ye! Lê berî ewil îzaha çend termên (gotinên) gramerê...

2. Tesnîfkirina Fiilan: Fiilên transîtîv û yên întansîtîv.

Di zimanan de fiil di du grûban de tîn komkirin: Fiilên transîtîv (gerguhêz/geçişli) û fiilên întansîtîv (negerguhêz/geçişsiz).

Fiilên transîtîv ew fiil in, ku li objeyekê (nesne/object) hukim dikin. Wek mîsal em dikarin li vir fiila *xwarin* yan jî *gotinê* bidin. Ev fiil di cumleyê de bi tena serê xwe nayên bikaranîn, yanî meriv nikare bibêje:

Ez dixwim.

Ez dibêjim.

Herdu cumle jî kêr in û guhdêr derhal bi van pirsan bersivê didin:

Tu çi dixwî?

Tu çi dibêjî?

Ji ber ku ev fiil, fiilên transîtîv in, ew objeyekê dixwazin û wek mîsal ew dikarin wiha bêjin:

Ez navrojê dixwim.

Ez kilaman dibêjim.

Gotinên *navroj* û *kilam* objeyên van herdu fiilan in.

Fiilên întansîtîv ew fiil in ku tu objeyê naxwazin. Wek mîsal, fiilên *gerîn* yan jî *tirsîn* dikarin ji bo vê grûba han werin dayin. Loma jî meriv dikare bibêje:

Ez dîgerim.

Ez ditirsim.

Ez radikevim.

3. Fiilên transîtîv û yên întansîtîv: Dem

Di Kurdî de ev herdu grûbên fiilan di hin deman de (zaman/tense) ji hev gelek cihê ne û di hin deman de jî wek hev tîn tewandin. Di demên niha û pêşerojê de (şimdiki ve gelecek zaman/ present tense, future) ew wek hev tîn tewandin.

Hemû fiil li gorî kes û demê tîn tewandin:

	pêşpirtika dema niha (önek/prefix)	koka dema niha	kes (kesê ewil)
fiilên transîtîv	di- di-	-xw- -bêj-	-im -im
fiilên întansîtîv	di- di-	-ger- -tirs-	-im -im

Di hemû demên derbasbûyî de (geçmiş zaman/ past tenses) ew ji hev cihê ne û ferqên mezin di nav wan de hene. **Di demên derbasbûyî de fiilên întansîtîv wek demên niha û pêşerojê li gorî dem û şexs tîn tewandin, loma jî eleqeya wan bi Ergatîvê tune ye û ji vir pê ve em li ser wan nasekinin – mijara me fiilên transîtîv e.**

Herçiqas ku fiilên transîtîv di demên niha û pêşerojê de mîna yên întansîtîv werin bikaranîn jî, ew di demên derbasbûyî de xwediye xisûsiyetên cihê ne. **Îcar ji vir pê ve meseleya Ergatîvê dertê pêşiya me.** Em herdu cumleyên jor di demên derbasbûyî dikarin wiha formule bikin:

Min navroj xwar.

Min kilam gotin.

Wekî ku xuya dibe,

1. Cînav *ez* di dema derbasbûyî de bûye *min*.

2. Fiila *xwarin* li gorî kesê ewil nehatiye tewandin. Eger ew bihata tewandin, diviyabû ew wiha ba: **Min navroj xwarim.**

1. Objeya *navrojê* bûye *navroj*

2. Di cumleya dudiyar de gotina *kilaman* ne pirr-hejmar e, ew wek *kilam* hatiye gotin.

3. Di cumleya dudiyar de fiila *gotin* pirr-hejmar e, ew ne li gorî “*min*” hatiye tewandin. Ew li gorî objeyê hatiye tewandin.

Ev pênc noqte û hin xisûsiyetên din, di Kurdolojiyê de wek Ergatîv tîn binavkirin. Ji vir pê ve ezê yek-eko li ser van xisûsiyetan bisekinim.

4. Ergatîv, yanê çi?

Fiilên transîtîv di demên derbasbûyî de xwediye xisûsiyetên cihê ne û ji bo wan paradîgmayeke taybetî heye.

4.1 Faîl

Faîl (kirde/özne/subject) ne di halê normal de ye; ew di halê Casus Obliquus de ye. Weku tê zanîn, di Kurdî de du hal hene: Halê Rectus û yê Obliquus.

Di dema niha û pêşerojê de faîl di halê Casus Rectus de ye. Em mîsalên jor cardin dikarin li vir bidin:

Dema niha			
	Faîl: Casus Rectus	Obje: Casus Obliquus	fiil
fiilên transîtîv	<i>Ez</i> <i>Ez</i>	<i>navrojê</i> <i>kilaman</i>	<i>dixwim</i> <i>dibêjim</i>

Gava em van cumleyan werdigerînin dema derbasbûyî, faîl halê Casus Obliquus digre. Objê jî diguherîne û halê Casus Rectus digre:

Dema derbasbûyî			
	Faîl: Casus Obliquus	Obje: Casus Rectus	fiil
fiilên transîtîv	<i>Min</i> <i>Min</i>	<i>navroj</i> <i>kilam</i>	<i>xwar</i> <i>got</i>

Gava faîl cînav (zamir/pronoun) be, di demên derbasbûyî de divê ew jî di halê Casus Obliquus de be. Di halê Casus Rectus û Casus Obliquus de cînav wiha ne:

Kes	Casus Rectus	Casus Obliquus
kesê 1. /yekjimar	<i>ez</i>	<i>min</i>
kesê 2. /yekjimar	<i>tu</i>	<i>te</i>
kesê 3. /yekjimar	<i>ew</i>	<i>wî/wê</i>
kesê 1. /pirrjimar	<i>em</i>	<i>me</i>
kesê 2. /pirrjimar	<i>hûn</i>	<i>we</i>
kesê 3. /pirrjimar	<i>ew</i>	<i>wan</i>

Gava faîl ne cînav be, kelîmeyeke din be, divê meriv van paşpirtikan li ber çavan bigre:

	Paşpirtikên Casus Obliquus	Paşpirtikên Casus Obliquus tevî yekê
kelîmeyên nêr (eril/masculine)	-	-(y)ekî
kelîmeyên mê (dişil/feminine)	-(y)ê	-(y)ekê
kelîmeyên pirrjimar (nêr û mê)	-(y)an	-

Ji vê şemayê em çî fêhm dikin? Ji şemayê tê fêmkirin ku divê kelîmeyên navdêr, gava bi fiilên transîtîv û di demên derbasbûyî de tîk bikaranîn, wan paşpirtikên jorîn bigrin. Da ku ev mijar baştir were fêmkirin, em dikarin van mîsalan bidin:

Mîsal	Îzah
Baran berê pirr dilîst.	=> <i>Baran</i> tu paşpirtik negirtiye, ji ber ku ew navê lawan e û nêr e.
Zozanê berê pirr dilîst.	=> <i>Zozan</i> paşpirtika <i>ê</i> , ku nîşana Casus Obliquus ya kelîmeyên/ navên mê ye, girtiye.
Leylayê berê pirr dilîst.	=> Li vir di nava paşpirtika Casus Obliquus û <i>Leyla</i> de herfa "y" heye, ji ber ku ew bi dengdêrkî (ünlü/vowel; herfa a) bi dawî dibe.
Dengbêjan xweş stra.	=> <i>an</i> ya dawîya peyva <i>dengbêj</i> nîşana Casus Obliquus e. Ew pirrjimarîyê nîşan dide.
Merivekî stran got.	=> <i>î</i> ya dawîya peyva <i>merivek</i> nîşana Casus Obliquus e. Kelîme nêr e.
Jinekê stran got.	=> <i>ê</i> ya dawîya peyva <i>jinek</i> nîşana Casus Obliquus e. Kelîme mê ye.

4.2 Tewandina fiilê

Fiil li gorî faîl nayê tewandin. Ji bo hemû kesan koka fiilê ya dema derbasbûyî tê bikaranîn. Da ku ev noqte were fêmkirin, em fiila *xwarin* wek mîsal didin. Weku ji şemayê jî tê fêmkirin, di dema niha de fiila *xwarin* li gorî kesan hatiye tewandin; lê di

dema derbasbûyî de tenê koka wê hatiye bikaranîn. Ev jî ji yek xisûsiyetên Ergatîvê ye:

Dema niha		Dema derbasbûyî	
ez	dixwim	min	Xwar
tu	dixwî	te	xwar
ew	dixwe	wî/wê	xwar
Zozan	dixwe	Zozanê	xwar
em	dixwin	me	xwar
hûn	dixwin	we	xwar
ew	dixwin	wan	xwar
telebe	dixwin	telebeyan	xwar

4.3 Obje û fiil

Pirrijmarbûna objeyê bi fiilê tê nîşandan; ne bi objeyê bi xwe!

Weku tê zanîn, di dema niha de obje yan yekjimar (tekil/singular) e yan jî pirrijmar (çoğul/plural) e û li gorî wê meriv paşpirtikê lê zêde dike. Di herdu cumleyên jêrîn de yekjimarbûn û pirrijmarbûna objeyê bi paşpirtikan hatiye nîşandan:

Zozan kilam-ê dibêje.

Zozan kilam-an dibêje.

Lê di demên derbasbûyî de obje ji ber ku di halê Casus Rectus de ye, ew tu paşpirtikê nagre, loma jî divê pirrijmarbûna wê bi şiklekî were nîşandan û ew jî fiil e:

Zozanê kilam got.

Zozanê kilam gotin.

Di cumleya ewil de *Zozan* tenê kilamekê dibêje, loma jî fiil kêmjimar e; di ya dudiyan de jî *Zozan* du yan gelek kilaman dibêje; loma jî fiil pirrijmar e. Bi gotineke din, fiil nîşan nade, ka faîl pirr in yan na; fiil pirrbûna objeyê nîşan dide.

Da ku ev mefhûm baştir were fêmkirin, mîsaleke din:

Dema niha: *Ez Zozan û Zelalê dibînim.*

Dema derbasbûyî: *Min Zozan û Zelal dîtî.*

Di herdu cumleyan de jî faîl kesê ewil e (ez/min). Di cumleya dudiyan de fiil pirrijmar e (dîtî), ji ber ku obje du kes (*Zozan û Zelal*) in.

Tiştêkî din î balkêş jî ev e ku fiil di demên derbasbûyî de li gorî objeyê tê tewandin, ne li gorî faîl. Wekî ku tê zanîn, di dema niha de fiil li gorî faîl tê tewandin. Ji bo ku ev ferq were fêmkirin, dîsa du mîsal:

Dema niha: *Ez te dibînim.*

Dema derbasbûyî: *Min doh tu dîtî.*

Di cumleya ewil de fiil li gorî faîl, yanê li gorî cînava ez, hatiye tewandin. Lê di cumleya dudiyan de ew li gorî objeyê, yanê li gorî cînava *min*, hatiye tewandin.

4.4 Di diyalogan de çi şaş e?

Em cardin werin serî! Di serî de me çend diyalog wek mîsal dabûn. Wekî ku ji îzahan xuya dibe, zarokên bi navê Baran û Hemze di diyalogên jorîn de di şûna cînavên Casus Obliquus de, yên Casus Rectus bi kar anîne. Ev yek. Ya din jî ev e ku zarokan fiil mîna di dema niha de tewandine. Bi gotineke din, ew avahiya fiilan ya dema niha hîn bûne, lê qaîdeyên Ergatîvê hê fêhm nekirine û loma jî wan ew li ber çavan negirtine:

<p>I: Bav: Baran, te çi got? Baran: Bavo, ez gotim, ji min re bisikletekê bikirre.</p> <p>II: Dê: Hemze, te xwarin xwar? Hemze: Na, dayê. Ez xwarin nexwarim. Ez birçî nînim, ez têr im.</p> <p>III: Bav: Zarokno, we bi hev re lîst? Zarok: Na, bavo. Em bi hev re nelîstin. Em ji hev hez nakin.</p>	<p>I: Bav: Baran, te çi got? Baran: Bavo, min got, ji min re bisikletekê bikirre.</p> <p>II: Dê: Hemze, te xwarin xwar? Hemze: Na, dayê. Min xwarin nexwar. Ez birçî nînim, ez têr im.</p> <p>III: Bav: Zarokno, we bi hev re lîst? Zarok: Na, bavo. Me bi hev re nelîst. Em ji hev hez nakin.</p>
--	--


5. Netîce

Ji îzahên jorîn meriv dikare avahiya fiilan di Kurdî de wiha nîşan bide:

		Faîl	Obje
fiilên intransîtîv	hemû dem	Casus Rectus	---
fiilên transîtîv	dema niha û ya pêşerojê	Casus Rectus	Casus Obliquus
	demên derbasbûyî	Casus Obliquus	Casus Rectus

Ji ber ku mefhûma Ergatîvê di Kurmancî de tenê di demên derbasbûyî de dertê holê, di zimannasiyê de (linguistic) ew wek "Ergatîva perçe" (split ergativity) tê binavkirin.

Ergatîv di zimanên Ewrûpî û yên cînarên Kurdan de tune ye û loma jî karê hînkirin û îzahkirina wê zehmet e. Ji ber vê, lê xisûsen ji ber nebûna perwerdeya zimanê Kurdî wê nifşên nû di aliyê Ergatîvê de gelek zehmetiyan bikşînin û divê em li rê û rêbazan bigerin, ka em çawa dikarin vê mefhûma han bidin hînkirin! ❁



Bê xêlî

Rojen Barnas

Te ji kê re çêkiriye xwe îşev
Bê xêlî derketiyî geştê
Li esmanê çardeşevî yê saya
Ku kadiza stêrkan girêdaye li piştê.

Tu min jî bi xwe re nabî gelo?
Ne pir zêde, heta tanga Şengalê
Çavxezal lê bi awirên çavan
Nêçîra şêran dikin di nîvê rojê
Şêrên çavpereng ên bijîgij
Ji ber wan
Şerpeze û şewişî
Dikevin ji pergalê.

Ku te divê em bîstek herin hafa Qoçgirî
Pirpizêk di semayê li dorhêla Elîşan
Wek xifşan bi nazdarî di çerxa serbilindî
Bi rindî
Eyloyan basko dikin
Bazên kûvî ji giyan.
Û gava distrên
Tê nikarbî li berê raneperî.

Xêr e? wisa bê xêlî dîsa
Derdikevî geşt û seyranê
Têr nabî ji tenêtiyê, qet?
Min jî bi xwe re nabî, canê?

Delîlên ku nabin delîl

Selman Dilovan

Di hejmeta 113an ya *Nûbiharê* de birêz Zilkîf Xweşhêvî nivîsarek bi navê "Du lêkerên çiyawaz û bikaranîna wan a çewt" nivîsiye. Tiştên ku wan çewt dihesibîne çiqasî çewt in, ên ku wan rast dibîne jî çiqasî rast in, bila ev mijar ji ehlê vî karî, ji zimanzanan re bimîne. Ez dixwazim ji hêleke din ve li ser mijarê rawestim; li ser numûneyên ku di vê nivîsarê de weke delîl hatine nîşandan. Ji bo ku dîtinek an jî îddîayek rind bête fêhmkirin, mînak pir girîng in, lê di hîlbijartina mînakên de divê mirov pir dîqqet bike û ji xwe bipirse: Gelo dayîna mînakê lazim e yan na; eger lazim be, ji îddîaya mirov re dibe delîl an na; eger dibe delîl, çiqasî di cihê xwe de ye û hwd.

Mixabin di dayîna mînakên de Xweşhêvî ev kar îhmal kiriye:

Birêz Xweşhêvî îddîa dike ku "were meşandin" çewt e, "bê meşandin" rast e. Ji bo vê jî mînakên dide, dibêje:

"Xebatên destûra bingehîn ya xweseriya demokratîk dikare were meşandin û bilezkirin. (çewt)"

"Xebatên destûra bingehîn ya xweseriya demokratîk dikare bê meşandin û bilezkirin. (rast)"

Eger ez bixwazim qala tiştêkî wiha bikim, ezê bi şiklekî din vî cumleyî saz bikim, lê ji ber ku ev tercîha wî ye, ezê derbas bibim. Bi gotîneke din, eger em cumlê rast qebûl bikin jî, ji hêla gramerê ve şaş e. Di vî cumleyî de peyva "xebatên" pirhejmarî ye, divê lêker jî pirhejmar be. Hingê rastiya vî cumleyî divê wiha be: "Xebatên destûra bingehîn ya xweseriya demokratîk dikarin bên meşandin û bilezkirin." Ji bo nivîsareke li ser ziman ev ne şaşîyeke piçûk e.

Weke ku min li jor jî got, ez nakevîm nav nîqasha "were kîrin û bête kîrin"ê, lê bikaranîna peyva "were" wek emir, tiştêkî pir eşkere ye û bi dîtina min pêdivî tune ku mirov ji Dîwana Melayê Cizîrî delîlan bîne. Bi ser de jî delîlên ku Xweşhêvî xwe sipartîye wan qet jê re nabin delîl. Xweşhêvî ji Dîwana Melayê Cizîrî neqil dike:

"*Wer ji ber perdê yedê beyda bi mucîz bête der.*"

Pir eşkere ye ku peyva "wer" ne bi maneya hatinê ye, bi ma-

Ji bo ku dîtinek yan jî îddîayek rind bête fêhmkirin, mînak pir girîng in, lê di hîlbijartina mînakên de divê mirov pir dîqqet bike û ji xwe bipirse: Gelo dayîna mînakê lazim e yan na

neya "eger" e. Dema mirov dewama wê dixwîne, mijar zelaltir dibe:

"Wer ji ber perdê yedê beyda bi mu'ciz bête der Şems û kewkeb dê hilên 'alem teji enwari bit"¹

Bi tu awayî "were" û "bête der" di vê beytê de bi hev nakin. Çimkî "were" ji kesê duyem re hatiye gotin "tu"; û "bête der" ji kesê sêyem re, yanî "ew".

Mela dibêje: "Eger ji ber perdê destê sipî yê mu'cizane bête der, dê ronahiya rojê û stêrkan jî winda bibe, here. Dê alem ji nûra wî destî tijî nûr bibe." Yan jî "dê ew dest weke stêrkan û rojê alemê ronî bike." Lê di her halî de, "wer" bi maneya "eger" e, ne bi maneya "were, derkeve der."

Eynî şaşî di mînaka duduyan de jî hatiye kirin:

"Wer ji qewseynan bi mîzan bête der cotek xedeng"

Li vir jî, "wer" bi maneya "eger" e, ne bi maneya "were" ye ku Xweşhêvî jê re "raweya fermanî" gotiye. Dewama wê wiha ye:

"Wer ji qewseynan bi mîzan bête der cotek xedeng

Dê ceger bit pare pare sîne tarûmari bit"²

Bi kurtayî, yanî: "Eger ji herdu ebrûyan cotek tîr bête der, dê ceger perçe bibit, sîne tarûmar bibit."

Bi fikra min numûneya sisêyan jî şaş e. Xweşhêvî gotiye:

"Dê ji çerxa pêncemîn bêtin tenezul kit Merîx"

Dewama malikê wiha ye:

"Dê ji çerxê pencemîn bêtin tenezul kit Merîx Mislê Şemsê ger kişîntin li wan tîxên xezeb"³

Mirov dikare bi du-sê şiklan vê malikê mane bike, lê ji ber ku mijara me ne ravekirina malikan e, em dev jê berdidin. Bi vîrgulekê mirov dikare vê beytê rast fêhm bike: "Dê ji çerxa pêncemîn bêtin, tenezul kit Merîx." Yanî armanc ne "bêtin tenezul" e ku Xweşhêvî dixwaze ji xwe re bike delfil û bibêje ku "were tenezul" nayê gotin, "bêtin tenezul" tê gotin. Melayê Cizîrî dibêje, dê Merîx ji çerxa pêncan bê û tenezul bike, dakeve.

Rast e ku standarteke ziman tune, em bi gellek awayan dinivîsin û xwe îfade dikin. Em hemî jî mirov in û çiqas pispore jî bin, aliyên me yên lawaz jî hene, em pir tiştan jî nizanin. Loma jî di nivîsên me gellekan de -çi bêhemd, çi jî ji nezanî- şaşî derdikevin, ev jî tişteki normal e. Lê dema mirov îddîa bike ku guya şaşiyek li holê heye, divê bê rastkirin, hingê şaşî û çewtiyên ku mirov dike piçekî sik in û di nivîsê de beloq dibin.


Bi vê munasebetê ez gazinên xwe ji hinek zimanzanan jî dikim ku dengê xwe nakin. Bi taybetî jî camêrên mîna Sabah Kara, Rojen Barnas, Reşo Zilan û Mustafa Aydoğan. Wan bi keda salan ewqas tecrube û zanînan dane hev, hef e ku me ji wê xezîneya giranbiha bêpar dihêlin. Şexsen ez ji nivîsên van camêran pir îstîfade dikim û hêvî dikim ku ev daxwaza min bersivêkê bibîn. ❁

1 Melayê Cizîrî, *Dîwan*, Weşanên Nûbiharê, Istanbul, 2010, r. 44.


2 Melayê Cizîrî, r. 45.

3 Melayê Cizîrî, r. 35.


Eskî Diyarbekir'de
Gündelik Hayat



Amid'den
Diyarbekir'e
Eğitim
Tarihi



SEYAHATNAMELERDE
DİYARBEKİR



Ji bo xwestinê
Tel: (0212) 519 00 09

Bi giştî weşangêriya Kurdî ya li Stenbolê

Azîz Samûr

Destpêk

Piştî avabûna Komara Tirkiyeyê, bi tunehesibandina Kurdan re, li ser çand û zimanê Kurdan demên qedexebûnê dest pê kirin. Ev dem gelek dirêj ajot û gihîşt desthilatiya [(1983-1989)-1993] Turgut Özal. Qedexebûna li ser Weşana Kurdî bi madeya 2932yan ya Maqeqanûna 1982yan hatibû misogerkirin. Di 1991ê de bi rakirina vê maddeyê re rê li ber Weşana Kurdî piçek vebû. Piçek vebû, lewra maddeyên 26 (Di daxuyanî û belavkirinên ramanan de tu zimanê ku bi qanûnan hatibe qedexekirin, nikare bê xebitandin.) û 28 (Bi zimanên ku bi qanûnan hatine qedexekirin, weşan nayê kirin.) hê jî li ser kar bûn û rê li ber Weşangêriya Kurdî teng dikirin. Bi rakirina madeya 2932an re, rê li ber Stranên Kurdî, Muzîka Kurdî û Weşangêriya Kurdî vedibû; lêbelê îcar di bin navê “Qanûna Têkoşîna bi Terorê re” ku ji madeyên 8 û 312yan pêk dihat, Kurdî dîsa dihat dorpêçkirin.¹ Di binê siya van made û zehmetiyan de, ji 1991ê heta roja îro Weşangêriya Kurdî sal bi sal gur û geş bû.

Li Tirkîyeyê Weşangêriya

Kurdî

Dema ku mirov li Weşangêriya Kurdî ya li Tirkîyeyê dinêre, tê dîtin ku di 3 qonaxan re derbas bûye. Em van serdeman li gorî naveroka wan disenifînin; lewra dema ku meriv li serdema pêşî dinêre ku ji 1908an heta 1938an pêk tê, meriv dibîne ku naveroka Weşangêriya Kurdî bi piranî li ser çand, wêje û bi her awayî pêşvebirina Kurdan e. Lê piştî Lozanê ku Kurd tune tîne hesibandin, naveroka weşanên Kurdî difetilin ser şerê man û nemanê ku rojnameya Agirî ya Îhsan Nûrî Paşa yek ji wan weşanan e. Lê piştî komkujîya Dêrsimê ya 1938an dê demeke dirêj weşanên Kurdî li Tirkîyeyê disekin. Lêbelê dema ku digihîje serdema duyemîn (1962-1980), bi carekê ve naveroka Weşangêriya Kurdî diguhere û dibe qada hişyarbûn û bixweve hatinê. Di serdema sêyem de (1988-2010) îcar dê herdu jî bigihîjin hev, hem Weşangêriya polîtîk û siyasî û hem jî weşangêriya çand û wêje û perwerdehiyê bi hev re bimeşin. Di van her sê serdeman de 3 navend derketine pêş ku ew jî

Dema ku mirov li Weşangêriya Kurdî ya li Tirkîyeyê dinêre, tê dîtin ku di 3 qonaxan de derbas bûye. Em van serdeman li gorî naveroka wan disenifînin; lewra dema ku meriv li serdema pêşî dinêre ku ji 1908an heta 1938an pêk tê, meriv dibîne ku naveroka Weşangêriya Kurdî bi piranî li ser çand, wêje û bi her awayî pêşvebirina Kurdan e.

Stenbol, Amed û Enqere ne. Ji van navendan ên ku herî zêde berhem dane, bi rêzê Stenbol, Amed û Enqere ne. Ji dawiya Osmaniyan heta roja îro, Stenbol bûye navendeke girîng ji bo Weşangêriya Kurdî. Ji ber navendbûna Stenbolê ya di serdema Osmaniyan de rewşenbîrên Kurd ên ji gelek bajarên Kurdistanê, xwe bi Stenbolê ve digirtin. Ev yek jî dibû danûstendineke çandî, hunerî, edebî û heta ciyekî jî siyasî. Ji wê rojê heta roja îro li vî bajarê qedîm gelek berhemên Kurdî hatin dayin. Dîsa li gorî agahiyên ku li ber destên me ne, Weşangêriya Kurdî ya li Stenbolê, bi derketina rojnameya *Şark ve Kürdistan-1908*² dest pê dike û heta roja îro tê. Ji ber ku mijara me Stenbol e, ji bilî senifandina serdemên weşangêriya li Tirkîyeyê ku me li jor destnîşan kir, emê li gorî weşangêriya li Stenbolê ji nû ve senifandinekê bikin. Li gorî weşanên ku li Stenbolê derketine, serdemên weşangêriya Kurdî ya li Stenbolê bi vî rengî ne:

1. Serdema Yekemîn (1908-1921)
2. Serdema Duyemîn (1962-1980)
3. Serdema Sêyemîn (1988-2010)

1. Serdema Yekem (1908-1921): Ev serdem, wekî ku me li jor jî anî ziman bi derketina Rojnameya *Şark ve Kürdistan-1908* dest pê kiriye û bi pirtûka *Hînkêrê Zimanê Kurdî* (Stenbol, Kitêb, 1921, Weşan: Hêvî Civata Talebê Kurdan) dawî lê hatiye. Di vê serdemê de berhemên ku hatine dayin ev in³:

- 1.1. *Şark ve Kürdistan* (Rojname, Stenbol, 1908)
- 1.2. *Kürt Teavûn ve Terakki Gazetesi* (Rojname, Stenbol, 1908)
- 1.3. *Kürdistan* (Rojname, Stenbol, 1908)
- 1.4. *Rojî Kurd* (Stenbol, Kovar, 1913)
- 1.5. *Yekbûn* (Stenbol, Kovar, 1913)
- 1.6. *Hetawî Kurd* (Stenbol, Kovar, 1913)
- 1.7. *Jîn* (Stenbol, Kovar, 1918)
- 1.8. *Kürdistan* (Stenbol, Rojname, 1919)
- 1.9. *Jîn* (Stenbol, Rojname, 1919)
- 1.10. *Mem û Zîn* (Stenbol, Kitêb, 1919, Weşangêr: Hemze Begê Miksî)
- 1.11. *Dîwana Melayê Cizîrî* (Stenbol, Kitêb, 1919, Weşangêr: Şefîk Arwasî)
- 1.12. *Elîfbêya Kurdî* (Stenbol, Kitêb, 1909, Muellîf: Xelîl Xeyalî Motkî)

Elîfbêya Xelîl Xeyalî Motkî, di dibistana "Kürt Numune İbtidaisi Meşrutiyet Mektebi" de ku di

1910an de ji hêla Ebdurrehman Bedirxan û Ehmed Ramiz ve hatibû avakirin, wekî kitêba dersê hatiye xebitandin⁴.

1.13. Hînkêrê Zimanê Kurdî, Rêberê Zimanê Her Du Kurdî: Kurmancî-Babanî (Stenbol, Kitêb, 1921, Weşan: Hêvî Civata Talebê Kurdan)

Di berhemên vê serdemê de Kurmancî û Soranî bi hev re hatine xebitandin. Amîr Hesenpûr destnîşan dike ku heta 1918an zaravayê Kurmancî di pêşiya zaravayê Soranî de bûye.⁵ Lêbelê piştî avabûna Komara Tirkîyeyê pêşî li ber Kurmancî tê girtin û demên qedexebûnê dest pê dikin. Soranî jî li Başûrê welêt pêşveçûna xwe didomîne.

2. Serdema Duyem (1962-1980): Piştî komkujiya Dêrsimê ya 1938an li Tirkîyeyê heta 1960î tu weşaneke Kurdî nayê dîtin. Lewra di vê serdemê de hemû weşan û çalakîyên Kurdî ji aliyê hikûmata Tirkîyeyê ve tînin qedexekirin. Lê piştî derbeya leşkerî û maqeqanûneke nû ya piştî 1960î, li Stenbolê careke din Kurd dikevin nav tevgerê. Di vê serdemê de gelek kovar û weşanên Tirkî-Kurdî hatine derxistin. Giraniya van weşanan bi Tirkî bûn lê di nav rûpelên wan de nivîsên Kurdî jî dihatin weşandin. Kovar û weşanên ku di vê serdemê de derketine ev in⁶:

- 2.1. *Dicle Firat* (1962),
- 2.2. *Deng* (1963),
- 2.3. *Roja Newe* (1963),
- 2.4. *Dengî Taze* (1966),
- 2.5. *Karakoçan* (1969),
- 2.6. *Dengê Sêrek* (1969),
- 2.7. *Doğu Notları* (1975),
- 2.8. *Rizgarî* (1976),
- 2.9. *Devrimci Demokrat Gençlik* (1978),
- 2.10. *Kawa* (1978),
- 2.11. *Ala Rizgarî* (1978).

Ev serdem, bi derbeya leşkerî ya 12ê Îlonê re xelas dibe û dîsa salên qedexebûnê ji bo Kurdî rû didin. Ji salên 1980ê heta 1988an dê tu weşanek Kurdî li Stenbolê neyê kirin.

3. Serdema Sêyem (1988-2010): Ev serdem di Adara 1988an de bi derketina kovara *Medya Guneşî* dest pê dike. Dîsa kovarên *Toplumsal Dîrîlîş, Ozgur Gelecek, Deng, Newroz* û *Stêrka Rizgarî* û rojnameyên *mîna Ulke, Azadî, Raj* ku hinek ji wan hefteyî û hinek jî pazderojî bûn, di vê serdemê de gihîştine ber destê xwendevanan. Di 1991ê de bi rakirina madeya 2932yan, qedexebûna Stranên

Kurdî û Weşanên Kurdî ji holê rabû. Bi vî awayî di navbera salekê de weşanxane û enstîtuyên Kurdî li Stenbolê vebûn. Bi weşanxaneyê *Nûbiharê* û Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê re berhemên xwerû bi Kurdî hatin çapkirin û ev yek vejîneke nû bû ji bo weşangêriya Kurdî; lewra dê ji dîroka Kurdan heta edebiyata wan gelek berhemên giranbiha bihatana çapkirin. Heta salên du hezarî ku şerê li welêt didomiya, ji ber zext û zordestiya dewletê, weşangêriya Kurdî li welêt nedihate kirin. Di van demên dawiyê de li bajarên Kurdistanê jî êdî weşanxane vedibin û li welêt berhemên tîn çapkirin. Li gorî vê serdemê emê weşanên Kurdî ku li Stenbolê derketine bikin du beş. Serê pêşî emê bi kurtasî navê rojname û kovarên vê serdemê bidin. Peyre jî emê weşanxaneyên vê ewrê bidin nasîn û hejmara kitêbên ku çap kirine bidin.

3.1. Rojname û kovarên vê serdemê: Di vê serdemê de ev rojname û kovar derketine pêş:

3.1.1. *Nûbihar*

3.1.2. *Rewşen*

3.1.3. *Newroz Ateşî*

3.1.4. *Welat*

3.1.5. *Azadî*

3.1.6. *Serkeftin*

3.1.7. *Tewlo*

3.1.8. *Tîroj*

3.1.9. *Azadiya Welat*

3.1.10. *Dema Nû*

3.2. Weşanxane û berhemên wan ên vê serdemê: Bi giştî weşanxaneyên ku ji salên 1991ê vir ve li Stenbolê dest bi kar kirine ev in: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Nûbihar, Doz, Deng, Avesta, Vate, Pêrî, Berçem, Tevn, Aram, Mîr/Elma, Hîvda, Komal, Doz, Do, Berfîn, Bajar, Öz-ge, Kor, Firat, Beybûn, Evrensel... û Îthakî. Weşanxane û bi awayekî giştî hejmara berhemên wan ên ku hatine weşandin wiha ne:

3.2.1. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji aliyê komek rewşenbîrên Kurd ve roja 18ê Nîsana 1992yan li Stenbolê hate damezirandin. Armanca damezirandina Enstîtuyê, bi awayekî zanyarî li ser dîrok, çand, huner, ziman û hwd. rawestîna bû. Koma damezirandina Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji van kesan pêk dihat: Musa Anter, Yaşar Kaya, Feqî Huseyin Sağniç, İsmail Beşikçi, Abdurrahman Durre, İbrahim Gürbüz, Cemşîd Bender û Süleyman İmamoglu. Enstîtu, ji ferhengan bigre heta kitêbên gramerê û li ser zargotina Kurdî gelek berhem çap kirine. Hejmara berhemên Enstîtuya Kurdî yê Kurdî wiha ne:

Çeşn	Gramer	Ferheng	Helbest	Çîrok	Biyografi	Lêkolîn	Perwerde
Jimar	2	6	8	10	1	17	5
Tevîn	49						

Tablo1: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

3.2.2. Weşanxaneyê Nûbiharê: Di Adara 1992an de ji hêla Muştêhîr Karakaya, Suleyman Çevik û Sabah Kara ve li Stenbolê wekî weşanxane dest bi xebatên xwe dike. Peyre bi navê Nûbiharê kovarekê derdixin ku heta niha 113 hejmar derketiye. Niha jî edîtorî û berpirsariya kovar û weşanxaneyê Suleyman Çevik dike. Bi derxistina kovarê re gelek kitêbên Kurdî-Tirkî çap kirine. Ji van kitêban 54 hebên wan bi alfabe ya latînî, 13 heb bi elîfbêya Erebî û 6 kitêb jî bi Tirkî hatine çapkirin. Di bin navê weşanxaneyê Kentê de 39 kitêbên bi Tirkî jî hatine çapkirin. Kitêbên ku hatine çapkirin bi piranî Kurmancî ne, 2 kitêb jî bi Dimilî ne. Hejmara berhemên Nûbiharê yê Kurdî wiha ne⁷:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest	Raman	Ferheng	Gramer	Lêkolîn	Dîrok	Pexşan	Jinenîgarî	Bîrewerî	Meal	Îmîhal
Jimr	4	6	24	16	4	1	1	4	3	1	1	1	1
Tevn	67												

Tablo2: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Nûbiharê

3.2.3. Weşanxaneyê Dozê: Bi navê Roj salnameyê Kurdî çap kirine. 25 hejmar kovara Serbestî, 5 hejmar jî kovara Pelîn çap kirine. Nêzî sed û çil pirtûkên Kurdî-Tirkî çap kirine⁸. Hejmara berhemên Dozê yê Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest	Dîrok	Ferheng	Perwerde	Gramer	Biyografi
Jimar	18	20	21	1	2	1	7	2
Tevîn	72							

Tablo3: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Dozê

3.2.4. Weşanxaneyê Dengê: Bi navê Dengê 77 hejmar kovareke siyasî derxistine û digel wê heta niha gelek pirtûkên Kurdî-Tirkî çap kirine⁹. Hejmara berhemên Dengê yê Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest	Dîrok	Ferheng	Folklor	Hevpeyvîn	Biyografi
Jimar	2	2	3	1	2	4	1	2
Tevîn	17							

Tablo4: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Dengê

3.2.5. Weşanxaneyê Avestayê: yek ji wan weşanxaneyên Kurdî ye ku li sirgûnê dest bi weşana xwe kiriye. Li bajarê Stenbolê, di payîza 1995an, meha Çiriya Paşîn de dest meşa xwe ya weşangêriyê kiriye. Ji hêla Ebdullah Keskin, xanima wî Rûken Baxdû Keskin û xwişka wî Songul Keskin ve hatiye vekirin. Heta niha nêzî 350 pirtûkên Kurdî û Tirkî weşandine. Niha jî wekî du navend ku yek ji wan li Stenbolê ya din jî li Amedê ye, xebata xwe ya weşangêriyê didomîne. Her wiha di bin navên “Keskesor”, “Şahmaran” û “Hêlîn” de kitêbên cûr bi cûr diweşîne. “Hêlîn” ew kategorî ye ku ji wê, pirtûkên zarokan derdikevin. Hejmara berhemên Avestayê yê Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest	Dîrok	Lêkolîn	Bîrewerî	Destan
Jimar	22	21	40	6	13	2	1
Tevîn	105						

Tablo5: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Avestayê

3.2.6. Weşanxaneyê Vateyê: Di sala 1996an de li Stockholmê ku paytexta Siwêdê ye, ji bo ku di zaravayê Kirmackî-Zazakî-Dimilkî de xebat bimeşîne, wekî “Koma Xebatê ya Vate” hat damezirandin. Di nav salên 1996 û 2008an de ji bo standardîzasyonê zaravayê Kurdî yê Kirmancî (Zazakî, Dimilkî) xebat meşandin. Ev xebat di kovara “Vate”yê de derketin pêşberî xwendevanan. Weşanxaneyê Vate, di 2003an de li ser

bingeha "Koma Xebatê ya Vate", li Stenbolê hat vekirin. Piştî vebûna Weşanxaneyê Vate, êdî kovara "Vate" û pirtûkên weşanxaneyê, li Stenbolê derketin. Heta niha 31 pirtûk û 10 hejmarên kovara Vateyê ji hêla vê weşanxaneyê ve hatine weşandin. Hejmara berhemên Vateyê yê Kurdî wiha ne¹⁰:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest	Hevpeyvîn	Folklor	Gramer	Ferheng	Bîrewerî
Jimar	3	9	5	5	14	1	4	1
Tevîn	42							

Tablo6: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Vateyê

3.2.7. Weşanxaneyê Pêriyê: Heta niha nêzikî 250 pirtûk çap kirine û ji vana heştê û pêncên wan bi zimanê kurdî ne¹¹. Hejmara berhemên Pêriyê yê Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest	Ferheng	Ceribandin	Gramer	Lêkolîn	Bîrewerî
Jimar	34	12	11	2	5	4	8	9
Tevîn	89							

Tablo7: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Pêriyê

3.2.8. Weşanxaneyê Berçemê: Hejmara berhemên Berçemê yê Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Ceribandin	Helbest	Şano
Jimar	3	1	4	1
Tevîn	9			

Tablo8: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Berçemê

3.2.9. Weşanxaneyê Tevnê: Hejmara berhemên Tevnê yê Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest	Destan
Jimar	2	2	8	1
Tevîn	13			

Tablo9: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Tevnê

3.2.10. Weşanxaneyê Aramê: Bi navê Vesta 6 hejmar kovarekê çap kirine û digel wê pirtûkên giştî û yê kurdî çap kirine.¹² Hejmara berhemên Aramê yê Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest	Dîrok	Şano	Ceribandin
Jimar	3	7	10	3	4	2
Tevîn	29					

Tablo10: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Aramê

3.2.11. Weşanxaneyê Mîr-Elmayê: Hejmara berhemên Mîr-Elmayê yê Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest	Ceribandin
Jimar	2	3	2	1
Tevîn	8			

Tablo11: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yê weşanxaneyê Mîr-Elmayê

3.2.12. Weşanxaneyê Hîvdayê: Hejmara berhemên Hîvdayê yên Kurdî wiha ne:

Çeşn	Raman	Çîrok	Gramer	Destan	Helbest
Jimar	2	2	1	1	1
Tevîn	7				

Tablo12: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yên weşanxaneyê Hîvdayê

3.2.13. Weşanxaneyê Komalê: Hejmara berhemên Komalê yên Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest
Jimar	7	4	1
Tevîn	12		

Tablo13: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yên weşanxaneyê Komalê

3.2.14. Weşanxaneyê Doyê: Hejmara berhemên Doyê yên Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Çîrok	Helbest	Biyografi	Ferheng	Folklor	Şano	Gramer
Jimar	10	8	11	2	1	4	2	1
Tevîn	39							

Tablo14: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yên weşanxaneyê Doyê

3.2.15. Weşanxaneyê Bajarê: Ji hêla Kawa Nemir ve di 2003an de hatiye avakirin. Hejmara berhemên Bajarê yên Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Helbest
Jimar	4	8
Tevîn	12	

Tablo15: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yên weşanxaneyê Bajarê

3.2.16. Weşanxaneyê Fîratê: Hejmara berhemên Fîratê yên Kurdî wiha ne:

Çeşn	Roman	Gramer	Helbest	Ferheng	Lêkolîn
Jimar	3	1	3	1	3
Tevîn	11				

Tablo16: Li gorî çeşnên edebî hejmara pirtûkên Kurdî yên weşanxaneyê Fîratê

Encam

Ji bilî weşanxaneyên navborî, weşanxaneyên bi navê *Beybûn*, *Berfîn* û *Yom* hene ku bi navên Kurdî hatine saz kirin; her yekî bi Kurdî du-sê kitêb çap kirine. Herwiha *Weşanxaneyê Korê* bi tenê kitêbek bi Kurdî çap kiriye ku ew jî bi navê: *Siyaseta Netewî û Helsengandina Tevgera Netewî ya Kurd* e û ji hêla Aslan, M. Emin ve hatiye nivîsîn.

Li gorî çeşnên edebî hejmara giştî ya berheman

Piştî agahdariya yek bi yek a weşanxaneyan, bi giştî li gorî çeşnên edebî hejmara weşanên ku ji hêla van weşanxaneyan ve hatine kirin jî wiha ne:

LI GORÎ ÇEŞNÊN EDEBÎ HEJMARA PIRTÛKAN

Çeşn	Helbest	Roman	Çîrok	Raman	Ferheng	Lêkolîn	Folklor	Gramer	Bîrewerî	Dîrok	Ceribandin	Biyografî	Hewpeyvîn	Şano	Destan	Perwerde
Hejmar	160	117	106	18	22	42	22	18	13	15	12	7	6	7	3	6
Tevîn	574															

ÇAVKANÎ:

1. Kaya, Fetullah. *Kürt Basını*, Hîvda İletişim, İstanbul, 2005, r.196
2. Lewendî, Mehmûd & Malmîsanij, *Li Kurdîstana Bakur û li Tirkîyeyê Rojnamegeriya Kurdî -1908-1992*, Öz-Ge Yayınları, 1992, Ankara, r.16
3. Berhema navborî.
4. Yıldırım, Kadîrî, Doç. Dr, *Dîroka Xet û Alfabeşên ku Kurdan Bikaranîne û Berhemên ku bi wan Alfabeşan Nivîsandine, 3yemîn Rojên Wêjeyê li Diyarbekirê-Konferansa Zimanê Kurdî, Weşanên Midûriyeta Çand û Turîzmê ya Şaredariya Bajare Mezina Diyarbekirê*, 2006, Diyarbekir, r.103
5. Hassanpour Amîr, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, Avesta Yayınları, 1997 İstanbul
6. Lewendî, Mehmûd & Malmîsanij, *Li Kurdîstana Bakur û li Tirkîyeyê Rojnamegeriya Kurdî -1908-1992*, Öz-Ge Yayınları, 1992, Ankara, r.16
7. <http://www.nubihar.com>
8. Verroj, Seîd. Kurtenihêrînek li ser Weşangêriya kurd li Kurdîstana Bakur, *Bîr 6*. 232-33. Amed.
9. Gotara navborî.
10. <http://www.zazaki.net>
11. Verroj, Seîd. Kurtenihêrînek li ser Weşangêriya Kurd li Kurdîstana Bakur, *Bîr 6*. r. 232, 2007, Amed.
12. Verroj, Seîd. Kurtenihêrînek li ser Weşangêriya Kurd li Kurdîstana Bakur, *Bîr 6*. r. 232, 2007, Amed. ●

Helbesta helbestê

Mesud Serfiraz

Dema we ev riste xwend belkî ezê nîn bim
Lê hêvîdar im bi helbestên xwe daîm jîn bim

Ez bikevim bin axê jî ev şîr wê hebin
Û bi barana biharê, wek kulîlka vebin

Wê mênin ji hezkirên min re ji min yadîgar
Bi bîranîn û dilsoziya wan ez jî bim bextiyar

Zarokê min in hemû, şevên dirêj de nivîsîn ew
Bo wan min terk kir sohbeta dost û yaran û xew

Em jî ketin pey şûnpêya Cizîrî û Xanî
Lê haşa, ew hunera wan bi min re kanî

Behra nezmê de geriyam gewherên giranbiha
Da helbestekê binûsim ku di çolê de bibe waha


Serfirazo bes e êdî gotinê qut ke
Xwe ji cil û bergên riyayê rût ke

Tu jî zanê, soza xweş û bi qiymet a kin e
Zêr sivik e, lê qedrê wê grantir ji hêsin e



Hêviya di eyneya huznê de Sabah Kara

Berken Bereh



*Sabah Kara
em ji çîrokekê welidîn
dapîra me çiya û berf
lew
her ku agir tê gotin
pêçiyên min radîpelîkin rojê
û
nikarim xwe, govendekê
digerînim
li navbera du çeman*

*ez
kurê êş û huznê
her li şî'rekê geriyam
zarokên wê ne sêwî*

*hevalê/a min av û şev e
ev hezar sal e*

Berken Bereh

Piştî cuntaya faşîst a 12ê Îlonê hemû sazî û dezgehên Kurdî yên bakurê welêt ketin bin nîrê sitemkariyeke barbar. Bakurê welêt bû zîndaneke servekirî. Her kesê ku dikarî ji xwe re rêyekê bibîne berê xwe da welatên Ewrûpa yan metropolên Tirkîyê.

Sabah Kara yek ji wan kesan e ku di şert û mercên zor dijwar de da dîv êş û kulên xwe -çi takekesî, çi civakî- ji ber nebûna weşanên Kurdî demekê wekî gelek kesan bi zimanê Tirkî nivîsand. Paşê vegeriya zimanê xwe yê zikmakî. Di amadekirin û weşandina kovara Nûbiharê de keda wî gelek e. Helbestên xwe yên ku bi Tirkî hatibûn nivîsandin ji nû ve û bi derfet û deliveyên zimanê Kurdî daxist ser rûpelên helbesta Kurdî. Sabah Kara em dikarin bibêjin li bakur piştî Tîrêjê yekem kes e ku kovareke Kurdî amade kiriye û berhemeke Kurmancî çap kiriye. Ku em werin ser poetîka û berhemên wî:

Sabah Kara di "Mersiyeyên Rojhilat" de poetîka xwe li ser huznê ava kiriye. Herçiqas di helbestên wî de em wekî jêderka huznê bûyer û qewimînên malbatî û têkçûnên di jiyana wî de rûdane bibînin jî, rewş û panoramaya li welêt û zilm û zordariya li ser gel jî di vê huznê de têra xwe girîng e. Ew li Stenbolê bijî jî, dil, hiş, gi-

yan û mejiyê wî her li Nisêbînê ye. Hesret û qewimînên li welêt di nav hev de disitire û bi helbestê radigihîne me.

*Ji dema min çavê xwe bi
dinyayê vekiriye*

*Menzera min (ango şair) dîtî
ev e*

*Têkçûyên payîzî ne, dest bi-
dim çi ez li çi binêrim*

*Şî'r û xewn in di nav pelên
belawela*

"Ji bo hevalên min" ku di sala 1980ê de hatiye nivîsandin hest û psîkolojiya serdemekê di-hewîne. Lew, wê hingê tu lukseke rewşenbîr an şoreşgerekî tunebû ku xwestekên wî yên şexsî hebin, ew divê her ji bo civaka xwe, xewn û xeyalên xwe têbikoşe.

em ku ji bo aştiyê dibêjin

Û em aştiyê dibêjin bi timî

Ev aşîti em zanin sembola politîkaya têkoşîna welat û ji wêdetir dinyayeke xwestir û aramtir e. Lê feleka xayîn di heman salê de di ser derbeya faşîst re, mirina kekê wî jî dike bar li ser dilê wî yê dilpiyar. Helbet helbestvan jî dê pênuşa xwe ji bo vê huznê û sergihayîkirina wê serê xwe biêşîne û li çareseriyekê bigere. Sabah Kara jî mirin û bandora wê ya li ser derdora xizmên mirî û bi taybetî jî li ser zarokan dike mijara xwe û dixwaze mirinê bidarizîne.

Em ku di hesreta bav de ne hê jî
 Ma wê çî bikin di wî umrê de zarok
 Çawa dimeşin hê jî mirov
 Ro çawa ronî dike hê jî
 Û bersiva pirsaxwe weha dide;
 Eger bi ya min be, ez ê bêjim
 Bila nemirin bavê zarokên biçûk

Lê zeman dermanê her tiştî ye. Bi demê re mirov
 hînê her tiştî dibe, herwiha bi mirina kekê xwe jî.
 Mirin rastiyeke dinyayê ye. Madem em hatine her-
 wiha dê rojekê jî herin. Vê jî wiha vedibêje;

Li cihkî ku ez nebihîsim dengê mirinê
 Kils nikare spî bike siya mirî û mirinê

Zarok û mirin du têgehên beloq ên di helbesta
 Sabah Kara de ne. Sabah Kara yekem kes e ku bi
 çav û hestên zarokê li mirinê û texrîbata wê ya di
 giyana zarokan de dike aniye zimên. Ew dinyayê û
 çawaniya wê û bextewariyê bi dilxweşî û tenduris-
 tiya zarokê ve girêdide. Ew zane ku ger însên qedr
 û qîmetê bide zarokan û ji bo dahatûya wan bihizire
 dê rê li ber gelek neheqî û neqenciyan jî were girtin.
 Ji ber vê jî;

Xemên wî bila yê min
 Nexweşiyên wî yê min
 Û hemû şahiyên min
 Bila bibin malê wî

Di dawiya vê beşê de baweriya xwe ya ku dê
 rojek zarok hemû xeletiyên paqij bike tîne zimên;

Dê pak bikê ku jêbir bikire zarok
 dê paqij bike dinyayê ji xeletiyên

Helbesta "nisêbîn/1 û nisêbîn/2" de rewşa welêt
 û perçebûna wê vedibêje ;

çima navê te
 Şirikê huznê ye
 Şirikê kinê ye
 Di devê min de,

.....
 Mamosteyê ku min
 zimanê wî nedizani
 Dibistan

.....
 Şaş û behitî, şaş û
 behitî
 Û;

Dema ku tu tê bîra
 min
 Dikin mayîn biteqin di
 dilê min de

Di "Şîna zarokên li Helebçe hatin qetkîrin" de;
 Hûn wisa dilgeş û karman in êdî
 Tevkujiya zarokan jî nikare we xemgîn bikê
 Ma ne em bûn nalîna mezlûmekî
 Zelzeleke cîhanî qevul dikir ji bona herkesî
 Gazindan dike ji her kesê li vê dinyayê dijî û paşê
 şûrê xwe raberî xwe jî dike;

Heyf e ku em biqasî kawa jî nehatin,
 Û ya xwe vedibêje;
 Bila di mejiyê me de rabê qiyamet eger wê
 rabê

Yan raperînek bi rûmet, yan bila tevkujiyek bi
 giştî biqedê
 Hawara xwe radigihîne Cegerxwîn û spasiyên
 xwe tîne zimên;

Dema ku te bang da bi dengê xwe yê xwînî
 Hişyar bûn dar û berê welatê min
 Kevir û ax û kulîlk
 Mirov û teyr û xezal
 Hişyar bê bibin


Di "Ji bo hevdeman/xwîn-pût-ço-asa" de li ser
 pirsgerêkên vê dinyayê disekine û bi peyvên olî û
 navên pîroz pirs û bersivên xwe vedirêse. Ji bo din-
 yayeke adil û jiyanekê bi rêk û pêk dîsa bi remzên
 olî banga xwe radigihîne me;

Bişkîn pûtên vî xaniyî Biraîm

Sabah Kara di helbestên xwe de pirsgerêkên xwe
 û yên civakî û gerdûnî bi zimanekî dewlemend û
 cuda vedirêse. Şêwaz û formeke cuda bi kar tîne. Di
 hin helbestan de em rastî bandora rîtuêlên helbesta
 Tirkên oldar bîn jî di tevahiya berhemana de rastî
 Kurd û Kurmancî û çanda wan tîne.

"Nameyên bê cewab" duyemîn berhema helbes-
 tan a Sabah Kara ye ku wek nameyeke dirêj hatiye
 nivîsandin. Balkêşî û taybetiya vê berhemê ew e ku
 Sabah Kara wek rojnamegerekî kamêraya xwe raberî
 heyatê dike û li erdnigariya cihê lê mezin bûyî digêrîne.
 Her tiştê bi kamêraya wî ve dizeliqe dibe dîmen û
 perçeyekî wî fotoyê mezin ku di dawiyê de dînya û
 mirovahî û hemû giyanewer di wir de bi cihûwar
 bûne. Helbet ev fotoyê mezin ku hemû giyanewer
 tê de bi cih bûne, wek filmekî tragediya qonaxekê li
 pêş çavê me diherike û em, ew kesên ku figûranên
 wî filmî ne, rastî rastî û tragediya xwe tîne.

Herçiqasî huzn di vê berhemê de jî di govendê
 de be jî sergovendê vê berhemê qîrîn û hawar e ku
 berê me û dilê me ji êşê zêdetir, ber bi asoya hêviyê
 ve radike pêdarê. Kî çî bibêje bila bibêje helbest
 wêrekerîrîn û kartîkerîrîn beşa wêjeyê ye. Ev rastî



di "Nameyên bê cewab" de wek tîrêja rojê xwe di dil û mêjî de bi cih dike.

Sabah Kara di vê berhemê de dike nake nikare agirê dilê xwe bivemirîne, sersebebê vî agirî baş nas dike lê ji kefteleft û berxwedana xwe jî bêhêvî ye. Dibe ku ev helwest û pêşbîniya wî jî jê re ji "Mersiyeyên Rojhilat" mabe. Ew, di wextekî wiha de jiyaye ku berdêlî sedan salan e. Civakeke li kêlek zaroktî û xortaniya wî ku ji hemû gencîneyên xwe bêpar maye û ji nû ve bi dest ve bîne têdikoşe. Ev têkoşîn û berxwedana qewmê wî helbet di giyanê wî ye nazik de dibe sedema serûbinbûna dil û mêjî. Di berhemê de em rastî hawar û qîrîna dilê wî tî. Ev hawara ku ku xwe digihîne erş û ezmanan. Ji ber vê hindê ez dikarim bibêjim ku "Nameyên bê cewab" ji bo her însanî hatiye hinartin û her xwînêr dê vê peyamê bi xwendinê re hîs bike.

Sabah Kara nameyên xwe li du cihan nivîsandine. Nameyên ewilîn li Nisêbînê hatine nivîsandin (ên sala 1991ê). Ji nameya 18ê pê de em pê dihesin ku li Stenbolê hatine nivîsandin. Sersebebê van jî lêgerînek e, hewldanek e. Lê em di wan de (herçiqasî mekan guherîbe jî) rastî guherîna huzn û hawarê nayên. Jixwe ew dixwaze vê rastiyê raberî me bike. Ev jî Kafka û Joysî tîne bîra me ku wext û zemanî diguvêşin û di kêlîkekê de top dîkin. Bi vî awayî hem rabirdû, hem îro li moxila rexneyê dixin. Em baş dizanin ku di vê helwestê de metirsiya dahatûyê heye. Ma Tolstoy di "Şer û Aştî'yê" de bi vê rêbazê civak û însên bi awayekî felsefî, exlaqî û estetîk nedarizandiye? Li vir arîşeya sereke darizandina wext û zemanî ye. Jixwe kesê nikaribe vê pêk bîne dê nikaribe estetîkeke edebî jî bi dest xwe ve bîne. Ango nivîskarê nikaribe li heqîqetê bigere dê nikaribe deriyê dinyayeke xwestir jî veke.

"Nameyên bê cewab" di kolan û kuçe û odayên me de diçe û tê. Di her gav avêtinê de pîrsekê aresteyî me dike ku ji şûr twîjîrtir û diwartir e. *Çi tişt heye di jiyana me de ku em dikarin bibêjin ev a me ye/ çima zarok pîrtir têne ve dunyayê her roj li vir/ Pîrsa van jî qebelat e û dînbûn jî bi iznê ve girêdayî. Ez li vir im bi teyrên ehlî re, yê mehkumên vî bajarî... û dimeşe, wek ku bibêje va ez li ber xwe didim lê ka hûn? Çawa roj diçe ava û gav bi gav tarîtir dibe, rist û rastî jî tîrtir û êşdartir dibin;*

*Em bi roj herbê dixwin, bi şev herbê dixwin li vir
Em mirovan xerc dîkin, quruş quruş bi hev re (r. 20)*

Bankê hêsiran li vir vebûn tu nizanî (r. 16)

Ma nehatin guhertin firaxê sifir bi yê bafon.

Dirustbûn enayîti ye û namûs peyveke anonîm... (r.24)

Wek bagera li olana xwe bigere, li dengekî, li destekî, li awirekî digere û ji ya xwe nayê xwar, ku ev neguherin ez dê ji ez bûnê derkevîm û bibim tiştêkî din.


Wek hemî şairên avant-garde, di helbestên Sabah Kara de jî reng û nexşên destanî dixuyin. *"Adem im ku di cennetê de li cennetê digirim/ez qatilê meqtûl, hakimê mehkûm, neheqê heqdar/li pişt her deriyê ku vedikim, dîwar, dîwar...û rastî û derwa îdeologên postmodernîstan ku dîrokê wek çîrokê vedibêjin, aşkêre dike/ ez dikarim bi bombeyên kîmyayî, zarokan bikujim û têra xwe kêfxweş bibim."*

"Nameyên bê Cewab" bê rawestan bûyer û qewimînan vedibêje, dîrokê didarizîne, îro û nihayê datîne ser sifirê. *"eger bibêjim ez ji nijadekî me ku ev bi sedan sal in/zimanê zarokên wî hatiye birîn, tu bawer naki./Bê siûd im, bê welat im, bê kes im û/qanûnê Dêrsimê hakim in li dunyayê ji bo min... û rojê sê danan dibe şahidê talanan ku baweriya wî bi insanbûna wî nayê...lê bavê wî tê hawara wî û ji bo ku kul û derdê hemî zemanan vebêje wî direvîne."*

Lê carekê felek lê xayîn derketiye, huzn bûye dildara wî ya tekane, ji ber hindê li tu waran kon veneda, tu wargeh wî qebûl nake; *"ez di nav du agiran de hatime jibîr kirin/loma ku ez dipeyivim dengê himhima hinan bilind dibe/loma dengê alemgiştî yê erd û azmana ye dengê min. Lê nikare bêdeng bimîne lew, ew zarokên lal, li devê min dinêrin."*

Li vir em rastî helwesta nivîskarên modêrn tî; afirandin bîyî felsefê, siyaset, civaknasî û asta zanîna însen nikare bi pêş bikeve. Ji ber hindê takekesiya ji reh û rîşalên civakî hatin dîrxistin, li ber aferîneriya hunermendî jî asteng û ke-leheke pîr bilind e. Sabah Kara rastiya berhemdariyê-ke rasteqîn raberî me dike û li ser me ferz dike.

Ger em bi hûrgilî li ber-hema Sabah binihêrin, em



evînistan

mehmet ali aluç

di reşika çavên te da zam
xwe ve hatim, xwe hesiyam,
strana li ser zimanê,
evîndaran,
û kesên bêkes bûm...
olan olan belav bûm.
li evînistanê,
di kerrika guhên te da
dişingiyam...

di reşika çavê te da hatim hêran
hûrik hûrik dibarîm
li ser tiliyên qelemîn.
te pêçiyê xwe yên nazik,
dimaştin bi bijangên min.
birûyên min şil dibûn,
bi hêstirên çavên te...

di reşika çavê te da hatim istiran
bi hevîrtirşê ji nav lepê germtirîn
hatim meyandin,
hilatim di dilê ku dibarî
li ser dilê min...
êdî hevîrê hilatî bûm
keliyam di tirrafa awirên kujer da
û... çavên te,
çavên te yên kenok
ez xwarim...

di reşika çavê te da heliyam
dibarîm dilop dilop,
li ser bejna ahengdar...
di kefa destê te da civiyam,
herikîm li ser rûyê xemrevîn.
eniya te diteyisî,
çavên te dibiriqîn,
rûyê te dipirijî.
te destên xwe şuştin,
bi rondikê çavên min...

di reşika çavê te da rijiyam
têrav bûn çem û robar,
li deşt û baniyan...
ava delavan bûm li serê çiyar,
ajalên benê bi tî û tî,
li min digeriyan...

di reşika çavê te de darivîm
çirava avzêma çavê te bûm
di pengava dilê te da
gihêştim hev.
nişkave miçiqîm,
lewra,
çavên te
ez vexwarim...

di reşika çavê te da pişirîm
bûm toz û tebar,
bûm dû û dûman
hilkişiyam ber bi asîmanan
spîçikê çavên te qirêj bûn
ku ez li ser te weşiyam...

di reşika çavên te da sincirîm
birijîm, sor bûm, geriyam bizot,
cit bûm di kevçika dilê te da,
bi axîn û keseran...

di reşika çavê te da hatim cûtin
di bin giraniya awirên te da
pelçiqîm
pij û belav bûm li ser sînga te
wenda bûm ji nişkave...
çavên te,
bi azwerî ez veşartim
nehatim dîtin ji wê demê pê ve...

16 sibat 2011/
hayrabolu

dê bibînin ku ew di hiş û bîra me ya têkçûyî de digere,
deriyê têkoşîna jiholêrakirîna neheqiyê, li wekhevî,
azadiyê digere, lew encax bi wê lêgerînê dê me û xwe
bibîne û deriyê jiyaneke hêjatir veke. Bi vê henûnî û
bawermendiya xwe jî moral û cesaretê dide me;

Lexwe tu pir bijî ey xapîn

Pir bijî ey fitiloka riya nû

Bila di mêjiyê min de qamçiya zanîne biçeqê

Bila rabê şahê îdî hespê sor ê zêhna min. (r.60)

Niha li vir, li ber we, ezê ya dilê xwe vebêjim;

Sabah Kara ji bo Arya'ya neviya min nivîsiye,
ji bo hevalên min...

danûstandina wî bi me re ye,
pênûsa te daîm be Sabah Kara.

JÊDERK

Sabah Kara, *Mersiyeyên Rojhilat* - 1998 Stenbol, Weşan-
xaneyaya Nûbihar

Sabah Kara, *Nameyên Bê Cewab* - Nisan 1998 Stenbol, We-
şanxaneyaya Nûbihar

Berhevdana kultura devkî û sosoyolojiya dengbêjiyê

Abdulkadîr Gok

Kevneşopiya dengbêjiyê, nîşana rastiya edebiyata gel a anonîm e. Dengbêjan kilamên xwe, di odayên mîr û begên Kurdan de, ji bo gelê xwe pêşkêş kirine. Bi vî awayî edebiyata devkî ya netewa Kurd li nav edebiyata cîhanê, ciyê xwe girtiye.

Lêbelê, tiştê ku heye tim û daîm bi tûjî, hêsîrî, evdalî, rebenî, pepûkî, xapandinî, mêrkujî, şîn, qaçaxî, egîdî, mêrxasî, dewlemendî, belengazî, evînî û dilîtiyê bûye. Netewa Kurd di sedsalên dawîn de li çar perçeyên ku Kurd lê dijîn de gelek şer û zehmetî kişandiye. Êş û azarên xedar kişandiye. Gelê Kurd qîriyaye, naliyaye, elem û kedera dilê xwe di hundirê xwe de beredaye. Ji ber van derb û hovîtiyên nefsanî hest û hîsên xwe anîne ziman. Li ser kul, keser, keder, derd û xemên xwe gotine. Kilam gotine, lawij gotine, şîn gerandine... Evîndariya di dilê keç û xortan de bi zimanê evîndariyê gotiye. Jin û mêran, derûniya dilê xwe bi gotin û bi terman deng dane. Pêşî, jinan peyv dane ser hevûdin. Mîna mûyê rîsîn kirine tevn û xemlê; mîna hiriyê hûnandine,

kirine hical, palas, heqîb, ber û xalîçe. Jana dilê xwe ya ji derdan êşiyayî û kezeba xwe ya ji kerban û derban şewitî, bi sedsalan, bi vî rêyê dane der. Van hestan bi dengê lorîn û lorikan xwe dane der. Pey re jî ev gotinên bişewat ên biaheng û biritm, ketine devê dengbêjan, bi sewt û awaza wan, olan dane li seranserê welêt. Li ser çar perçeyên ku Kurd lê dijîn; li zozan û çolan, li dûz û berriyan ev dengên stranbêj û denbêjan olan dane. Hest û hîs bûye deng, deng bûye ritm, ritm bûye nirxa evîndariyê, êş û elem bûne qedera Kurdan. Dengbêjî nîşana dîroka qedera Kurdan bereder dike.

Bi saya dengbêjiyê dîroka Kurdan bi awakî zindî li ser nigan maye. Di dema modern

Bi saya
dengbêjiyê dîroka
Kurdan bi awakî
zindî li ser nigan maye.
Di dema modern de, tu
nirxên dîrokî mîna
esliyeta xwe ne
dî heyatê de ne



Kawis
Axa

de, tu nixên dîrokî mîna esliyeta xwe ne di heyatê de ne. Esliyeta nixên civakî yên gelek netewan hatine guhertin û bi awakî modernî hatine veguherîn.

Dengekî ji van, olana awaz û ritma dengbêjên Kurdan e. Nalîneke dûr û dirêj; zarîneke ji geliyîne kûr... Gewriyeke mişt bi sebr û sebatê girtî. Erê, bi rastî bêhna sewtên dengbêjî, ne mîna yên bêhna tew yek dengekî Kurdistanê ye. Bêhna dengên dengbêjan bi peyvên xwe yek bi yek, hêdî hêdî, narîn narîn, lorik lorik û bi hemd dibêjin. Hem mirovan dibe rojên berê, hem jî tehmeke xwe dide dil û hinavên mirovan. Bi dengê dengbêjan dîrok, bûyer, çih û war, dîldarî û evîn li ber çavên merivan û di mêjiyê merivan de mîna şirteke filîman raber dibe. Dengê dengbêjan dibe filîm. Filîmekî dîrokî, civakî, exlaqî, olî, mîrî û begitî û hwd.

Edebiyata Kurdî ya devkî, bi gotina gotinbêjên di alî nixên civakî de pir girîng e. Edebiyata devkî bi dewlemendiya kilam û stranên dengbêjan hîn zêde û geş dibe. Heyf û mixabiniyeke mezin e ku têra xwe nehatiye lêkolîn. Edebiyata me ya devkî ku sedî sed ji deng, kilam û çîrokên dengbêjan tê, lê bi awakî zanistî û bi qedr û qîmet nehatiye lêkolîn. Li cem Lêkolînerê zargotina Kurdî, hêja ye Ahmet Aras, Prof. Dr. Celîlê Celîl û Salihê Kevirbirî, berê çira,

fanos û fenera xwe dane vê hêlê jî, dîsan jî hîn dilê vê şaxa edebiyata Kurdî honik nebûye. Derdê wê şaxa edebiyatê derman nebûye. Lêkolîner û zanayên dengbêjiya Kurd, mixabin li gor dewlemendiya wê pirr kêma in. Eger, ev edebiyata devkî bi dest Rojhilatnasan biketa, wê bi hezaran pispor û bi dehhezaran pirtûk û berhem li ser dengbêjî û stranbêjiyê derxistana.

Hin qismên edebiyata devkî li gor herêm û zaravayan têne pêş:

1. Taybetiyên şîrê (bend, teşeyê nezî)

2. Hêmanên naverokî (mijar û tema)

3. Hêmanên ahengî (kêş, pergala qafiyeyê, redîf)

4. Ziman û şêwaz (xweseriya dengbêj, stranbêj, çîrokbêj, hunerên edebî yên peyv û gotinan)

Bi ser van de jî me hewl da ku ji hêla antolojîk ve van kilam, lawij û stranên jî derxin holê. Mixabin ji vê yekê re çavkanî pêwîst bûn. Ew jî tenê birêz Baqî Xido, Osmanê Xaniheşerê, Xaarî, Şûkrî Îzol, Mehmûdê Abê, Cemîl Horo, Degbêja Salhê, Bavê Ferîd... Loma ji aliyê mêjûyê van berheman hinekî qels, kêma û neçê mane. Heger, mecal û firsenda me hebe, emê bi xêra çavkaniyên zindî, pêşiya xwe hinekî din ronî bikin û baştir bibînin, cîhana xwe ya

dengbêjan û hêla edebiyata xwe ya devkî zelal bikin.

Her dengbêj û stranbêjekî terz û ritmeke xwe heye. Li gor terza dengbêjên mamoste, tesîra li ser dengbêjên li pey mamostê xwe hatina xwe bereder dike. Baqî Xido li ser herêma Berazan an jî li ser herêma Berrîyê gelekî bi tesîr e. Terza wî di kilamên gelek dengbêjan de heye.

Ez dixwazim bi lêgerîn û lêkolînên li ser ziman, dîrok û çanda Kurd xwerûtî û aliyên ciyawazên çand û dîroka Kurdan derxînim holê û rastiya wan a dîrokî û civakî pêşkêşî xwendavanan bikim. Dîrok, bi lêkolîn û bi tesbîtkirina nixên mirovî dibe. Dibe ku hiş û bîra we ya dîrokî-civakî teze bike, rastiya dîroka civaka Kurd û berhemên çanda wê li ber çavan raxîne û ji aliyên erênî û neyînî, başî û xirabî, rastî û nerastî, ronî û tarî ve bi bîra we bîne. Û digel wê jî dê bersiva wan kesên mejîşêlûker bide ku bi navê "zanistiyetî" û "pêşverûyî", li miqabilê hemû hovîtî û bêperwayiya dagirkeran, tevgera netewî û civakî ya Kurd bi "kevneşopî" û "neteweperestî" yê tawanbar dîkin. Çand û kultura zimanê Kurdî û edebiyata devkî ya dengbêjiyê ji bo me gelekî girîng e. Divê ev lêgerîn û lêkolîna li ser dengbêjan bi rêkûpêk be. Di vê çarçovê de rêbaz û rêgezên bingehîn ev in:

1- Dîroka mirovahiyê, dîroka hilberîna çandê ye. Çand (kultur), di pêvajoya dîrokê û jiyana civakî de hilberîna hemû nixên maddî û manewî ye. Hilberîn an jî bingeha çand û kultura zimanê Kurdî jî kilambêjî û stranbêjî ye.

2- Ji ber sedemên diyar, dewlet û unsûrên dewletên herêmî, naxwazin hebûn û tesîra Kurdan



di pêkhatina mîrasa şarezayî ya Mezopotamya û Rohhilata Navîn de qebûl bikin. Lê pêwîst e ku Kurd dîrok û çanda xwe ya devkî ya dengbêjîyê ji hemû dinyayê re rave bikin. Kurd, pêwîst e ku çanda xwe ya devkî mîna royê raberî gelê xwe û netewên cîhanê bike. Mîna rîstekê li ber çavên dinyayê raxîne.

3- Hebûna mirovahiyê xwe bi çand û kultûra devkî bere-der dike. Ev hebûna Kurdan di jîyanê de hîn zindî ye. Hebûna çandên ji hev cihê, dewlemendiya dîrokî ya mirovayetiye ye. Di herêma em lê dijîn de parastina pîrzimanî, pîrçandî, pîrkultûrî û pîrengîtiya çandî, wezîfeya me ya mirovperweriyê ye. Di vê çarçovê de lêgerîn û lêkolînên li ser çand û dîroka Kurdan ya dengbêjîyê, diyarkirina têkilî û li hev tesîrkirina çanda Kurdan û milletên din (Ereb, Faris, Tirk, Suryanî, Keldanî, Ermenî, Cihû, Êzîdî, Aşûrî û hwd.), yek ji armanca lêkolîn û berhevdana me ye. Lewra, ji mêj ve heta îro çandên ji hev cihê hene, lêbelê çandekê yekreng û homojen a li ser yên din nîne. Her çand û kultur li gor nîrxekî gerdûnî nîşan dide. Herwiha çanda Kurdan jî ne di ser ya milletên din re ye û ne jî ji ya wan paşvetir û kêmtir e. Her çand bi qedr û qîmet e.

4- Her dîroka netewan bi rabûn û bi daketîne ye. Dîrok wek çemekî diherike û li gor şertan tê guhertin. Edebiyata Kurdan ya devkî jî guhertina dîrokê tesdîq dike. Bêguman di pêvajoya dîroka milletan de serkevtin û têkçûn, windakirin û îxanet, kêfxweşî û xemgîni, başî û xerabî, rastî û çewtî jî hene. Denbêjiya kultura Kurdan, dîrokê mîna ku bixwîne,

tîne ber çavên mirovahiyê. Ronîkirina sebeb û encamên van bûyeran, ji nû ve lêkolîn, honandin û şîrovekirina wan yek ji armancên berhevdana dengên dengbêjîyê ye.

5- Armanca lêkolîna me ya li ser dengbêjîyê (ziman, dîrok û çanda Kurdî) ev e ku Kurd wek subjektekî dîrokî bigihîje bîreweriya hebûna xwe ya çandî, civakî û netewî. Kultura devkî bi dengbêjîyê ve girêdayî ye. Çanda dengbêjîyê, hest û hîsên netewî di dil û mêjiyê Kurdan de bi cih dike. Bêşik daxwazên netewî ne tenê bîdestxistina mafê kulturî (çandî) ye, di heman demê de/herwiha rêgezeke mafê siyasî ye.

6- Li ser ziman (hemû lehçe û devokên herêma bajarê Riha û derdorê bajarê Riha), dîrok, wêje (edebiyat) û çanda Kurdî pêkanîna lêkolîn-lêgerîn û weşandina cûrbicûr nivîsar, rojname, kovar, cd, tesbîtkirina rûbirû, serlêdana rîspiyan û belgeyên di heqê vê babetê de, armanca bîngêhîn ya li ser lêkolîn û berhevdana stran û kilamên dengbêjan e. Bi taybetî jî xebatên li ser zimanê Kurdî. Lewra ziman, şiklê hebûna netewî ye û binyata bixwehisîn û cudahiya ji yê din derdixê holê û diyar dike. Dengbêjî, ev cihêbûna kultur û çanda Kurdî bi awakî xweser nîşan dide. Edebiyat û kultura devkî ya Kurdan bi dengê dengbêjan netewa millî derdixê holê. Dewlemendiya kultura netewa Kurdan bi awakî eşkere derdixê meydanê.

7- Her netewe rih û milkiyeteke hevpar peyda dike, ev rih, xwe dispêre du bîngêhan, yek jê rabirdû yanî mîrasa bîranînên navxwe ye, yê din jî dilxwaziya bihevrebûna îroyîn e. Bav û kalên me, rîspî û îxtiyarên me bi ede-

biyata stran û dengbêjîyê hest û hîsên xwe yên millî îfade dikin. Her îxtiyarekî Kurd, bi dengêkî dengbêjan mejî û hişê xwe tijî kirine. Ax û axîna xwe bi dengê stran û kilaman tînine ziman. Gotin û pisepisa her Kurdî bi kilamên evîni û dilkeserî ve tîne ziman. Tesîra dengbêjan bi awakî tebîî li ser neslên me yên îxtiyar û pîran bûne. Wek berhemê rihê hevpar berhevdan û jinûve honandina çîrok, kilam, lawij, heyranok, metelok, serborî û hwd. yek ji armanca lêkolînên me ye. Milkiyeta hevpar jî ax e, sirûşt e, di mîrasa netewî de xaka sirûştî, çavkaniya objekt û berhemên çandî ne. Ax, cenneta mêjî û kultura mirovahiyê ye. Axa Mezopotamya jî bo Kurdan bûye çavkaniya çand û kultura millî. Ev axa berê û paşê ji bo medeniyeta her gelî jî bûye bîngêh û çavkanî.

8- Nirx (helseng) û berhemên çanda Kurd, di nav pêvajoya dîrokî de li encama fealiyeta biarmanca gelê Kurd peyda bûne. Berhevdana çanda Kurdî ya devkî pir ne hêsan e, lê bi awakî tebîî lêkolîn û lêgerîna baş pêwîst e ku em bikin. Berhevkirin û ji nû ve honandin û şîrovekirina nîrxên çandî, bîngêha xebata me ye. Dengbêjî, berhevkirina nîrxên civaka Kurdan hîn hêsan dike. Deng bi nîrxên xwe olan dide. Deng, her çêşîdên çanda civaka Kurdan bi nîrxekî girîng raberî me dike.

9- Girîngiya pêdana çanda Kurdî, tê wateyê ku em parastina fêma netewetiya kulturî dikin, netewetî, di heman demê de mafê desthelatbûna siyasî ye jî. Dengbêjî, tê maneya dengê hest û hîsa netewî ya desthilatdariyê jî. Hîsa dengbêjîyê bîngêha nîrxên neteweyî ye. ❁

Zerê zer bû

Hatîce Mollakendî

haticemollakendi@hotmail.com

Ez hatim ku we aciz bikim!
E. Şerîetî

Min ji diya xwe xatir xwest. Ew çax payîzê jî xatir ji havînê dixwest, diçû zivistanê. Pelgan xatir ji daran dixwestin, diweşîn.

Diya min heta devê çem bi min re hat, ez birêkirim. Birazaya min Zerê jî dabû dût me. Diya min hat herdu çavên min. Ez çûm destên diya xwe. Diya min got: "Kurê min, mirin heye, jiyîn heye... Here, Xwedê xêra te qebûl bike."

Çûm. Min dê perwerde bida zarokên ku hewcedarê perwerdeyê bûn. Dê xwendekarên min ji gelê xwe re bibûna rewşenbîr, paşdemayîna gelê xwe dê ji navê hîlanîna. Dê bibûna karsaz, welatê xwe ji xizaniyê xilas bikirana. Dê bibûna bijîşk, nexweşîna xilas bibûna. Dê bibûna siyasetmedar; demoqrasî ji gelê xwe re rave bikirana. Piştê her hîlbijartinê dê eşîr li nav hev neketana, serî, guh li hevdu nepelixandana; hîlbijartina wana dê îdî nebûya şerê nava eşîran.

Ev çûn bi min pîroz dixuya. Ez şa dibûm. Di nava vî coş û xiroşê de min xwe ji bîr kir û xatir ji Zerê nexwest. Ku meriv hinek tiştan di dilê xwe de dike pîroz,

an jî bêguneh; gava meriv reviya cem wê pîroza xwe, hinek ezîzên din jî bînpê dike, dipelixîne. Ku meriv reviya gulek, gulan li ser rêya xwe dipeçiqîne. Zerê gula perçiqandiye.

Çûm. Dê bibûma xwediyê xêran. Min ji Zerê xatir nexwest Çûm. Nizanim, çima min xatir jê nexwest. Hay jê nema bûm. Zerê zarok bû. Zerê du hêstikên ziwa palandibû li dût min. Li dût apê xwe. Ji bo ku min ew ji bîr kir, xatir jê nexwest. Ji bo ku ez çûm. Ji bo ku min ew hiştin... Du rondikên ziwa palandibû li dût min.

Zerêya birazaya min, xwendekar bû. Salek dinê dê dest bi lîseyê bikira, lê lîse li gundê me tunebû. Yanê xwendekariya Zerê îsal bû. Ez jî çûm, ku bibim xwediyê xêran.

Zerê û diya min vegeyriyan cem jinên li devê çem. Jinan kuçik danîbûn. Av kelandibûn. Berav dikirin. Cilên ku dişûştin radixistin ser zinaran. Li ser zinaran kinc ziva dikirin. Zarokên ku bi diyên xwe re diçûn beravê ava wî çemê vedixwarin. Piştê emel dibûn. Diyên wan nizaniyên ku sedemê emelê ava qirêj e. Digotin: "Zarokên me

Çûm. Dê bibûma xwediyê xêran. Min ji Zerê xatir nexwest. Çûm. Nizanim, çima min xatir jê nexwest. Hay jê nema bûm. Zerê zarok bû. Zerê du hêstikên ziwa palandibû li dût min.

nexweşok in, heta mezin dibin awha ne." Zarokên wan her gav ta digirtin. Di tayê de bûn.

Ez qedere du seet şûn de gihêştim bajêr. Çûm balefirgehê, li balefirê siwar bûm. Ez bêjim du seet, hûn bêjin pênc seet şûn de li welatek xerib, welatek ku min qet zimanê wana nizanibû peya bûm. Hevalên min yê wekê min ku ji bo xêr bikin, welatê xwe terkandibûn, hatibûn pêşiya min. Em siwarê texsiyê bûn, çûn. Li ber lîsekê pênc qat peya bûn. Dê min li wir mamostetiya zimanê Tirkî bikira. Gava ez gihêştim wir dawiya heftê bû. Roj derbas bûn. Duşemê min dest bi kar kir.

Zengila dersê lêda. Çûm pola xwe. Di polê de bîst xwendekar hebûn. Xwendekar tev çavûjin bûn. Ez bibêjim xwendekar Qazak bûn, hûn bibêjin na Qirgiz bûn. Çawa Xwedê mohra xwe li xwendekaran dabû meriv dizanibû ka ku ew ji kîjan qewmî ne, wisa jî çav û birûyên min jî sed metro ji dûr ve digot ez Kurd im. Min piştê hevnasînê ji xwendekarên xwe pîrsek pîrsî:

- Xiyalên we çi ne? Her kes bila xiyalên xwe bibêje. Xwendekaran yek bi yek xiyalên xwe gotin. Ê ku dibû bijîşk ji xwe re dubleks ava dikir; di hewza hewşa mala xwe de avjenî dikir. Ê ku dibû endezyar paşê ji xwe re otomobîl dikirî. Ê ku dibû stêrnas li esmanan digeriya... Hemûyan xiyalên xwe gotin. Dor hate lawikê bejinbilind û qemer. Rabû ser piyan, got:

-Ez dixwazim bibim mamoste. Herim gundê xwe. Li wir lîsekê vekim... ken ji polê bilind bû. Xwendekar tev bi xiyalên wî kenyan. Ez jî devliken bûm. Ew çax wek xiyalek pîr piçûk xuya kir ji min re. Min pol da sukûtkirin, û jê pîrsî:

- Çima li gundê xwe lîse vekî?

- Lewra lîse li gundê me tune ye. Ez jî loma li vir im. Pîr hevalên min nekarîn ku xwendekariya xwe bidomînin, lîseyê bixwînin. Di jiyana wan de xwendin xilas. Tev jî pîr jîr in, û ji xwendinê jî hez dikin.

Zengila teneffusê lêda. Xwendekar derketin devre. Ez jî di cîhyê xwe de sar bûn, mam. Zerê hat ber çavên min. Di xiyalên xwe de çûm gundê xwe; min ewan ciwanên bê xwendin dît. Ewan zarokên ku di nav ava çemê qirêj de dileyîstin û nexweş diketin dît. Ewan dayîkên ku nizanibûn zarokên wan ka ji bo çi ye nexweş dikevin... Min hemû rewşên rebeniyê dît. Hin tişt ji dûr ve çêtir dixuyên.

Pîstre zengila dersê lêda. Ji nav xiyalên xwe bi veciniqînekê derketim. Dersa min li polek din bû. Çûm. Min ders da. Seet derbas bûn. Ders derbas bûn. Rojan dan dûv hev. Heftê borîn. Meh xilas bûn...

Min şevê di nivê şevê de xewnek dît: Di rêya kela Hewlêrê de dimeşiyam. Qederekê meşiyam. Hevrazek derkete pêşiya min. Min da hevrazê, meşiyam, meşiyam, meşiyam...Min rê kudand. Li milê rastê fetilim. Meşiyam. Ketim nav kela kevnar. Di nav de meşiyam. Her malên di nav kelê de wek perên dîrokê bûn. Ji pencerên kelê de min li Hewlêra ku li derveyê kelê avabûye nihêrî. Kel di navenda bajêr de bû. Meriv digot qey bajêr pêşî li kelê avabûye paşê gel ji bo ku xwe ji êrîşan biparêze doralîyên xwe sûr kiriye, ew sûr jî aniha bûye kel. Piştê ji pîrbûna nifûsê avahî di nav sûra kelê de bi

cih nebûne. Îcar li derveyê kelê jî mal ava bûne. Heta ev deşt tije avahî bûye. Di kuçên kelê de meşiyam. Mal wisa nêzîkên hevdu bûn ku bêhnildana dîwaran ji hev du digirtin. Qederek di wan kuçên teng de meşiyam. Hilma min û hilma dîrokê di wan kuçên teng de li hev du qelibîn. Her kevir dîrok bû li wir. Hinek kevir ji bapîrê min jî extiyartir bûn.

Ji kelê derketim. Meşiyam. Hatim palî. Ji palê de berjêr bûm. Zerê û tevê xwendekarê minê bejinbilind û qemer li wir rûniştî bûn. Di destê xwendekarê min de pênusekê birqandî, di destê Zerê de jî qirşek zer hebû. Zerê li qirşa di destê xwe de dinihêrî. Zerê zer bûbû. Lawik jî li qelema xwe ya birqandî dinihêriya, dibişirî. Min deng li Zerê kir. Zerêya zer bûyî serê xwe bilind nekir. Li min nenihêrî. Birazaya min li min nenihêrî. Lawik li min nihêrî, û got:

- Mamoste, divê xêr ji nêz ve destpê bike. Zerê nexweş e. Zerê tenê na, gelê te hemû nexweş e. Ji her ferdê gelê te re terapî pêwîst e. Tu çima êşên wan nabînî? Te çima mala xwe servekirî, bê derî, bêşibake, hêştîye? Berf û baran, ba û bahoz, hişkesayî tev di nav malên te de ye. Tev di nav mala te de ye, mamoste! Tu bi xwe jî hatî derê me boyax dikî! Çima?

Zerê serê xwe bilind kir, lê li nav çavên min nenihêrî. Beşdarê axaftinê bû, got:

- Mamo, tu ji şagirtên xwe re bibî tav û roj. Her derê germ bikî. Bi germaya te erd bizê. Giyamêrg hêşîn bin. Ax fêkî bide... Lê ez jî li welatê me cemidî bim, qefilî bim, qeşagirtî bim, qerisî bim... Ji min re çi ku tu tav î?! Heke hatina te ya li vir ku xêr be, lê piştdayîna te ya li me çi ye? Neheqî nin e gelo?

Çima ev rûyên xemgîn, rûyên gelê me, hestên berpirsiyariyê nade te? Gelê me yê ku ji sedsa-la xwe re biyanî ye, ji sedsala xwe nine. Çawa dilê te naşewitîne, mamo?

Bi ser xwendekarê xwe û bi ser Zerê de heta ji min hat qîriyam, min got:

- Bees! Bi qîrîna xwe re ji xew şiyar bûm. Min nihêrî ku xewn e. Hinek rihet bûm lê ditirsiyam. Nîvê şevê bû. Xwezil ew xewn berdestê sibê bûya. Qet nebe awqas neditirsiyam. Di nav nivînê xwe de hinek mam. Li xewna xwe fikirîm. Xewn tev nehate bîra min. Hindik hindik hate hişê min. Tîrsa min zêde dibû. Min serê xwe xist binê lihêfê. Qîrîna min ya "bees!" hêj dihat guhê min. Te digot qey min li wan qîrîn nekiriye. Min ji xwe re gotiye "bees!". Îdî nedibû sibe, ew nîvşev derbas nedibû. Ji tîrsan min xwe di binê lihêfê de qinciland, bûme qasê lepek. Tîrsa min didomiya û zêde dibû. Hestî û werselê min tev diêşiyam. Mîna ku erebeyek ser min re derbas bûbe. Ez wisan qederekê di binê lihêfê de mam. Baş e xewn tev nedihate bîra min.

Tav derket. Ez rabûm ji nav nivînan reviyam. Min dest û rûyê xwe şûşt. Mehdê min hatibû girtin. Min taştê nexwar. Min qerevata xwe xiste stûyê xwe, ez xurîn çûm xwendegehê. Ezmûna pola min hebû. Min kaxizê ezmûnê belav kir. Îmtihan 45 deqe bû. Ew ketin îmtihanê. Ez jî li ser masa xwe rûniştim. Car caran meşiyam di nav polê de. Dîsa xewna xwe fikirîm. Îcar xewn tev hate bîra min. Wek filmek dibar çavên min re derbas bû. Min melheze kir:

Ew çi xewn bû? Min qet Hewlêrê nedîtiye. Ma qey li

Hewlêrê kele heyê? Zerê li wir çi dikir? Lê xwedekarê min çi dizane ku ez ji ku derê, ji nava qewmek çawa hatime vira? Tenê dizane ku ez ji Tirkîyê me. Nizane ku ez Kurdî dizanim. Di xewnê de bi min re Kurdî diaxivî. Û bi xwe jî Kurdî nizane.

Meriv çiqas ji xwe bireve jî, zimanê meriv, li cihê meriv diqefilîne. Di rastiye de nebe jî, di xewnan de. Lewra her kes bi zimanê xwe yê zikmakî xewn dibîne.

45 deqe qediyam. Zengila te-neffusê lêda. Îmtihana wan xilas. Melheza min bi dawî bû. Min kaxizê ezmûnê top kir. Ez jî polê derketim, çûm.

Xewnê ji min re pencereke nû vekiribû. Wijdana min rexne li min dibarand. Tiştên ku ewil ji min re baş dixuyan aniha ji min re êş çêdikirin. Çi heqê min hebû ku min pişt dabû gundê xwe? Ku min pişt dabû gelê xwe? . . .

"Gelî kesên bawerî diênin! Xwe û malbatên xwe ji agirekî... biparêzin"(1) Min çima heta aniha ev fêhm nekiribû. Dibû pilepila min, min ev ayet jiber dikir. Dubare dikir. Lê ya rast ayet emir dike, dibêje: Rabe, agirê bitemirîne. Min dubare neke! Rabe agirê bitemirîne...Malbatê min kî ne? Zerê, gundê min, gelê min... Malbata min in. Lê agir çi ye? Nezanîn, çavkaniya hemû agiran nine gelo? Paşvemayîn, bê qelembûna Zerê, ji sedsala xwe re biyanîbûn ma ne agir e gelo?

Min xewna xwe dabû piştta xwe. Biçûma ku min wê bi xwe re dibar. Îdî xewna min ji min re bibû mîna şiretek. Ji min re bibû hiş-yarker. Dilop dilop hişyariya min kom dibû. Dibe ku rojek bibûya

bendav. Bendava hişyariyê. Dibe ku ez jî rojek bibûyama Mahatma Gandhi. Ez jixwe bi xwedina xewna xwe re mijûl bûm. Meh derbas bûn. Demsal zivirîn. Dibistan ketin betlanê. Betlan xilas bû. Xwendekar fetilîn dibistanê. Perwerdehiyê dest pê kir. Payîz qediya. Zivistan hat û berê xwe da biharê. Befira zivistanê dest bi helandinê kir. Di bin belekiyan de çêra hişîn xwe da nîşan.

Şevê dîsa min xewnek dît: Şilî dibariya. Na befir dibariya. Na na, baran û befir tevê hev bûn, şilope dibariya. Avahiyek mezin hebû. Di nav avahiyê de aletek hebû. Zerê di nav wan de bû. Çûm ku Zerê bibînim. Lê avahî tarî bû. Çav muhtacê ronahiyê ye ji bo dîtîne. Min ew nedît. Di tarîtiyê de lê geriyam, min erd palmisêl kir, çavên xwe kuskusand, lê min ew nedît. Li devdorên xwe zivirîm... Lê Zerê nedixuya. Li derê avahiyê geriyam ku derkevîm derve. Derî jî nedixuya. Hemû tişt di nav tarîtiyekê de bû. Min Zerê nedît. Gera min a ji bo Zerê dewam dikir. Di nava xwêdanek cemidî de ji xew şiyar bûm. Min got: Ox! xewn e!

Min lihêfê ji ser xwe avêt, virvirand, rabûm. Di nav odê de geriyam. Çûm serê odê, hatim binê odê. Xewn tev dihate bîra min. Lê îcar jî di xewnê de tişteke eşkere û vekirî tunebû. Gelo ev xewn jî şiretek bû ji min re? Ew elalet çima di nav tarîtiyê de bû? Ew elalet kî bû? Ew çi bû dibariya? Bi van pîrsan min xewna xwe ya duyemîn jî xiste kitêb, û min kitêbê xwend, şiretên xwe jê hilda...

Min şalekî kot ê şîn li xwe kir. Fahîkekî reş jî bi ser de kir. Çûm dibistanê. Min li derê oda midur da, ketim hundir. Me selam û kelam li hevdu kir. Min jî mudir re got:

Evîn

Yılmaz Yalçın

ezê xwe, dijminê bikujim,
ji bo te
evîn

tu welatê şînê
evîna teyrê baz î
evîn

dilê min çar perçe ye
ji bo te
evîn

bila sorgulên stûxwar stûyê xwe rast bikin
li meşa te mêze bikin
evîn

bila Cûdî serî bitewîne
li ber te
evîn

bila Şivan Perwer stranekê bêje
ji bo bejna te
evîn

bila helbestekê binvîse nevîyê Ehmedê
Xanî
ji bo te
evîn

bila mamoste doza Seîd bêje
xwendekar bixwînin ji bo te
evîn

bavê te bi te serbilind e
li benda evîndariya te ye,
evîn

hêstirê dayika te
ji te re name ye
evîn



-Ezbenî, jixwe re li mamostekî bigerin. Lewra ez ji îro pê ve îstifa dikim. Kerem bikin, ev daxwezname min e. Midur li benda tiştek awha nebû. Matmayî ma. Daxwezname ma di destê min de. Pirsî:

-Çima îstifa dikî? Ev ji ku derket?

- Ez xewnê dibînim. Di xewnan de li mala xwe me.

- Em jî xewn dibînin. Ev ji hesretê ye.

- Na, xewnê min ne ji hesretê, ji rastiye ne.

- Tu me di nivê rê de dihêlî, diçî, ma eva heq e?

-Îdî nabe ez bisekinim. Birîndar bi birîna xwe dizane, ezbenî. "Rêyên me bêrêwî, rêwiyên me bêrê mane"² Divê ez herim. Di navbera me de hinek gengeşî jî çêbû. Lê di dawî de îstifaya min hat pejirandin. Ji dibistanê derketim derve. Li ser merdîwanan sekinîm. Min li çiyayê li hember dibistanê nihêrî. Bihar bû; çiya şîn dikir. Xwendekaran di polan de ders didîtin; ji dahatûya xwe re amade dibûn. Bihar bû. Min kar berda. Pişt da kargehê, berî da gundê xwe. Meşiyam û ramiyam: "Ev bihareke çawa ye? Tiliyên baranê ên nazdar di vî

rezî de tenê direvin ba darek. Bi darên din re pêwendî nakin. Ev rezê han çi bike ji ewrên ku tenê ji darek re dibare? Bila darên din bi hêrs destên xwe dirêjê esmanan bikin. Deng li ewran bikin, û bi hawar bêjin: Gelfî ewrên biharê we bi hêstirkên çavên xwe di vî rezî de kon vegirtiye û li erşê de pal vedaye. Hûn dityeşin. Gelfî ewrên baranê, hûn fêhm nakin gelo? Darên vî rezî hemû tînin!"³ ❁

1] يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا اتَّقُوا اللَّهَ وَالْهَيْكَلِ ...
نَارًا Qur'an 66: 6

2] Tu, Mehmed Uzun


3] گفتگوهای تنهایی (Guftûgohay Tenhayî), Elî Şerîetî

Seydayê min

Mehmet Bozkoyun

Ji bo pakrewan Izzeddîn Yıldırım...

Ez nizanim te çawa bînim ser zimanê xwe
Di paşila Miryema Îmranî de tu hatiyî xweyîkirin
Tu bi wêrebûna Hz. Elî
Tu bi wêrebûna Rustemê Zal hatiyî afirandin
Dilê te Behra Wanê
Hesreta te axa Kurdistana rengîn e
Seydayê min, ez nizanim te çawa bînim ser zimanê xwe
Dîrokê tomar nekiriye jiyana te
Ez, te bi rengê Ebûducane dibînim
Desmala sor li serê te pêçayî
Ne li şerê Uhudê, li qada şaristaniyê
Bi xwînxwaran re tu di şerekî giran de yî
Rêberê te Qur'an
Şûrê te Rîsale ne
Ber bi min ve were ku ez hesreta te bizanibim.
Vaye ez dibînim
Herîrî ji bona te helbestan çêdike
Ehmedê Xanê Nûbiharê ji bona te nûjen dike
Melayê Cizîrî li Medresa Sor dersê dide
Mijara dersa wî tu yî
Mêze ke, Feqyê Teyran li hember dilberê
Helbestek bi navê *Seydayê Min* nivîsandiye
Seydayê min, bi dûrketina te, ez bûm dînekî çolistanan
Pirtûk nikarin nîrxê te binivîsin
Ez dibînim Şêxê Kal ala serxwebûnê radestî te kir
Li civata Seîdê Kurdî tu xwendekarekî xweyî doz î
Seydayê min, ez nizanim te çawa bînim ser zimanê xwe
Zarokên me, li zindana Amedê li benda te ne
Waye ez dibînim ji bona te raperîn derxistin
Li hewşa zindanê
Li ber çavê Esat
Sirûdên serxwebûnê dixwînin
Dibêjin an Seydayê me, an jî mirin
Were Seydayê min
Kekê Memed Uzun romaneke nû bi navê *Seydayê Serhedê* nivîsandiye
Haya te jê hebe
Seydayê min, ez nizanim te çawa bînim ser zimanê xwe
Min berê xwe da Mûşa şewitî, bi deşt û kanî ye



Ezê herim dîwana dengbêjan
 Û bi kela dilê xwe
 Û bi axîna welatê xwe
 Û bi hêviya hezar salan
 Xwe bavêjim bextê şahê dengbêjan
 Ezê bêjim kekê Şakir, tuyê kilama Seydayê min bêje bi dil û bi yeqîn.
 Seydayê min ez nizanim te çawa bînim ser zimanê xwe
 Li çar hêlên Kurdistanê bigerim
 Silav û rêzên rêzanê me ji te ra bînim
 Binêre li qada Çarçira Qadî Mihemed
 Binêre li Barzan Mele Mistefa
 Binêre li çiyayê Dêrsimê Seyid Riza
 Binêre li ser sêpêyan li ber xeniqandinê Şêx Seîd
 Binêre li Qostirmayê Seîdê Kurdî
 Binêre li qada Hittînê Silaheddîn
 Ji te bi hevî ne
 Seydayê min, ez nizanim te çawa bînim ser zimanê xwe
 Çûme Stenbola şewitî bi heftgire
 Li kolan û qadê bajarê şewitî geriyam lê min tu nedî.
 Ez çûm goristaneke bênav
 Bêhna Serhedê ji goristanê dihat
 Li ber gora te sekinîm û min du hestirên bi xwîn weşandin
 Dilopên hestira li ser gora te lê xençer di dilê min de
 Ev çi ye dengê ji gora te hat.
 Seydayê min şiretek wisa li min kir
 “Mamoste, xwendin xwendin xwendin desthevgirtin desthevgirtin
 desthevgirtin.”

Jiyana Bedîuzzeman

Abdulkadir Kurşun

Seîdê Kurdî, di sala 1877an de li bajarê Bedlîsê, navçeya Hîzanê û gundê Nursê hatiye dinê. Navê bavê wî, Mîrze û navê diya wî jî Nûrê ye. Heta neh saliya xwe li cem dê û bavê xwe dimîne. Birayê wî yê mezin Mele Ebdullah jî li medresan ilim tehsîl dikir. M. Ebdullah, ji ber ku dixwend, ji hevalên xwe pir cuda bû. Kesên ku li îtîbar û meziyetên wî dinihêrîn, li wî heyran diman. Ev halên han jî, ji bo xwendinê şewq û heyecan dida Seîdê Piçûk.

Seîd, di neh saliya xwe de dest bi perwerdahiya xwe ya medresê kiriye û li gundê Taxê, li cem Mele Mihemed Emîn jî dest bi tehsîla xwe ya ewil kiriye. Lêbelê, pir lê nesekiniye. Yek ji taybetiyên Seîd jî; hertîm izzeta xwe diparast û qet tehemulê gotinên emirane nedikir. Ev taybetiya han ji Seîd re ji bo veqetîn û dûrketina medresê sedemek bû. Piştî, Seîd vedigere Nûrsê. Birayê wî yê mezin Mele Ebdullah, di heftê de rojekê di hate gundê xwe, li cem dê û bavê xwe. Qederekê Seîdê Piçûk dersa xwe di wê rojê de ji kekê xwe distend. Piştî muddetekê Seîd diçe Gundê Pîrmîsê. Piştî,

diçe cem Şêxê Hîzanê. Fitreta wî di zaroktiya wî de jî, tehemmula neheqiyê nedikir. Mirovekî merd û cesûr bû. Ji ber vê xusûsiyeta wî, li vê medresê çar şagirdan ji Seîd hez nedikir û hertîm ew aciz dikir. Ew jî, ji bo şîkayetê diçe cem Şêx û dibêje: “Şêx efendî, ji şagirdên xwe re bibêje, wextê ku dê werin şer û lêxistinê, bila çar bi çar neyên, bila dudu bi dudu werin.”


Ev mêraniya Seîdê Piçûk, pir li xweşiya şêx diçe û ji Seîd re dibêje: “Tu şagirdê min î. Kesek nikare tiştêkî bi te bike.” Piştî vê bûyerê, êdî bi navê *Telebê Şêx* ve tê yadkirin. Qederekî li vir dimîne. Piştî, ew û kekê xwe Mele Ebdullah diçin Nûrşînê.

Di nav Medresên Kurdan de adet e; wexta ku alimek îcazeta xwe distîne, diçe li gundekî medresekê vedike. Eger ku qeweta wî hebe, pêdiviyên telebeyan ew dibîne, lê ku qeweta wî têrê neke wî çaxî, gundî di nav xwe de temîn dikin. Di nav şagirdan de tenê Seîd zekat nedistand û nedikete bin mineta tu kesî. Ji ber vê sedemê Seîdê Piçûk, li Nûrşînê jî zêde namîne. Vedigere Hîzanê û

Ev mêraniya
Seîdê Piçûk, pir li
xweşiya şêx diçe û
ji Seîd re dibêje: “Tu
şakirdê min î. Kesek
nikare tiştêkî bi te bike.”
Piştî vê bûyerê, êdî bi
navê *Telebê Şêx* ve tê
yadkirin.

tê Nûrsê. Dîsa qederekê li gund dimîne û li gund xewnekê dibîne. Di xewna xwe de dibîne ku qiyamet qewimiye û diya xera bûye. Piştî mirinê însan dîsa îhya bûne. Seîd jî di wê heyamê de difikire û endîşe dike ka gelo wê çawa Resulullah ziyaret bike? Tê hişê wî û dibêje: "A baş ew e ku ez herim ser Pira Siratê bisekinim. Jixwe herkes dê wir de derbas be." Li ser pirê yek bi yek pêxemberan ziyaret dike û mezherê dîtina Resulullah jî dibe û ji xew radibe.

Seîd ji vê xewnê feyzeke pir mezin distîne. Biryara xwe dide û ji bavê xwe jî destûrê distîne û dîsa li çend medreseyan digere, heta diçe Bazîdê. Li Bazîdê, li medresa Şêx Mûhemmed Celalî sê mehan dimîne. Ilm û zanistên ku di bîst salan de têne xwendin, Seîd di sê mehan de tehsîl û îqmal dike. Wextê xwe bi haşîye û şîroveyan ve zayî nake. Mebesta Mele Seîd, divê di usula medreseyan de şeweyekî nû yanî teceddudek çêbibe.



Şevêkê di xewna xwe de Şêx Abdulqadirê Geylanî dibîne. Di xewnê de şêx jê re dibêje: "Mele Seîd! Here cem serokê Eşîra Mîran, Mistefa Paşa. Wî dawetê heqqiyê û hîdayetê bike. Bila bes zilmê bike. Bila li ser rêya heq bimeşe. Eger bi ya te neke û neyê li ser rêya heq, wî bikuje." Mele Seîd piştî vê xewnê amedekariya xwe dike û diçe konê Mistefa Paşa

Li Bazîdê bi roj li medresa Celalî tadrîsat didît û bi şev jî diçû Kumbeta Ehmedê Xanî. Ehmedê Xanî, alim û edebiyatnasekî Kurdan e. Gel digot: "Mele Seîd mezherî feyza Ehmedê Xanî bûye." Mele Seîd li vir îcâzeta xwe distîne û bi navê *Mele Seîdê Meşhûr* bi nav û deng dibe. Mele Seîdê Meşhûr, di vê wextê de çardeh salî ye.

Ji Bazîdê vedigere Bedlîsê û diçe medresa Şêx Mûhemmed Emîn. Du rojan li wir dimîne. Şêx jî wî re dibêje, çek û kîswa aliman li xweke. Lê, Melayê Meşhûr vê teklîfê red dike û dibêje ez hê zarok im.

Piştî Bedlîsê diçe Şîrwanê, li cem birayê xwe yê mezin. Di navbera wan de sohbetek derbas dibe. Mele Ebdullah, birayê xwe îmtîhan dike û piştî fêhm dike ku Seîd heştê kitêb xelaskiriye û îlmê xwe îkmal kiriye. Helbet, Mele Ebdullah birayê xwe teqdir û pîroz dike. Ew Seîdê ku heta heşt meh berê telebetî ji Mele Ebdullah re dikir, êdî ji niha pê ve bû ustadê wî. Qederekê li cem Mele Ebdillah dimîne û piştî Şîrwanê jî diçe Sêrtê. Medresa Mele Fethullah ziyaret dike. Heftiyekê li medresa Mele Fethullah dimîne. M. Fethullah çî kitêbê ji Mele Seîd re dipirse, ew jî dibêje: "Min xelas kiriye." Ji kîjan kitêbê dipirse, Mele

Seîd jî bersiva wî dide. Ji aliyê hifzê jî îmtîhan dike. Mele Seîd, ji Meqamatê

Herîrî pelekî carekê dixwîne û ji ber dike. Mele Fethullah dibêje: "Cembûna/kombûna zeka û hifzê li ser mirovekî, pir kêr e." Bi vî awayî heyret û heyraniya xwe dîne zimên û li ser kitêba ku Melayê Meşhûr xwendiyê: *Kitêba Cem'û'l-Cewamî'* di hefteyekê de ji ber kiriye, dinivîse. Mele Fethullah jî îcâzetê dide Mele Seîd. Bi vî awayî Melayê Meşhûr, dibe xwediyê du heb îcâzetan (Belgeya/sûretê îcâzeta Mele Seîd, niha li muftiyeta Urgupê ye).

Nam û şohreta Mele Seîd li welêt belav dibe. Wexta ku li Sêrtê dimîne, bo qederekê diçe Tilloyê. Dikeve hundirê wê tirba meşhûr. Bi ilm û îbadetê meşxûl dibe. Li wir, Qamûsa Oqyanûsê heta herfa sînê ji ber dike. Şevêkê di xewna xwe de Şêx Abdulqadirê Geylanî dibîne. Di xewnê de şêx jê re dibêje: "Mele Seîd! Here cem serokê Eşîra Mîran, Mistefa Paşa. Wî dawetê heqqiyê û hîdayetê bike. Bila bes zilmê bike. Bila li ser rêya heq bimeşe. Eger bi ya te neke û neyê li ser rêya heq, wî bikuje." Mele Seîd piştî vê xewnê amedekariya xwe dike û diçe konê Mistefa Paşa. Lê, paşa ne li konê xwe ye. Demek şûn de paşa dikeve hundirê kon û mirovên ku di hundirê kon de rûniştine bi tevayî radibine ser piyan lê, Mele Seîd ji cihê xwe ranabe. Bala paşê dikşîne û paşa ji zilamên xwe dipirse û zilamên wî

Armanç û mebesta Bedûzzeman a girîng û mezin, li Kurdistanê bi navê Medresetuz-Zehrayê vekirina zanîngehekê bû. Navenda vê zanîngehê li Wanê û şaxek li Bedlîsê û şaxek jî dê li Diyarbekirê bûya. Dixwest ku bi vê rêyê ve Kurdistanê ji cehaletê, xizaniyê û bêtifaqiyê xelas bike.

Jî dibêjinê: Mele Seîdê Meşhûr e. Mistefa Paşa hîç ji mela û aliman hez nedikir. Ji Mele Seîdê Meşhûr dipirse: "Tu ji bo çi hatî vir?"

Mele Seîd: "Ez hatime ku te dawetî hîdayetê bikim. An tê zilma xwe biterikîni û dest bi nimêjê bikî yan jî ezê te bikujim." Paşa pir aciz dibe û derdikeve derve. Dîsa tê hundirê kon û pirsra xwe dubare dike.

Mele Seîd: Wek min ji te re got. Ez ji bo vê mebestê hatime.

Paşa: Bi vî şûrê pîs tê min bikujî?

Mele Seîd: Şûr jênake, dest jêdike. Paşa dîsa derdikeve derve û mudetekî digere û tê hundirê kon.

Paşa: Li cizîrê alimên min pir hene. Ezê wan li cihekî bicivînim. Eger tu bersiva hemûyan bidî û wana îlزام bikî, ezê bi ya te bikim. Lê, tu wan îlزام nekî wê çaxê, ezê te bavêjime Çemê Firatê.

Mele Seîd: Çawa ku îlزامkirina hemû aliman ne heddê min e, wisa jî avêtina min a çemê Firatê jî ne heddê te ye. Lê, bi şertê mawzerekî ezê derkevime pêşiya alimên te. Ji ber wexta ku min ewan hemû îlزام kirin û tu jî li ser soza xwe nesekîni, ku ez te bi wê tivingê ve bikujim. Mele Seîd çil pirsên wan aliman bersivandin û hemû îlزام kirin. Piştê ew alim hatin ji Mele Seîd ders standin. Paşa jî tivingek diyariyê Mele Seîd kir û dest bi nimêjê kir.

Ji nav eşîreta mîran tê Mêrdînê. Alimên Mêrdînê, ewil tehemula wî nakin. Lê, dibînin ku ilmê wî pir e. Mecbûr dimînin wî ustad qebûl dikin. Li Mêrdînê du şagirdan dibîne. Yek ji wan, telebeyê Cemalêdîn Efxanî ye û yê din jî terîqeta Senûsî ye.

Mele Seîd li Mêrdînê dikeve nav jiyana siyasî. Herwiha, jiyana wî ya siyasî jî li Mêrdînê dest pê dike. Ji gel û welatê xwe re dest bi xizmetê dike. Ji ber fealiyetên wî yên siyasî, waliyê Mêrdînê aciz dibe û destê wî kelepe dike û wî dişîne Bedlîsê.

Li Bedlîsê jî wexta ku dibihîze walî û memûrên wê derê araqê wedixwin, hema rasterast diçe civata wan. Ewil çend ayet û hedîsan piştê jî gelek gotinên tehl li ser araqê dibêje. Destê wî jî her tim li ser rovelwera wî bûye. Ji ber ku walî kesekî hemiyetperwer bû dengê xwe dernaxe. Yawerê walî tê kêleka Melayê Meşhûr û dibêje: "Te çi kir? Tiştên te got, îcaba dardekirina te dike." Mele Seîd: "Îdam qet nehatiye xeyala min. Min got qey cezayê min an hebs e, yan jî sirgûn e. Tiştêk pê nayê ji bo munkerekî ku ez şerekî biqewimînim, ez bimrim jî çi zirara wê heye? Piştî du seetan ropêl tîn û Mele Seîd dibin qonaxa walî. Wexta Mele Seîd dikeve oda walî, walî radibe û bi hurmet rê didê. Dixwaze destê wî maçî ke û dibêje: "Herkesek ustadê wî heye, ustadê min jî tu yî."

Piştê, Waliyê Wanê Hesên Paşa, Mele Seîd dawetî bajarê Wanê dike. Alimekî marûf li Wanê tunebû. Mele Seîd, diçe Wanê û panzdeh salan li wir dimîne.

Mele Seîd zanibû ku ilmên dîni û ilmên medresan ji bo berterekirina şek û şubheyan ne bes e. Ji ber vê pêwistiye dest bi xwendina zanistên fennê kir. Tarîx, erdnîgarî, matematîk, jeolojî, fîzîk, kîmya, astronomî û felsefe digel usûl û termînolojiya wan ve xwend û esasê wan hîn bû.

Ehlê ilmê ferq dikin ku Mele Seîd hem waqîfê ilmên dîni û hem jî ilmên fennî ye. Di vî temenê piçûk de wekî Behra Ummanê bûye xwediyê ilmê. Ji ber vê taybetiyê ehlê ilmê, ji re gotin: *Bedûzzeman*.

Bedûzzeman wexta ku li Wanê bû, di hinek waran de muxalîfê alimên dora xwe bû.

1. Ji kesekî diyarî û pere nedistend. Di jiyana xwe de, xwediyê tu mal û milk nebû, feqîr û bêkes bû, tim li heps û sirgûna bû. Dîsa jî ji kesî pere û hediye qebûl nedikir.

2. Ji tu aliman *pîrs* nedikir. Lêbelê, kê çi jê bipirsiya bersiva wan dida û li ser vê xisûsê digot: "Ez ilmê aliman înkâr nakim lê, pîrsa ku ez li wan bikim, fuzulî ye. Yên ku şupha wan jî, ji ilmê min heye, bila ji min bipirsî ez ê jî bersiva wan bidim."

3. Mele Seîd, şagirdên ku li cem wî diman jî, ji zekat û hediye men dikir û digot: "Divê em tenê ji bo rizaya Xwedê bixebitin."

4. Mal û serwet, lezzetê nadin min. Ez bi nezera mêvanxaneyekê li dinyayê dinihêrim. Bi vî awahî, qasî ku ez bikaribim bi destê xwe bigerînim, divê malê min hebe.

Mele Seîd wexta ku li Wanê bû her daîm bi walî Tahir Paşa re rojname dixwend. Bi taybetî jî, pirsgirêk û xalên ku bi îslamiyetê ve eleqedar bûn bala wî dikişand. Rojekê Tahir Paşa di rojnameyekê de nûçeyeke mudhîş nîşanî wî dide. Nûçe jî ev e:

Di meclîsa Ingilîzan de wezîrê mêtinkariyê (mustemleke), Qur'ana Pîroz bilind dika û dibêje: "Heta ku ev Qur'an di destê Misilmanan de be, em nikarin bibin hakimê wan. Em çî bikin divê em bikin; yan emê Qur'anê ji destê wan derxin, an jî Misilmanan ji Qur'anê dûr bixin û wan ji Qur'anê sar bikin." Ev nûçeya han tesîrek gelek mudhîş li ser wî dika. Li ser vê bûyerê Mele Seîd dibêje: "Ezê îsbatî dunyayê bikim ku nûra Qur'anê venamire û nayête vemirandin" (Çawa ku roj bi pifkirinê ve natemire, Qur'an jî wisa ye). Ev bûyer dibe wesîle ku niyeteke bi quwwet di ruhê wî de şiyar be û dest bi xebatê bike.

Armanca û mebesta Bedûzzeman a girîng û mezin, li Kurdistanê bi navê Medresetuz-Zehrayê vekirina zanîngehekê bû. Navenda vê zanîngehê li Wanê û şaxek li Bedlîsê û şaxek jî dê li Diyarbekirê bûya. Dixwest ku bi vê rêyê ve Kurdistanê ji cehaletê, xizaniyê û bêtifaqiyê xelas bike. Ji bo bicihanîna vê armanca xwe, berê xwe dide Stenbolê. Dixwest ku Siltan Evdilhemîd bibîne da ku mebesta hatîna xwe ya Stenbolê bêjê. Ew jî ji bo vê xebata Bedûzzeman xelatekê didinê. Mixabin, ev xelat jî timarxane û hebs e. Dibêjin, ev dîn e û wî bavêjine timarxanê.

Beriya ku biçe Stenbolê, rojekê ji Tahir Paşa jê re dibêje:



"Tu hemû alimên Kurdistanê îlزام dikî, baş e. Ka gelo tu dikarî, li Stenbolê wan masiyên mezinên di nav behrê de jî, meydanê bixwînî?" Gava hate Stenbolê, alim giş dawetî munazarayê kirin. Li ser deriyê îqametgaha xwe ya Stenbolê lewhekî dadileqîne. Li ser lewhê jî nivîseke wiha heye: *Li vê derê hemû pirsgirêk têne çareserkerin. Bersiva her pirsê tê dayîn lê, ji kesî tu pirs nayê kirin.* Alimên Stenbolê kom bi kom hatin dîtina Bedûzzeman û pirsê xwe jê kirin. Bedûzzeman bersiva hemûyan da. Hetta, şêxê Zankoya Ezherê piştî ku bersiva pirsê xwe distîne, wiha dibêje: "Bi vî xortî re munazere nabe, bersiveke wiha jixwe yekî mîna Bedûzzeman dikare bide." Ne ji bo quretî û xwefiroşiyê wiha dikir; dixwest ku bala aliman ji nezera hikûmetê bikişîne ser Kurdistanê.

Jiyana Bedûzzeman ya qonaxa Stenbolê, dereceyê siyasî ye. Bi rêya siyasîyê ve ji îslamiyetê re xizmet dikir. Alîgirê azadiyê bû. Dixwest ku ji vê îlana azadiyê îstîfade bike û mirovahiyê şiyar bike. Piştî îlana azadiyê, sê rojan

li Selanîkê, li meydana hurriyetê nutqekê îradê gel dika. Ji bo ku millet hişyar bike; di rojnameyan de meqaleyan dinivîse, li her derê digere û hetta diçe qehwexaneyên ku hemalên Kurd lê ne. Di wan rojan de, di Rojnameya Pêşketin û Hekariya Kurdan (Kürt Teavûn ve Terakki Gazetesi) de vê nesîhetê li gelê Kurd dika:

Ey Gelî Kurdan! Î wet, îttihadê de heyat, di biratiyê de se'adet, di hukûmetê de selamet heye. Kapika îttihadê û şirîta muhebbetê qewî bigrin, da we ji belayê xelas ke.

Qenc guhê xwe bidinê, ezê tiştêkî ji we re bibêjim:

Hûn bizanin ku sê cewherê me hene; hifza xwe ji me dixwazin.

Yek îslamiyet e; ku hezaran şehidan bi xwîna xwe buhayê wê dane.

Ê duduyan însaniyet e; ku lazime em xwe nezera xelqê de bi xizmeta 'eqîlî, ciwanmêranî û însaniyetî xwe nîşanî dinê bidin.

Ê sisiyan milliyeta me ye, ku meziyetê da me; yên berê ku bi qenciya xwe sax in, em ê bi karê xwe, bi hifza milliyeta xwe, ruhê wan qebra wan de şad bikin.

Piştî vê, sê dujminê me hene, me xerab dikin:

Yek feqîrtî ye. Çil hezar hemmalê Îstenbolê delîlê wê ye.

Ê duduyan cehalet û nexwendinî ye; ku hezar ji me de yek "qazete" nikarin bixwînî delîla wê ye.

Ê sisiyan dijminî û îxtilaf e; ku ev 'edawet, quweta me wenda dika, me jî musteheqê terbiyê dika û hukûmet jî, ji bêînsafiya xwe zulm li me dikir.

Ku we ev seh kir, bizanin çara me ev e; ku em sê şûrê elmas bi

dest xwe bigrin, da ku em hersê cewherê xwe ji dest xwe nekin û hersê dijminê xwe ser xwe rakin.

Û şûrê 'ewil: Me'rifet û xwendin e.

Ê duduyan: Îttifaq û muhebbeta millî ye.

Ê sîsiyan: Însanê bi nefsa xwe şuxla xwe bike û mîna seffilan ji qudreta xelkê(xelqê) hêvî neke û piştta xwe nedetê.

Û wesiyeta paşî:

Xwendin, xwendin, xwe din...

Desthevgirtin, desthevgirtin, desthevgirtin...

Mela Seîd

Nîhayet, Bûyera 31ê Adarê diqewime. Panzdeh xoceyên ku navên wan di bûyerê de derbas bûne, têne dardekirin. Xurşî Paşa di pacê re, alimên ku hatinê dardekirin, nîşanê bedîuzzeman dîke û weha dibêje: "Dibêjin ku te jî şerîet xwestiye, halê şerîetxwazan tu dibînî." Bedîuzzeman jî wiha bersivê dide: "Ji bo heqîqetê şerîetê eger hezar serê min hebîn û rojê yek were jêkirin jî, ez ji bo fedakirinê dîsa jî amade me. Şerîet, egera se'edet, edalet û fezîletê ye. Ne wekî ku sergerde terîf dikin e." Ji dadgehê beraset derdikeve û Bedîuzzeman jî ji dadgehê re tu spasî nake û ji Bayezîdê heta Siltan Ehmedê tevî gel dimeşe û weha dibêje: "Ji bo zaliman bijî cehnenem." Piştî, Bedîuzzeman parastina xwe ya dîwana herbê, diweşîne.

Bedîuzzeman, piştî vê bûyerê li Stenbolê pir nasekine, vedigere Wanê. Wexta ku digihîje Wanê di nav eşîrên Kurdan de digere. Di vê gera xwe ya di nav eşîran de Bedîuzzeman, bi piranî li ser asteng û pirsgirêkên Kurdan sekiniye û çareyên wan destnîşan

kiriye. Piştî, bi navê *Munazeratê* wekî kitêbekê çap dîke.

Piştî vê gerê, li ser daxwaz û israra alimên Şamê, Bedîuzzeman diçe Şamê. Dîsa bi israra wan aliman Bedîuzzeman, di Mizgefta Emewiyê de xutbeyekê dide. Ev xutbeya Bedîuzzeman hem ji aliyê aliman û hem jî, ji aliyê gel ve tê teqdîrkirin. Piştî, Bedîuzzeman vê xutbeya xwe bi navê *Xutbeya Şamê* ve diweşîne. Di vê xutbeya xwe de bedîuzzeman, li ser paşdemayîna alema Îslamê û peşketina Ewrûpayê disekine. Behsa felaket û esareta Misilmanan dîke û li ser nexweşiyên maddî û manewî yê Misilmanan disekine û çarenûsa wan destnîşan dîke. Ev xutbe hem ji bo alema Îslamê û hem jî, ji bo însaniyetê derseke gelemperî û xweş e.

Bedîuzzeman, li Şamê pir nasekine û ji bo vekirina Medresetu`z-Zehrayê dîsa diçe Stenbolê. Di seyahata Siltan Reşat a Rumeliyê de li ser navê alimên Kurdistanê beşdarî dîke. Siltan Reşat, wê li Kosowayê zanîngeheke îslamî vekira. Lê, bi despêkirina Herba Balkan ve, ev proje têk diçe. Li ser daxwaza Bedîuzzeman, ew nozdeh hezar zêrên ku ji bo Zanîngeha Kosowayê hatibû veqetandin, ji bo çêkirina Medresetu`z-Zehrayê tê dayin.

Piştî Bedîuzzeman vedigere Wanê, li kêleka behra Wanê, li Edremîtê temelê Medresetu`z-Zehrayê davêje. Lêbelê, herba cîhanê ya yekemîn dest pê dîke û ev teşebusa Bedîuzzeman jî naçe serî (1914).

Bedîuzzeman, bi tevî şagirdên xwe ve, di herba cîhanê ya yekemîn de li hemberî Rûsan cîhadê dîke. Bedîuzzeman digel şagirdên xwe di vê herbê de gelek fedakarî

kirine. Dîsa di heyama herbê de Bedîuzzeman, bi alîkariya şagirdê xwe Mele Hebîb ve tefsîra xwe ya bi navê *Îşaretu`l-Î'caz*, car caran di sîperê de û car caran jî, li ser hespê nivîsandiye. Bedîuzzeman, ji bo vê tefsîrê wiha dibêje: "Wexta min *Îşaretu`l-Î'caz* nivîsand, min ne bi niyeta tefsîrekê nivîsand; belkî, min nivîsand ku di paşerojê de ji bo nivîsandina tefsîran bibe emsal." Di vê herbê de, tevî katibê *Îşaretu`l-Î'cazê* Mele Hebîb û bîst telebeyên Bedîuzzeman ên fedakar, şehîd dibin. Bedîuzzeman jî, li Bedlîsê ji aliyê artêşa rûsan ve dîl tê girtin û artêşa rûs jî, wî dişînin Kostûrmayê. Bedîuzzeman, dora du sal û nîvan li Kostûrmayê di esaretê de dimîne.

Rojekê, serfermandarê artêşa rûs Nicola Nicolovic, tê teftîşa dîlgirtiyên. Di teftîşê de bedîuzzeman, ne selamê didê û ne jî di ber de radibe. Serfermandar, bi rêya tercuman jê dipirse: "Qey wî ez nas nekirim?"

Bedîuzzeman: "Min nas kir; Serfermandarê artêşa Rûs û xwarziyê çarê Rûsan: N. Nicolovic."

N.Nicolovic: "Naxwe, te hem heqaret li artêşa Rûsan kir û hem jî şexsê min kir."

Bedîuzzeman: "Mebesta min, ne heqaret e. Ez alimekî Misilman im. Di bawerîya me de, kesekî xwedî îman li pêşberî kesekî Xwedênenas ranabe."

Li ser van axaftinan N.Nicolovic, Bedîuzzeman dide dîwana herbê û dadgeha leşkerî jî biryara îdamê dide. Wexta ku biryara îdamê wê bê înfazkirin, N.Nicolovic tê ji Bedîuzzeman lêborînê dixwaze û dibêje: "Min tu şaş fêm kiriye."

Bedîuzzeman, li Enqerê jî vala nasekine. Ji bo vekirina wê zanîngeha ku ji berê de xeyala wê dikir, dixebite û ji bo Medresetu`z-Zehrayê sed û pêncî hezar banqnotî ji meclîsê derbas dike. M. Kemal jî, ji bo ku Bedîuzzeman bikşîne cem xwe, teklîfa mebûsiyê, waîztiya hemû Kurdistanê û koşkekê dike...

Piştî du sal û nîvan şûnde nîhayet Bedîuzzeman firar dike. Bi xeta Petersburg-Warşova û Wiyanayê ve digihîje Stenbolê. Hatina wî ya Stenbolê, ehlê ilmê memnûn dike. Bê xebera Bedîuzzeman, wî dikin endamê Daru`l-Hîkmetu`l-Îslamiyeyê.

Di 1918an de Ingilîz, Stenbolê dagir dikin. Bedîuzzeman, ji bo ku millet hişyar bike, bi navê Xutuwater`s-Sitte pirtûkekê dinivîse û belav dike. Di vê heyamê de Bedîuzzeman, têkoşînek serkeftî û xweş dide. Ev têkoşîna han pîr li xweşiya Hikûmeta Enqerê jî diçe û bi şîfre Bedîuzzeman dawetî Enqerê dikin. Bedîuzzeman, peşî vê teklîfê qebûl nake. Piştî dostên wî dixin dewrê û Bedîuzzeman jî wan dostên xwe naşkêne û berê xwe dide Enqerê.

Wexta ku Bedîuzzeman digihîje Enqerê, di meclîsê de bi atmosferike germ wî pêşwazî dikin. Lê, weziyeta hikûmeta Enqerê, nakeve serê wî. Bedîuzzeman, nesîhetê li mebûsan dike û li ser vê nesîhetê şêst mebûs dest bi nimêjê dikin. Lê, serokê meclîsê M. Kemal ji vî halî razî namîne û bi Bedîuzzeman re dikeve munaqesê. Rojekê, di nav pêncî-şêst mebûsan de serokê meclîsê ji Ustad re wiha dibêje: "Me gazî te kir ku tu jî werî û em ji wan fikr û ramanên te îstifade bikin. Lê, tu jî hatî qala nimêj mimêjê dikî û îxtîlafê dixî navbera me." Li ser vê gotinê Bedîuzzeman her-

du tiliyên xwe dirêj dike û wiha dibêje: "Paşa paşa! Li vê dinyayê piştî îmanê heqîqeta herî mezin nimêj e. Yê ku nêmiy neke, xain e. Hukmê xainan jî merdûd e."

Bedîuzzeman, li Enqerê jî vala nasekine. Ji bo vekirina wê zanîngeha ku ji berê de xeyala wê dikir, dixebite û ji bo Medresetu`z-Zehrayê sed û pêncî hezar banqnotî ji meclîsê derbas dike. M. Kemal jî, ji bo ku Bedîuzzeman bikşîne cem xwe, teklîfa mebûsiyê, waîztiya hemû Kurdistanê û koşkekê dike. Lê, Bedîuzzeman ew şexsê axirzeman ê ku di rîwayetan de derbas dibe, li ber çavê xwe dibîne, wan teklîfan red dike û vedigere Wanê. Ji bo înzîwayê diçe çiyayê Ereke. Heta bûyera Şêx Seîd li çiyayê Ereke dimîne.

Piştî bûyera Şêx Seîd Bedîuzzeman sirgûnî Burdurê dikin. Li vî bajarî di bin zulm û te`deyê de jiyanekê weke esaretîyê dikişîne. Dîsa vala nasekine, xebat û xizmeta îman û Qur`anê dike. Bi navê "Deriyê Ewîl yê Nûrê" pirtûkekê dinivîse û belav dike.

Ji Burdurê jî wî sirgûnî Barlayê dikin. Hedef û armanca nefîkirina wî ya Barlayê, dûrxistina ji nav bajar û mirovan, ji bo ku nepewiyê, berhemên îmanî nenivîse û xizmeta Qur`anê neke. Ev rewş jî ji bo alimekî têkoşer ezabekî pîr mezin bû. Di bin îstîbdad û teressudê de pîr îşkence û ezab dîtîye. Ji sala 1925an heta sala

1934an li Barlayê dimîne. Li vê derê dest bi nivîsa Rîsaleyê Nûrê dike. Bi şev Qur`ana pîroz, Cewşen, munacata Şahê Geylanî û Şahê Neqşîbend û çavkaniya Rîsaleyê Nûrê "Hizbu`n-Nûriyye" dixwîne. Di nav rojê de jî li ser teshîha Rîsaleyan disekine. Ehlê îlhadê dinêrin ku Rîsaleyê Nûrê geş dibe, îman Îslamiyet bi hêz dibe û li ser vê dibêjin Bedîuzzeman cemiyeteke ne hişkera ava dike û li dijî rejimê xebatan dike.

Li ser van îddîayan di eleyhê Bedîuzzeman de di 1935an de li bajarê Eskîşehîrê mehkeme vedibe. Wî digel sed û bîst telebeyên wî dixine girtîgeha Eskîşehîrê û îşkenceyên bidehşet li wan kirine. Bedîuzzeman xistine nav tecrîda mutleq. Digel wan îşkenceyan girtîgehê dixwe medreseya Yûsifiye. Û ew kesê di girtîgehê de bi tevahî îslah dibin. Lem`eya Sêyem û Şû`eya Yekem û Duyem li wê derê dinivîse.

Piştî girtîgeha Eskîşehîrê wî sirgûnî Kestamonuyê dikin, demeke dirêj, li hemberî qereqola polîsan "îqameta mecbûrî" li ser wî ferz dikin. Ji 1936an heta 1943yan, heşt salan di bin çav de dimîne. Bedîuzzeman, di bin vî zulm û esaretê de jî vala nese-kiniye. Xizmeta îman û Qur`anê domandîye. Bedîuzzeman, bi şiklekî veşartî ve bi rêya nameyan, bi telebeyên xwe re dikeve îrtibatê (peywendî). Rîsale-î Nûr bi vî awayî li herêma Karadenîzê belav dibe. Bi vî şiklî, daîreya Rîsaleyên Nûr fireh dibe û jîmara kesên ku Rîsaleyan dixwînin û dinivîsînin, zêde dibe.

Dujminên Îslamê li hember vî futûhatê, dek û dolaban dizivîrin, dibêjin: "Bedîuzzeman di eleyhê Hikûmetê de ye, cemiyeteke veşartî saz dike û ji M. Kemal re, Deccal û

Sufyan dibêje.” Bi van îddiayan ve Bedûzzeman û tevî sed û bîst û şeş telebeyên wî, di sala 1943an de sewqî dadgeha Denîzliyê dîkin. Li ser parastina Bedûzzeman, ew û telebeyên xwe serbest têne berdan. Dîsa ji neh mehan di girtîgehê de dimînin. Di vî girtîgehê de jar didin Bedûzzeman. Jixwe, tevî vê carê nozdeh caran jar dane Bedûzzeman. Lê, her carî bi hîfz û parastina Xwedê Bedûzzeman ji van qomployan xelas dibe. Di bin van zehmet û îşkenceyan de jî Bedûzzeman, nivîsîna rîsaleyan didomîne. Bi van xebatan ve Rîsaleyên Nûr, seranserê Tirkîyeyê belav dibe. Bedûzzeman, di sala 1944an de ji girtîgehê derdixin û wî ji Denîzliyê dişînin Emirdagê. Bedûzzeman, heta 1947an li vir maye.

1947an de Ustad û telebeyên wî dibin Afyonê. Li Afyonê jî dozger, bi heman îddiayan ve li hember Bedûzzeman û telebeyên wî doz vedike. Li vir jî wan dixine girtîgehê. Di encamê de ew îthamên ku der heqê Bedûzzeman û telebeyên wî de hatibûn kirin, tev pûç dertên. Dîsa jî bîst mehan di girtîgeha Afyonê de dimîne. Heta îlona 1949an di girtîgeha Afyonê de dimîne. Piştî girtîgehê, du mehan li Afyonê disekine. Ji wir jî diçe Emirdagê û ji Emirdagê jî 1950î de derbasî Ispartayê dibe. Di 1952î de ji bo mehkemeya Gençlik Rehberî diçe Stenbolê.

Di Adara 1960î de li ser daxwaza Bedûzzeman, telebeyên wî, ewî bi otomobîlê ve li ser guzergeha Konyayê ve dibin Ruhayê. Bedûzzeman, piştî ku digihêje Ruhayê du roj şûnde, ruhê xwe teslîm dike. Xwedê rehma xwe li bike.... ❁

başûrgerî

sidîq gorîcan
s.goricani@hotmail.com

perî

qilintareke berfê di destan sekiniye li ber derî
dibêjim nav çî ye biçûkê rasterast dibêje perî
heqeten perî ye bi rûkeniya xwe a narîn û zirav
hesreteke asûde derdîçe j' min l'vê şarê bi çîya û sûlav

digerim ez bi dilê xwe li nav tax û sûka amedî
demsal zivistan e berfebaran e şil e û cemidî
perîya gulnak û minara kevnare dibin du havîngeh
yek mizgînî dide siberojan yek ji bo azadî dibe bîngeh

sibat 1,2011 amediye

derî

azadiya reng û peyvan e
ku li deriyên dike tiqetiq
û li ba dikeve li ser ziman û sinceqan
ewr dilyeqîn dişeyne dilopên xwe
xwe li temarê dara mazi dipêçe
terrahî li çîya bi şadî
rîmbêlên bereketê tîn firandin
ji libên dara narincî
ji ber deriyên taqvekirî

sibat 3,2011 duhok

bêrî

ji nişka ve bêriya te
xwe li beriya min bi lertzane dike ripin û asê
dixwazim bi qasê vê deşt û bajarê
vekim himbêza xwe ji te re
bi hênîkahiya belçîma dara tû û gelasê

dilala min a biçûk
eniya xwe birêke bi kuliyan wê berfa spî
ku li baniya bilindahiya artosê
dibe xwera kulîlkên gîlêr
birêke zû bi zû ku bi tîra dilê xwe
te bîxim li nav qelbê xwe
birêke zû bi zû ku ez bikarim ji zulfepora te
hêlîna bilbilên heziyariyê ava bikim
li vî welatê azadîxewnak û êşnas
sivik bigire herdu destên xwe
kilam di gewriya min de vegezan şapeyeke sil û har
sivik bigire herdu destên xwe
giran û nexweşkês e lew li me piştî û bar
dilala min delala min dîlnala min

sibat 4,2011 hewlêr

Vajeya Siftekêni

Bediuzzeman Seîdê Nursî
Açarnok: Şaban Şenates-Şenaymandar

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِیْمِ
وَبِهٖ نَسْتَعِیْنُ

الْحَمْدُ لِلّٰهِ رَبِّ الْعَالَمِیْنَ وَالصَّلَاةُ وَالسَّلَامُ عَلٰی
سَيِّدِنَا مُحَمَّدٍ وَعَلٰلِیْهِ وَصَحْبِهِ اَجْمَعِیْنَ¹

Hey bira! To mira çend nesî' hetiy waştîy, Qando ki ti eskerê, bi yûsildê eskereya 'heşt meselan û dîrê şîretanê biraştan bi nefsdê mina piya goşdarey ki. Çiki ez nefse xwu 'hemini vêşerî mi'htacê nesî'hetan vîna. Wextêra mi "'Heşt Vajey"'ê ki "'heşt ayetan"'ra vetiy bî û îstîfade kerdiy bî, mi nefdê xwurê derg vatîy bî. Nika jî eza înan kena tayên kilm û bi zuwandê xelqîya nefsdê xwurê vaja, kam ki qayîlo wa bi nefsdê mina piya goşdarey kero.

VAJEYA SIFTEKÊNI

Bîsmîllah'i, serê hergi xeyriya. Cora ma jî sifte bi aya dest kenê pa. Bizani ki hey nefse mi! Senîn ki na kelîmaya bimbareki nîşanê Îslam'îya, winî jî mewcûdatî sero bi

¹ Bi nameyê Homayî ke Rehman û Rehîm o. Û ma tena ey ra ardim wazenî. Ezel ra heta ebed heme tewir hemd, goyen, pesn, şikir û minet rebbê aleman Ellah rê yo. Selat û selam efendiyê ma Hz. Muhammed (a.s.w) û aileyê ey sero bo.

'haldê xwuyê lîsaniya tamê serdê zuwaniya.

Eger ti qayîlê bîsmîllahi di çi berkeyêdo pêpeynî û çi qewetêdo bê'hesab bivînê û fe'hm kerê, biewnî na merselerda temsîlîra û goşdarey biki. Îşte winasîn:

Merdimo ki deştandê 'Erebandê bedewiyanra geyreno, cirê lazimo ki, nameyê reîsêndê qebîlayênda înan bigîro, ew dekewo sersûneyda ci bin. Ta ki şerrdê şaqiyanra, raybirrokanra bireyo û îhtiyacanê xwu bivîno. Eger wina nêkero, do dişmendan û îhtiyacandê xwuyê bê'hed û bê'hesaban vero pêrîşan bo.

Îşte qandê seyranêndê winasînî, di merdimê raywaniy deştên di kewnê ray û şinê. Înanra jû mitewazî bî, o bîn mexrûr... Mitewaziyê ci nameyê reîsên grot, mexrûrî nêgrot. O ki grot, 'heme ca di bi silamete-ya geyra. Eger raştê raybirrokên, raştê rayqetokên bêro, vano "Eza bi namedê filan reîsiya geyrena," raybirrok(şaqî) ce'hnimêno, nêşeno ci veyo. Dekewno xeymên bin, bi ê namiya 'hurmet vîno. O mexrûro bîn, seyrandê xwu di winî bela û bêteriy vîno, winî rezîley anceno ki vatena ci jî kesî kena belengaz; tim lebayêno, tim gazincêno, tim parse keno. Hem bî rezîl, hem bî zelîl û pêrîşan!

Bîsmîllah'i, serê hergi xeyriya. Cora ma jî sifte bi aya dest kenê pa. Bizani ki hey nefse mi! Senîn ki na kelîmaya bimbareki nîşanê Îslam'îya, winî jî mewcûdatî sero bi 'haldê xwuyê lîsaniya tamê serdê zuwaniya

Îşte, hey nefse mino mexrûr! Ti o raywanê, o dinya jî deştênda siyaya. 'Ecz û feqrê to bê'hesabo. Dişmen û'htiyacê to jî bêpeyniyo. Madamo ki winao; nameyê Malîkê Ebedî û 'Hakîmê Ezeli'yê na deşta siya bigî. Ta ki ti parsekareya dinayay û hergi 'hadîsî vero nêlerzê û bireyê. Laberê na kelîma winî xiznayênda bimbareka ki; 'ecz û feqrê toyê bê'hesabî, torê bi qudret û re'hmetê bê'hesabiya bestena, ew Dergahê Qadîrê Re'hîmî di ê 'ecz û feqrî torê kena şefaatkларêndo tewro meqbûl.

Belê. O merdimo ki bi na kelîmera 'herket keno, beno zê ê merdimî ki; eskerey di qeyd beno, bi namedê dewleta 'herket keno, minneta ci kesîrê nêmanena. Vano bi namedê dewleta, bi namedê qanûniya, ew hergi karî keno, çiyên vero nêterseno, damîşê hergi çî beno.

Ma sifte vat bî hergi mewcûdat, hergi çî bi zuwandê xwuyê 'haliya vano: Bîsmîllah.

'Eceb winiyo?

Belê. Senîn ki to dî, merdimên ame bizora şarê sûkên pêro arêda pêser û sewkê cayên kerd, ew pa karên da kerdeni. Wexta ti bi yeqîna fe'hm kenê ki o merdimo sirf bi namedê xwu, bi qewetdê xwu teniyaya 'herket nêkeno, beno ki o eskerêno bi namedê dewleta 'herket keno, paştiya xwu daya paştîda padîşay.

'Eynî bi no babeta jî 'heme çî bi namedê Cenabê Heqî'ya 'herket keno; ki toxim û dendikê ze zerrekîy xwu sero daranê zêdê qantaran hewadanê, êyê baranê zê koyan nanê xwu doşî ser û hewadanê.

Dêmax kî hergi dara vana bîsmîllah, ew aya Xiznada Qudretî'ra bena ze lên û bi xeylên

şamiyandê tamweşanan pêya peyşena, destanê xwu pîrr kena û marê tewlakarey kena. Hergi manga û deve û mî û biza bimbareki vana bîsmîllah û marê bi namedê Rezzaq'iya, qandê coy-dareya ma werdê gandarane'yê tewrê letîfî, ew arişê tewrê nezîfî kerem kena, kena ma qîrrî.

Hergi kok û tamarê nebatî û dar û vaşandê ze 'herîrê nermekiy vanê bîsmîllah, sî û 'erdanê wişkan qul kenê û ravêrenê. Bi namedê Ellah'iya, bi namedê Re'hman'iya vanê, hergi çî înanrê beno emîrber.

Belê. Zêdê hewara hêl biyayena gilana û zêdê meywe dayenda daranan ê sî û 'erddê wişkî bin di bi gengazeya 'herketê ê kokan û 'erdî bin di meywe dayena ê nêbatan, hem bi manganan şiddêtdê ê germ û germîstanî vero vinderdena ê perrandê nazenîn û nazîkan bi 'hukmêna şîlmaxên dana ê tabîatperestan rîro û cira cîrîngî vejena, ew gişta xwu kuwena ê çimandê ciyê somande mendan û cirê vana ki, "Salabet û 'herareto ki şimayê cira bol paştî gîne, ew şima bi ciya firrenê jî, oyo emrî bin di 'herket keno, hergi rîçeyêndê ciyo zê herîrî oyo zêdê Gopalda Mûsa('a.s.)y bi emirdê *فَلَمَّا اضْرَبَ بِعَصَاكَ الْحَجَرَ*² iya bestêno û siyan lete keno. Ew perrê ciyê zêdê perrandê cixaranê nazenînan jî hergi jûda ci zêdê azayê İbrahîm ('a.s.)'î şewatê adirperrayî vero *يَا نَارُ كُونِي بَرْدًا وَسَلَامًا*³ wanenê.

Madamo ki hergi çiyoy bi babetêna bîsmîllah vano, bi namedê Ellah'iya ne'hmetanê

Ellah'î ano dano ma, ma jî gerego ki bîsmîllah vajê. Bi namedê Ellah'iya bidê, bi namedê Ellah'iya bigîrê. Madamo ki winao, gerego ki ma însanê cahîlê ki bi namedê Ellah'iya nêdanê, înanra nêgîrê.

Persên: Mayê çerçiyarê, 'ettaranrê, tewlakaranrê fîyetêdanê. 'Eceb whêrê maliyo 'esîlo Ellah'o mara çî fîyet wazeno?

Cewab: Belê. O Mun'îmo Heqîqî'yo bedelê ê ne'hmetandê qîmetdaranrê mara çiyoy ki wazeno, hîrêyê: Jû zîkro, jû şukro, jû jî fikro.

Sifte bîsmîllah, zîkro. Peynî di el'hemdulîllah, şukro. Mabeyndê nînan di şikê nê ne'hmetandê qîmetdaran û harîqaperweranan û mûcîzeaweran û sen'hetperweran biyayeni, ew fina şikê mucîzeyê qudretê E'hedê Samed'îra peyda biyayenda ci, xelata re'hmetdê Samedê 'Ehed'î xwu vîrî ardeni jî fikro.

Senîn ki padîşayên torê bi merdimêndê mîskîniya xelatên birîşo û ti dest û linganê ê merdimê mîskînî maç kerê, laberê ti tew whêrê a xelati xwu vîrî nêarê. Wexta ti jî, 'heme jî zanê ki na bena xîntey. 'Eynî bi no babeta jî mun'îmanê zahîran'e(çerçî û 'ettar û tewlakaran)rê med'h û sena kerdeni, laberê Mun'îmê Heqîqî xwu vîrî nêardeni hewna ey xîntêriya, dîwaneyêriya.

Îşte hey nefis! Eger ki ti jî qayîl niyê wina zêdê tabîatperestan eble'h bê;

Bi namedê Ellah'iya bidi,
Bi namedê Ellah'iya bigî,
Bi namedê Ellah'iya dest paki,
Bi namedê Ellah'iya kardi
Û selam...

2 Çanqilê xo bidi kerra ro (Sureya Beqera: 60)

3 Hey adir! Seba İbrahîmî honik û selametin bi. (Sureya Enbiya: 69)

Ji kaniyê çend qurt av

Dilazad ART

dilazadart@gmail.com

I. Carna tiştin têne sere însan. Însan bi wan tiştan dikeve rêyen nebaş û rêyên şaş. Sebir daneyeke Xwedê ye ji mirovên bi hişmend re. Di xuyaniyê de tiştên têne serê mirov dibe ku xerab bin lê di paşiya wan de dibe ku xweşî hebe. Dîtina mirov bi sînore. Ji ber vîna ye ku pêşeroja xwe rind nabîne. 19.10.2004

II. Ketim rêyeke dûvdirej. Di ser rêya min de gelek pirsgirêk hene. Jixwe jiyaneke bê pirsgirêk tune ye.

Armanca ew e ku mirov karibe van pirsgirêkan ji meydana rake. Ez ketim pey raza jiyane. Çi qas ez pê de çûm rê û şaxê rê li ber min zêde bûn. Min xwe avête deriyaya zanistê. Çiqas çûm kûrahiya deryaya zanist wulqasî li ber min fereh bû. Bi qasî bêhna xwe ketim bin avê. Derya kûr, rê dirêj, temen kin, xwestek û daxwaz pir, jiyana bi derd û jan, wext pir dereng û nizanîm çî bikim. Ji bo razên jiyane fer bibim min berê xwe da xwendinê û gerê.

Piştî ku gelek sal derbas bûn, min fêma kir ku hînbûna jiyane li ser xwendinê û gerê ye. Xwendin aliyê însanê manewî, ger rexê maddî geş dike.

Di xwendinê de rêya min lê şopand:

Pêşî pirtûka diket destê min min dixwend. Ku ez fêrî xwendinê bûm, min berê xwe da klasîkên Tirkî. Piştî re klasîkên dinyayê xwendin. Min cûdayî nexist nava pirtûkan de. Min xwend heta ji xwendinê têr bûm. Lê çî qasî min dixwend hê behtir eşqa xwendinê li min zêde dibû. Hattim dereceyekê ku pirtûkên min dixwendin ti fêda wan ji min re çenedibû. Wê demê ez li pirtûkên cûda geriyam. Pirtûkên roman, helbest, çîrok, raman, huner, çandî, dîrok û mîtolojiyê ez hew tîr kirim. Lê ez ji gera xwe venegeriyam. Geriyam heta ez gihîştim armanca xwe. Pirtûkên min dîtî û zanistî û tesewwîfî bûn. Dema min xwendin, min fêma kir ku ji bo xwendina wan ez gelekî dereng mame. Lê yek ji ku dera xisarê vegere kar e. Ez jî vegeryam. Û min berê xwe da wan pirtûkên bêhempa. Ew pirtûk ji min re bûn derya, bûn rê, bûn kanî. 24.10.2004

III. Her dem; xwedî jiyaneke xwe, xwedî zimanekî xwe, xwedî zanîneke xwe, xwedî toreyeke xwe ye... 24.10.2004

Pirtûkên ên roman,
ên helbest, ên çîrok,
ên ramanî, ên hunerî,
ên çandî, ên dîrokî,
ên mîtolojiyê ez hew tîr
kirim. Lê ez ji gera xwe
nevegeryam.
Geriyam heta ez
gihîştim armanca xwe.

IV. Hemû tişt hatine gotin. Ya ez dikim li gor dema xwe cilên dema xwe li heman ramanan dikim. 24.10.2004

V. Ji bo fêrbûna ziman dibe mirov hînî hevokan bibe. Bi hînbûna bêjeyan ziman nayê fêrkin. 31.05.2005

VI. Jiyana mirov dibe roj bi roj pêşde here. Hişê mirov gav bi gav dibe fereh û kûr bibe. Zanîn û têgihîştina jiyane bi nerîneke kûr û fereh çêdibe. Rastiyek heye ku nayê windakirin. Bi bihurandina temen re mirov têdigihîje ku di jiyane de gelek derew hene. 09.05.2005

VII. Heta niha min gelek çewtî û xeletî kirine. Îsal bi awayekî vala derbas bû. Min tiştê ji jiyana xwe fêm nekir. Li gor baweriyaya min dem zû derbas bûn. Sedemeke wê çêdibe ku ji serdema ragihandinê be. Bi qasî pêşketiniya teknîkî û ragihandinî jiyana mirov jî zû diherike. Lê haya mirov jê nîne.

Ez gelekî li ser tenduristiya xwe ranawestim. Dibe ku her roj tevgerên sporî bikim lê min dev jê berdaye. Hem dibe ku her roj diranê xwe paqij kim lê ez serê heftekê carekê diranê xwe paqij dikim. Serûştina min jî ne di pergalekê de ye. Ev hemû jî teraliya min û ji bixwernedîtîya min derdikeve holê. Ya rastî di demeke pêşerojê de ezê li van rojan poşman bibim, lê yê hingî dem bihurîbin. Hem dermanê ku bijîjk dane min jî, ez wana bi kar naynim. Ev jî ji sersariya min e. Ya rastî tu karê giran jî nakim. Lê dem mîna çem diherike diçe. Ya rastî roj wek çavgirtin û vekirinê ji min re tî. 29.05.2005

VIII. Piştî ku mirov hate afirandin roj bi roj şaristanî pêş ket. Ku

şaristanî gihaste asta herî bilind êdî roj bi roj paşde diçe. Ev bûyer heta roja qiyametê dê bidome. 31.05.2005

IX. Aramî ne di bédengiyê û di tenetiyê de ye.

Aramî; dema ku dilê mirov rehet be çêdibe. 06.06.2005

X. Ji bo tenduristiyê; hindik razan, hindik xwarin, bi ava cemidî serşûştin, tevgerandina bedenê. 18.07.2005

XI. Pêşî mirovan perwerdeyî xwendinê bikin. Dûvre pirtûkan bi wan bidine xwendin. 26.08.2005

XII. Zewac destpêkeke nû û zayîneke nû ye. 26.08.2005

XIII. Zilm û zordarî ji ku derê û ji kê were ez li hemberê wê me. Lê ez dixwazim hemû kes ji gelê xwe hez bike û ji bo gelê xwe bixebite. Lê dibe di vê xebata xwe de gelên din piçûk nebîne û tu gelan bindest neke û wana ji xwe re kole nebîne. 31.05.2005

XIV. Can tu car namire, ya ku dimire laş e. Gihîştina can bi gihîştina laş ve girêdaye. Ya ku çêdibe, digihîje û dimire beden e. Can girêdayê bedenê ye. Heta beden jîndar be can di bedenê de tevdigere. 12.06.2005

XV. Ev çend roj in ku li mirovan û li dinê temaşa dikim. Min dît mirovên ku xwe pêş dixin her roj xwe nûj dikin. Ez di cihê xwe de me. Min dît mirovên ku xwe li ber bayê beradayiyê/sefahatê berdane roj bi roj paş dikevin. Ji rûmeta mirovahiyê dûr dikevin.

Min çî qas li mirovan temaşe kir wulqasî têgihîştim ku ez gelekî li paş mame. Gelek kêmasiyen min hene. Lêbelê ji teraliye û ji bixwernedîtîyê ez tu karî û tuxebatê nakim. Temenê

min hê di dema xweavakirinê de ye. Lê ez bi çavekî gihîştinê li xwe meyze dikim. Ev çewtiyeke mezin e. Îro min biryara fêrbûna zimanê Ingîlîzî daye. Bi destûra Xwedê ezê vê biryara xwe bi dawî bînim. Hem dibe ez xwe li hemberî astengiyên jiyane bi alavên hunerê jî bixemilînim. 05.06.2005

XVI. Ji nû ve têgihîştim ku hemû kes çî bike ji bo xwe dike. Ji bo rûmeta xwe dike, ji bo ku rastîya xwe derxe meydanê tekoşinê didomîne. 06.06.2005

XVII. Heta îsal (Îlona 2005) min hemû nivîsên xwe bi Tirkî dinivîsîn. Ji bo wê nivîsandina min a bi Tirkî pêşketibû. Hem ramanên min jî qulipibûn ser Tirkî. Lê niha bi zimanê xwe dinivîsim. 21.05.2005

XVIII. Heta niha gelek zarokên dewlemend bi navê hişmendtir (deha/dahî) bi me dane naskirin. Bi rastî hişmendiya wan ne ji wan tî. Ji derfetên wan tî. Di nav civakên xizan de gelek zarokên hişmend hene lê ji bo ku derfet di destê wan de tunene zanînen wan dernakevin meydanê. 21.05.2005

XIX. Li gundekî ku rêya wî ji bo ragihandinê hêsan be, av û kehrîbara wî hebe û îklîma wî baş be, li cihêkî xweş xanîkî ava bike. Di nav hewşa wî de hawizekî ava ke, dora hawiz bi dara şîn bike. Û bikeve xêra Xwedê de 09.07.2005

XX. Ji bo aboriyê li welatekî ku xanî lê erzan be xaniyekî bikire. Dibe ku rojekê rewş were guherîn û ew dever pêşde here. Bi vî awayî bi hindik diravî gelek tişt bi dest dikevin. 26.08.2005

Delal

Ergül Mercan

Serê vê sibehê min çavên xwe bi şirpîniya baranekê vekir. Weke bi hemd ji dinyê qehirîbû û keserên dilê xwe bi ser Diyarbekirê de vala dikir. Weke ku bigirî. Ewr û ezman xwe bera ser Diyarbekirê dabûn. Li kuçe û kolanan tu kes nedixuyan. Di rojên wanî de xemgîniyek di dilê min de peyda dibe, min ji jiyanê aciz dike û wê roja reş tîne bîra min, birîna dilê min nû dike.

Wê rojê jî baraneke wisa dibariya. Hîna jî gava baran dibare ez diherim nexweşxaneyekê, bêdeng rûdinim, li nexweşxanê guhdar dikim, di wê wîliwîlê de hizûrê dibînim. Nexweş li dermanê xwe digerin, ez jî li dermanê birîna dilê xwe digirim. Di rûyê nexweşan de jana ku li laşê wan peyda bûye jî xuya dibe. Her yek ji wan bi aliyekî ve diherin. Dema ku mere ji bo temaşa wan rûdine mere manakê dide reva wan î bi lez. Carna li nexweşxanê bêhna min fireh dibe û ez berê xwe didim malê. Carna jî bûyerên nexweşxanê bandoran li ser min dihêlin û yeke din jî li kul û keserên dilê min zêde dike.

Rojekê ji van rojên nexweşxanê ez li Delalê rast hatim. Çavên wê yî wekî asîman şîn di nav

kirasê reş de bi masumiyet li der û dor dinerîn. Bijankên wê yî dirêj û badayî siya xwe bera ser hinarêkên rûyê wê yî li ber tavê qemirî dabûn. Lêvên wê yî sor weke gulebûkan bûn. Keserên dilê wê di qermîçekê eniya wê de xwe dida nîşan. Delal weke peykereke bedewiyê bû. Lê êş û eleman, xetên kûr li ser rûyên wê yî ciwan kişandibû. Ew jî wê rojê weke min bêdeng bû. Xuyabû ku jiyan li rûyê wê jî nekeniyabû. Ez demekê li hemberfî wê rûniştim û min ew rûyê bedew û xemgîn temaşe kir. Bêdeng li ser wê tabûreyê rûniştî bû. Tenê bû, kes li ba wê tunebû. Ji dûr ve dirûvê wê, ew li dora 20-25 salî xuya dikir. Lê stûxwariya wê nîşan dida ku dilê wê gelek kul û keser dîtine. Weke rihana di payîzî de li ber ba û barana bêûjdan bimîne û pelên xwe biweşîne, li ber jiyanê bê star mabû. Ev jê re bûbû qeder. Meraqeke bêdebar ez bi aliyê wê ve dehf dam, vî rûyê ewqasî bedew û ciwan, lê ewqasî jî bi barê huznan ve tije gelo çî kişandibû, çî rojên reş bi serê wê de hatibûn û weke ku gulek biçilmise ew çilmisandibûn.

Wê rojê jî baraneke wisa dibariya.
Hîna jî gava baran dibare ez diherim nexweşxaneyekê, bêdeng rûdinim, li nexweşxanê guhdar dikim, di wê wîliwîlê de hizûrê dibînim

Ez bêhemd ji cihê xwe rabûm bi aliyê wê ve meşiyam, li ser kursiya teniştê wê rûniştim. Belkî min sebebek, rêyek tê de bidîta û hinekî ew bida peyvandin. Bi-bama şirikê huzna wê. Lê minê çawa dest bi peyvê bikira, minê çawa vê kesa ku weke sindoqe-ke deriyê wê bi qulikan hatibû kilftkirin, vekira û ew bidaya peyvandin.

Li kêleka wê ez qederekê bêdeng rûniştim. Di binê çavan re min lê dinêrî. Min dît simalka destê wê ket erdê, evaya firsetek bû, derhalê ez lê xwar hatim min ji erdê rahiştê û min dirêjî wê kir, min got:

-Ev ne simalka destê te yî?

Ew weke ku ji xewnekê şiyar bibe, li min nêrî, dûv re li simala wê ya ku di destê min de nêrî. Lêvê wê hêdî mizicîn û hinekî bi fedyokî destê xwe dirêjî simalê kir. Êdî deriyek di nava me de vebibû, gereke min nehiştê were girtin, bêyî zûkirinê lê bi usûl min got:

-Xwedê şifayê bide, gelo çi nexweşiya te heye?

Wê hew got:

-Xwedê ji te razî be. Û qut kir.

Nedixwest bipeyive, lê minê dev jê berneda. Piştî bîsteke ku em herdu jî bêdeng man, min got:

-Ewê kengî dora te yî muayenê were?

Bi vê pirsê re êdî hêdîka li min zîvirî bi dengê zirav î melûl dest bi peyvê kir. Îcar em çiqasî peyvîn, ez nizanim. Êdî em nema dipeyvîn, em herdu jî ketin nava behra bêdengiyê. Min dît zilamekî nêzî 60-70 salî hat li kêleka Delalê sekinî. Ew jî

bû hevalê bêdengiya me. Dengê hemşîrê weke birûskeke, xwe berde nav ramanên ku em ketibûnê û bêdengiya em tê de qelaşt.

Ew li bende wî dengî bûn. Bi deng re herdu rabûn, Delal da du zilamê yextiyar. Tiştê ku Delalê ji min re gotibûn, hişê min tevli hev kiribû, gelo tiştên wanî dibin li dunyê, qene mimkun in van tiştana.

Çaxa ji hundur derketin ez hîna li ciyê xwe rûniştibûm. Delal digiriya, hêstirên wê weke bê û baranê diherikîn, weke çemekî li dû baranê dîn û har bibe di çavên wê de cih ji xwe re nedidîtin û xwe bera ser hinarikên Delal î li ber tavê qemirî didan, mil û baskên wê bi yekcarî ketibûn, westiyabûn ji barê jiyane. Weke ji xwe re li starekê bigere li dora xwe nerî. Xwe bera ber dîwarekî da û demekê li ber dîwêr hêstir barand. Heta ku zilamê kêlekê, bi destê wê girt û ew ji ber dîwêr rakir. Bi zor li ser xwe diedilî. Dema min ew dî, hêstiran ji bijankê min xwe berdand ser rûyê min. Ez bi ber wê de çûm, lê sekinîm, bi şûnde vegeyiam. Dilê min hilnegirt ku ez pê re biaxivim. Bi gavên giran û bi dilekî şikestî dan rê û çûn. Min li dû wan nerî. Niha ez ji xwe re difikirim, gelo tiştê ji min re qalkiribû, min nizanîbaya ewê ne çêtir baya?

Delalê, çavên xwe weke hemû zarokan bi girî li dunyê vekiribû, lê giriyê wê ne weke yên hemû zarokan bû. Te digot qey ew li bextê xwe yî reş digiriya, li tenêbûna ku ewê bihataya serê wê digiriya. Pîrika Delalê bi giriyê wê re hêstir dibarandin. Diya wê carekê tenê jî ew hembêz nekiribû. Dema ku wê çavên xwe li vê dinya

derewîn vekiribû diya wê jî koça xwe kiribû, ji vê dunyê bar kiribû. Ez dibêjim dê, lê çenek zarok bû, hîn di bihara jiyana xwe de bû, ji çardeha nû daxilî pazdeha bibû. Keça maleke feqîr bû, bibû bûka maleke feqîr jî. Axir zewacê jî tu guherîn di jiyana wê de nekiribû û feqîriya li mala bavê li mala xezûr jî berdeham bû. Wexta Delalê bi zikê wê ket, kêfeke nayê pesinandin kiribû dilê wê. Destên xwe li ser zikê xweyî roj bi roj gir dibû dida hevdu û ji Delalê re sitran û çîrok digot. Delala xwe bi van sitran û çîrokan wê mezin bikira. Wê Delal bi xwendinkirin bida, siûda Delalê, wê ne weke ya wê baya.

Lê destarê qederê bi hawakî din digeriya, dilê ruhsitîn ne bi wê û ne jî bi yên li dû wê diman şewitibû. Di nav nivînên xwe de mabû bêruh. Delala dilê xwe avêtibû nav destê qedera bêujdan. Barê qederê ji pîrikê re giran hatibû û pîrik ji li dû qîza xwe bi riya nehatinê de çûbû. Delal û bavê xwe di tunebûnekê de, di binê xanîkekî de êdî mabûn bi tenê. Lê jiyana wê berdeham bikira, herçend şopa kulan bimîne jî, êşa wan kêmbû. Bavê Delalê wê ew mezin bikira, lewra ji herduyan pêv tu kesên di li heyatê nemabûn ji vê famêlê, bavê wê hem dê û hem bav bû êdî.

Çemê zeman herikî, meh bihurand, sal bihurand. Erê gotin rehet e, lê em cardin jî were bêjin, Delalê û bavê xwe jiyana xwe dibuhartin. Keçeke rind ji Delal derketibû. Pakbûn û bedewbûna wê di devê hemû gundiyan de bû, navê wê li hemû gundên der û dor di dilê xortan de bû. Delal derketa ji derve hemû gundî li temaşa wê bûn.

Ji **Nûbiharê** bi silavên germ

Ji roja ku padişahê Osmanî Meh-mûdê Duduyan îmtiyaza begên Kurdan rakirîye Kurd doza heqê xwe dikin. Ew mîrektiyên ku di dema Yavuz Selim de li heremên xwe xwedîirade bûn ji salên 1800î pê ve rasterast bi navendê ve hatin girêdan.

Ji wê demê ve Kurd bi hikûmeta merkezî re di mucadelê de ne. Dema meriv vê meselê piçekî dikole dibîne ku heta niha Kurd rastî gelek musîbet û belayan hatine.

Ji destpêka salên 1800î pê ve hetanî dawîya umrê xwe Osmanî, dora 100 salî bi mesela Kurdan re rûbirû maye. Herçiqas avakarên Komara Tirkîyê di destpêkê de soz û bext dabine Kurdan jî lê di demeke pirr nêzîk de fen û fûtên wan derketine.

Ev 80 sal e jî Tirkîye bi meseleya Kurdan re rûbirû ye. Piştî ew qas mexdûriyetan dîsa jî jiyaneke însanî nebûye nesîbê Kurdan; tişteki xêrê nebariyaye, pirsgirêk bûye lehî herikiye û gihaştiye îro...

Ev pirsgirêka ku di dema kalên me de hebû, îro jî rojeva me meşxûl dike.

Di van rojên ku em tê de ne li Rojhilata Navîn bûyerên muhîm diqewin.

Îqtîdarên dewletên Ereban ku ew

qas dem e ji xelkê xwe re bêyî zilm û tirsê tu tişt nedane, yeko yeko ji îqtîdarê dikevin.

Em hêvî dikin ev dîktatorên van welatana destê xwe ji pêsîra xelkê xwe bikşînin û îdareyên ku xêra xelkê difikirin û hezkirinê didine xelkê xwe, bêne îqtîdarê.

Di dunyayek wiha de ma wê meseleya Kurdan wekî xwe bimîne?

Helbet na!

Kurdên ku ewqas sal in rûyê rehetiyê nedîtine jî dê derkevin ferehiyê û divê derkevin jî.

Îjar di Rojhilata Navîn ya nû de ne tenê Kurdên Tirkîyê, digel wan em hêvîdar in ku Kurdên dewletên din jî derkevin ferehiyê...

Hikûmeta ku îro li ser kar e jî ber berjewendiyên xwe li hinek dîktatorên Rojhilata Navîn xwedî derdikeve û aqil dide wan. Lê av wê di coya xwe de biherike û ev dîktatorên dewletên Ereban jî wê biçin.

Heta doh jî hikûmeta Tirkîyê li Rojhilata Navîn doza serokatîyê dikir û dixwest navbera xwe û wan xelkana xweş bike. Eger li dîktatoran xwedî derkeve û guh nede daxwazîna xelkê van dewletan û xelkê xwe, ew tişt dê çawa bibe?

Nûbihar

Dewrêşê delodîn

Xezal Meral Dêrikî

Dewrêşê Edûlê ji bo evîna xwe
ji artêşekê şûrê xwe kişand,
Dewrêşê min ji tirsê dilopek xwîn
Şûrê xwe di dilê min de çikand.
Min deriyê dil ji bo Dewrêşê xwe
Bi kulîlkên hêviyê xemiland
Wî, hespê xwe rakir çargavê
Derî bi ser serê min de hilweşand.
Dewrêş, ji bo xatirê Edûlê
Qahweya bixwîn ji erdê rakir.
Dewrêşê ku para min ket,
Jan û elem bi ser dilê min de dakir.
Erê, Dewrêşê min yê delodîn!
Tu ji min re nebû Dewrêşekî bidilîn.
Û te nehişt ez jî bibim
Edûla te ya xemrevîn...



Bayê ku tê serê gellek kesan bivê nevé ewê bihata serê Delalê jî û hatibû jî. Xortekî çeleng bala wê kişandibû, Delalê pê derdixist gava navê wî xortî dihat gotin, yan ew didît, di dilê wê de pêlên germ radibûn. Navê wî Mirad bû û çavên wê ji Mirad pêve kes nedidît. Mirad jî weke Delal bê dê mezin bibû, li ber destê dêmariyê mezin bibû, pirr kişandibû ji ber destê dêmariyê. Mirad xortekî çeleng bû, lê feqîriyê stûyê wî xwar kiribû. Gavanê gund bû Mirad. Cara ewil li ser kaniyê hevdu dîtibûn. Delal barê avê li kera xwe dikir, Mirad jî keriyê heywanên xwe anîbû avdanê. Herduya jî bi nerînên dizî li hevdu nerîbûn. Ji wê rojê şûnde dilê wan ji bo hevdu diavêt. Delal ji bo ku Mirad bibîni li bende wextê avdana keriyên dima.

Roj û meh derbas bûn, êdî herduyan jî xuyê hevdu, halê

hevdu rind ecibandibûn. Êdî dor hatibû Delalê bixwaze. Lê qeder tevna xwe bi hawakî din ba dide, eniya nivîsa kesan li gor xwe li deftera xwe dinivîse. Miradê Delalê bi Mirad nebibû. Bavê wê jî li bende mezinbûna keça xwe bû, lê bi hesabekî din. Ew jî hê ciwan bû, û dixwest bizewice. Bi hinekan re li hev kiribûn ewê berdêlî bidana hevdu. Weke gellek jinên li der û dor Delalê jî ewê biba qurbana berdêliyê. Bi dilê wê bû, ne bi dilê wê bû, jê nehatibû pirsîn, biryar hatibû dayin. Berdêliya bavê xwe bû Delal.

Tu kêf jê re nemabû, lê ne xema bavê wê bû. Bavê wê bi kêfeke nayê pesinandin tije bibû. Wê piştî gellek sal bûkeke ciwan di himbêza xwe kira.

Lê Delal, ne weke tu bûkan bû. Ew jî weke hevalên xwe yê qurbanên berdêliyan bû, weke wan bi xemgîniyekê bibû bûk û ji

mala bavê xwe hatibû derxistin. Hem ew, hem jî hemû hezkiriyên wê digiriya. Şûşa dilê Delalê bibû hezar perçe...

Delal 23 salîbû û ew zilam zilamê wê bû. Wê tu bextewarî nedîtibû heta vî ûmrî. Dixwest biba dêya zarokê, bi hêviya ku rengê jiyana xwe biguherîne. Bi destê zarokê bigire û pê şad bibe. Ji ber vê yekê bû ku hatibûn doktor. Piştî şerma xwe avêtibû û gelek astengî kişandibû doktor ew muayene kiribû û xebera reş dabû wê.

Delal di vî ûmrî de ji geda vebibû. Ji wê bedena nazik û nazdar re barê jiyana giran hatibû. Elem û kederan, ev derdê bê derman lê peyda kiribûn. Xeyalên wê yî dêtiyê tev de serûbin bibûn. Ev halê ku bi serê wê de hatibû, belkî dihat serê kêman kesan, lê di jiyana Delalê de ev bê siûdî tim hebûn. ❀



Umrekî ji şîrî heta pîrî di rêya ilmê de: Mela Hakimê Qoraxî [1939-2010]

Veli Vural

Seydayê Mele Hakim di sala 1939an de li gundê Hingirvan, ji herêma Kosorê ku girêdayî bajarê Mûşê ye hatiye dinyayê. Navê bavê wî Hesên e diya wî Perîşan e. Du sal piştê ku hatiye dinyayê diya wî wefat kiriye.

Qebîla malbata Seyda Xoradî ye. Ev qebîle jî girêdayî bi eşîra Xûytî ye. Seydayê hêja di heft saliya umrê xwe de Qur'ana Pîroz li cem Seydayê Mele Salihê Botî, li gundê Exdadê xitim kiriye. Piştî xitimkirina Qur'anê hezkirina wî, eşqa wî ji xwendinê re çêdibe û xwendina xwe li vî gundî berdewam dike. Heya kitêba Şerhil Muxniyê li vî gundî dixwîne.

Seyda piştî tehsîlê ji vî gundî diçe navenda ilm û îrfanê Norşêna mala Seyda. Xwendina xwe li Norşên li cem gelek seyda û alimên navdar; wekî Mele Baqî, Şêx Mûhemmed Hefîd, Seydayê hêja Şêx Nureddîn; herwiha seydayê seydayan, deryaya ilmê, di sedsala xwe de alimê yekem Mele Sedreddîn Yuksel; herwiha seydayê xwe yê xwedî zekaya pir zêde –xarîqulade- seydayê mutebehhir Mele Îbrahîmê Exdadî dike. Herwiha dîsa li menbea ilmê û îrfanê li Oxînê li cem mala Şêx Eladîn li cem seydayê hêja Şêx Mûhemmed Asim xwendiyê. Herwiha li cem seydayê seydayan Mele Ce'ferê Balekî tehsîla ilm û îrfanê kiriye. Dîsa li herêma Botan jî xwendina ilmê, tehsîla ilm û îrfana xwe berdewam kiriye. Li Hezzo li cem seydayê Mele Sebrî, li Batmanê li cem Seydayê hêja Şêx Fexreddînê Ernasî xwendiyê. Herwiha li Qiziltepê li cem Seydayê Mele Ebdurrezzaq jî kitêba ilmê mentiqê Şerha Şemsî xwendiyê.

Seydayê hêja, li derveyê Tirkiyeyê jî tehsîla ilm û îrfanê kiriye. Li Sûriyeyê li gundê Tilme'rûfê li cem seydayê Şêx Eladînê kurê Şêx Ehmedê Xeznewî xwendiyê û li vir xwendina xwe qedandiyê û îcazeta ilmê li Tilme'rûfê girtiyê.

Taybetiyên Seyda

Taybetiya yekemîn: Dema meriv wiha difikire, Seydayê Mele Hakim di demekê, di esreke wisa de perwerdehî dîtîye ku alimên wê esrê pir in, qedr û qîmeta aliman û qîmeta ilmê pir zêde ye. Ev rewş ji seydayê hêja re bextewariyeke gelek mezin e. Lêbelê zêdetirê wî ew e ku Seyda pir jîr bûye, armanca wî ya herî mezin tehsîla ilm û îrfanê bûye. Ewî jî, ev firsend baş nixandiyê. Ev rewş bi vê ayetê tê şîrovekirin;

“Ev (salixên baş) qencî û kerema Xwedê Teala ye. (Ew), kî bivê dide wî”

Xwedayê teala wî ji vî xêrê bêpar neke.

Taybetiya Seyda ya duyemîn: Mele Hakim, melayekî hemdem bû. Ilmê wî, zanîna wî ne bi tenê ilmê dînî bû; di ilmê lûxetê de nexasim di lûxetê Erebi de, di nehwa û serfê de pispor bû. Amilê bi ilmê xwe bû.

Li aliyê din di ilmê felsefê, ilmê mentiqê, ilmê tarîxê û coxrafayê de jî zanyar bû. Bi rastî dîrokna bû, bi taybetî dîroka Îslamiyetê pir xweş dizanî û pir xweş şîrove dikir. Sohbetên wî yên dîrokî gelek xweş bûn.

Taybetiyeke Seyda ya din jî ew bû ku ji pirsgirêkên civakî re pir hessas bû. Li hember

pirsgirêkan bêdeng nedima. Xwe li pirsgirêkan dikir xwedî. Li hember zaliman, li cem mezlûman bû.

Seydayê bi rûmet, di heqê ilm û îrfanê de, di heqê şerîetê de, di heqê fetwayê şer'î de bi tevahî girêdayê bi Qur'ana pîroz, sunneta Nebî û re'ya se-lefan bû. Di vê mijarê de tawîz nedida.

Tiştê jê bihata pirsîn xwe bi qal û qîlan nedigirt. Her tim xwe bi nesa Qur'anê, hedîsa sehîh û re'ya se-lefan digirt. Ji bil (xejrê) van xwe bi tu tiştî ve ne-digirt. Ji ber van çendan fetwayê wî muteber bûn.

Li aliyê din Seydayê hêja, ilmê xwe tu wext nexis-te bin bandora tu meşreban. Ewî her tim ilim dida beriya hemû berjewendiyên dinyewî. Ewî her tim bi ilmê xwe emel dikir.

Seydayê hêja, ji tesewwifê jî ji mutesewwifan jî pir hez dikir. Têkiliyê wî jî her tim bi ehlê tesewwifê re hebûn. Lêbelê ewî her tim ilim dida beriya her tiştî. Lewra ewî, wekî tamamê alimên zana digot: "Te-sewwifa bê ilm ne pir zexm e, ne pir qewî ye; lêbelê tesewwifa digel ilmê gelek mufid e, pir bikêr e."

Taybetiyeke Seydayê hêja yek jî ev bû ku her tim qîmet dida silaya rehmê, yanê çûyîn û hatina cem eqrebayan, serdana eqrebayan, pirs û pirsîya-ra wan. Ewî her tim silaya rehmê dikir û serdan û pirs û pirsîyarê tewsiye dikir. Li eqreba û merivên xwe xwedî derdiket. Li gor ayeta Xwedê û hedîsa Pêxemberê wî. Weke her meseleyê li gor van tevger (hereket) dikir. Wî her tim digot: "Qencyên xwe, beriya her kesî li merivê xwe bikin."

Taybetiyeke wî jî wefadariya wî bû. Bi rastî jî di wefadariyê de gelekî li pêş bû. Ji dost û ehbabê xwe re gelek wefadar bû. Ev jî gotin û îqrara dost û ehbabên wî û ya hezkiriyên wî ye.

Taybetiyeke Seydayê hêja jî ev bû ku pir mu-deqqiq bû. Li ser meselekê, pirsgirêkekê bisekîni-ya, ew meseleyê û ew pisgirêk heya zela nekira nedisekîni.

Taybetiyeke Seyda jî ew bû ku tu wextî qîmet ne-dida mal û meqamên dunyayê. Lewra gelek daxwazî jê hatine kirin û gelek meqam û mewqiyên balkêş jê re hatine pêşniyarkirin, wî ev pêşniyar hilnedane nezerê îtibarê, xwe lê nexistiye xweyî. Lewra arman-ca wî ya herî mezin razîbûna Xwedê bû, distûra wî ya herî mezin ev bû;

"Heqdestê min tenê ji Xwedê ye."

Welhasil tiştê ku Xwedê û Pêxemberê wî jê hez dikir, wî jî jê hez dikir; tiştê ku Xwedê û Resûlê wî

Taybetiyeke wî jî wefadariya wî bû. Bi rastî jî di wefadariyê de gelekî li pêş bû. Ji dost û ehbabê xwe re gelek wefadar bû. Ev jî gotin û îqrara dost û ehbabên wî û ya hezkiriyên wî ye.

jê hez nedikir wî jî jê hez nedikir. Xwedê (c.) rehma xwe lê bike. Dereca wî bilind bike.

Xizmeta ilmê (Tedrîsat)

Dema Seyda îcazeta xwe li Tilme'rûfê ji mala Şêx Ehmedê Xeznewî sitand, demekî kin (4-5) mehan li gundê Qesrika ku girêdayê Nisêbîna Mêrdînê ve ye, melatî kir. Ji vî demê û pê de dest bi xizmeta ilmê û dest bi tadrîsata ilmê kir.

Piştê van (4-5) mehan di sala 1964an de çû gundê Navhendê ku girêdayê bi bajarê Wanê ye. Demeke dirêj qasî 12-13 salan li vir melatî kir. Lêbelê ne bi tenê melatî; hem îrşad û te'lîma gelê gund, hem jî ya herî girîng tadrîsata ilmê kir. Di serî de mizgeft û medrese li vir ava kir. Li aliyê din di van 12-13 salan de li vê herêmê bi sedan feqî xwedî kirin.

Seyda di sala 1975an de bi daxwaza xwe bi taybetî jî li ser daxwaz û israra bavê xwe û eqrebayên xwe rihlet kir çû gundê xwe yê Qoraxê. Bi qasê 3-4 salan li vir xizmeta gelê gund, gelê xwe kir. Di serî de mizgeft li vir ava kir. Û paşê bi te'lîm û tadrîsata gelê gund ve mijûl bû, li vir hem te'lîma (hînkirina) Qur'anê hem jî îrşada gelê gund kir.

Piştê 3-4 salan li ser daxwaza Şêx Taha, li Norşêna Mala Seyda dest bi muderristiya wî kir. Li Norşên hem darsa feqiyên ji derveyê Norşên, hem jî darsa zarokên Mala Seyda dida. Zivistanê li Norşênê, havînê jî li Adgon ders didan. Di van çend salan de dîsa gelek feqî li vir xwedî kirin. Seyda tu wext bê feqî nedima.

Seyda, hem ilmê xwe bi piranî ji Norşên girtibû, hem jî li vir muderristî kiribû. Ji ber vê çendê, jî vê malbatê pir hez dikir; wan jî jê pir hez dikirin. Têkiliyê wan jî li ser vê esasê bûn, yanê têkiliyê wan jî ilmî bûn.

Seyda di sala 1985an de rihlet kir çû bajarê Edenê. Li vir jî dîsa tadrîsata ilm û îrfanê bi awayekî fexrî, serbixwe berdevar kir. Hem te'lîma Qur'ana Pîroz, hem jî darsa xwendevanên îmam xetîbê dida. Li aliyê din em dixwazin vê bînine ziman; Seyda tu

wextî wezîfa fermî nekiriye. Lewra Seyda nedixwest ku xwe bi saziyan ve girêde, her tim xizmetên xwe serbixwe kiriye.

Piştî ku Seyda deh salan li Edenê ma di sala 1994an de li ser daxwaza malbata wî ku Seyda bi xwe jî ji bajarê Edenê hez nedikir rihletê bajarê Stenbolê kir. Seyda ji bajarê Stenbolê pir hez dikir. Lewra li vî bajarî dost û muhibbê wî gelek hebûn, berî her tiştî mela û alimên welat li vir pir bûn. Herwiha cihê vî bajarî jî cihekî gelekî xweş e. Hem bajarekî dîrokî ye, hem jî navnetewî ye. Ji ber van çendan gelekî jê hez dikir.

Seyda li Stenbolê jî tadrîsata ilm û îrfanê berde-wam kir. Li aliyekî dersên îlahiyatçiyên dida, li aliyê din gelek dersên tefsîr, fiqh; herwiha dersên lûxetê Erebi û Farisî didan.

Eserên Seyda

Seydayê Mele Hakim di van salên dawî de gelek lêkolîn kirin. Hinek meseleyên rojane yê fiqhê kom kir û bi navê **“Meseleyê Bilave Yê Girîng Ji Şerîetê”** pirtûkek bi zimanê Kurdî û Erebi weşand. Ev pirtûk jî ji sê beşan çêbûye: Bi zimanê Erebi; bi zimanê Kurdî bi tîpên Erebi; bi zimanê Kurdî bi tîpên Latîni.

Di heqê vê pirtûka xwe de Seyda bi nezim wiha gotiye:

“Nivîsandî Mele Hakim

Ji her tiştê weko lazim

Ji merdê salih û alim

Ji bo fathan recûkar im”

Herwiha gelek werger û neqlên Seyda hebûn, li ser dîroka Kurdan lêkolîn dikir. Gelek eser xwendin,

gelek belge jî kom kirin, lê mixabin êşa penceşêrê firsend nedayê.

Seyda di sala 2010an meha Adarê de bi nexweşiya penceşêrê ket. Nexweşiyê gelek giran kişand. Seyda nexweşiya xwe bi vê beyta Melayê Cizîrî te’rîf dikir.

“Ji ber ahîn me dinê agir û du pêt ne ecêb

Me di dil da heye narek ku disojit seqerê.”

Seyda bi vê beytê giraniya nexweşiya xwe dianî ziman.

Seydayê Mele Hakim, ji heft saliyê heya heftê saliya umrê xwe; jiyaneke pir tijî, pir bi xêr û feyde; di rêya ilmê de, digel ehlê ilmê û îrfanê derbaz kir. Di 12.06.2010an de ji dinyayê îrtihal kir. Wefat kir. Bi bergiriyekî xurt û qenc, bi paqijî çû ser dilovaniya xwe, gihîştê Rebbê xwe, îmtîsala emrê Xwedê kir: *“Hey nefsa bibawer û êmin, piştrast û hedinî! Qayîlbûyî û qaîlkirî li Xwedayê xwe vegere.”*

Rihleta herî dawî ew e. Rebbê rehîm, hezar rehmetê lê bike, dereca wî bilind bike, qebra wî bixe baxçekî ji baxçeyê cennetê. Amîn...

Şîrên li ser Seyda hatine nivîsîn

Mele Mihemed Zahidê Qulpî herî wefata Seyda di ziyaretekê de li ser Seyda vê şîra ha dinivîse:

“Çi xweş Seyda Mele Hakim ji Kosor

Herin ronîn di dersa wî dor bi dor

Belê zêr bû nebin jê xafil û kor

Ku hingiv bû nedin hûn wî bi avşor”

Herwiha Mele Muhemmed Emînê ku hem feqiyê Seyda, hem ji biraziyê Seyda ye bi hesret ev şîra han li ser Seydayê xwe nivîsiye:

1) *Eya Seyda Mele Hakim*

Tu çûyî lê ezê çakim

Bê te ez qet sebir nakim

Li dinyayê dibûm haim

4) *Tu çûyî lê ez mam li vir*

Dunya ji bo min bû agir

Bê te ji bom nîne sebir

Ya Reb ji bo te zehf şukur

7) *Sala du hezar û dehan*

Donzdehê meha hezîran

Wî rihlet kir ji van waran

Li ser bî rehmet wek baran

2) *Di vî esrê da pir âlim*

Ji mu’minan ra pir lazim

Lê dûr kir feleka zalim

Ewî hebîbê pir alim

5) *Wellah ji bo min hewes î*

Bê te bûm gula çilmisî

Sebram nayê bi tu kesî

Ya Reb ji bo me tu bes î

8) *Tu ji bîr meke Mehmed Emîn*

Heta sax bî li rûyê zemîn

Fîzar ke ji Rebbil alemîn

Daîm rehmet jê ra bişîn. ❁

3) *Me çavê xwe pê vedikir*

Daîm pîrsa xwe jê dikir

Wellah me pir jê hez dikir

Bi me şîrîn bû wek şekir

6) *Bila xweş bin zarûyê te*

Bira û dost muhibbê te

Hezar rehmet li qebra te

Rebbim pir razî be ji te

Seydayê Nemir


Yusif Xemgîn

Ey Seydayê hêja, Seydayê Nemir!

Li gor xelqê belkî tu mirî bî,
Li gor min tu ne mirî yî. Tu sax î, lewre ez pê
bawer im.
Rebbê 'Ezîm dibêje: "Ên ku di rêya Xwedê de
têne kuştin, ji wan re nebêjin mirî. Ew sax in lê
hûn nizanin." (Beqere: 154)
Te jî di rêya Xwedê de canê xwe feda kir.
Te, mirin li me xweş kir.
Li hember zaliman te serî rakir
Te doza pîroz şidand, sist nekir.
Te di ber da xwîna xwe rijand,
Te bihayê wê erzan nekir.
Te jî weke Ustadê xwe;
Mal û milk, hibb û meqamên dinyayê li xwe bar
nekir.
Te digot: "Heta ez îmana xortan di xeterê de
bibînîm, zewac ji min re haram be."
Şûna zar û zêçan, bi hezaran bira û hezkiriyên te
çêbûn.
Her yekî fikra wan nûr, qelbê wan nûr, rêya wan
nûr.
Ma ne te ji wan re ders rewya kir.
Tu û hevalên xwe, we de'wa Ustad ji bid'eyan
xelas kir.
We gulek sor çand, koma Zehra ava kir.
We dilê Ustad şad kir
We biharek nû ava kir
We navê Nûbiharê lê danî
Çanda gelê Kurd geş kir
Hêviyên me, we gelek xweş kir.

Ey Seydayê hêja, Seydayê nemir!

Ez çî qas jî bidîm pesnê te hêj jî hindik e
Dîtina te ji min re bû nesîb
Li bajarê Sêrtê, demek beriya wefata te bû
Ez hêj zarok bûm, dozdeh-sêzdeh salî bûm.
Dema ez hatim medresê, tu li wir bûyî.
Te ez hembêz kirim, lê teferruat nayê bîra min.



Mixabin ez wî çaxî nezan bûm. Min nezanî tu kî
yî. Piştî şhadeta te ji min re gotin, ew Seydayê
Mele Izzeddîn bû.

Ji wê rojê ve dîtina te, şekl û sîmayê te ji min re
bû xeyal. Gava ku behsa te tê kirin sûretê te yî
bi ken tê ber çavê min. Ev xeyal, dîmenek xweş
dide min.

Rojeke zivistanê tu ji me veqetiyayî, çûyî alema
axretê.

Bi çûyîna te şîn hate danîn. Em qehirîn, dilên
me bûn birîn.

Ey şehîdê doza pîroz!

Kengê behsa "şehîd", an jî "şhadetê" derbas
dibe, tu têtî bîra min

Hêviyên te mabûn nîvîşkan. Projeya Zehrayê
mabû nîvtemam

Mizgînî li te! Wa hevalên te, şagirtên te, dest
bi xebata warê perwerdehiyê kirine. Projeya
Zehrayê didomînin.

Lewra perwerdehî dermanê hemû derdan e,
çara hemî pirsgirêkan e

Di bin sîwana Zehrayê de, Nûbihar bûye kaniya
ziman. Bûye warê perwerde, çand û edebiyata
Kurdî. Ez bawer im ev xizmetên pîroz rihê te şad
dikin.

Şîretên te her tim di bîra me da ne

Em li xwe dikin ehd û eman

Emê bişopînin doza Qur'an

Emê bixwînin Nûran

Emê bajon, rêya we qencan.

27.12.2010

Şerefname de Mîreyê Suweydiyan

Wisif Zozanî

Şerefxan Bidlîsî û Şerefname

Derheqê heyatê **Şerefxan Bidlîsî** de çimeyo tewr hol hewna zî **Şerefname** bi xwi yo. Çunkî Şerefxan peyniya cîldê ewilîni yê **Şerefnameyî** de behsê heyatê xwi keno. In rid ra malumatê tewr mezbutî ma fekê ey ra musenî.

Nameyê ey o esil **Şerefxan bîn Şemsedîn Bidlîsî Rojkî** yo. Zafane bi nameyê Şerefxan Bidlîsî yeno naskerdiş. Bidlîs de ciwiyayo, in rid ra ey ra vûnî "Bidlîsî" û semedo ke eşîra Rojkan rê mîreyiye kerda, in rid ra zî vûnî "Rojkî". Babiyê ey Şemsedîn, sebebêk ra şino welatê Ecemî. Uca keynaya Emîrxan bîn Gulabî reyde zewicêno. Şerefxan, serra 949 (1543) de 20ê aşma zilhîcce (edare) de dewa Kerxerudî ke besteyê bacarê Qumî ya de ameyo dinya. Inî bacarî de xeylê alîmî estbiy, Şerefxanî înan ra zaf îstifade kerd. Serra 958 (1552) de gama ke newserre bi, hukimdarê Safewiyan Şah Tahmasbî Şerefxan guret qesrê xwi. Uca di pa babiyê xwi Şah Tahmasbî rê xizmet kerd. Serra 961 (1555) de wexto ke babiyê ey wezîfeyê xwi ca verda, inê ser, eşîra Rojkan ameye Şah Tahmasbî het û va, wa Şerefxan mîreyiya ma bikiro.

Şerefxan hama duwêsserre bi, Salyan û Mehmudabad ke besteyê Şîrwanî yê de bi mîre. Hîrê serrî uca mend. Badê cû, lelê Şerefxanî Şêx Emîr Bilbasî merd. Şerefxan inê ser agêra qesrê Şah Tahmasbî. Şahî o şawit Hemedan, xalê ey Mehemedî het. Uca di xalkênaya xwi reyde zewiciya. Hemedan ra kar û gureyê eşîra Rojkanî îdare kerdin. Hîrê serrî zî Hemedan de mend. Serra 984 (1576) de Şah Tahmasb merd û Îsmâil Mîrza kewt herinda ey. Şawit Şerefxan ard Şîrwan. Uca de mîreyiya welatê Kurdistan, Luristan û Goranî pa piyorê eşîranê ê welatan da ey. Labelê yew mude cuwa pey tayê merdimê hesudî beynateyê ey û Îsmâil Mîrzayî xeripna. Inê ser Îsmâil Mîrzayî o kerd waliyê Nexçivanî. Şerefxan yew serr û çahar aşmî Nexçivan de mend. Serra 986 (1579) de padişahê Osmaniyan Murado hîrin xebere ey rê şawite û welatê Bidlîsî da ey. Wexto ke ina xebere rasa Şerefxanî, ca de pa 400 heb merdimê eşîra Rojkanî ra kewt rahar ame Wan. Uca de bi mêhmanê Xusrew Paşayî. Xusrew Paşa derheqê ey de yew

Kêberan û
gulîstanan ra boya
vistanikanê verînan
vejîya û resa zinca
nuştoxê inî kitabî:
Vatişan gore,
nesebê mîreyanê
Suweydiyan şino
reseno Bermekiyan

nuşte padîşahî rê şawit. Padîşah zî welatê Bidlîsî da Şerefxanî û berat ey rê şawit. Yew kalmeyo zerrîn ke qesrê hukimdarê Memlukiyan Qilawunî ra amebi guretiş, o zî pa in berat a şawit. Şerefxan vera ina holiyê Muradê hîrinî şeranê Şîrwan, Gurcîstan û Azerbaycanî de paştî da padîşahê Osmaniyan. Serra 991 (1584) de wexto ke Ferhad Paşa Eriwan guret, Şerefxan xezîne û cebilxûneyê ey ci rê kirişt. Inê ser Ferhad Paşa vera ina holiya ey, welatê Mûşî pa dewanê ey da Şerefxanî. Şerefxan hetani serra 1012 (1603) ciwiya. Ina serre de merd û Bidlîs de defn bi.

Şerefname, qey tarîx û kulturê kurdan yew çimero erjaye û wahaî qiyetî yo. Şerefxan in kitabê xwi serra 1005 (1597) de nuşto. Kitabê ey, di cildan ra yeno pê. Cildo ewîlin derheqê tarîxê dewletan û eşîranê kurdan de yo. Cildo diyin de zî behsê tarîxê Osmaniyan û Safewiyan keno. Destnuştêyê Şerefxanî bi xwi inka ha Kitabxaneyê Bodleian de yê.

Ma waşt ke in kitabo erjaye ra qismê mîreyanê Suweydiyan biçarnîn kirdkî ser. Qey inî zî ma yew destnuştêyo ke kitabxaneyê Suleymaniye de yo û qismê Halet Efendî numreyê 584 de qeyd biyo, ma o destnuşte û çapê Rusya nay têver û çarna kirdkî. Destnuştêyo ke ma xwi rê bînge guret, 20 serrî badê mergê Şerefxanî ameyo nuştiş, in rid ra ina yew nusxaya kuhun a. Çapê Rusya zî, V. Veliaminof-Zernofî beynateyê serranê 1860-1862 de yew nusxaya ke pê destê Şerefxanî ameya rastkerdiş aye ra çap kerda. Ma zî her di metnî zî semedê çarnayîşê xwi rê bînge guretiy.

Mîreyanê Suweydiyan Çewlîg û dormalê ey de mudeyêko derg hukim kerdo. Serra 1650 de wexto ke Ewliya Çelebî ameyo bi Çewlîg, hama zî mîreyê Suweydiyan îtya de hukim kerdîn. Înan ra Elî Beg Suweydî Gînc de hukimdar bi û wahaî henzar eskerî bi. Suweydiyan xwi dima zaf eserî verdayê. Cûmiya Gîncî, Cûmiya Meneşkurdî, Cûmiya Isfahan Begî nînan ra yê. Inî mîreyî eslê xwi kird (zaza) ê. Qey tarîxê kurdan zî in metn muhîm o. In rid ra ma waşt ke in metn zîwanê kurdan de biyero wendiş. Homa nesîb bikiro, qismo ke behsê mîreyanê Mirdasiyan keno, ma ê zî çarnenê kirdkî ser. Xêr û xebate ma ra, murad û serfirazî Homay ra.

خوشی یک جزئی است که چون اراد حکام کردن آن افاضی و مایه از زبان تکلیف است بر وی
کودکی در دامن و نگاه کردن و مغزت به سلسله ای که نمودند در جمل اینها
قد با یکی از اینها بخواهیم بخیر و نیت با یکدیگر نموده در جمل نیز بخیرند و جسد یک سنجی هم
چون یکی از اینها بخواهیم بخیر و نیت با یکدیگر نموده در جمل نیز بخیرند و جسد یک سنجی هم
باورند در نهانستند هر کوی شده در یکی که مصطفی است سواران که در شرف خود خیر بران
در آنجا مدینه عمل با او را کردی در صورت که آنرا از غیب بیند و خود را از جانب او
نزد از غیرین بدان رجب و فصل هشتم در ذکر امراء سوزی از اینها و دیگر
گوشه در کار حکایات غیر مستهتاب این اخبار است و جهان را از این اخبار نیز سید
نب ابراهیم سیدی مال بر یک شهر میگرداند است پیرایشه که سوزی که از عظمای
محابه و رسالت است عیالی که عیالی است می بود و در این سفسطه الراجی عیالی سوزی
از قریب سوزی است که در روزی در شب نموده است بطرف شام واقع شده القدر اعلم
اقالی بر آنکه نیت خود را بکلی فری برساند در او اهل بیخ سعادت است اینها می نمودند
که گاه نیت سعادت ازلی داشته اند از طرف از برای آنکه با جانان در روزی در خیر
گوشه در حال ایام از پیشه سار و جود ساری و در اینها از علم و نیت که آن گویاست
در اینها نیت که آنرا بر این نیت میگرداند و در روزی در حال که در میان و در میان
در اینها نیت که آنرا بر این نیت میگرداند و در روزی در حال که در میان و در میان
چون سوزی است که در روزی در حال که در میان و در میان
خیر و اینها نیت که آنرا بر این نیت میگرداند و در روزی در حال که در میان و در میان
از سبب نیت که آنرا بر این نیت میگرداند و در روزی در حال که در میان و در میان
و اینها نیت که آنرا بر این نیت میگرداند و در روزی در حال که در میان و در میان
سوزی است که در روزی در حال که در میان و در میان
استفتاد که در روزی در حال که در میان و در میان
کتابی است که در روزی در حال که در میان و در میان
شیرین است که در روزی در حال که در میان و در میان
زود علم با اینها نیت که آنرا بر این نیت میگرداند و در روزی در حال که در میان و در میان

Destnuştêyê Şerefnameyî de cayo ke qisimê Suweydiyan dest pêkeno

Şerefname ra Qismê Heştin

Derheqê Mîreyanê Suweydiyan de

Kêberan û gulîstanan ra boya vistanikanê verînan vejiya û resa zinca nuştokê inî kitabî: Vatişan gore, nesebê mîreyanê Suweydiyan şino reseno Bermekiyan. Eslê eşîra înan zî şino û bestiyeno Eswedî ra. In merdim embazanê Hezretî Mehemedî (saw) ra yo. Yew vateyo muhîm de zî vûnê, şarê ina eşîre dewa Suweyd ra yo. Ina dewe Medîneya Munewera ra di menzîlî ha dûrî de û hetê Şamî ser kuwena. Ina mesela de zanayîşo tewr hol Homayî het de yo.

Labelê Bermekî eslê xwi benê resnenê hukim-daranê farisan. Verînanê ina famîla bacarê Belxî de adirî rê îbadet kerdîn. Cuwa pey, nişka ra destegîriya Homayî û roşniya lutfê ey gîraneyê înan tepîşt û ê şay têra. Awka çimê baweriya zelale, çirê bedenê înan ra nesiliya û ameye war. Babiyê Xalid Bermekî, Cafer Bermekî wextê Ebdulmelîk bîn Merwanî de, goreyê vateyêkê bînî zî, vûnê, wextê Sîleman bîn Ebdulmelîkî de pa zaf mal û milkî ya ameyo bi bacarê Dimeşqî ke o wext paytextê Ebasiyan. Wexto ke padîşahê Ebasiyan pêhesiya, şawit Ceferî dima û o ard dîwanê xwi.

Wexto ke Cafer ame dîwan, rengê riyê padîşahî bediliya. Ca de fermane da, Cafer kerd teber. Merdimê ke dîwan de hazir biy, persay va, gelo çira rengê riyê padîşahî bediliya? Padîşahî va: Ê merdimî zehîr xwi reyde ardbi û bêters kewt dîwanê ma. In gure weşê mi nêşi. In rid ra mi o eşt teber. Çunkî baziyanê mi de di hebî şemamekî estê. Kam wext yew merdim xwi reyde zehîr biyaro mi het, inî şemamekê mi leqenê.

Wexto ke padîşah ina qale vano, merdimê ke dîwan de hazir biy, Caferî ra persenê vanê: To çira in zehîr xwi reyde ard bi dîwan? Cafer vano: Ez in zehîr binî giştaneyê xwi de nimnena. Beno ke bêbextiyêk bi mi bibo, ez inî 'bermekem'. Yanî, ez in zehîrî sipe-na û a bêbextiye ra xelisiyena. Inî rid ra merdimê ke dîwan de biy, nameyê "Bermek"î na ey ra.

Hasilê kalam, ina camêrdî û egîdiya Caferî zaf weşê padîşahî ya şî. Padîşahî het payeyê Caferî roj bi roje bi berz. Peynî de zî bi wezîrê padîşahî. Yew mudeyo derg wezîriye kerde. Badê cû, yew mudet zî wezîriya Ebul Ebas Sefahî kerde. Cafer pa lajê xwi Xalid û tuernê xwi Cafero birayê Sefahî, Ebu Cafer Dewanîqî rê wezîriye kerde. Wextê Harunê Reşîdî de lajê Cafer Yehya bi wezîrê padîşahî. Mal û milkê Yehyayî bi zaf, quwet û ezametê ey resa dereceyêko

wina ke ey ra ver in tewir yew seltenet û esalet çewî rê zî nesîb nêbibî. Hîrê hebî lajê Caferî estbiy û hîrê heme zî in qayde wahaê esaletî biy. Nameyê înan Fezl, Cafer û Mûsa biy. Rueja ke îslamiyet tede vejiya û bi vila, a rueje ra hetanî wextê Bermekiyan, çî kesî zî in tewir seltenetêk nêdîbî. Labelê bi destê fesadan beynateyê Yehya Bermekî û Harunê Reşîdî xeripiya. Cafer bi fermanê Harunê Reşîdî ame kiştîş. Yehya û lajê xwi Fezl hetanî peyniya umrê xwi zindan de mendiy û uca merdiy. Mal û milko ke wextê wezîriya xwi de dabi arê, serekê dîwanê Harunê Reşîdî dest na piyorê ey ser.

Merdimo ke wazeno hal-weziyetê ina famîla bimuso, wa sere bido kitabanê tarîxî ro. Çunkî in kitabê ma yo kilm qey îni rê qîm nêkeno. Ez aqîbetê Mûsayî kitabanê tarîxî de cigêraya la ez nêeskaya bimusî. Beno ke Harunê Reşîdî wexto ke babî û birayê ey eştê zindan, Mûsa zî remayo şîyo hetê koyanê Kurdistanî ra û uca ca dayo xwi.

Ina esta, vûnî hikaya meşhur a ke ziwanan û lewan ser o vajiyaya: Bermekiyan ra hîrê tenî wextê Ebasiyan de Bexdad ra hetê Kurdistanî ya amey. Welatê Gîncî de koyê Şeftalu ra nîzdiyê dewa Xançukî de nayo ro. Birayê înanê pîlî xwi dayo îbadet, teqwa û taetê Homayî. In rahar de zî payeyê ey zaf biyo berz û biyo holêkê Homayê (c.c.) ke duayê ey ameyêne qebul kerdiş. Rojêk birayo qij qey yew gureyî ya şino cayêk. Şarê ê welatî qaydeyê xwi ser o ratîbê Şêxî û murîdanê ey ard. Şêxî, birayê miyanên û murîdanê ey bara xwi werde û bara birayê qijî zî wedarte. Gama ke birayo qij gureyê xwi ra agêra, barê xwi werd waşt. Birayê miyanênî va: Seba ke ti erey kewtî, mi xwi rê xwi de va, tu hetanî înkê nûn werdo, mi zî bara to werde. Birayo pîl, yanî Şêx ina nemerdiya ey ra hêrs bi, o nalet kerd û zewtî day piro, va: Seba ke ti bi bara xo razî nêbî Homa Teala zî zerriya to pare-pare bikero. Ca de o xort gina erd ro û ruhê xwi teslîm kerd. Baweriya şarî ê welatî derheqê Şêxî de yew bî, ini hedîse ser o bî se.

Mîr Şehab

Nameyê birayê Şêxî yo qij mîr Şehab bi. Şêxî birayê xwi de vateyê xwi kerd yew û o xwi ra ver tepîşt. Her di birayî zî Xançuk de miyanê eşîr û şarê Suweydiyan de mendî û idareyê in çayan guret bîne destê xwi. Xançuk de yew diza xişne viraşte û qedîna. Yew mudet Şêxî ina eşîre rê serekiye kerde.

Badê cû, şî rehmet. Ey dîma qijê lajînî nêmendiy. Birayê ey mîr Şehab herinda ey de bi serekê eşîre. Pê destegîriyê Homa Tealayî ma qijanê mîr Şehabî ra înanê ke in welat de mîreyîye kerda, nameyê înan tiya de rêz kenê.

Mîr Celalo Lajê Mîr Şehabî

Badê mergê babiyê xwi gureyê îdareyê mîreyîye guret xwi mil. Yew mudet in gure rahar ra berd. Peynî de goş da vengê Homayî va belê û dima şî rehmet. Badê ey lajê ey mîr Mehemed kewt herinda ey.

Mîr Mehemedo Lajê Mîr Celalî

O zî kewt herinda babiyê xwi û çend serrî mîreyîye kerde. Peynî de şî axret. Ey ra pey lajê ey kewt herinda ey.

Mîr Fexredîno Lajê Mîr Mehemedî

Badê babiyê xwi bi mîre. Şarê xwi bi edalet îdare kerd. Welatê xwi kerd şên. Peynî de ina wareyê xapî ra wedar bi şî axret. Lajê ey kewt herinda babiyê xwi.

Mîr Hesên

Herinda babiyê xwi de şî serê textê mîreyîye. Merdimêko bêters bi. Zaf gonî rijnaye. Peynî de vînyê çimanê ey şî û bi kor. Reşmeyê gureyê îdareyî kewte lajê eyê pîlî mîr Fexredînî dest. Nameyê lajê eyê bînî mîr Mehemed bi. Yew merdimo waharê cesaret û fazîletî bi. Exlaqê ay hol û xisletê ey zî baş biy. Yew merdimo camêrd û sexî bi. Dost û nasê xwi ca verday û welatê xwi ra wedar bi şî Diyarbekir Uzun Hesênî het. Wexto ke resa ê padîşahê qedirşinasî het û lew na bînberê ey ra, padîşahî ey rê îkram kerd û o guret xwi het. Badê cû zî welatê Xançuk û Çepaqçurî da ey. Mîr Mehemed hetê welatê xwi ser kewt rahar. Labelê kalme û xiştî kewtiy beynateyê di birayan. Xeyliyek herb û şer ra pey mîr Mehemed ame kiştîş. Îdareyê mîreyî bê muxalefet û bê şerîk destê mîr Fexredînî de mend. Çend serrî mîreyîye kerde û şî rehmet. Lajê eyo pîl çin bi, in rid ra birarzayê ey Ebdal Begî herinda ey gurete.

Ebdal Bego Lajê Mîr Mehemedî

Badê mergî apê xwi şî serê textê mîreyîye. A esna de serekê qizilbaşan Ayqutoxlî ke waharê Çepaqçurî bi, hetê Xançukî ya ame û eşt Ebdal Begî ser. Beynateyê her di hetan de heşt rojî û heşt şewî



Cûmiya
Isfahan
Begî

herb dewam kerd. Her di hetan ra zî zaf merdimî bi derbanê kalme û tîran amey kiştîş. Peynî de hewayê fethî hetê Ebdal Begî ra tadiya serfiraziye ser û bi embazê kar û gureyê Ebdal Begî. Ayqutoxlî kewt bin, pêro mal, milk, xeym û estorê ey zî amey talan kerdiş û kewtî destê merdimanê Ebdal Begî. Çend serrî badê in hedîse hukmê xwi dewam kerd û peynî de zî ruhê xwi na waharê dunya dest a. Ey dima di hebî lajî mendiy. Nameyê înan Subhan Beg û Sultan Ehmed Beg bi.

Subhan Bego/Isfahano Lajê Ebdal Begî

Badê babiyê xwi kewt herinda ey. Birayê xwi Sultan Ehmedî reyde vateyê xwi kerd yew. Vera dişmenî semedê pawitişê welatê xwi de zaf cad û xîret kerd. Vûnê: *"Dewletî piyor îttifaq ra niyên piye ra. Bêdewletîye zî, piyor îxtîlaf ra virazyenî"*. Semedê pêkerdişê birayan ra Homa Tealayî guretişê zaf cayan kerd nesibê înan. Înan ra yew badê mergê Çolaq Xalidî Pazukî ra bacarê Gîncî merdimanê ey ra guret û vist binê destê xwi. Badê şerê Çaldiranî wexto ke Sultan Yawuz Selîm Xanî Diyarbekir guret, pa îtya wa diz û welatê Çepaqçurî destê Ayqutoxlî ra guret. Welatê Axçaqale Mensur Beg Pazukî ke nameyê Şah Îsmailî ya îtya îdare kerdêne, destê ey ra guret. Welatê Zag û Meneşkurd bi quwetê xwi Qadîr Begê Qizilbaşî dest ra vet, guret binê destê xwi. Badê cû her di birayan welatê xwi miyan de kerd bare. Çepaqçur pa cayê ke besteyê in bacarî ey, bara Subhan Begî kewtî. Ca û dizê bînî zî bara Sultan Ehmed Begî kewtî. Çend serrî in qeyde viyertî. Badê cû rîdê fesadiya tayê merdiman ra dişmenî û xirabiye herinda dostî û birayî guret. Gerreyê Ehmed Begî ser o birayê ey Subhan Beg bi fermanê Sultan Suleymanî ame kiştîş. Çepaqçur zî diya beganê Osmaniyan ra yew tenî. Subhan Begî ra yew laj ca mend û nameyê ey zî Meqsud bi.

Sultan Ehmedo Lajê Ebdal Begî


Birayê ey Subhan Beg ke ame kıştış, ey ra pey xeyliyek yew mudet hukim kerd. Mudetê mîreyiya ey 50 serrî viyartbi, o ina dunyaya dîberine ra kewt teber. Ey dima di heb lajî mendî. Yew Murad Beg û o bîn zî Mehemed Beg bi.

Meqsud Bego Lajê Subhan Begî

Badê mergê babiyê xwi seferê Nexçîwanî de sultanê Osmaniyan Silêmanî het de bi. Mintiqayanê Nexçîwanî ra Arpaçay de wexto ke nobete tepıştîn, raştê qizilbaşan ame. Meqsud Beg in herb de zaf egîdiye muete ra. Ina egîdî û camêrdiya ey şî resa gueşê Sultan Silêmanî. Inê ser o sultanî sencaxa Çepaqçurî ke wextê babiyê ey çi qayde îdare biyêne, hewna in qaydeyî ser o da ey. Fermanê padîşahî bi nameyê ocaqlixî ser o vejîya. O wext de Îskender Paşayo Çerkes mîrê mîranê Diyarbekirî bi. Bêtersî fitretê milletê kurdî de esta. Meqsud Beg zî xizmet û fedakariya ke semedê sultanî ya kerda, paştê xwi aye ra şîdêna û in rid ra sereyê xo nêkerd binê Îskender Paşayî ra, tede nêviyarna û pênerd. Inê ser o Îskender Paşa bacarê Çepaqçurî ey dest ra vet da beganê Osmaniyan ra yew merdimî. Inê ser o Meqsud Beg qey halê xwi erzê padîşahî bikero û dişmeniya ke Îskender Paşa vera ey de keno ra padîşahî pêbihesno, hetê welatê Silêmanî İstanbulî ya bi raywan. Hewt serrî İstanbul de mend. Wezîrê pîlî ridê pawitîşê xatirê Îskender Paşayî ra ehwalê ey erzê padîşahî nêkerd. Peynî de o zî zey her kesî şî rehmet.

Murad Bego Lajê Sultan Ehmed Begî

Mîrê mîranê Diyarbekirî Îskender Paşa welatê Sultan Ehmed Begî beynateyê lajanê ey de bare kerd. Xançuk û Axçaqale day Mehemed Begî û bê Çepaqçur cayê bînî zî day Murad Begî. Bacarê Çepaqçurî destê beganê Osmaniyan de bi. Her di birayan welatê xwi piya îdare kerd. Çewê înan neheqiye bi yê bînî nêkerdîn. Des û şeş serrî mîreyiya



Xirabeyê Cûmiya Meneşkurdî

înan ser ra viyartiy. Peynî de Murad Begî mîreyiya xwi raziya zerrîya xwi ra da lajê xwi Silêman Begî. Çend serrî ra pey zî Murad Beg şî rehmet. Ey dima bê Silêman Begî hîrê hebî lajê bînî mendiy. Nameyê înan Elîxan Beg, Uluxan Beg û Mistefa Beg bi. Mistefa Beg herbo ke tede Tebrîz gêriya, o herb de mîreyanê kurdan het bi û Sedabad de destê qizilbaşan ra ame kıştış. Elîxan Beg zî in herb de êsîr kewt destê qizilbaşan. Di serrî diza Qehqeha de heps mend. Badê cû pa mîrê mîranê Diyarbekirî Murad Paşayî xelîsya û agêra welatê xwi. Pê destegîriya Murad Paşayî hewna agêra ke sencaxê Çepaqçurî bifino xwi dest. Hêviya ma a ya ke serfiraz bibo. Birayê Silêman Begî Uluxan Beg zî Diyarbekir de merdimanê pîlan het de wextê xwi viyarneno. Mîr Mehemed zî Xançuk û Axçaqale de hukim keno. Labelê pawitîşê welatê xwi û îdarekerdiş de kê m mend. In rid ra Ferhad Paşayo serdar sencaxê ey kerde sencaxê Silêman Begî ser. Semedê inî çend serrî beynateyê Mehemed Beg û Silêman Begî de xeyliyek munaqeseyî viraziyay. Peynî di Mehemed Beg merd.

Silêman Bego lajê Murad Begî


Bê şik û şubhe, hempayanê xwi miyan de bi cesaret, sexîti û camêrdiye ameyêne şînasnayîş. Serranê ciwaniya xwi de mîrê mîranê Amed û Bexdadî de,



Cûmiya
Gîncî

hetê Erebîstanî de zaf cefa dî û xurbe-
tiye ante. Miyanê mîreyanê Kurdîstanî
de niştîşê estoran û şuxulnayîşê cerge
de merdimêko asaye bi. Wexto ke qi-
sey kerdêne, qala xo peymawitên hema
vatên. Suhbetê xwi de merdimêko
nuktedan bi. Wextê verî ra nat cayê
bawkalanê ey bacarê Gîncî bi. In ba-
car yew cayo zaf pawite û xişn o. Verê
koyêk de û kişta royê Feratî de yo.
Hende serrî hedîseyî ameyê û şarê în
bacarî sere ra viyertê labelê în piyor
bi selametiye xwi ser ra eştiy. Silêman
Beg yew merdimo wahaerê zanayîş û
hîmetê herayî bi. In rid ra bi in bacarê
qijî razî nêbi. Inê ser deşta Meneşkurdî
ya hera de yew bacar viraşt, kerd
şên. In bacar de dest bi viraştîşê yew camiya ber-
ze kerd. Çend serrî estê ke xeyliyek xebate kerde
hema zî viraştîşî aye nêqedînaya. Hela ke welatê
Ecemî, Şîrwan û Azerbaycan pê destê Osmaniyan
ameyêne guretiş, zaf xizmetê holî kerdîy. Xaseten
wexto ke Niyaz Beg Pazukî pa di-hîrê henzar eskerê
Sadçuqurî eşt Qarayazî ser û eşîra Badillî talan ker-
de, a hele Silêman Beg pa çend hebî merdîman û

Şecereyê Mîreyanê Suweydiyan



birayanê xwi Pazukiyan dima şî. Şerê camêrdan înan
de kerd. Pê quwetê baziye xwi mal, astuer û pesî
destê înan ra guretî. In herb ra weş-war û zengîn
vejîya û agêra welatê xwi. Mustafa Paşayî Serdarî
ra xelatî guretî. Wexto ke babiyê ey hema weş bi, o
mehel ra nat hetanî serra 1005 (1597) û serê aşma
zîlqade (miyanê aşma hezirani) hema ra zî ho serê
mîreyiya welatê xwi di. Ma hevî kenê bi qabîliyetê
xwi gureyanê holan de serfiraz beno. ❁

Bûka pepûk

Kasim Buğurcu

Ez zanim ev evîn
Bi vî hewayî dom nake
Rojekê, sibê zû
Parsekek destên xwe
Li ber min veke
Ezê dilê xwe di destên wî xim
Kî çi dibêje? Bila bêje!
Her çiqas ji te bê hevî bim
Bêzar bûm ji tenêbûnê
Xwarinên te jê hez dikir
Hê li ser xoçeya min in
Lê di qirka min de narin
Helbesta te çêkiribû
Tim û tim li ser zimanê min e
Nalîna te ya şewat
Wek kilamekê di guhên min de ye
Û gulên te di guldanka min de
Bê av û stûxwar in
Agirê te vêxistiye

Hîna di bixêlîka min de ye
Çer bikim, çawa herim
Mîna ecel li pêşîya xwe
Ez te dibînim!
Xwezîka te zanîba
Ku çend şevên tarî
Tenê wek evdalekî
Di quncikên sim û sar
Giriya me ji boyî te
Bi awakî bê dengî
Car car hevalan dipirsîn?
Kî ye? sebaba te
Min nedigot welat e
Bi şerm min bersiv dida
Min ji yekê hez kir
Bi şîr û şekir xwedî kir
Mala xwe ji vir bar kir.

Li Kopa rengîn, dersa Kurdî ya pêşîn

Nevzat Eminoğlu

Dixwazim bîranîneke xwe, bi we re parve bikim. Bi rastî ez, qeyd û nivîsîna xatirat û serborîyan, ji bo me Kurdan gellekî girîng û lazîm dibînim. Lewra tarîx û edebiyat, hafîze û xezîneya mîllî ye. Tarîx û edebiyat jî, bi temamî li ser qeyd û nivîsînê, bilind dibe. Ev qeyd û nivîsîn tunebe, hafîze û şîûra mîllî jî pêk nayê. Milletê ku ji van cewheran mehrûm be û qîmetê nedê; ew millet, milletekî mirî ye. Ji nû ve rabûn û hebûna wî jî, girêdayî saxkirin û vejandina van cewheran e.

Ez bawer im hûnê jî bibînin ku sergovend û serkêşê vê bûyer û bîranînê, Nûbihar e, Weşanxana Nûbiharê ye. Bihara sala 1992an e. Eynî ev çax in. Ez li bajarê xwe, Kopa Mûşê, Lîseyaya Îmam Xetîbê, sala dawî dixwînim. Ew du sal bû ku me çend telebên lîsê, Medresa Rîsaleyê Nûr nas kiriye. Em diçin wir. Kitêban dixwînin. Ev medrese, wek kitêbxaneyekê ye ku ji her mektebê telebe tîna kitêban dixwînin. Kitêbên dînî û xasma kitêbên Bedîuzzeman Seîdê Kurdî yê bi navê Rîsaleyê Nûr mutalee dikin. Paşê ku me kitêbên Ustad

Seydayê Bedîuzzeman tetqîq kir, me dît ku wî bi xwe gotiye: “Ew teşebbûsa min a Unîversîteyê ya bi navê Medresa Zehra ya ku min dixwest bi zimanê Erebbî, Tirkî û Kurdî perwerdeyê bide, ji ber ku vê gavê bi temamî muvesser nebû; heta ku Telebên Rîsaleyê Nûr huwîyeta wê ya maddî çêkin, qe nebe wek dendik û toximekî manewî; ger mumkin be, li her bajarêkî, bila dersxaneyekê Nûrê ya piçûk vebe, hebe...” Îcar xaseten piştî wefata Ustad Nûrsî bigre li her bajarî, ji teref xêrxwaz û xîretkêşan ve, ev dersxaneyên Nûrê yê xeyrî resmî, vebûn.

Ev dersxaneya Nûrê ya ku me jê ra digot medrese, di salên 1970ê de, li Kopê ji teref Seydayê Mela Mûhemmed Zahîdê ji gunê Mela Mistefayê ve hatiye avakirin. Mela M. Zahîd jî seydakî hêja bûye. Hê di wî çaxî de Rîsaleyên Bedîuzzeman ku tefsîra Qur’ana Kerîm in, tercumeyê zimanê Erebbî û Kurdî kiriye. Ji ber zulm û qedexeya resmî, îmkana teb’ û çapawan nedîtiye. Ji ber van xebatan, gellek cara hatiye girtin û de’we lê vebûne. Dawîyadawîn, ji bervan tedayî û teqîbatan, di sala 1980’

Ev dersxaneya Nûrê ya ku me jê ra digot medrese, di salên 1970ê de, li Kopê ji teref Seydayê Mela Mûhemmed Zahîdê Mela Mistefa ve hatiye avakirin. Mela M. Zahîd jî seydakî hêja bûye

de, ji welat derdikeve diçe Lubnanê. Van xebatên xwe, li wir didomîne. Di diduyê Sibata sala 2008an de, di berbanga roja Cum'ê, piştî nimêja sibê, li ser seccadê, ruhê xwe teslîmê Rehman, emanetê xwe teslîmê xwediyê wî dike. Rehma Xwedê hezar carî lê be. Seydayê Mela M. Zahid gava li Kopê Medresa Risaleyê Nûr vedike, gelek însan diçin ji wir îstifade dikin. Dîne xwe hîn dibin. Ehlê Kopê û seyda û melayên gundan jî, diçin wê medresê, li sohbet û dersan guhdarî dikin. Piştî ku Seydayê M. Zahid çû Beyrûda Lubnanê, yê herî pir li medresê xwedî derdiket, Hecî Kadrî Özdemir abê ye; ku ehlê Kopê jê re digot Hecî Koşelî. Me jê re digot, Hecî abê. Di nav Telebeyên Rîsaleyên Nûr de adetêkî pir xweş heye ku mezin ji piçûkan re dibêjin bira(kardeş), piçûk jî ji mezinan re dibêjin abê (kekê). Mezin çiqas mezin be jî, abê ye. Di wê daîrê de, kes seyda û telebê kesî nîne, şêx û murîdê hev, nînin. Her kes, bira ye. Her kes Telebê Rîsaleyê Nûr e. Lewma Hecî Qedrî abê 60-70 salî bû, me dîsa jî jê re digot abê. Hecî abê, bi eslê xwe Terekemeyê Qafqasyayê bû. Çar sal berê mala xwe bir Erzeromê û li wir wefat kir. Xwedê rehma xwe lêke. Terekeme qewmekî Tirk in. Esas bigire nivê Kopê Terekeme ne. Piştî avabûna Cumhûriyetê, ji teref dewletê ve li nava Kopê û 5-6 gundên Kopê yên merkezi û xweş, hatine bi cih kirin. Hecî abê jî, di nav malmezînan Kurdan de û cem eşîrên Kopê yên sereke de, maye. Şofêrtiya wan kiriye. Kurdiyeke pir xweş jî hîn bûye. Di nav Kopê de esnaftiyê dike. Dikana wî di nav çarşiyê de, ji ber ku li koşe bû, xelkê jê re digot Hecî Koşelî. Heta dorekî Seydayê Mela Muştâq Aydın, li medresê ders dike. Mela Muştâq alimekî pir kûr bû. Pir jî nuktedan û bi tinaz bû. Gava ders dikir, pir bi heybet û heyecan dixwend û digot. Carna jî, radibû piya, tizbiya xwe ya dirêj dida destê xwe û di salona dersê de diçû û dihat, wisa ders û sohbet dikir. Meriv qet nedixwest ku darsa wî biqede. Par wefat kir. Xwedê Rehma xwe lêke. Îcar Hecî Koşelî abê jî, kî ders bixwîne bila bixwîne, her car tevî dersê dibe û hin ciyan îzah dike. Mela Muştâq ders dikir. Bi heybet û heyecan dîsa rabûbû ser xwe, dixwend û vedigot. Hecî Koşelî abê jî çend caran hêz da xwe û xwest îzah bike. Seydayê Mela Muştâq qet heyecana xwe kêr nekir. Eynî bi wî sewtê bilind got:

–“Hecî Koşelî! Sen koşende dur!” yanî “Hecî Koşelî! Tu di koşa xwe de bisekine!”. Êdî bû pîrxîniya millet. Seyda ders dewam kir. Millet, jî kenê xwe birî.

Me nivîs û kitêbên Kurdî pir meraq dikir. Xasseten hin xêrnexwazên derdora me ku nedigotin “Jixwe Kurdî ne ziman e, eserên bi Kurdî tunin. Kurdê bajarekî, ji yê din fêr nake...” ew çax me digot xwezî kitêbên Kurdî hebana

Jixwe ders bi Tirkî dihate xwendin. Esas me telebeyên Kurd dixwest bi Kurdî jî ders bikin. Lê ne Rîsale û kitêbên bi Kurdî derketibûn û ne jî ew îmkân hebû. Yasax û qedexeyeke nedîtî li ser Kurdî hebû. Ez bawer im di eynî wê salê de bû, parlamentereke Kurd, ji ber ku kelîmeyeke Kurdî di Meclîsê de qise kir, deh sal ceza danê. Lewma em tî û birçiyê zimanê xwe bûn. Me nivîs û kitêbên Kurdî pir meraq dikir. Xasseten hin xêrnexwazên derdora me ku nedigotin “Jixwe Kurdî ne ziman e, eserên bi Kurdî tunin. Kurdê bajarekî, ji yê din fêr nake...” ew çax me digot xwezî kitêbên Kurdî hebana û derketana, me bixista çavê van munkir û muarizan. Jixwe di wan salan de der heqê Kurd û Kurdîtiyê de millet hêdî hêdî hişyar dibû. Bi rastî di nav me Kurd û Terekemeyên Kopê de jî reqabeteke veşartî hebû. Lê me ji hev re hurmet û mudara jî teksîr nedikir. Rojekê hevalekî me yê hêja bi navê Metîn, hate Medresê got ku:

–Kitab û Risaleyên bi zimanê Kurdî derketine, li kirtasiyê, li kitêbfiroşa çarşiyê hene. Em bi lez û bez çûn, me dît ku li ser kitêba “Weşanên Nûbihar” dinivîse. Rebbiyo, Xwedêyo.... Em çiqas kêfxweş bûn, her Xwedê dizane. Lewra dora ewwil e ku em nivîsa Kurdî dibînin. Wekî xewnên şeva. Em dibêjin gelo ev xewn e yan xeyal e. Rind tê bîra min, me di nav çend rojan de ew kitêbên Kurdî xwendin û em hînî xwendina wan bûn.

Çend meh şûn de, eynî ev çax in... Bihara Serhedê hatiye. Şair negotî “Bi hezaran deng û awaz in.... Qîbîna kewribata tê, quling û werdek û qaz in... Bîhna gul û sosina ye...her teref cîlwe û naz in.”

Malmezîneke eşîra Hesenan heye. Xanedan û aristokratê Kopê ne. Mala Hecî Medenî. Kalkê wan Xalid Begê Hesênî rêvebir û ronakbîrekî Kurdan bû. Sereskerê Şêx Seîd Efendiyê rehmêtî bû. Bi Şêx Seîd re hate şehîdkirin. Xwedê rehma xwe li wan ke. Kurê Hecî Medenî, Kerem, du sê sal berê wefat kiribû. Xwedê rehma xwe lêke. Wan jî ji bo wî, her sal di meha Gulanê de, li gundê xwe yê Qoşinciye,

Em ji nav Kopê derketin; tava biharê ya xweş û geş û germ.... Mêrgên hêşîn dikin û zeviyên zîl dayî, çayîr û çîmenên xweşik... hewesa meriv pê re tê. Di erebê de gotin piştî nanxwarinê wê hem mewlid were xwendin û him jî wê dersa Risaleyê Nûr were guhdarîkirin

mewlideke mezin didan. Wê salê jî, dîsa gazî hemû pêşdetirên Kopê kirine. Medreseya Rîsaleyê Nûr jî dawet û tekîf kirine. Jixwe Hecî Koşelî Abê û Rehmetiyê Keremê Hecî Medenî şîrikê hev ê dikanê bûn.

Ez li medresê me. Seydayê Mela Resûl e, ji gundê Sîmo. Seydayê Mela Resûl jî, alimekî hêja ye, hevalê Seydayê Mela Muhemmed Zahid bûye. Zanayekî dîn û kezebşewitiyekî derdê Kurdan bû. Seyda û Hecî Koşelî abê, li ser aliyê Kurdbûna Bedîuzzeman wek hev nedifikirîn. Seyda dixwest ku aliyê Bediuzzeman yê ku ji bo Kurdan xebitiye jî, eşkere bike û bîne rojevê. Lê Hecî abê nedixwest behsa Kurda yan jî Kurdbûna Ustad were qîsedanê. Lê dîsa jî hurmeta wan ji hev re hebû. Min dît Ebdulbaqî hevalê me, nebiyê Hecî Medenî, lawê rehmetiyê apê Kerem, hate hundir. Got: "Erebe hazir e. Em, ehlê medresê dawetî mewlûdê dikin, kerem kin." Tê bîra min çend telebên lîseyê ku ji Terekemeyên gundê Têxûtê ne û telebekî jî, ji Lîzê ye, navê wî Ergîn e, Kurd e; evana li Medresê dimînin. Ez im û Seydayê Mela Resûl e. Em pênc-şeş heb in. Îşê Xwedê Hecî Koşelî abê wê rojê qe tune bû. Hin memûrên Tirk ên ku ehlê medresê bûn, ew jî nedixuyan. Em ketin texsiyê û me berê xwe da gundê Qoşinciye. Em ji nav Kopê derketin; tava biharê ya xweş û geş û germ.... Mêrgên hêşîn dikin û zeviyên zîl dayî, çayîr û çîmenên xweşik... hewesa meriv pê re tê. Di erebê de gotin piştî nanxwarinê wê hem mewlid were xwendin û him jî wê dersa Risaleyê Nûr were guhdarîkirin. Seydayê Mela Resûl got: "Nevzat tu dersa Rîsaleyê bixwîne." Min got tamam. Wan rojan, ez di cêva xwe de her tim Risaleyên Kurdî digerînim û hema wisa dixwînim. Heta şev jî, di nav cî û nivînen min de jî, destê min de ne; li ber serê min in, carna dibînim ku bi wan ve raza me. Ez zanîm Seyda nabêje na, min got, Seyda madem em diçin gund û li cem min jî Risaleyên bi Kurmancî hene. Hema ez bi Kurmancî bixwînim çêtir nîne? Ka gundiye feqîr Tirkî çî dizanin! Wî jî got: "Dibe, çima

nebe. Eger dikarî bixwînî, bila bi Kurmancî be." Em di gundê Rustemgêdûkê re derbas bûn. Rasta Çemê Muradê bi mêrg û zeviyên hêşîn ve, ber çavê me ket. Çemê Mûradê bi hemû nazenîn û nazdariya xwe hate xuyan. Dengbêj negotî: "Lo bi qurban, Çemê Mûradê wa bi lem e, lem e. Reng bi reng e; bi gul e, bi kulîlk e, bi kelem e... Ez heyrana wê xulîn û wê xuşîn û herikîna te me..."

Em di ser pira Mûradê re derbas bûn û li milê rastê ber bi Sultanliyê zivirîn. Em hê negihîştin Sultanliyê, me dî gundekî şîrîn û piçûk, hema bigre çend mal li milê me yê çepê hatin xuyan. Di nav wan malan de, maleke mezin, wek koşeke bilind li ber çavê me ket. Gotin, "Vaye em hatin Qoşinciye." Bi rastî, izzet û hurmet û pêşwaziyeke maqûl. Li ser urf û abûrên eşîrtî û malmeziniyê. Di nava saloneke pir mezin de, sifreyên gelek dirêj raxistine. Hema bigre hemû giregir û eşrafên Kopê li wir in. Ma kî tune! Eşraf û esnafên Kopê, Zewatên resmî, Mudurê Milli Eğitimê, Mudurê Lisê, Mudur û mielimên mekteba min Lîseyê Îmam Xetîbê, Mudurên nizam ku derê... Seyda û Melayên Camiya Merkezê ya mezin û camiyên din. . . Tijî kesên bi qirewat û bi kincên taxim, Seydayên şaşik sipî, şaşikên wan sipîçil qerqaş dikin, adeta diçilwilin. Gundî bi dizî, ji hev re dibêjin, ev seydayê Seyîd Ahmedê nizam ji ku ye, ev nizam Seyîd Elbaqiyê ku ye... Ev Xelîfe Mela Îhsanê nizam çikê ye... Sênî û sifre danîn erdê. Dest bi xwendina mewlidê kirin. Seydayê Mela Kerem Yılmaz ê Xerabşehrê, Melayê Camiya Merkezê bû, Mewlid xwend. Ewî jî wefat kiriye. Xwedê rehma xwe lêke. Wan Seydayên din jî pê re xwendin. Mewlid xelas bû. Min dî Hecî Medeniyê rehmetî, got: "Mela Resûl, ka bila mêvan li derseke Rîsaleyê Nûr jî guhdarî kin. Ka ji we kê dersê dixwîne? Mela Resûl got: "Ev Telebê Îmam Xetîbê Nevzat, wê bixwîne." Çavê hemû wê cimaeta giran zivirî ser min. Min kitêba xwe ya "Peyva Bîst û Sisêyan" ji cêva xwe derxist û bismillah got û dest bi xwendinê kir: "Însan, di vê kaînatê de, weke zarokekî pir nazik û nazenîn e. Ji ber ku di şiklê ehse'ul teqwîm de hatiye xuliqandin û îstidadên pir fireh bi wî hatiye dayin, bi vî haletî hatiye vê meydana îmtihanê. Îman hem nûr e, hem quwwet e. . ." Her kes şaş û metel maye. Li min guhdarî dikin. Lewra cara ewil e ku di civîneke wiha de, derseke Kurdî ji kitêbeke Kurdî, tê xwendin. Kifş dibû ku hinek bi hewes û heyran. . . hinek jî bi tirs û endîşe, guhdarî dikin. Lê her kesî nefesa xwe

girtiyê û sekiniye. Min rûpelek xelas kir, tamî derbasî ya din dibûm. Hecî Medeniyê rehmêtî, di rêza min de û şeş heft meriv wê de, serê xwe dirêj kir û wiha bi endîşe û hîddet got: "Bira ewê kitêbê kê tercume kiriye." Min serê xwe ji ser kitêbê bilind kir û bi awayekî xayet ciddî û bi xwe bawer: "Hecî, Telebeyên Rîsaleyê Nûr, evana tercume kirine."

-Na lo! Ji ku telebên Rîsaleyên Nûr?! Tiştêkî wisa hebûya, wê haya me jê hebûya." Min got, "belkî we nebihîstibe, lê ev kitêbana tercumeyê hemû zimanên dinyayê bûne. Erebî, Ingilîzî, Farisî. . Vê dawiyê bi Kurdî jî derket." Paşê, min herwekî qet tiştêk nebûye, dîsa dersa xwe dewam kir. Heciyê rehmêtî jî pir pê de neçû. Bi rastî, Hecî jî heqdar bû. Di wê demê de, kitêbeke Kurdî li cem kê yan li mala kê bidîtana, davêtin hebsê. Hem qismek mêvanên Hecî Tirk û zewatên resmî bûn. Kalkên Hecî, mezinên wanê berê, di doza Kurdî de, şehîd ketine. Ji ber wê zor û zecra ku dîtine, di rewşeke/psikolojiya çewisandî de ne û zahiren xwe ji Kurdayetiyê dişon/dûr digrin. Him ew mêvandar û ez mêvan bûm. Lewma heqê îdare û rêveberiyê, yê wî bû. Haya min feqîrê Xwedê ji van yekan tune. Ez tenê bi tîbûna dehan salan ya bi zimanê xwe yê şîrîn tevdigerim. Ev zimanê ku yasax/qedexê bûyî û xêrnexwaz, dixwazin ji holê rakin; ez dixwazim bi însanê xwe bidim nasîn û zanîn. Lê dîsa jî reaksiyona Hecî, pir tûj nebû. Bi esalet nêzîkî hadîsê bû û nûciwanekî wek min ê xam lê bixîret, rencîde nekir. Min dersa xwe qedand û fatîha xwe xwend. Hema bigre her kesî memnûniyeta xwe anî ziman. Piştî ku me nan xwar, li ser hêşînaya ber derî û rasta malê, di fesla çayê de, ew cemaeta mezin bûbû du qisim. Hinek li dora Hecî Medeniyê rehmêtî rûniştibûn. Qismekê seyda û ciwan û memûr û gundî jî, hatin li dora min civiyan û digotin: "Ev kitêba li ku tê firotin? Em jî bistînin" û tişt dipirsîn. Mîna pirs û cewabê dawiya qonferansekê. Lê tenê neviyê Hecî, Abdulbakî yê hevalê min, hat cem min û bi Tirkî got: "Nevzat yak-tın beni. Hacı dedem inşallah sonra bana kızmaz." Yanî "Nevzat te ez avêtim agir. İnşallah kalkê min ê Hecî, paşê li min neyê xezebê." Abdulbaqî paşê firçe xwar, nexwar ez nizamim. Lê di nav çarşiyê de ez û Hecî Medeniyê Rehmetî her ku rastî hev dihatin, Apê Hecî her car digot: "Kurê Hecî, çanî..." û min dipirsî. Lê ku aniha bûya, ezê li cem rûniştama û minê ev tişt bi dil û can pê re parvebikirana. Hecî Medenî, Mela Resûl, Mela Muştâq, Hecî Koşelî, Mele Kerem, ew Seyda û mezinên civîna wê rojê de, aniha bigre tevan wefat kirine. Rihê wan rehmêt xwest, Xwedê rehma xwe li wan bike. Em jî, li dû wan in. Belê, yê baqî, her Xweda ye. ❀

Dîmoqrasî

Langstone Hughes

Ji Ingilîzî: Azad Rêbiwar

Dîmoqrasî ê newê
Ne îro ne îsal
Û ne jî tu carê dî
Bi sertewandinê û bi tirsê.

E'jî bi qasî êdî xwedî maf im
ji bo ku li ser herdu piyên xwe
rawestim
Û xwedîtiye li vê xakê bikim.

Ez westiyam ji bihîstina wê peyva ku
mirov dibêjin
Sibeh tê xêr pê re
Bihêle bera her tişt bi herka xwe ve
here
Dema ku ez mirim ji mir ne lazim e
azadî
Ez naşêm xwe bizebirênim
Bi hêviya nanê sibeha dî.

Azadî
Bizrekî zexm e
Hatiye çandin
Di hewcedariyeke gewre de.
E'jî li vir im
Azadiyê dixwazim
Tam weke we.

Eşîrên Herêma Botan III

Şilêd: Batuwa

M. Munir Timurtaş

Di bin mîrîtiya Mîrê Botan de du navên taybet hene:

- 1-Şilêd
- 2-Çiqsor

a-Şilêd

Şilêd koçerên mîrê Cizîra Botan in. Koçer, di devoka Botan de ew kesê ku jiyana xwe di konan de derbas dikin, havînê diçin zozanan û zivistanê têne germiyanê. Bi çandinî, rez û dehlan ve mijûl nabin. Karê wan tenê pez e. Lê bi sebebê guhertina şert û mercan, koçer mecbûrê dera ku ji wan re germiyan bû man û bi cih bûn, awayî ava kirin.

Şilêd, ji pênc eşîran pêk tê:

- 1-Batuwa
- 2-Teya
- 3-Kiça
- 4-Musareşa
- 5-Xêrêka

Eşîra Batuwa

Emê ewil ji eşîrên Şilêd behsa Eşîra Batuwa bikin û piştê emê li gor rêza me danî behsa yên dîtir bikin.

Eşîra Batuwa, ji aliyê kelehên xwe ve û hem ji aliyê erdnigariya

xwe ve eşîreke berfireh e. Mezinê van her pênc eşîrên li jor jî Batuwî ne. Di dema mîrê Cizîrê de ev desthêlatdarî ji Eşîra Batuwa re hatiye dayîn heta roja me ya îro jî halo berdewam e û ev her çar eşîrên din jî ev biryar wiha qebûl kirine. Îro jî, dema axayê Batuwa amade be, yek ji axayên van her çar eşîrên din nadin pêşiya axayê Batuwa.

Eşîra Batuwa di erdnigariya xwe de, ji Cizîra Botan heta Şîrnexê heta bigihê gundê Torik û Memîra ye. Ev der cihê wan ê germiyan e û li vir bi cih bûne û xanî çêkirine. Belê zozanê Eşîra Batuwa zozanê Alandeştê ye. Debara Batuwa niha li ser çandinî, pez û dewar û bazirganiya komir û dara ne.

Batuwî, di exlaqê xwe de nerm in, ne serhişk in, hij mirovên oldar dikin; belê xwendayê wan yên olî gelekî hindik in û gelekî girêdayê bi şêxa ve ne. Paqijî li cem wan esas e. Zilamê wan yê hijxwekirî di wergirtina cilan de hij şalşapika dikin û hij wergirtina cemedaniya dikin û dikin weke şaşikê û dûvkê wê lê diqulibînin. Jinên wan bêtir hij fîstanê pembeyî û çeçem dikin.

Eşîra Batuwa di erdnigariya xwe de, ji Cizîra Botan heta Şîrnexê heta bigihê gundê Torik û Memîra ye. Ev der cihê wan ê germiyan e û li vir bi cih bûne û xanî çêkirine

Eşîra Batuwa niha ji 32 gundan pêk tê:

1-Xêrim pênc mal e û ava ye.

2-Dêrgulê. Sê sed mal e û xwedî şaredar e, ava ye.

3-Qesirkê. Nêzî sê sed malî ye ava ye, xwedî şaredar e û xwedî kelh û xwedî şikeft û xwedî pireke dîrokî ye.

4-Şawîşa. Nêzî sî malî ye û ava ye.

5-Şêxêreş. Nêzî şêst malî ye û ava ye.

6-Bêsukê. Nêzî çil malî ye û ava ye.

7-Fêrisa. Nêzî bîst malî ye û ava ye.

8-Berkever. Nêzî pazdeh malan e û wêranbûyî ye.

9-Emowiya. Nêzî bîst malan e, wêranbûyî ye.

10-Banêbotiya. Nêzî sed malî ye û ava ye.

11-Zeytunok. Nêzî pêncî malî ye û wêranbûyî ye.

12-Mendîkera. Nêzî pêncî malî ye û ava ye.

13-Niyar. Nêzî bîst malî ye û ava ye.

14-Milakêrî. Nêzî şêst malî ye û ava ye.

15-Gurdêla. Nêzî heftê malî ye wêranbûyî ye.

16-Cinêd. Nêzî pêncî malî ye wêranbûyî ye û Fileh in.

17-Navyan. Nêzî du sed malî ye ava ye û şêx in.

18-Nanîf. Nêzî pêncî malî ye, wêranbûyî ye.

19-Xuêdan. Nêzî bîst malan e û wêranbûyî ye.

20-Baqertal. Pênc mal in û ava ye.

21-Genda. Nêzî bîst malan e, wêranbûyî ye.

22-Avatîrş. Nêzî deh malan e, wêranbûyî ye.

23-Kehnîrol. Bîst mal in, wêranbûyî ye.

24-Misuriyê. Nêzî pêncî malî ye û ava ye.

25-Zora. Bîst mal in û ava ye.

26-Newalaşaxa. Bîst mal in û ava ye.

27-Banêmehinda. Pêncî mal in û ava ye.

28-Feqa. Nêzî sih malî ye û wêranbûyî ye.

29-Mendîşana. Bîst malî ye û wêranbûyî ye.

30-Malkerêj. Nêzî şêst malî ye û wêranbûyî ye.

31-Dêrajêrî. Nêzî sih malî ye wêranbûyî ye û Fileh in.

32-Dêrajorî. Deh mal in wêranbûyî ye û Fileh in.

Di dema mîrekan de, axayê Eşîra Batuwa Qoçî Beg bû. Qoçî Beg ji alî mîrek, ji mîrê Cizîra Botan ve hatiye tayînkirin û bûye axayê Eşîra Batuwa. Ema Qoçî Beg pêşiya ku bibe axayê Eşîra Batuwa navê wî Qoço bu. Qoço tê wateya ku navê wê dara ne dirêj û stûr weke qurmekî jê re dibêjin qoç. Yanî Qoçî Beg weke Qoçekî hatiye dîtin. Qoçî Beg bavê xwe

nedîtiye, dayîka wî mîrek din kiriye; navê zirbavê Qoçî Beg, Pêlo ye.

Belê Qoçî Beg, çawa bûye axayê Eşîra Batuwa?

Rojek ji rojan, mîrek ji mîrê Cizîra Botan li Herêma Botan digere û digihê gundê Bikat. Kefxwê Bikat (yanî mezinê wê) Gewro bûye. Gewro Fileh bûye. Jina wî navê wê Gulê bûye. Gulê jineke jîr û jêhatî û gelekî sipehî bûye. Ne bi dilekî, bi sed dilan dilê mîr dikevê Gulê. Mîr radibê Gewroyê mîrê wê dike tehsîldarê Welatê Bikat û mîr divegere Cizîrê. Bes kul û kedera Gulê ji dilê mîr dernakeve. Mîr jî nikare car cara here Bikat. Çimkî ew mîr e û dewsa wî giran e. Lê mîr radibe xulameke xwe rêdike cem Gulê û gelek tiştên weke zêr û mucewheratên biqîmet ji Gulê re dişîne û hijêkirina mîr pê dide zanîn. Gulê jî hijêkirina mîr qebûl dike. Piştî xulam ev zanî radibe ji Gulê re dibêje: Mîr gotiye ezê ji Gulê re li Burtê dêrekê çêkim da qene Gulê were wê derê. Ezê jî ji Cizîrê werim wê derê emê hevdu li wê derê bibînin. Gulê vê biryarê di cih de qebûl dike. Xulam vedigere Cizîrê û meselê ji mîr re dibêje. Mîr gelekî kêfxweş dibe û emir û ferman dide ku dêrekê li Burtê çêkin. Di wextekî kurt de dêrê çêdikin û xilas dikin. Ji hingî ve navê Burtê bûye Dêrgulê. Yanî dema ev kelîme bête şîrovekirin tê wateya Dêra Gulê. Heta îro jî ev nav berdewam e, Dêrgul bûye bajarok û şaredarî tê de heye.

Belê piştî avakirina dêrê, dîsanê mîr xulamê xwe dişîne cem Gulê û dibêje: Vaye dêra mîr ji te re çêkirî tamam bûye û amade ye, ka tê kengî werî. Gulê ji xulam re dibêje: Tu dizanî hevserê min Kefxwê li Welatê Bikat e û hem tehsîldarê Welatê Bikat e. Dema hevserê min here tehsîlatê ezê hingî werim. Çimkî dema diçe tehsîlatê, pir dom dike. Eger neçe ez nayê. Xulam got: Temam û vegeriya Cizîrê. Dema xulam tê Cizîrê û diçe koçka mîr selam didiyê. Dora mîr qelebalix e. Mîr sebir nake heta dora wî vala bibe û xulam meselê jê re bêje, radibe ji xulam dipirse: Te çi kir? Xulam heyirî dimîne, bersiv nede nabe, bersiv bide jî nabe, bes mecbûren bersiveke weke mamik dide û dibêje:

Ez çûm Awal ne li mal

Ez çûm Nît min nedît

Ez çûm Bikat ji wir ve hat

Eger çû wê werê

Eger neçû nayê.

Mîr bersiva xwe stand, mirovê li derdorê jî fêm

nekirin. Ev adeteke mezin û mîra ye dema xulam û xizmetçiyê wan hebin, divê zana û eqilmend bin.¹

Kêfa mîr bi vegera xulamê wî û bi bersiva wî zehf hat û mîr sebîr dike. Wext tê, hevserê Gulê diçe tehsîlatê û Gulê jî qesta dêra xwe dike û diçe dêrê. Mîr bi hatina Gulê agahdar dibe û ew jî bi heyetek xwe ve qesta Dêrgulê dike û digihê Meydana Qoçî Beg.

Qoçî Beg hingê şivan e li ber pez e. Dinêre waye komek însan ji wir ve tîn. Qoçî jî diçe xwe nêzî wan dike û dipirse ev kî ne. Dibêjinê evê hanê mîrê Cizîra Botan e. Qoçî diçe xwe nêzî mîr dike û bixêrhatina mîr û hevalê wî dike û bi hurmet diçe destê wî dibêjê: Mîrê min tu bi hevalê xwe ve hûn mêvanê min in. Kêfa mîr jî jê re tê û qebûl dike. Qoçî dikeve nava pezê xwe pezekî qelew digire û serjêdike li wê meydanê goşt çêdike, dide wan. Dema mîr û hevalê xwe goştê xwe dixwin radîbin qene bi rê bikevin, Qoçî dîsanê bi edeb diçe destê Mîr û şûnde şûnde tê. Kêfa mîr gelekî ji Qoçî re tê, dipirse û dibêjê: Tu ji kîjan gundî yî xortê hêja? Qoçî dibêjê: Ez xulam, ez ji wî gundê ba tuwa me. Qoçî behsa gundê Şawîşa dike. Çend darê tuwa ji gund xuya dikirin. Mîr dibêjiyê navê te çi ye? Dibêjê navê min Qoço ye. Mîr dibêjê ji vir pê de navê te Qoçî Beg e tu qoçiyê min î, tu mezinê Şilêd î. Heta niha jî Batuwa mezinê Şilêd in. Qoçî Beg xortekî gelekî sipehî û mêr bû û jîr û çeleng û jêhatî bû. Ew dera Qoçî pez ji mîr re serjêkirî navê wê dê ji hingê ve bûye Meydana Qoçî Beg.

Piştî Qoçî Beg bû mezinê Şilêd, çûnûhatina Qoçî

1 Mînakê vê hene: Weke carekê ji caran mîrê Cizîra Botan bi heyeta xwe ve diçin ziyareta mîrekî derdora Herêma Botan. Dema xwarinê tê, xwarinê dixwin. Du lib birinc bi simbêlê mîrê Cizîra Botan ve dimînin. Xulamê mîr dibêje: Mîrê min du şêr ketine hewêngê. Mîr fêhm kir û destê xwe bi simbêlê xwe ve anî, simbêlê wî paqij bûn. Mîrê Botan bi aqilmendi û jîrîtiya xulamê xwe gelekî kêfxweş bû. Lazim e xulam û mişêwrê mîra aqilmend û şareza bin. Bi rastî ev qaîdeki exlebî ye, ne daîmî ye. Belê carina berevajiyê vê jî çêdibin. Weke mîrê mazûvan ku ev bûyer bala wî kişand û ji xulamê xwe re got: Dema em jî çûne derekê bûyere halo qewimî tu jî halo bêje: Xulam gotê tamam. Dema rojekê ew mîr bi heyeta xwe ve diçin mêvandarî. Mîr jî qestî du lib birinc bi simbêlê xwe ve dihêle. Xulam dibîne, lê mixabin ew lefzê xulamê mîrê Botan gotin nehatin bîra wî û ma heyirî. Ji bê mecalî got: "Mîrê mîn! Weke xulamê Mîrê Botan gotî." Erê mîrê mazûvan simbêlê xwe paqij kirin lê di rihê xwe de gelekî enîrî heç ku xulamê wî eqil ji xulamê Mîrê Botan girtî.

Beg bi ser Mîrê Cizîrê de çêbûn. Mîrê Cizîrê xerc û bêşê her derê distendin bes ehlê Kelha Tewrêzê xerc û bêşê xwe nedidan. Mîr bi vê nedana xerc û bêşa ehlê Tewrêzê gelekî nerazî bû û Qoçî Beg jî bi vê bûyerê nerihet bû. Qoçî beg çû cem Mîr û got: Mîrê min! Ez bi vê nedana xercê ehlê Tewrêzê nerazî me, tu destûra min bide ezê herim ka ez xercê wê derê nastînim. Mîr dibêjê: Ez jî pê nerihetim ema dilê min bi te ve ye min navê tu herî. Qoçî dibêjê: Tu îzna min bidî ezê herim. Mîr îzna Qoçî Beg dide.

Piştî destûra mîr, Qoçî Beg di wextekî kurt de hêza xwe pêk tîne û diçe qesta Tewrêzê dike. Dema digihê nêzî Tewrêzê, ji leşkerê xwe re dibêje hûn hawîrdorê kelehê bigirin, ezê herim ber deriyê kelhê bi pasvanê Fileh re biştexilim û ezê wî mijûl bikim û pêre pêre ezê şûrekî deynim stûyê pasvan. Dema we dît min daniyê hûn jî bi tevahî hicûmê bidin ser kelehê û ezê jî bikevim kelehê da hingî tiştê me bivê emê bi dest bixin.

Li gorî plana ku Qoçî Beg di serê xwe de gerandî û emir dayî leşkerê xwe, wilo pêk hat û keleha Tewrêzê bi dest xistin, talan kirin û heta Qoçî Beg deriyê kelehê ji ber dike û tîne ji mîrê Cizîrê re. Li gorî hinek gotinan, deriyê Mizgefta Mezin ya Cizîrê ew derî ye. Belê di sala 1982an de ew derî ji ber deriyê mizgeftê rakirin û birin Topkapiya Stenbolê.

Li gorî gotina ehlê Cizîrê piştî mîr pê dihesa ku Qoçî Beg ev keleh bi dest xistiye gelekî kêfxweş dibe û dibêje: Qoçî Beg çi bixwazê ezê bidimê. Piştî Qoçî Beg tê nêzî Cizîrê dibe, Mîr dahol û zirnê rêdike pêşiya Qoçî Beg. Vêca zilamek ji Şilêd tê hêdîka ber guhê Qoçî Beg de dibêjê: Mîr gotiye: "Qoçî çi bixwazê ezê bidimê." Vêca ji bo pêşeroja Şilêd tişteki girîng heye bila daxwaza te ew be. Qoçî pîrsî ew çi ye? Got: Li ser kuçekî di sûra Cizîrê de bi Erebbî nivîsiye "Kullu Şilêd qetîl helal" yanî, timê Şilêdî kuştina wan helal e. Tu vê daxwazê ji Mîr bike û wî kuçî ji wir derxînin û bavêjin. Piştî vê tu çi daxwaza xwe bikî bike. Çimkî dema nivîsandinek wilo hebe li dereke balkêş, ew nivîsandin dibe qanûn û wesîqe. Weke dema berî Îslamê li Mekkeyê dema biryarek bihata dayîn ew biryar dinivîsandin û bi Ke'be ve dadileqandin ew nivîs dibû qanûn herkes mecbûr bû wê qanûnê qebûl bike.

Ji ber vî qasî dema ewil Qoçî Beg tê hizûra mîr daxwaza vê yekê ji mîr dike. Belê mîr ne bi dilê wî ye lê gotina xwe jî gotiye. Mîr îzna Qoçî Beg dide û diçe wî kuçî ji sûrê derdixe û tavêje Gêra mîr Mihema.

Piştî vê, Qoçî Beg dibêje: "Mîrê min! Ez bê cih û war im tu cihêkî bide min." Mîr bang dike xulaman, sê hespan, neh-deh rojan bi ka û ceh taze xwedî bikin, bila Qoçî Beg û du xulam siwar bibin û herin heta sê rojan ka gihatî ku derê, vî alî wî alî bila ji Qoçî re be. Qoçî bi du xulaman ve li hespê xwe siwar bûn û çûn heta gihîştin Şehkuşehburê dûvê Alandeştê. Li wir ser wî borî hespê Qoçî Beg avê vedixwe, du caran avê qurt dide, cara sisyan jî qurt dide weke adeta her dewarî hesp serê xwe radikê bi ezmanan ve û bi rê dikeve. Hingî ji westînê xwîn di dev û lêvên hespê Qoçî Beg re tavêje, dikeve û dimire. Ev dera hespê Qoçî Beg lêketî û mirî ew der bûye tixûbê Qoçî Beg. Yanî ji Cizîrê heta dûvê Alandeştê. Bes ji Cizîrê heta Torik û Memîra gundê wan û avahî û erdê wan e, ji wir pê de û heta dûvê Alandeştê rêbar ku tere biburin ew heqê wan e. Dûvê Alandeştê bû zozanê Batuwa.

Meydana Casus ma ji Hewêriya re. Hewêrî Êzîdî ne. Mezinê Hewêriya Gebo yê kurê Gebo navê wî Hisênê Hewêrî ye. Derê Gerê ji Xêrika re, Sêrêk ji Musareşa re, Kelha Hêt ji Kiça re, Mexelê Şengê ji Teya re. Ji hingê yanî ji dema Qoçî Beg û heta niha ev qîrar halo maye û halo berdewame. Weke çawe me ji devê kal û pîra bihîstî, Qoçî Beg li gundê Şawîşa Xwedê daye. Piştî mîrê Cizîrê begîti da Qoçî û pêde, nûkanê Qoçî Beg diçe gundê Xêrim ava dike û li wir dimîne û heta wesiye dike û dibêje eger ez bimrim wesiya min ew e hûn min li Xêrim veşêrin. Çimku evder devê rêya koçeratê de ye, dema pez here zozana qene dengê pêz û şivana were min.

Di dema Qoçî Beg de Xêrim navenda Eşîra Batuwa bû. Piştî mirina Qoçî Beg axatiya Eşîra Batuwa digihê Mala Emerê Temer. Piştî hilweşandina mîrîtiya mîrê Cizîra Botan her eşîrek bi serê xwe, xwe bi rêve dibe, xêr û şerê wan bi wan ve girêdayîne. Ji beriya hilweşandina mîrîtiya mîrê Cizîra Botan timê eşîrên Botan bi mîrîtiya mîrê Cizîrê ve girêdayîbûn. Ji ber vêqasê şerê eşîrên Botan yê xwebxetî gelekî kê mîrê bû û eger hebûya, yê eşîrê xerîb car cara çêdibû. Ema weke me gotî piştî hilweşandina mîrîtiya Cizîrê şerê eşîrên Botan yê xwebxetî çêbûne weke şerê Batuwa û Dêrşewiya. Wekî din şerê gelekî giring çêbûne, neyartiyê bi bîst salan dewam kiriye weke çawa me ji devê pîr û kalan bihîstî Dêrşewiya 100 mêr ji Batuwa kuştîne û Batuwan jî 101 ji Dêrşewiyan kuştîne.

Ev neyartî û şerê ha nêzî şerê Ews û Xezreciya ye. Neyartiya şerê Ews û Xezreca bi hatina dîne Îslamê û

bi hatina Hezretê Mûhemmed bi dawî bûye. Ev şerê henê jî piştî fêmkirina gelê kurd ya dîne Îslamê û fêmkirina xwe û li rênîna derdora xwe ev şerê hanê bi dawî bûye. Em hêvîdar in ji Xwedayê Dilovan ku van rojên reş û tarî ser gelê Kurd de neynê.

Di dema axatiya Emerê Temer de, axayê Hecî Eliya zavayê axayê Dêrşew Emer Axa bûye tete cem xezûrê xwe û jêre dibêje, axa ma tu bûrayê min bi min re rênakî taziya mala Emerê Temer. Emer Axa jî nabe ser milê xwe û nabêje neyartiya me û Batuwa heye, radibe kurê xwe Hesên bi zavayê xwe re yê ku axayê Hecî Elyayê re rêdike.

Hesam axa û 7 zilam pêre ne. Hesên kurê Emer axa jî 23 zilam pêre ne û diçin taziya axayê Batuwa. Hesên kurê Emer axayê Dêrşew ew jî xarziyê Emerê Temer e. Emerê Temer bixêrhatina mêhvanê xwe dide û ji xarziyê xwe Hesên dipirsê bavê te çawa ye û tu qewîti nekirine? Hesên dibêje: Bavê min gotiye: Bila tukes ji Rosor derbas nebin. Civat dikene. Emerê Temer got: Xarzi dilê bavê te ye, ema ev zimanek yê axatiyê ye û ne ji dil e.

Emerê Temer bi xulamê xwe ve diçin ser Rosor destnimêj digirin û tèn. Di rê de ji xulamê xwe Ehmedê Cangîr re dibêje: Hesên Axa bibe Konê Qero. Dibêje bila. Dema tene nav malan, Ehmedê Cangîr ji Hesên Axa re dibêje, xalê te gotî ye Hesên Axa bibin Konê Qero. Hesên axa gelekî eciz dibe, dest tavêje xencera xwe li xulamê Emerê Temer Ehmedê Cangîr dide. Ehmedê Cangîr dike hewar. Batuwi li wan tene hevdu; Hesên Axa û neh hevalên wî bi mîkutan dikujin û xulamêk birîndar xilas dibe û dikeve nav Ava Gurdêlê ku Rowê Şemsê ye. Pîrekên Batuwa li wê derê balavê dikin. Yê birîndar ji jana birîna xwe dijûna dike axayê Batuwa. Jineke bi navê Eyşa Osman, radihêje kuçekî li zilamê birîndar dide û dukuje.

Di vê bûyerê de şaşitiyek çêbûye. Sebeb vê şaşitiyê evqas însan hatine kuştin. Ev şaşiti jî ev bûye: Dema Ehmedê Cangîr dibêje "Hesên Axa: Xalê te gotiye, bila Hesên Axa bibin Konê Qero" Hesên Axa dibêje qey 'Konê Qero' ji konê sê re dibêjin û lewma dest avêtiye xencera xwe û li Ehmedê Cangîr daye. Ewî nezaniye Konê Qero bi zimanê Batuwanî, ji konê Qehreman re gotine, navê zilamekî ye.

Axayên Batuwa, ji çend pisebavan pêk tèn: Mala Emerê Temer, Nanîfî, Sadûnî, Tuzbegî, Ezdînî, Qoçîbegî, Banbutyanî, Mala Hisên. Ev pisebavê hanê

ji wan re dibêjin "Pêşaxa" di nav van pisebavan de yê axatiya Eşîra Batuwa kirin Mala Emerê Temer in. Halo berdewam kiriye heta gihaye Osmanê Ehmedê Qêsim kalkê Osmanê Ehmedê Qêsim.

Emerê Temer ji alî dewletê ve hatiye şeniqandin. Şeniqandina Emerê Temer weke ji devê kalê Batuwa Mihemedê Mêjdîn hatî bihîstin halo dibêje:

Bedirxanî mîrê Herêma Botan bûn, piştî bêtehemuliya dewletê şer û nexweşî di neqeba dewletê û Bedirxaniyan de çêdibe. Bedirxanî hinek koçbir dibin û hinek mecbûrê çûna nav dewletên biyanî dibin. Yek ji Bedirxaniyan bi navê Silêman Beg ew jî hatiye sirgûn kirin, lêbelê Silêman Beg rêkekê dibîne û tê Herêma Botan. Li nav axayê Kurdan digere daxwaza wî ji axayên Kurdan yekîtiya gelê Kurd û berxwedaneke hereketa Kurd e. Soz û ehdan ji gelek axayên Kurdan distîne. Yek ji wan axa Emerê Temer e û yek jî Silêman Axayê Şirnexî ye. Silêman Axa diqulibe û dibe hevalê dewletê. Rayedarên dewletê ji Silêman axa re dibêjin: Tu birayê me yê mezin î bes tu ji me re bibî alîkar di kuştina Silêman Beg de. Silêman Axa vê biryarê qebûl dike û Silêman Beg dikujin.

Pey vê re serhildana Şêx Seîd çêdibe. Di vê serhildanê de Şêx Seîd bi ser nakeve, bi 47 hevalê xwe ve tête şehîdkirin. Piştî şehadeta Şêx Seîd û hevalên wî hê nû dewlet fermana axa radike. Yek ji wan axayên ku biryara şeniqandina wî hatî dayîn Emerê Temer e. Dewletê rabû Emerê Temer û melayê wî yê bi navê Mele Evdilkerîmê Gamêşa ji Cizîra Botan û kefxuwê Fileha yê bi navê Yûsif girtin.

Piştî girtina Emerê Temer û hevalê wî, Eşîra Batuwa kete nav tevgerê de. Li gorî agahiyên eşîretê sitandî; yê Emerê Temer bi hevalên wî ve di rêya Birîniyê re bibin Dihê û ji wir yê bibin Sêrtê. Li gorî van agahiyên Eşîra Batuwa jî rûçelengê xwe bi

rêkurtkarê dişînin Mêla Birînî, qene Emerê Temer û hevalê wî ji dest dewletê xilas bikin. Lê mixabin desthilatdarê demê, dîsanê xapînokê xwe kirin, wê rêyê re neçûn; di rêka Welatê Bikat re çûn û heta birin Sêrtê û ji wir birin Diyarbekirê kirin hebsê de.

Piştî demekê wan dibin dadgehê. Pêşî Mele Evdilkerîm mehkeme dikin. Mele Evdilkerîm hinekî Tirkî dizane, parastina xwe dike û dibêje: Ez însanekî mela me û hay û gumanê min ji vê bazarê nîne, ez zilamekî derwêş im. Li gorî hinek rîwayetan, Mele Evdilkerîm çûye xiyaretê û îfade li ser Emerê Temer û hevalê wî daye. Belê piştî xilasbûna îfada Mele Evdilkerîm, ewî rêdikin hebsê. Emrê Temer û yê Fileh dipirsin, Seyda çawa çêbû? Seyda dibêje: Dê min berdîn, bes dê we herduyan yanî Emerê Temer û Yûsifê Fileh dê bixeniqînin.

Dema baweriya Emerê Temer tê ku dê wî û hevalê wî yê Fileh bixeniqînin, dibêje hevalê xwe, tu bi ya min bikî ev e her dê me bixeniqînin, a baş ew e tu Misilman bibî. Yê Fileh baweriya wî baş hatiye ku Mele Evdilkerîm giliyê wan kiriye, ji ber vî qasî Yûsifê Fileh dibêje: Ez Misilman nabim, ew cineta Mele Evdilkerîmê Gamêşa heriyê, ez naçimê. Çimkî wî dev ji min û te qeraye û wî soza xwe şikandiye. Yê Fileh ji Emerê Temer re dibêje: Hema ez jî wek baweriya te hêvî û mecalê me Xwedê ye. Dema dora îfada Emerê Temer û yê Fileh tê, wan dibin dadgehê û îfada wan digirin, Emerê Temer û hevalê wî yê Fileh dişeniqînin.* ❁

* Ev gotinên me nivîsandî me ji devê kal û pîran bihîstine ku şaşîtkêk hebe em bexşandina xwe ji xwendevanan dixwazin. (M. Munir Timurtaş)



Qedrîcan û helbestên wî yên Hawarê

M. Zahir Ertekin

zahirertekin@hotmail.com

A-Destpêk

Qedrîcan, yek ji helbestvanên mezin ên gelê Kurd e. Qedrîcan jî yek ji wan navan e ku pêdivî bi lêkolîna li ser jiyana wan heye. Heta niha li ser wî bi awayekî musteqil pirtûkek hatibe amadekirin jî, bi ya min ev ne bes e. Li ser jiyana, kesayetî û berhemên wî xebat divên. Dema ku mirov li kovarên *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nû* dinihêre, Qedrîcan wek navek ji wan navên ku edebiyata Kurdî ya nûjen xistiye rêyekê tê xuyan.

Me gotibû ku Qedrîcan yek ji nivîskar û helbestvanên kovara *Hawarê* bû. Ji destpêkê heta dawiya kovarê piştgirî lê kiriye û bi berhemên tê de weşandiye rûpelên wê rengandiye. Herwiha di *Hawarê* de ji hêla helbestvanîya xwe ve bi helbesteke nûjen û serbixwe derdikeve pêşberî me. Emê di vê nivîsê de bi taybetî li ser heşt helbestên wî yên di *Hawarê* hatine weşandin bisekinin. Di *Hawarê* de bi tevahî 19 berhem weşandine.

B-Kurtejiyan

Navê wî Evdîlqadir Ezîz Can e. Li gorî gelek nivîskar û rew-

şenbîran ew di sala 1916an de li Dêrika Mêrdînê hatiye dinê.¹ Lê li gorî daxuyaniya Dîlawer Zengî ew di sala 1911an de hatiya dinê.² Dibistana seratayî û ya navîn li Dêrikê xwendiyê, paşê li bajarê Konyayê dest bi xwendegeha mamostetiyê kiriye. Li gorî hinek çavkaniyan, wî dibistana mamostetiyê li bajarê Îzmîrê qedandiye û li Enteqya û Îskenderûnê mamostetî kiriye.³

Ji ber xebatên wî yên Kurdayetiyê tê şopandin, ew û hevalê wî Reşîdê Kurd di sala 1928an de derbasî Binxetê dibin.⁴ Li Binxetê

- 1 Temo, Selim "Qedrîcan, *Kürt Şiiri Antolojisi C II*" Agora Kitaplığı, İstanbul 2007
Dildar, Recep "Qedrîcan" Bîr 8 117-124, 2008
Uzun, Mehmed *Antolojiya Ebebiyata Kurdî Tûm Zamanlar Yayıncılık, İstanbul 1995*
Deniz, Servet "Qedrîcan, Ömer Seyfettin û Çend Pirs" Kovara W 17 Diyarbakir, 2007
- 2 Zengî, Dîlawer *Qedrîcan Weşanên Komal, İstanbul 2005*
- 3 Temo, Jêdera berê 1432
- 4 Dildar Jêdera berê. 118 (Recep Dildar di vê nivîsa xwe de dibêje ku Qedrîcan Xwendegeha Mamostetiyê neqedandiye û hîn di sala çaran de dev ji xwendegehê berdaye û çûye Binxetê.)



di demeke kurt de hînfî Erebî dibe û dest bi mamostetiyê dike. Piştî ku çend salan li Qamişlo û Amûdê mamostetiyê dike, derbasî Şamê dibe û li wir bi cih dibe. Qedrîcan di bin bandora sosyalîzmê de dimîne û bi Partiya Komunîst a Surî re dikeve têkiliyê. Ew û hinek xortên Kurd di sala 1957an de li Moskovê, beşdarî Mîhrîcana Xortên Ciwan a Navnetewî dibin.⁵

Qedrîcan hinek kesayetên navdar wekî Berzanî û Qanadê Kurdo li Moskovê dinase. Gava li wir diçe cem Mistefa Berzanî, helbesta xwe ya bi navê *Serdarê Kurdan Berzanî* diyarî wî dike.⁶ Di hevdîtina xwe û Qanadê Kurdo de çend helbestên xwe yên neçapkirî diyarî wî dike. Qanadê Kurdo vê meselê di pirtûka xwe de wiha dinivîse: "Bona rastîhevhatinê û hevbinê, bona bîranînên min û Qedrîcan me şiklê xwe tevayî kişand û wî deftera çend şê'rên xwe yên çapnekirî pêşkêşê min kir. Herçendî heta niha ew şê'rên bi Kurmancî nehatine çapkirinê jî, ez wan gişkan li vê xebata xwe da bona xwendevanên me yên delal çap dikim. Ji wan şê'ran, şê'ra wî ya bi sernavê *Ez Diçim Mosko* wextê festîvalê di rojnameya *Îzvestiya* de bi zimanê Rûsî hatibû çapkirinê; navê wan şê'ran ev in: *Ez Diçim Mosko, Begê Axirzeman, Rya Teze û Gula Sor.*"⁷ Qedrîcan ji sala 1959an heta sala 1961an di girtîgeha Mezê de radizê. Ji bo kar û xebatên xwe bi rehetî bike carinan derbasî Iraq û Lubnanê jî dibû.⁸

Qedrîcan di sala 1939an de bi Nîlûfer Xanimê re dizewice. Sê zarokên wan bi navên Mizgîn, Şêrîn û Serwer çêdibin. Rojên dawîn ên jiyana xwe li bajarê Şamê dibihurîne. Di meha tebaxa sala 1972an de li bajarê Şamê diçe ser dilovaniya xwe. Mezelê wî li taxa Kurdan, li goristana Şêx Xalidê Neqşebendî ye.⁹ Izzeddîn Mistefa Resûl bi mirina helbestvan Qedrîcan re şînenamayekê di rojnameya *Elteaxî* de belav dike. Ew tê de dibêje ku Qedrîcan şairekî payebilind, nûxwaz û têkoşer bû, wî rajeya neteweya xwe kir û ji bona wê kete zîndan, hat derkirin û azarkirin. Ew çend helbestên Qedrîcan jî werdigerîne Erebî û di wê rojnameyê de çap dike.¹⁰

C- Berhemên wî

Herçiqas Qedrîcan wek helbestvan hatibe naskirin jî, gelek çîrok û kurteçîrok jî nivîsandine. Herwiha wergerên wî jî hene. Ji nivîskarê Misrî Menfelûtî çîrokek bi navê *Tayek Porê Sipî* wergerandiye Kurdî. Ev çîrok di kovara *Ronahî* de hatiye weşandin. Herwiha romana Grîgorî Petof a bi navê *Di Welêt Zembeqê Gewir* de wergerandiye zimanê Kurdî.¹¹ Arîkarî di wergerandina romana *Şivanê Kurd* a Erebê Şemo de kiriye û pêşgotina dîwana yekê ya Cegerxwîn nivîsiye. Pirraniya helbest û nivîsên xwe di kovarên *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nû* de weşandine. Çend helbest li Iraqê di kovarên *Hêwa*, *Gelawêj* û rojnameya *Azadî* de weşandine.¹² Berhemên wî yên heta sala 1960î di destê me de ne. Ji destpêka sala şêstî heta sala hefteyî tu berhemên wî bi dest me neketine. Zengî dibêje, me ji keça wî Dr. Şêrîn Can û mala wan pirsî, lê mixabin tu destnivîs an reşbelek li nik wan tunebûn.¹³

Lîsteya hemû helbestên wî

Helbestên Qedrîcan bi rêzeke dîrokî ev in:

- 1- Berdêlk, Hawar – 1932
- 2- Hesinker, Hawar – 1932
- 3- Di Şorezarekê de, Hawar – 1932
- 4- Tabûta bi Xwîn, Hawar – 1932
- 5- Cegerxwîn, Hawar – 1932
- 6- Xewna Hişyariyê, Hawar – 1932
- 7- Dadê, Hawar – 1932
- 8- Cuhab Lawanî li Diya Hawarê, Hawar – 1932
- 9- Reşbelek, Rojnameya Roja Nû – 1943
- 10- Şîn li ser Giyanê, Rojnameya Roja Nû – 1943
- 11- Rêya Teze, Kovara Ronahî – 1944
- 12- Niştiman Birîndar e, Kovara Gelawêj – 1947
- 13- Şêr Hat Welat û Şêrê Welat, Kovara Hêwa – 1958
- 14- Çardeyê Gelawêjê, Kovara Hêwa – 1958
- 15- Name bo Êstgehê *Radyo Tehran*, Rojnameya Azadî – 1959

5 Temo Jêdera berê. 1432, Dildar. Jêdera berê. 118

6 Dildar jêdera berê. 118. Zengî, jêdera berê 10

7 Qanadê Kurdo, *Tarîxa Ebebiyata Kurdî Özge Yayınları*, Ankara 1992

8 Dildar, jêdera berê 118

9 Zengî, jêdera berê 11

10 http://www.netkurd.info/gotar_bixwine.

asp?id=466& yazid=20

11 Dildar, Jêdera berê 119

12 Zengî, Jêdera berê 11

13 Zengî, Jêdera berê 11

- 16- Karwanê me, Kovara Ronahî – 1960
 17- Begê Axir-Zeman, Kovara Ronahî –1961
 18- Gula Sor, Tarîxa Edebiyata Kurdî Qanadê Kurdo– 1983
 19- Ez Diçim Mosko, Tarîxa Edebiyata Kurdî Qanadê Kurdo – 1983
 20- Şîna Pêşiwa, Serokê Cûmhûriyeta Kurdistan
 21- Heyva Sor
 22- Cejna Oktober
 23- Li Zîndanê Şoreşa me
 24- Şîna Celadet Bedirxan
 25- Serokê Kurdistan¹⁴

Helbestên wî yên Hawarê

Helbestên Qedrîcan ên kovara Hawarê 8 in û heta hejmara 20an meriv dikare rastî helbestên wî were. Jê û pê ve di kovara Hawarê de helbestên wî nînin. Taybetmendiyeke van helbestan ev e ku hemû di nav salekê de (1932) hatine weşandin. Ji ber vê yekê jî ji aliyê naverok, form, teşe û awayê vegotina mijaran bêhtir nêzikî helbesta klasîk têne xuyan. Lê dîsa jî hestên neteweperweriyê weke di helbestên din de cîyekî taybet digirin. Jixwe meriv dikare bibêje ku ne tenê helbestên wî yên Hawarê, di hemû helbest û ne tenê helbest jî, di pexşanên wî de rola ramana neteweperiyê cîyekî taybet digire.

1- Berdêlk¹⁵

-Ji bo loriya Bedirxan-

Rabe mêze ke, hebek li doran
 Te xwe dirêj kir, em pir li ber man
 Êdin mezin û lo lo lawecan

Rabe Bedirxan, dê rabe lo lo!

Berdêlk, helbesta yekem e ku Qedrîcan di kovara Hawarê de weşandiye. Di hejmara şeşan de hatiye weşandin. Meriv dikare vê helbestê weke diyariyekê an weke bersivê jî bide nasîn. Lewra di pêşiya wê de gotiye, *Ji loriya Bedirxan re.*¹⁶ Ji ber



vê yekê, ev helbest weke ji bo dilê Bedirxan xweş û geş bike hatiye nivîsandin, an Qedrîcan avêtiye ber dilê Bedirxan. Qedrîcan bi xwe jî di jêrenota xwe de dibêje, min ev helbest ji bo helbesta Bedirxan a ku di hejmara pêncan de hatiye weşandin nivîsiye. Her du helbest jî bi hejmara qit'eyan yek in. Qedrîcan ji her qit'êke Bedirxan re qit'eyek daniye. Ji bo nivîsa me zêde dirêj nebe ez tenê qit'eyekê didim:

*Dewra felekê li ser me kîn e,
 Bextê me reş, kezab birîn e,
 Mesken ji me re niho nivîn e,
 Binve kezaba min binve lo! lo!*

.....
 (Helbesta Bedirxan Qit'a 4m, Hawar 5.)

*Dewra felekê, eger ku kîn e,
 Razan ji me re, qet bi kêr nîne
 Mesken ne nivîn, darû devî ne,
 Rabe Bedirxan! dê rabe lo lo!*

.....
 (Helbesta Qedrîcan, Qit'a 4m, Hawar 6.)

Bi awayekî zelal dixuyê ku Qedrîcan li ser xebat, hêvî û têkoşînê disekine û weke ku Bedirxan daweta hişyariya ji xewa xefletê dike. Bêguman, helbesta Bedirxan jî pirr muhîm e. Lewra hestên

¹⁴ Zengî, Jêdera berê, 25

¹⁵ Qedrîcan, Berdêlk, Hawar 6, Şam 1932

¹⁶ Loriya Bedirxan di bin sernamê Delaliya Zarowan û di hejmara pêncan, rûpela duduyan a Hawarê de belav bûye. (Ev jêrenot a helbestvan bi xwe ye. Ew helbesta ku behs dike û dibêje di hejmara pêncan de hatiye weşandin û helbestvanê wê Emîn Elî Bedirxan e.)

ku di helbestê de dilivin, şert û mercên Kurdên wê demê jî li ber çavan radixe. Lê weke ku Qedrîcan, van şert û mercan baş dizane û dipejirîne jî dîsa hewlê dide xwe û hevalê xwe ber bi bayê hêviyê ve dikişîne. Helbest bi seranserî li ser bilindkirina têkoşînê rawestiyê.

2- Hesinker¹⁷

Hesinkerek şev û roj, dixebitî ji dil can
Xebata wî zincîrek, ku naqete tu caran

Her carekê ku çakûç, lê dixist dilxweş dibû
Umîda wî qewîtir, hêviya wî geş dibû

Helbesta *Hesinker*, helbesta duyem a ku Qedrîcan di *Hawarê* de weşandiye. Helbest, mijareke ku di navbera helbestvan û hesinker de derbas dibe. Di helbestê de gelek mijar di nava hev de hatine bikaranîn. Tê de ji bo xurtkirina mijarê gotinên pêşyan hatine bikaranîn. Hesinker dibêje, bira toqa dîliyê, bibe polayê zelal gava ku em hewl bidin wê çaxê emê ji dîliyê xelas bibin. Bi xebata me Xweda jî dibe arîkar ji bo me. Zimanê helbestê zelal e. Lewra tu xem û şayîşa helbestekê tê de naxuye. Bi vê dilrehetiyê helbest diherike û xwendevanê xwe aciz nake. Em dikarin vê xusûsiyetê ji her 8 helbestên wî re jî bibêjin.

3- Di şorezarêkê de¹⁸

Ez û hevalekî xwe li ser rêkê dimeşin
Em ji kêra hatine ku da diçin? Napirsin.

Ji halên xwe dizanin em rêwî nin qedîm in
Çiqas zeman dibore xwe bêmeçal dibînin

Ku ev kurteçîrok bi awakî pexşane bihata nivîsandin, dibû ku çîrokeke gelekî serkeftî derketana holê. Lê helbestvanê me ev qîsse bi awakî helbestkî û bi uslûbeke ku bêtir Cegerxwîn bi kar tîne, şixulandiye. Mijar di vê helbestê de dîsa perîşanî, xerîbî, hesret, talankirin, welatparêzî û zilm e. Ev mijarên keserkûr rê li ber pênuşa helbestvan vedikin, helbestvan jî bi dilekî şairane -ku bi kul e, helbesta xwe dirêse. Helbest ji hêla rêbaz,

ziman, teşe û hûnandina rêzikan dişibe ya berî xwe, *Hesinker*.

4- Tabûta bixwîn¹⁹

-Şêx Evdirrehmanê Garisî çû rehme-
Li erdê dinêrim dilopên xwînê
Didime ser şopê çî bibînim ez
Dar û ber, kevir kûç kaş dîkin şîne
Bê hemdî canê xwo diqîrînim ez

Di vê helbestê de Qedrîcan -weke di serê helbestê de jî aniye ziman-, li ser wefata Şêx Evdirrehmanê Garisî nivîsiye. Forma klasîk bi kar aniye. Ji ber mirana wî hestên xwe yê keserbar bi zimanekî zelal û vekirî tîne ziman. Helbestvan, di helbestê de hinek taybetmendiyên ku aîdê însanan ne dispêre lawir û siruştê. Ev taybetmendî di helbesta Qedrîcan de, di gelek ciyan hatiye bikaranîn. Mînak: "*Dar û ber, kevir kûç kaş dîkin şîne*". Mijara helbestê çiqas ku şîna kesayeteke girîng be jî, mesela niştimanperweriyê di nava helbestê de rengê xwe xuya dike. Mînak: "*Kir terk heyat bû, cennet mekan bû/ Bi rehma wî şa bin hemî Kurd û ez*".

5- Cegerxwîn²⁰

Di dema heşê min wenda dibûyî
Mizgînek ji min re hat û got: Bixwîn
Min cegerperitî, min dilhilûyî
Mêze kir ev mizgîn b'navê Cegerxwîn

Şîret yek ji rêûdirba helbestên Qedrîcan e. Di gelek ciyan de şîretkirin dixuye. Di vê helbestê de jî ev rêbaz derdikeve pêşberî me.

6- Xewna hişyariyê²¹

Ax welato ax welato
Roja me zû lê hilato
Bav û birên me çawan in
Çima xeber jê nehato

Xewna hişyariyê xewn û xeyalên Qedrîcan bi xwe ne. Di vê helbestê de jî, mijarên sereke bi awayekî xewnane hatine hûnandin.

17 Qedrîcan "Hesinker" *Hawar* 7, Şam 1932

18 Qedrîcan "Di Şorezarekê de" *Hawar* 10, Şam 1932

19 Qedrîcan "Tabûta bi Xwîn" *Hawar* 11, Şam 1932

20 Qedrîcan, Cegerxwîn, Şam, *Hawar* 12, 1932

21 Qedrîcan, *Xewna Hişyariyê*, Şam, *Hawar* 13, 1932

7- Dadê²²

Buhara jiyîna min bê te payîz e dadê
Bo min diyarê cennet, bê te faîz e dadê
Çêlkewa lingsikestî li pê hevalên xwe ma
Çêlkew ez bim û negrîm qey caîz e dadê!

.....
Di nava helbestên Qedrîcan ên di Hawarê de hatine weşandin, ev helbest a herî nêzî nûjeniyê ye. Mirov dikare bibêje ev helbest di nava van 8 helbestan de bi mijar û naverokê, ya herî serkeftî ye. Bi diya xwe re diaxive. Lewman jê dike. Hesreta xwe pê dabîn dike. Derd û kulên welat parve dike. Pirsgirêkên gel û êşên dilê xwe bi rêyeke nûjen rêz dike li ser kaxizan.

8-Cuhaba lawanî²³

Dadê! Dadê hawarê
Roma, nan ji ber xwarê
Gelekî ez kêfxweş bûm
Ji ber te pirsiyarê

.....
Helbesta paşî weke nameyekê an weke bersiva nameya diya xwe nivîsiye. Ziman û teşe hatiye dubarekirin. Dîsa pirsgirêkên Kurdan û zilma ku li wan hatiye/tête kirin bi zimanekî sivik û herikbar kiriye mijar.

D- Encam

Em dikarin bibêjin ku Qedrîcan yek ji pêşengên şîra Kurdî ya modern a bê wezn tê nivîsîn e. Li gorî wê heyamê şîrên ku nivîsîne gelekî bedew, pêşketî û nûjen in. Em dikarin şîrên wî bidine ber ên şairên wê heyamê. Lê ev nûjeniya helbesta Kurdî ya Qedrîcan pê mijûl bûye, di helbestên wî yê Hawarê de zêde dernakeve pêşber. Lewra bi qasî ku em dizanin helbestên xwe yê pêşî di kovara Hawarê de weşandine û ji van helbestan bêhtir bêhna helbesta klasîk tê.


Zimanê wî yê helbestê, zimanekî xwerû û gelêrî ye. Qedrîcan herçendî demekê di dibistanên Osmanî û Tirkî de xwendibe jî, bandora xwendina wî ya Tirkî di nivîsarên wî de naxuye. Bêhtirîn devoka Mêrdînê bi kar aniyê. Zimanê wî zelal û hêsan e. Belê, ku nivîsarên wî hûrik hûrik bêne dahûrandin,

dê bixuye ku wî zimanê tevahiya Kurdistanê vekoliye, guhdarî kiriye an jî bihîstiye. Mînak di cihekî de peyva "nola" bi kar aniyê. Ev peyv li hêrêma ku Qedrîcan zarokatiya xwe lê derbas kiriye tuneye. Bêhtir li Riha û deverine din tê bikaranîn peyva "wisa" herçiqas li herêma wî tunebe jî di şîra wî de heyê. Ev dide nişandan ku Qedrîcan bi awayekî gelêrî helbest nivîsiye. Di şîrê de ziman rast û rê bi kar aniyê. Zêde cih nedaye remzeyan.

Piştî sala 1944an şekl û mijarên helbesta wî diguhere. Li ser lehengên navdar helbestan dinivîse. Mînak, *Berzanî Berzan, Şer Hat Welat, Serokê Komara Mihabadê* û hwd... Hin helbestên niştimanperwerî û şoresgerî jî hene. Minak; *Dadê, Heyva Sor û Rêya Teze...* ❁


ÇAVKANÎ

- Cewerî, Firat, "Kultur, Huner û Edebiyat" Weşanên Nûdem, Stockholm 1996
Deniz, Servet, "Qedrîcan, Omer Seyfettîn û Çend Pirs" Kovara W 17, Diyarbekir 2007
Dildar, Recep, "Qedrîcan" Kovara Bîr 8, Diyarbekir 2008
Dost, Jan, "Nûjeniya Me" Kovara W 18, Diyarbekir 2007
Qanadê Kurdo, *Tarîxa Ebebiyata Kurdî Özge* Yayınları, Ankara 1992
Temo, Selim "Qedrîcan" *Kürt Şiiri Antolojisi C II* Agora Yayınları, İstanbul 2007
Uzun, Mehmed *Antolojiya Ebebiyata Kurdî Tûm Zamanlar* Yayıncılık, İstanbul 1995
Uzun, Mehmed *Kiüllerinden Doğan Dil ve Roman İthaki* Yayıncılık, İstanbul 1995
Yetişir, Zozan "Ji Rewşenbîrên Kurd: Qedrîcan" Kovara Mizgîn 45, Diyarbekir 2009
Zengî, Dilawer *Qedrîcan Weşanên Komal*, İstanbul 2004
Zeraq, Dilawer "Wêjeya Kurdî ya Li Sirgunê Rengekî Nostaljik Girtiye" Kovara W 18, Diyarbekir 2007



22 Qedrîcan, Dadê, Şam, *Hawar* 14, 1932

23 Qedrîcan, Cuhaba Lawanî, Şam, *Hawar* 20, 1932



Biro*

Rahmetullah Karakaya

N

ivîskarê hêja Yılmaz Çamlıbel, serhildana Gilîdaxê, di romana xwe ya "Biro" de, bi zimanekî zelal û rengîn, pêşkêşî xwendevan kiriye.

"Biro", ji sehîfa pêşî heta ya dawiyê, di nav meraq de û bi dil tê xwendin.

Gava ku min berhem girte destê xwe, heya xelasbûnê, roj û şev, di bin tesîra wî de mam.

Beriya her tiştî, zimanê wî tê fêmkirin. Teswîrên ku nivîskar tîne ziman, xwendevanan di carekê de dibe ser Gilîdaxê.

Di wê deqê de meriv xwe di nav rext û çekan da dibîne.

Dibe şervanên ser Gilîdaxê.

Di dîroka Gilîdaxê de, jiyana Kurdan, kul û derdên Kurdan, zilm û zordestiya dijminan, şerê hebûn û tunebûnê mîna filmekî di ber çavan re derbas dibe.

Meriv xwe di carekê de li Bazîdê dibîne. Dibe Biroyê Heskê Têlî, li ser Çiyayê Agirî dikeve xewn û xeyalan.

Dibe hevalê wî yê qedîm Cîhangir. Dibe birê wî Eyûb. Dibe herdu kurên wî Qulixan û Dawo...

Dibe Ferzende Beg, dibe Şêx Zahar, dibe Tîmûrê Şemsikî, dibe Çerxo, dibe Xalis Beg, dibe Nûman Efendî, dibe Ehmedê Hecî Biro, dibe Kor Hisên Axa.

Dem dema biharê ye. Serê Agiriya mezin dîsa mij û dûman e. Guje guja bayê Elegazê ye. Axa Çiyayê Agirîyê, ji xewa zivistanê hişyar bûye. Qeraxê Agirîyê, bi kulîlkên biharê ve, wek xalûçên Mehabadê, bi heft rengan hatiye xemilandinê. Berfên ser Agirîyê dihelin. Xuşe xuşa çemên piçûk, li nav kirê Gilîdaxê tê bihîstinê.

Bêhna gul, sosin û rihanan, wek parfumek bêhampa, li ezman belav dibe...

Her carê, piştî şêwr û mijûlbûnê, ew dua li pale û zinarên Agirîyê dikeve, paşê dikişe ezmanan:

-Xwedê alîkarê we be. Per û baskê Ehmedê Xanî, li ser serê we be.

Hinek heval û nasên me, "Em nivîsên Kurdî dixwînin, lê fehm nakin" dibêjin.

Di dîroka Gilîdaxê de, jiyana Kurdan, kul û derdên Kurdan, zilm û zordestiya dijminan, şerê hebûn û tunebûnê mîna filmekî di ber çavan re derbas dibe

* *Biro-Romana Serhildana Agirîyê*, Weşanên Deng, Sibat 2010.

Ez bi dilekî geş, ji wan re wiha dibêjim:

-Romana Biro bixwînin... Heya xelasbûnê hûnê nikaribin wê ji destê xwe berdin.

Zimanekî şîrîn

Gotina xwe kêm dibirim, xwendevanan bi hinek beşên "Biro" re rûbirû dihêlim:

Biro, bi devkenî got:

-Ez heyran ca piçekî sebir bike, ez bêjim. Nuha em werin ser dewra Mistefa Kemal. Ingilîzan ji Kurdan re digotin: "Emê ji bo we dewleteke Kurdan ava bikin", ne wisa? Mistefa Kemal jî ji Kurdan re digot: "Guh nedine gotinên Ingilîzan. Kafirê Ingilîz we dixapîne. Em du millletên Misilman in. Emê bi hev re dewleteke mişterek ava bikin. Padîşahê Îslamê, ji deste kafiran xilas kin."

Li ser van gotinên Mistefa Kemal, gelek Kurd çûne cem wî. Tiştê ku Xwedê dizane, ez çima veşêrim. Min jî alikariya Mistefa Kemal kir.

.....

Mistefa Kemal digot: "Şêx Seîd ajanê Ingilîzan e. Arîkariya wî nekin."

Me jî nekir. Kur û birayên Şêx Seîd Efendî, dixwestin derbasî cem Simko bibin. Li ser daxwaza dewleta Romê, em derketin pêşiya wan. Me xwîna hev rijand. Ji hev mêr kuştin.

Biro, bi şermî destê xwe dirêjî Ferzende Begê kir û got:

-Aha ev camêrê ku îro di nav cimaeta me de rûniştiye, di nav wê qeflê de bû. Ez niha fedî dikim li rûye wî camêrî binêrim.

Ferzende, zivirî ji Biro re got:

-Birahim Axa, ew mesele derbas bû çû. Gelek tişt hatin guher-

tin. Gava wext hat, emê li ser vê meselê xeber bidin.

.....

Sifra taştê, di çadira Biroyê Heskê Têlî de hatibû amadekirin. Li ser sifrê, penêrê bi mendik, to-mast, mastê miya, hêka qelandî, rûnê nivîşkê û toraq hebû.

Li derdora sifrê, nanê lawaş hebûn. Di nav demlikek porselen de çaya Îranê hatibû demkirin. Gurpe gurpa ava semawerê bû. Bêhneke rind, li nav çadirê belav bibû.

Nan û ava welat

.....

Biroyê Heskê Têlî, Ferzende Beg, Şêx Zahar, Têmûrê Şemsikî, Çerxo, Xalis Beg, Nûman Efendî, Ehmedê Hecî Biro, Cîhangir, Eyûb li dora sifrê rûniştibûn.

Xalis Beg, nanekî lewaş xiste nav nanê xwe. Paşê, gezek mezin lêxist. Pariyê gezkirî, di nav devê xwe de bir û anî. Bi kêfxweşî daqurtand û got:

-Oxxweeeş! Gelo di dinyayê de, ji vê rindtir xwarin heye! Wey ez qurbana nan û ava welatê xwe bim. Şikir ji Rebillalemin re... ez dîsa li ser sifra tomast, penêrê bi mendik, mastê miya, rûnê nivîşkî û toraqê rûniştî me. Êdî mirin di telaşa min de nîne.

.....

Rojek serê nîvro, ji nişkê ve gurmîniya def û zurnê li ser ezmanê Gri Kesk belav bû. Cimaeta ku li çadira Biro kom bibû, li çavên hev nihêrin. Paşê ji çadirê derketin derve. Dîtin ku di pêşiya konên jinan de, govendek digere.

Mirdesî, destmalek sor di dest de, sergovendiyê dike. Tev mêr û jinên serhildanê, destê hev girtibûn, direqîsîn.

Koma mêran, ber bi dawetê meşiya. Ber bi def û zurnê ve çûn, pêşwaziya wan kirin. Govend sekinî. Mirdesî, çû ber Ferzende Begê sekini û jê re got:

-Ferzende Beg, tu jî wek Biro, kurê min î. Ev sê sal in tu, ji bermaliya xwe dûr î. Şikir ji Xwedê re, hûn dîsa gihîştine hev. Ev dawet, daweta te û Besê ye.

Biro, piçekî sekini, çavê xwe li ser cimaetê gerand:

-Geli Celaliyan. Ev şerê min û Roma nîne. Ev şerê me hemûyan e. Îro Rom, dixwaze min bişîne nefiyê. Sibê wê yekî dinê bişîne. Îro Rom hatiye ser min, dê sibê were ser yekî dinê. Rom dixwaze, tev eşraf û axalerên me bişîne nefiyê, wan serindayî bike.

.....

Bêrivan diçûn bêriyê

Di nav eşrên Celaliyan de, wext bi kar û barên rojan derbas dibû. Her roj sibê zû, şivan pezên xwe, gavan dewarên xwe, berxvan jî berxên xwe, ji bo çêrandinê ber bi mêrg û çîmenan diajotin.

Rojê du caran pez dihatin dotin. Bêrivan diçûn bêriyê. Mî dixistin rêzê. Şivan, li ser keviran rûdiniştin, serê miyekê hildidan bin milê xwe yê rastê, yek jî hildidan bin millê xwe yê çepê, ew zebt dikirin. Du bêrivan, pêşberî hev rûdiniştin, mî didotin. Di wê demê de hinek miyan bişkulên xwe berdidan nav sîtilan. Bêrivanan sîtilên şîr hildidan diçûn nav zoman. Berê şîrên xwe parzûn dikirin, bişkul davêtin derve. Paşê şîrên xwe dikelandin. Dikirin mast û toraq.

.....

Ferzende Beg, piçekî sekini. Li çavên şervanan nihêrî. Tev

şervanên Agiriyê, bê tirs li nav çavên Beg dinêhirin. Ferzende Beg, bi kêfxweşî, axaftina xwe wiha domand:

-Qehremanên serhildana Agiriyê! Bi îzna Xwedê, emê wisa bikin ku leşkerê Romê, wek garanekê li peşiya me birevin. Nuha herin nav konên xwe. Li benda Cîhangir bisekinin. Emrê dawiyê, wê Cîhangir bide we. De rabin oxira we ya xêrê be. Hezretî Xanî li piştta we be. Gilîdax we biparêze.

.....

Kor Hisên Axa, serokeşîrê Heyderan bû.

Ji Osmaniyan re gelek xizmet kiribû. Piştî hilweşandina dewleta Osmaniyan, ketibû bin baskê Kemalîstan. Dewleta Tirk, jê çî dixwest, bê teksîr dianî cî. Li ser binketina şerê Şêx Seîd Efendî, bira, kur û hevalbendên wî, dixwestin di ser Patnosê re derbasî

Îranê bibin. Herin bigihêjin Simko Axa. Li ser emrê dewleta Tirk, Kor Hisên Paşa, derkete pêşiya wan. Sê rojan bi wan re şer kir. Gelek meriv hatin kuştin.

Li ser evqas xizmetan, dewleta Tirk, dîsa malbata Kor Hisên Paşa, sirgûnê Aydinê kir.

.....

Gilîdax bê xwedî ma

Fîşengên Biroyê Heskê Têlî, xilas bûbûn. Bi xwe jî, ji sê ciyan birîndar bû.

Tivinga xwe danîbû ser sînga xwe. Piştta xwe dabû zinarekî, li benda mirina xwe sekinîbû. Di laşê wî de, tu mecal nemabû. Edî çavên wî dihatin girtin.

Dengek hate guhê wî. Bi zor û zehmet, çavê xwe vekir. Dît ku mifrezek ordiya Îranê, der û dora wî girtiye. Qumandarê Îranê, jê re got:

-Ger tu tivinga xwe bidî min, ezê îzin bidime te ku derbasê Îranê bibî.

Biro, gotina wî qebûl nekir.

Qumandarê Îranê, hat li pêşiya Biro sekinî. Destê xwe avête tivinga Biro, bi zorê stand.

Biro, bi zor û zehmet rabû ser piyan. Destê xwe dirêj kir ku tivinga xwe paş de bistîne. Di wê deqîqê de, leşkeran gulle barandin ser Biro.

Biro, axînek kûr kişand û got:

-Heywaxxx! Gilîdax bê xwedî ma!..

Û deverû kete erdê...

.....

Gotina dawî ew e ku ji nivîskar Yılmaz Çamlıbel re jidil dibêjim:

-Şîrê dayika te li te helal be Kekê Çamlıbel, ku te ev berhema delal û xweş nivîsandiye... ❁

Girtî me

Kamran Simo Hedilî

çarenûsa min
di zinarên asê de
asê bûye
giyanê serhildan û dostaniyê
di xefkên xapînok de dirizê
xweliya helbestên min
tariyê vedişêrin
temenê min
agirê dojecha Nemrûd e
li çaxê paşmayî
ez zû hatime dinyayê
stêra jê ketim
nayê bîra min
û stêra min tu lê maçkirî

ji bîra min çû
dil hezkirina min bû
ji ber wî
ji te
ji hevjin û evîna te hez dikir
hêviyê hêvî dida min
ku ez bigihim te
evîndara
kolanên evîna min birîndar
ez
di girtîgeha demê de girtî me
û dilê min
bûye birca ketî destên neyaran

12.03.2011



Bûyerên dawîn û rewşa me

Murad Celalî

muradcelali@gmail.com

Bi bayê bezê gelek tişt diguherin. Mirov çî çaxî li nûçeyan binihêre, wekî navê xwe rastî bûyereke nû tê. Bi piranî jî nûçeyên di eleyhê mirov û mirovahiyê de. Jixwe ev jî rastiyeke jîyanê ye. Tu car mirov nikare pêşîra xwe ji wê xelas bike. Lê qet nebe divê mirov ji xwe re hawilekî bike da ku nebe ji wan kesên bêdeng û his. Hema çî ji destê merivan bê pêwîst e ku wê bike, şerm neke, nebêje ev hindik e û yan bêtêr e. Lewra dê rojekê, heke bibe nesîb dê bi kêr bê û bibe sedemê qencyê.

Wekî min li jor jî got, sermaya me ya di dest me de her roj hinekî din kêr dibe û dihele. Tu ji kîjan aliyê ve lê binihêrî ev yek wisa ye. Em kal dibin, emrê me kin dibe, çand û gencîneyên me yên di bîr û hişên pîr û kalên me de, yek bi yek bi wan re diçine gorê, dibine xwarina mar û mişkan. Çima? Ji ber ku di nav me de, li cem gelê me nivîsîn, qeyd û tomarkirina hêmanên wekî zargotin, gotinên pêşyan, kilam, stran, bîr û bawerî û hê gelekên dinê ku çanda me pêk tînin, nebûye adet.

Berê di serdema cahiliyeyê de ji bo Ereban nivîs, nivîsîna tiştan

şerm bû. Ewana bi hiş û bîra xwe ewlê bûn û loma bi hêza helbesta xwe bawer dikirin. Çî tiştên ku dixwestin ji bîra nekin, bi helbestkî digotin û nedihîştin ew winda bibin. Ji ber vê di nav wan de helbest gelekî bi pêş ket. Wan bi helbestê hem zimanê xwe yê xurû parastin û hem jî dîroka xwe ragihandine nîfşên ayende.

Piştî hatina Îslamê nivîs û xwendin di navbera wan de jî bela bû û bû adet. Gava bîr û nivîs gihîşte hevdu, êdî derfetekî teze derkete holê. Ango ew dewlemendiya pirtûkxaneya Îslamî encama vê rastiye ye. Lewma êdî îro pirtûkxaneyêke dewlemend heye û hemû cîhan dikare jê wec werbigire.

Lê herçendî di nav me Kurdan de adet û baweriyeke wisa tunebe jî, meriv dibêje qey ew nexwaşiya nerind a ku êdî di dîrokê de maye, ji wan derbasî me bûye. Tu dibêjî qey zana û rîspiyên Kurdan sond xwarine ku dê heta hetê nenivîsin, astengan têxine navbera xwe û pênuşê. Yên dinivîsin jî yan tiştên berê hatine nivîsin dubare dikin û yan jî çav didine xelkê û dikin ku bişibine wan. Ev rewşa

Tu dibêjî qey zana û rîspiyên Kurdan sond xwarine ku dê heta hetê nenivîsin, astengan têxine navbera xwe û pênuşê. Yên dinivîsin jî yan tiştên berê hatine nivîsin dubare dikin û yan jî çav didine xelkê

kambax li aliyekî, di hêla din de ji ber van navgînên mîna telewîzyon, radyo û înternetê di van axiriyan li ser rûyê cîhanê bela bûne, ji bo mirovahiyê bûne hewcedariyên sereke, malik li me û tevî cîhanê xirab kirine. Ji çar niqarên cîhanê serê mirovahiyê ketiye belayê, êdî nikarin xwe ji vê xelas bikin. Ango rêveberê vê hêza nûjen kê be, ew li ser mirovahiyê hakimê bê şîrîk e û bi wî hefsarê di destê xwe çî bixwaze bi wan dide kirin. Lewra bi dilê xwe dikeve hemû deran.

Jixwe ew gelê me yê teralê xwendin û hînbûnê, dev ji xwe, bi tevayî hemû kevneşopî û kelepora xwe berdane û bûne bengiyên van navgînên bêgîyanên bi zîman. Êdî hewcedarî bi şer, çek û pevçûnên berê nemaye. Neyar bi hêsanî serdikeve, em jî bi dil û can, him jî bi kêf û eşq dibine zebûnê wan.

Lewma ew Kurdên bi sedsalan li hember hêzên dagirker berxwe-dan, zîman û çanda xwe parastin, îro êdî ketine nav lepên wanê qirêj. Dikin nakin nikarin xwe ji van tele û dolabên wan bifiltînin. Herweha ew kesên li ber vê sê-lava pişaftinê roda çûne, vedigerin li ber wanên li ber xwe didin dibine edûw û asteng. Gava yek bixwaze xwe û malbata xwe ji vê şeteleyê biparêze, loma li wî dikin û wî wekî ew kesekî paşverûyê bêfîrasê be nîşan didin.

Di hêla di de ew hêzên dagirkerê taxûti, ne guh didine hed û hidûdên Xwedê û ne jî mineta wan li zagon û rêgezên navnetewî heye. Gava dilê wan bixwaze hî-nek guherînen ku êdî bi kêrî tu tiştî nayên û nabine derman —wekî vekirina televîzyon û radyo, qurs û beşên di zanîngeh de— dikin, him jî ligel gelek berbend û astengên

Bi kurtasî ev rewşa me ya diltezîn, ne elametê xêrê ye. Divê gelê me bi bîrewerî tevbigere, xwedî li zîman û çanda xwe derkeve, zar û zêçên xwe li gor wê mezin bike

ku nahêlin xêra wan bigihêje gel derdixin. Van pêngavana jî tenê ji bo berjewendiya xwe û xapandina sazî û rêxistinên eleqedar yê rojhilatî diavêjin.

Dema daxwazeke heyatî, here guhê wan mîna kerr û korên zikmakî deng û hisê xwe dibirin, qet eynî xwe naynin. A vaye van rojên axiriyê dîsa li ser perwerdeya zîmanê dayikê gelek gengeşî tîn kirin, lê dewleta digirker tu dibêjî qey ev daxwazeke wisa ye ku di dîroka mirovahî û şaristaniyê de nehatiyê bihîstin û ne jî hatiyê bînan, lewma wekî gurên har ê li ser beratana dij derdikeve. Bi sedsalekê gelê Kurd bi tevayî înkâr kirin, îro jî dibêjin heye, lê naxwazin zîmanê wan ê ku nîrxekî sereke ye, bimîne. Loma heya ji destê wan tê ji bo vî mafê resen neyê dayîn dilikijin.

Bi kurtasî ev rewşa me ya diltezîn, ne elametê xêrê ye. Divê gelê me bi bîrewerî tevbigere, xwedî li zîman û çanda xwe derkeve, zar û zêçên xwe li gor wê mezin bike. Lewra meriv çî qasî xwe ji wan, sazî û dezgehê wan ê qaşo ji bo perwerdeyê, lê ya rastî ji bo pişaftinê hatine damezîrandin dûr bigire û alternatîfên xwemalî çêbike baş e.

Ji bo ku vê rewşa xeternak bibînin, hema derkevin derva, li kuçe û kolanan, li der û dora

xwe binihêrin, wê hingê rastîya van gotinên min derkevine pêşîya we. Hûn çî çax merivekî di dibistanên dewletê de xwendiyê, bûye xwedî meqam û mal bibînin, hûnê bibînin ku bi qasî wê ji zîman û gelê xwe, ji bîr û bawerîya xwe dûr ketiye, bi qasî wê xwe wekî endamê civaka xwe ya rastî nabîne û bi pozbilindî li wan dinihêre. Gava li derekê rastî wan tê, ji ber wan şerm dike, eslê xwe înkâr dike. Heya ji destê wî bê bi wan re têkiliyê danayne û xwe ji wan ta dike. Malbata xwe ji wan diqetîne, zarokên xwe ji wan dûr digire.

Lê gava mirov wan zarokên li kuçe û kolanan digerin, tiştan difiroşin, solan boyax dikin dinihêre, wan xortên ku di însaet û pazaran de dixebitin dibîne, mirov lê dinihêre hê di nav wan de zîmanê Kurdî serdest e, bi wê kar û barê xwe dimeşînin. Bi taybetî jî divê mirov bala xwe bide wan zarokên li kuçe û kolanan. Gelo çima? Cudahiya di navbera van herdu çînan ji ber çî ye? Helbet îstisna hene, lê ev wêneyê giştî ye û rastîyeke xedar e.

Belê, sedema wê tenê yek e. Ew kesên derfeta xwendinê dîtine, tevî wan kesên serdest bûne û ji civaka xwe qetiyane, ketine ber çerxa wan, ew çerxa asîmilasyonê. Yê din jî ji Xwedê de neketine ber lepên wan û hesbelqeder xwe ji wan parastine. Loma divê em civaka xwe ji wan biparêzin da ku qirêja asîmilasyonê bi me jî negere. ❁

Paşeroja Rojhilata Navîn ber bi ku ve diçe?

Mela Mûhemmedê Bêrkevanî

Bi navê Xwedayê dilovanê dilovîn.

Hemd ji Xweda re be. Dirûd û silav li ser rêzan û bînahiya çavên me pêxemberê Xweda Muhemed, ehl, eshab û peyrewên wî bin.

Herçî rojhilata navîn e, aloztirîn devera dinyayê ye ku heta îro jî pirsgirêkên xwe çareser nekirine û li gorî çavdêriyên min ewê di demeke kurt de jî asêpîrsên xwe nikaribe çareser bike. Lewra jêdera hinek pirsgirêkên wê Emperyalîzma Rojava ye ku di paşwexteke nêz de xelkên deverê dê nikaribin serê xwe ji afir û cihêrên wê derxin û gerdana xwe ji nîrê wê azad bikin. Herwiha jêdera hinek pirsgirêkên wê jî ew fikr, bîrewerî û nijadperestîya ku li herêmê bi xwe zal û desthilat e.

Herçî pirsgirêkên rojhilata navîn yên ku jêdera wan Emperyalîzm e jî ev in:

1. Emperyalîzma Rojava bi taybetî jî Brîtanya û Fransa li gorî peymanî Sykes-Pîkoyê li ser masayê bi pêkar û cedwelên xwe yên bêqudûş û mêhtingerane tixûbên deverê xîjk kirine û hinek dewletên qewmî tê de dane

damezirandin. Bi vê plana xwe ya şeytanî hesabê sed salî kirine û bi damezirandina dewletên deverê re hev kêşî û beraberîya deverê serûbin kirine. Wan kiriye ku heta sed salî jî dever bi xwe neyê û neyê ser hemdê.

2. Ev dewletên qewmî yên ku Emperyalîzmê dane damezirandin jî ew rehet û serbest nehiştine, hev kêşîya nava wan jî bi destên xwe û bi awayê ku xîzmetê ji wan, meslehet û berjewendiyên wan re bike, rêxistine; desthilatiya wan xistine destê hindikahiyên ku li wan dewletan hene. Bi vî awayî ew rêvebir û desthilatdar bivên-nevên nikarin ji binê bandor û wesiyetên axayên xwe yên kolonyalîst derkevin û siyaseteke serbixwe û hekîmane bişopînin.

3. Dema Emperyalîstan sîno-rên wan dewletên qewmî xîjk kirine, bi zikreşî, zulm, bêwijdanî û bê edaletîyeke wisan xîjk kirine ku heta sed salan ew pirsgirêk neyên çareserkirin û herêm jî rûyê aramî, aşti, biratî, pêşveçûn û geşbûnê nebîne. Ew tim di nakokî û îxtîlafên xwe de noq bibe û xelk û rêvebiriyên wan bi qirika hev ve bimînin. Her tim di navbera wan

Herçî rojhilata navîn e, aloztirîn devera dinyayê ye ku heta îro jî pirsgirêkên xwe çareser nekirine û li gorî çavdêriyên min ewê di demeke kurt de jî asêpîrsên xwe nikaribe çareser bike

de nakokiya tixûban û şerrên navxweyî û deverî biqewimin. Bi vî awayî ji wan re jî behaneya desttêwerdanê were meydane.

4. Hinek ji wan dewletên qewmî yên ku dane dameziran-din jî di rastiya xwe de tu derfet û îmkanên wan yên jiyana ser-bixwe tunebûne. Bes ew ji bo hinek armanc, xizmet û hedefên Emperyalîzmê hatine dameziran-din. Mirov dikare nimûneya vê jî dewletên Kendavê bide.

5. Dema ew dewlet dane dameziran-din jî rejîmên wisan ji hev re dij û nakok li teniştê hev dane çes-pandin ku ew tim dijatiya hev bikin û tu car nikaribin werin li kêleka hev rûnin, li derdên hev guhdarî bikin û ji bo pirsgirêkên xwe bi hev re li çareseriyên bigerin.

Herçî pirsgirêkên Rojhilata Navîn yên ku jêdera wan dever bi xwe ye jî ev in:

1. Di parvekirina deverê de ji hinek xelk û qewman re **“pişka şêr”** ketiye û pariyê mezin bûye behra wan. Hinek xelk û qewm jî yan hîç tu pişk ji wan re neketiye, yan jî pişka kêr li behra wan ketiye. Ew jî ji statûya xwe hîç ne memnûn in. Bi vî awayî hevkêşî û beraberiya deverê serûbin bûye, ew ji hev ketiye û xirab bûye.

2. Ew xelk û qewmên ku **“pişka şêr”** li behra wan ketiye, ne amade û razî ne ku heqê birayên wan yên ku bi ser wan ve hatiye li wan vegeşandin û bidin wan. Di wê dewleta qewmî ya ku li ser navê wan hatiye çes-pandin de ne hazîr in ku serwet û desthilatîyê bi birayên xwe re parve bikin. Ev jî bûye û dibe sersedema şerrên navxweyî û wêranbûna aborî, çandinî, xizanbûna pirranî û paşmayînê. Mirov dikare nimûneya vê jî

Li welatên Îslamê gelek sebebên serhildan, xwepêşandan û prote- stokirinan hene. Di serî de jî feqîrtî, bêkarî, bêdaletî û dîktatorî tê

dewletên wekî Sûdan, Çat, Etyopya, Îran, Iraq, Tirkîye, Yemen, Cezaîr û Pakistanê bide.

3. Ew tixûb û statûyên ku ji aliyê Emperyalîzmê ve hatine sepandin û diyarkirin ji terefê wan xelk û qewmên ku **“pişka şêr”** li behra wan ketiye ve wek eqîdeyêke dînî, fermaneke îlahî û baweriyêke pîroz û zehf muqeddes tên dîtin û parastin. Êdî tu kes nikare rexne li wan bigire, bi awayekî jidil rakirina wan bîne rojevê û heqê millet û malbatên ku hatine perçekirin biparêze. Nimûneya vê jî mirov dikare wan dewletên ku Kurdistan di navbera xwe de parvekirine nîşan bide. Ew wan tixûbên ku Emperyalîzm danîne û xedreke mezin li milletê Kurd kirine ji bo xwe wekî ku ruknekî pîroz yê Îslamê be, ji xwe re ewqas mubarek dijmêrin. Lewra ew li meslehet û berjewendiyên wan û li xisara milletê Kurd e.

4. Li deverê qewmên ku pişka şêr li behra wan ketiye Ereba, Tirk û Faris in. Qewmên ku tu pişk li behra wan neketiye, pêşî ji terefê Emperyalîzmê ve û pişt-re jî ji terefê birayên xwe yên ku pişka şêr li behra wan ketiye ve hatine mehrûm û bêparkirin jî ev in: Kurd, Belûç, Qibtî, Amazîxe, Berberî, Nûbiye, Darfûrî, Aşûrî û hinek qewmên din yên ku ez navên wan nizanîm.

Durûtî û nîfaqa siyasî

Di dema ku min ev gotar dinivîsand de li gorî nûçeyên kanalên ragihandinê rêberê şoreşa Îranê Seyyid ‘Elî Xamaney hevzemî, palpiştî û piştgiyaya xwe ji bo serhildêr, şoreşger, xwepêşandêr û protestokarên welatên Îslamê diyar dikir û ji wan re temenniya serkeftinê dikir. Herwiha serokwezîr û rayedarên hikûmeta Tirkan jî gazî li rayedarên welatê Îslamê yên dîktator dikir ku ew guhên xwe bidin deng û daxwazên gelên xwe. Di vê navê de dîktatorê fermannerewayê Sûriyeyê Beşşar Esed jî di dema destpêka protestoyên gelên Tûnis û Misirê de îlan kir ku her divê rejîmên dîktatorên Ereba ji serhildanên xelkê xwe ders bistînin û di cih de dest bi reforman bikin.

Belê, eger navlêka durûtî û nîfaqa siyasî ji bo hinek mirovan durist be, bêguman ewê ji bo rayedar, karbidest û hikûmetên van dewletên zalim û dîktator caiz û durist be. Lewra bi qasî ku li van welatan daxwazên xelkê wan bi rêbazên serkutkirin, çewisandin, perçiqandin û ji holê-rakirinê tên bikaranîn ew li tu welat û deverên din yên cihanê nayên bikaranîn; eger zehf werin bikaranîn jî bes bi qasî dijiwariyên van welatan tên bikaranîn ne zêdetir.

Bi destûra we, em awireke hûr li ser hinek axaftin û gefên rayedarên van welatên qaşo piştevanên protestokarên azadîxwaz bigerin. Em bala xwe bidin helwesta hikûmeta Tirkan ya derveyî û navxweyî; ew li derveyê Tirkîyeyê hevalbend û piştevanê serhildêr û azadîxwazan e, lê bi şertê ku ew azadîxwaz ne Kurd bin. Dema za-

rok li deverên dinyayê yên wekî Filistîn û Uyguristanê tên kuştin li ser wan digrî û bê dudilî û tereddud şermezar û protesto dike û dibêje: Ev jenosîd û tevkujî ye! Lêbelê dema ku zarok, protestokar û azadîxwazên Kurd ji terefên hêzên qaşo ewlekariya Tirk, Sûrî û Îranê ve tên kuştin deng ji wan dernayê û bi sikûta xwe erê û qebûl dikin. Dema ew diçe dewletên wekî Almaniyayê yên ku gelek derbeder û koçberên Tirk lê hene, rexne li polîtîkaya hikûmeta wî welatî digre û dibêje: Gelî hemwelatîyên min! Pêşî Tirkî baş hîn bibin, paşê Elmanî, bi ciwaka Almaniyayê re entegre bibin lêbelê asîmîle nebin! Herwiha li pêşberê çapemeniya Alman û dinyayê dibêje: "Asîmîlasyon sûcekî însaniyetê ye." Yanî ew ne sûcekî wisan e ku li dijî çend mirovan tenê hatiye kirin; lêbelê sûcekî wisan e ku li dijî temamê însaniyetê hatiye kirin. Lêbelê dema ew li Tirkiyê vedigere û rojnameger jê dipirsin; rewşa Kurdî dê çawa bibe, tu dê çawa wê pirsê çareser bikî? Dibêje: Me hemû astengên qanûnî ji pêşiya Kurdî rakirine, kî bixwazê dikare fêrgeha xwe veke û tê de Kurdî hîn bibe, lêbelê bila tu kes hêviya perwerdeya bi Kurdî ji me neke. Li Tirkiyeyê zimanê resmî û yê perwerdeyê bes Tirkî ye.

Em awireke hûr li ser hinek axaftin û gefên rayedarên Faris yê qaşo piştevanên protestokarên azadîxwaz bigerînin. Ew piştevaniya xwe ji bo protestokarên Tûnisî û Misrî yê li dijî dîktatorên wan welatan diyar dikin. Lêbelê li welatê xwe ji hurmet û rêzgirtina ji bo heqê gelên wekî Kurd, Belûç û Ereban re neke behs! Ew li hemberî protestokarên ku heta



Dîmenek
ji bûyerên
Sûriyeyê

beriya çendekê terefdarên wan bûn jî rêbazên hovane û neînsanî bi kar tînin, ji mîlîsan bigre, heta bi pesdaran, ji polîsan bigre heta bi artêş û besîcan. Ew temaman bi kar tînin û bi hezaran xelkê dixin bin çavan û şkençeyê li wan dikin. Heta bi gotina Mehdî Kerrûbî "rêbazên şkençeyê yên ku rejîma Îranê li hemberî reform-xwazan bi kar tîne, Siyonîstan hê ew li hemberî xelkê Filistînê bi kar neaniye!" Naxwe tu mane ji wê piştevaniya wan re nîne.

Jixwe rejîma nerewa ya Sûriyê û zulm û zordestiya wê ewqas eşkere ye ku hewce nake mirov behsa barbarî û wehşeta wê bike. Terefdarên rejîmê ji navbera xelkê Sûriyê ne zêdetirî 16% e. Ev jî nerewatiya wê radixe ber çavan. Nexwe ew rejîma hindikahiyê ye; ne ya temamê xelkê xwe ye. 3 mîlyon û nîv Kurd ji temamê mafên xwe mehrûm in. Bi qasî 400-700 hezar Kurd jî ji mafê welatîbûnê jî mehrûm kirine û nasnameya Sûrîtiyê jî ji wan standiye. Ji xwe rewşa xelkê Sûriyê ya maddî bi taybetî ya Kurdan belkî ji ya Efrîqayê jî kambaxtir e!

Protestokar ber bi ku ve diçin?

Li welatên Îslamê gelek sebebên serhildan, xwepêşandan û protestokirinan hene. Di serî de jî feqîrtî, bêkarî, bêdaletî û dîktatorî tê. Tu xizmetên dewletê yên bi duristî ji welatîyên wan re nayên teqdîm û pêşkêşkirin. Ewên ku tên pêşkêşkirin jî qelîteya wan gelekî nizm e. Ji xwe sihhet û tenduristiya mirovan îhmal kirine. Ji ber van hemû sedeman xelk li hemberî dîktatorên xwe serî hildidin. Li hinek welatên wekî Misir û Tûnisê biserketine. Dibe ku li welatên wekî Yemen û hinek welatên din yên wekî Cezaîr û Fas/Mexribê jî biserkevin. Lêbelê eger piştevaniya dewletên wekî Amerîka û dewletên Rojava nebe, serkeftina xelk û milletan bi tenê li hemberî wan dîktatorên xwînmij gelek zor û zehmet e.

Lêbelê mixabin, ew tabloyên pembe yên ku hinek analîst pêşkêş dikin û dibêjin: Êdî demokrasî tê, sînor dê ji navbera xelkên deverê werin rakirin û bêmane bibin, dewletên neteweyî girîngî û fonksiyona xwe ji dest didin. Ji vir û pê de hemû xelk dê ji hev re bibin

bera, can û dost, ewê dewlemendî û tecrîbeyên xwe bi hev re parve bikin û her kes êdî dê bigihîje heqê xwe! Mirov dikare xewneke wiha şîrîn bibîne û ji devera xwe re xwezî û temennî bike. Ev îhtîmal û daxwazeke gelek geşbîn e. Lê mixabin, tehqîqbûna vê gelek zehmet e. Ez bi xwe ne mirovek reşbîn im. Lêbelê bi qasî ku ez hinekê çûme navbera hinek ji wan xelkan û min ji wan fehm kiriye; di mejiyê wan de nijadperestiyê zehf dijwar heye ku bi wê eqliyetê ne mumkin e ew bikarin medeniyeteke pêşverû û geşxwaz ava bikin. Nijadperestiyê rayên xwe di navbera wan xelkên misliman de ewqas kûr berdane ku li van deveran tu kes nikare ji

nijadperestan re bibêje; tu nijadperest î, ev fikra te nijadperestî ye. Lewra ew nijadperestîya xwe ewqas tiştê rast û xwezayî qebûl dikin. Protestokarên Misrî û Tûnisî ne amade ne ku îtirafê bi hiqûqê xelkên Amazîxe, Berber û kêmneteweyên din yên çandî û kulturî bikin û nasnameya wan ya qewmî qebûl û nas bikin.

Leşkerên Erebiştanê li Memleketê Behreynê ne

Leşkerên Erebiştana Siûdî ji bo piştevaniya rejîma Behreynê ketin wî welatî û ji aliyê Şîiyên Behreyn, Iraq û Îranê ve bi tundî hatin protestokirin û wek mudaxele û desttêwerdaneke derveyî îlan kirin û jê xwestin ku di cih

de ew leşkerên xwe ji Behreynê bikişîne. Li Îranê bi telîmatên rejîmê ji terefê hinek rêxistinên qaşo sîvil ve li hemberî Erebiştanê banga cîhadê tê kirin. Ev jî nîşan dide ku di rojên pêş de li herêmê şerrên germ û rewşên aloz dê biqewimin. Herwiha ev bûyerên ku di van rojên dawîn de li Sûriyê diqewimin dibe ku mizgîniyê xêrê be û bibe destpêka hilweşîna faşîzma Be'sê û heqbidestxistina xelkê me yên Binxetê. Ez ji cenabê zatê pak heq Teala hêvîdar im ku Xweda li ser heqiyê arîkar û piştevanê hemû xelk û milletên mezlûm be, wan jî bi dewlet û şûnwar bike. ❁

Baro giran

W.K Merdimîn

Hêverê tedbîr bigêro, dima gurey xo bikero
Homayî ra çi ke bêro, hinî sere w' çiman ser o!

Elametê minafiqan, ti vanî qey tewrey zuran
Xetayê nê zurekeran, maneno mumînan ser o!

Debarey' keye w' kulfetan, wa xem nêbo sey korfaman
Rizqê pêroyê merdiman, ha yo Rebbê Rehman ser o!

Her kes wayir yew bawerî, ferq çin o kam î, ça ra yî
Lanetê Homa Tealayî, timûtim zaliman ser o!

Tayên adir' fitne wekerd, malî millet pa pirç a werd,
Kamî goreyê xo se kerd, bêyomî mend buman ser o!

Gam k' zarar gina vilan, berme pêşen ro bilbilan,
Vanê barê tay aqilan, ha yo xînt û boman ser o!

Hewcey zaf vateyan çin o, faydey rakewteyan çin o,
Xeyrê dua w' zewtan çin o, mezg bikewo guman ser o!

Ame qîrnê di hezaran, çiqas ciwan şî kendiran,
Merdimîn baro tewr giran, zanaye w' alîman ser o!

Hezîrane-2010

Şîretên pîrka min

Xelîl Îbrahîm Banûkî

Di demsalên zivistanê de em li dor pîrka xwe rûdiniştin û wê ji me re qala meselên berê dikir. Gava ku behsa aliman dikir te digot qey em digel wê di hizûra wan de, bi kernalê edeb ve rawestiyane. Pîrka min nexwende bû lê rewş û ehwalê mezinan baş dizanî. Ewê em bê hemdê me li ser terbiye û adabê bav û kalên me em perwerde dikirin. Hinek tiştên ku wê ji me re digotin, paşî bi derbasbûna salan me ew tişt û mesele di kitêban de keşf dikirin û ez dicibîm. Te digot qey pîrka min a nemir ew kitêb hemî ji ber kirine û ji me re gotine.

Hewşa mala me pîr fireh bû û neviyên pîrka min zehf bûn. Min di piçûkatiya xwe de nikaribû ew bijimartana, lê wê navê gişkan dizanibû. Wê ne tenê navên zarokan, dema zayina wan û bûyerên ku di dewra wan de qewimîne hemû bi teferrûatê dizanibû û qala wan dikir. Navê pîrka min Zulfiye bû. Te digot qey zulfên wê jê re bûbûn nav. Bejna wê mîna dara serwiyan dirêj bû. Xeberdana wê pîr şêrîn bû. Wextê wê xeber dida şekir ji me re tal dihat. Xwezî me ew û emsalên wê wînda nekirana. Niha ez mezin bûm û

temenê min gihîşte çil û heft salan, hê jî behsa pîrka xwe ya nemir dikim. Lewra wê xwendin û zanatî bi min da hezkirin. Rehma Xwedê lê be.

Serê sibehê em radibûn. Her kes kare wî hebû, kare min jî xizmeta dapîra min bû. Wê wisa dixwest ku ez neçim axur û binê heywanan paqij nekim. Ji min re digot ew ne karê te ye. Tu mêze bike wek kalikê xwe bixwîne û bibe melayekî mezin. Li Erdexanê me'lûmê we ye ku medrese tunebûn. Piştî demekê bavê min mala me anî Stenbolê, li wirê em çend salan man. Jixwe ew bi xwe li Almanyaya dişixulî. Xwest malê bibe wir, dêya min nexwest here Almanyayê. Bavê min jî ji nav heft zarokên xwe ez bijartim û birim wir. Piştî çend salan ez li wirê mutteli'ê kitêbên ku behsa Îmamê Xezalî bi zimanê Almanî ve dikirin bûm. Min ew xwendin. Gotinên pîrka min hatin bîra min. Wê tim ji min re digot tu wek kalikê xwe bixwîne bibe mela. Belê min rêya xwendina medresê nedizanî. Ez pîr di bin tesîra wan kitêbên ku behsa jîyan û zanîna Îmamê Xezalî dikirin de mam. Di dile min de tu dibêjî qey perdeyek vebû û

Serê sibehê em radibûn. Her kes kare wî hebû, kare min jî xizmeta bapîra min bû.

Wê wisa dixwest ku ez neçim axur û binê heywanan paqij nekim. Ji min re digot, ew ne karê te ye

şîretên pîrika min wek tavek nû dest bi hildanê kirin. Min jî zehf hewes kir ku ez biçim welêt û li medreseyan bigerim û kîjan baş be tê de bixwînim. Min ji bavê xwe re got, min bişîne welêt da ez herim wek kalikê xwe medresê bixwînim. Bavê min got kurê min medresê neman ku tu jî herî bixwînî. Li vê derê xwendina xwe bidomîne. Min jê re got: Ma tu hez nakî ez herim medrese û wek kalikê xwe bibim mela? Bavê min kêfa wî her ji xwendinê re hebû. Lêbelê dixwest li Almaniya di dibistan û zanîngehan de bixwînim. Loma ez biribûm Berlînê.

Kes nizane ka çi dibe nesîbê wî. Xwendin, jiyan, xebat, xwarin û vexwarin her yek cure cure rizq in. Wê demê ku ez difikirîm ez li medresê ilmê Erebi û Îslamî bixwînim, min di heqê usûla medresê de tiştêkî nedizaniyê. Piştî demekê ku ez hatim Stenbolê û min dest bi gera medresan kir, min ji kê dipirsî ji min re digot, ma qey tu nizanî li berî niha 70

salî li welêt înkîlab çêbû û ji wir û pê de medrese hatin qedexekirin. Niha mekteb hene. Pêşketin kete nav gel. Ew êdî bi îrtîca û ulûmên îrtîcayê mijûl nabin. Lê mixabin ev gotin wek mîx û bîzan mêjiyê min qul dikirin. Ez matmayî bûm. Di navbera welatê me û Almanyayê de tu ferqeke dîni tune. Almaniya Fileh e û welatê me Misilman e. Ev çi rewşek ecêb e? Li Stenbolê min çend hevalên ji rojhilatê Enedolê nas dikirin. Wan medrese li herêmê xwendibûn. Qala seydayan dikirin. Seydayan li gundan di hicrên mizgeftan de darsa feqiyan didan. Teze teze ez rêya medresan û cihê wan hîn dibûm. Herêma me wek navê xwe rojhilata heqîqetê ye jî. Lewra min ferqa di navbera Almaniya û Misilmanên herêma me de dît. Belê gelê wê herêmê feqîr û belengaz bin jî di dildayina heqîqetê de dewlemend in. Tu dibêjî gundî jî wek seydayan ji bo ilmê Îslamê xwe weqif kirine.

Digel hebûna pir kêmasiyan jî

wê fezîlet û heqşînasîyê wekî tavê ronahî dida. Di her gundekî de rojek hebû. Asîmanê mezin ji wan gundan çavnebarî dikir. Lewra di her gundekî de roja heqîqetê dibiriqî. Axa deşt û çiyayên Kurdistanê bi wan ve şîn dibû. Min ji nav medresan medresa Bilîsê û usûlên wê ji xwe re baş dîtîn û min li wirê dest bi xwendina xwe kir. Nêzî çar salan ez neçûm Stenbolê. Te digot qey ez di bihiştê de me. Ez ji wirê neçûm. Qederê 9-10 salan min li gundên Bilîsê xwend. Xwedê ji ustad û seydayên me razî be û rehma xwe li wan bike. Xêr û bereketa ilm û îrfana wan bidomîne.

Medrese ji bo gelê Kurd dîrok, çand û her tişt e. Binêrin dewletên Misilmanan hemiyar dev ji usûlên qedîm berdane. Kurd xwedan hukûmet nînin jî ew usûlên qedîm domandine. Gerek em jî vê adetê bi xîmê wê ve li gora esra xwe bidomînin. Xwedê Teala me hemûyan muwefeqê rêya rast bike. ❁

Evîn

Hadi Kuranlıoğlu

Evîn kuştin nava dil da
Gora wî çêkirin nava gul da
Çavê wî hiştin nava kil da
Ji vir diherim çavreşa min tu megrî

Xwîn û xwîdana xwe ve
Te birêsim bi ser hev ve
Qiristalên hêsrê xwe ve
Seraykê çêkim bi navê te

Kalamast

Kenanê Nado

Roj dirêj bûn, tarî dereng dikete erdê, Mamo ji sibe zû heya êvarê leyistibû, lê dîsa jî jê têr nebibû. Êvarî filmê Chakî Chan di televîzyonê de hebû. Rekla- ma wî ji çend roj berê ve hatibû kirin. Mamo hay jê hebû. Dê teqez temaşe bikira. Çû, xwe li hember televîzyonê, li ser qenepekê dirêj kir û li hêviya destpêkirina filîm sekinî...

Bi çend bangên dîk û wilwilînên elokan Mamo ji xew rabibû. Birçî bû. Hundirê malê kerr bû. Bav û birayê wî tu kes li mal nemabû. Li diya xwe geriya, lê nedît. Pê derxist ku li tewlê çêlekan didoşe. Filmê duh êvarê hate bîrê. Temaşe nekiribû. Hê filîm dest pê nekiribû ku ew di xew re çibû. Hêrs bû ji xwe, poşman bû ji xewa xwe, nizanibû, lê îsyar dikir ji yê xewa wî anî re. Sond xwar û bi sondên bêteraz got: "Wellahî, bi Qur'ana ku bavê min xitimkirî, bi serê melê gundê me, ez vê êvarê heya filmê Van Damme temaşe nekim ranazê."

Dengê hat, gujjiniyek bû, hêdî hêdî bilind dibû, ji cihekî din jî eynî deng, li derê mala apê wî, li axpîna wan, li hewşa mala Şero... heman deng dihate bihîstin, xebitîna partozên genim, gujjinî, qêrînî, vizzînî... piştê kelewehceke zarokî...

Mamo derketibû derve. Diya wî, li pêşiya malê di dest de bêjîngek, li ser bêjîngê jî çend parçeyên destenanan, li ser rûyê wan jî toyê mastê pezan, lê neşekirî...

Mamo birçî bû, zikê wî dikire xurrinî. Li hêviya taştê nesekinî, parçeyekî nan ji diya xwe sitand, ber bi partozê ve bazda... di destê wî de parçeyekî nanê gezkirî, çavên wî li mêrikê ser ereba genim, guhê wî ji hemû dangan re bel, devê wî jî bêhemdî li hev diket. Êdî ew ketibû nav xeyalên bêdawî...

...Mamo di xeyalên xwe de wî mêrikê ku sapê genim dihavête partozê winda dikir û bi jîr û jêhatiya xwe, bi gernasî û qudreta xwe, xwe di şûnê de bicih dikir. Mamo dema ku lûsê genim diavête partozê gurminî pê dixist, piştê qasê lehzekê bêhna xwe hildida û dîsa dizivîrî lûsek din jî diavêt, dîsa gurminî û pey re dîsa lûsek din jî, keçên xama heyran heyran li Mamo temaşe dikirin, Mamo tû dikir destê xwe, xwe radikişande dirganê û bi forseke gladyatorî lûsek din jî li zikê partozê dida... Mamo her diçû nêzî gêlê dibû, di nav alema xeyalan de hay ji xwe tunebû, heya ku bavê wî ew hilda hembêza xwe û pê şabû, Mamo hay ji xwe tunebû...

Hevalên Mamo hêdî hêdî dicivayan, çawa çav bi genim ketin di serê wan de alarmên kalamastê veketibûn, lê dîsa jî heya li ser partoz, genim... hwd. çend gotin ji hev re negotana zûbizû mijara kalamastê venedikirin. Mîna her gavê bi awayekî siruştî dest pê kiribûn dîsa, ji wan hin kesan pesnê bavê xwe dida, hin kesan qala jêhatîbûna birayê xwe

dikir, hin kesan paleyên gund ên navdar dişibhandin şêrên ku di belgefilman de temaşe kiribûn, ji bo ku her kes xwe mezintir û jêhatîtir bide nîşan hezar efsane li pey hev dirêsandin. Hin kes jî pirê tesîra filmê Chakî Chan ê duh êvarê de mabûn ku yên li gêlê dixebitîn dişibandin wî. Mamo jî ji ber ku xwe wekî filîm temaşekirî bide nîşan digot:

- Lawo Cimo ew bêbavê bêbav duh çi qas xweş şer dikir. Dibêjin carekê pazde gule berdane laşê wî lê dîsa jî tiştêk pê nehatiye.

- Kuro derew e dev ji van berde. Duh di dawiya filîm de jî bi du guleyan laşê wî raxistin erdê. Ma te nedît?

- Ew filîm e kero. Rastiya wê tune.

- Ehhh! Êcar film êcar çi. Bêje min temaşe nekiriye?

- Min çawa temaşe nekiriye? Qey ez nizanîm, ma di filîm de bi keçekê re şer nekir, piştê nebû aşiqê wê?

- Na welle, min ji serî heya dawî temaşe kir lê min tiştêkî wisa nedît.

- Ê law bêje min temaşe nekiriye, tu çima ji min re wisa dibêjî?

- Ê temam kê temaşe nekiribe Xwedê nizam wî çi bike erê welleh?

- Erê well...

Mamo piştî vê sohbetê û sondxwarineke nîvco, ji ber ku xwe zêde temaşenekirî nede nîşan, ji hevalan re got:

- Hevalnô ezê îroj ji xwe re li kalamastê bigerim kî hez dike bila bi min re were.

Zar kom bikom ji hev veqetiyên, li aliyekî di nav gund de gujjîniya dangan, li aliyê din jî qêrînî û şahiya zarokan

li hev ketibû. Te digo qey Cejna Remezanê ye. Te kîjan zarok bidîta bi lezûbezî û poşetên destê xwe ve tam tertîbat li gêleyan digeriyan û digotin:

- Bi xêr û bereket be Xalo! Em hatine para xwe ku tu bidî me yek kalamasto.

Mamo, Cimo, Bêzo bi hev re bûbûn komek. Mamo serleşkerê komê bû. Dê ew roj li kalamastê bigeriyan, dê biçûna hin gêleyan destvala vegeyriyan, dê ji hin gêleyan bihatana qewirandin, dê ji hin gêleyan jî serweteke bêhempa bidest bixistana, yanê serweteke katlok nîv genim...

Tu tişt Mamo bi qasê danûstandina wî ya serbixwe mexrûr nedikir. Jixwe ev lebat, qewirandin, leyistok, gêle, roj, zarok, kalamast tev ji bo meqse-da danûstandineke azad bûn. Lewra xwediyê mal, genim ango kalamastê Mamo bi xwe bû.

Ew roj Mamo û hevalên wî ji du malan kalamasta xwe sitandibûn. Qet nesekînin berê xwe dane dikana Apê Silho û di nav xeyalên fêkiyan de zûzûka ve beziyan. Apê Silho li ber derê dikanê, li ser kursî rûniştî bû. Mamo sînga xwe nepixand û got:

- Apo tu dikarî ji xêra xwe vî genimê me bipîvî, emê ji xwe re pê tiştan bikirin.

- Waaa! Mamo ezê çawa nepîvim? Camêrekî mîna te hatiye vir, qet ez vala vedigerînim.

Apê Silho pêşî bi genimê Mamo dest bi pîvanê kir. Genimê wî sê katlok û du kulm derketibû. Genimên hevalên wî jî hema hema ew qas derketibûn. Lê Mamo xwe wir de bir û anî, îtiraz kir. Apê Silho dît ku Mamo xwe diqilqilîne jê re got:

- Mamo heger ez heqê te

bixwim bila ev genim bibê nan û di ber min û zarê min de neçe xwarê. Weyyy! Ma heq navê Xwedê ye ez qurban.

Mamo ji vê gotin û îtirazkirina xwe piçekî şerm kir, lê ev şerm di bin siya kelewehca destxistina fêkiyan de zû bihurîbû. Mamo û hevalên wî ketine dikanê, li gorî dilê xwe çi xwestin sitandin; ji dendikên bi xwê bigire heya nokên spî û şîrîn, ji ava mişmişan bigire heya kolayên bê marqe, ji gofretan bigire heya sedilezamên ku wek loqiman in kirîn. Mamo çi qas bi genim danûstandinek bikira, her dem têr û tijetiyek, bereketek û zêdehiyek didît. Ji ber vê genim ji bo Mamo pîroz bû. Heger parçeyekî nanê genim li ser rêya xwe bidîta, pêşî hildida, radimûsa, li eniya xwe dixist û piştê datanî cihekî bilind. Genim, ji bo Mamo serweta herî mezin bû.

Ew roj heya ku zikê wan êşiya xwar û vexwarin, bi hevalê xwe re parî kirin, hin tişt jî bi deyn dane hevalên xwe yên din. Peymanên ku bi sondxwarinên wan ên bê teraz hatibûn îmezekin, bûn belgeya deynê wan. Ji ber ku her kes belav be û biçê mala xwe Mamo rabû qêriya:

- De haydêê hevalnoo her kes li mala xweee, çivîk jî êdî ketine qula xweee.

Roj dirêj bû, tarî dereng ketibû erdê. Mamo ji sibe zû heya êvarê li pey kalamastê geriyabû lê dîsa jî jê têr nebibû. Êvarê filmê Van Damme di televîzyonê de hebû. Reklama wî ji çend roj berê ve hatibû kirin. Mamo hay jê hebû. Dê teqez temaşe bikira. Çû, xwe li ber televîzyonê li ser qenepekê dirêj kir û li hêviya destpêkirina filîm sekinî... ❁

Mistoyê Tofan

Şemoyê Memê

Ax eman eman eman eman...

Eman eman eman eman...

*Misto digo, kuro Hiso lawo dilê
min kênekîn e*

*Misto xwe re Tapê Qersê ders û
talim e, lê nîzamê dibîne*

*Qasoyê Çadircî, bêbext e, ji xwe
re Cemo direvîne.*

*Eman eman eman eman, te
rûreşê, lê te bi xwe kir.*

Ax eman eman eman eman...

*Qasoyê Çadircî dibê, Cemoyê
sibe, dusibe raze ji min re lawekî
bîne,*

*Lêxe Mistoyê Tofan bikuje, dîsa
heyfa giranê erdê bimîne.*

Misto ji bajarê Qerekosê (Agirî) ji gundê Darebiya Jêrîn bû. Berî here eskeriyê bi qîzeke gundiya xwe ya bi navê Cemo re dizewice. Misto roja dikeve bîst saliya xwe, berê xwe dide eskeriyê. Wî dişînin Tapê Qersê. Wî wextî eskerî çar sal bû. Wextê Misto çû eskeriyê, du zarê wî hebûn, yek Kerem ê din jî Fexrî bû. Bavê Misto di zarokatiya wî de miribû. Pişt çûna Misto ya eskeriyê li malê jina wî Cemo, diya wî û herdu kurên wî mabûn.

Cemo jineke pîrr bedew bû, bejindirêj, porgej bû. Xelkê qêmîş

nedikir lê binêriya. Dilê gelek xortan wextê hê neçûbû mêt, tê de bû. Ji wan yek jî Qasoyê Çadircî bû. Li wî gundê bi navê Qaso merivek hebû, gundiyan jê re digot Qasoyê Çadircî.

Ser çûna Misto ya eskeriyê du sal derbas nebûbûn ku Qasoyê Çadircî Cemo direvîne. Wextê Cemo reviya, kulfetên wê Kerem çar salî, Fexrî jî pênc salî bû. Di wan salan de tê texmînkirin ku Misto hevdeh salî zewicibû. Li mal herdu kur û diya wî ya pîra belengaz mabûn. Dêya Misto wisa pîr bû ku ne dikaribû xwe xwedî bikira, ne jî Kerem û Fexrî. Kerem û Fexrî heta êvarê li ber diwaran di nava xalî û gemarê de mîna du êtîmên belengaz mabûn.

Li gundê Darebiya Jorîn destebirayekî Misto hebû, navê wî Hiso bû. Bi xwe şivanê gund bû. Merivekî camêr, qedirzan û dilbirehm bû. Rojekê diçe mala diya Misto, teseliya wan. "Gelo rewşa wan çawa ye, çi dikin, kêmasiyeke wan heye yan na? Gelek wext e ez ber bi mala wan ve neçûme." Hiso diçe mala Misto, di ber deriyên wan re halê Kerem û Fexrî dibîne, halê diya destebirakê xwe dibîne, dilê wî

Li gundê Darebiya
Jorîn destebirayekî
Misto hebû, navê
wî Hiso bû. Bi xwe
şivanê gund bû.
Merivekî camêr,
qedirzan û dilbirehm
bû. Rojekê diçe mala
diya misto,
teseliya wan

bi wan pirr dişewite. Hiso difikire gelo çî bike. Paşê digire, ji Misto re nameyekê dinivîsîne. Rewşa mala wî jê re eyan dike.

Ji hinga çûye eskeriyê, Misto hêjî ji mala xwe nameyek negirtiye. Çavê Misto timî li nameyeke ji mala wî bû. Nama Hiso şandî rojê yekşemê digihê wî. Berê sifte gelekî şa dibe û çend qurîşan dide postevan. Wextê nameya Hiso digire, fêhm dike ku tiştêkî xirab çêbûye. Namê dixwîne.

Hiso digo:

*Kuro Misto lawo dilê'm
kînekîn e*

*Kuro Misto lawo îşê te bi
eskeriya Romê tunîne*

*Cemo reviyaye, xwe re kêf û
zewqa xwe dibîne*

*Kuro lawo tu enbîrê hilîne,
were Qaso bikuje,*

Heyfa lawê xwe derxîne

*Kuro lawo Kerem û Fexrî
mane ber dîwaran, serçavên
wan îs û xalî ne*

*Misto nobedarê çawîş e,
noba xwe digêrîne*

*Bala xwe dide postevanek li
jêr ve tê, xwe re postê tîne*

*Misto dibê kuro postevan
lawo, tu bi Xwedê kî nameya
min heye an tunîne?*

*Postevan destê xwe nava
nama dixîne, nama Misto
derdixîne,*

*Pênc panota dide postevan,
dibê derê qantel û dikana kilîtî
ne,*

*Han ji te re pênc panot şansê
te tunîne,*

*Min ê te re, hediyeke rind
bistenda.*

*Misto namê vedike, dixwîne,
Hacê aqilê serê xwe tunîne,*

*Mîna gamêşa çavê wî sor
bûne, rîya xwe nabîne.*

*Namê hildide, yuzbaşiyê xwe
re digihîne.*

*Dirêja yuzbaşiyê xwe dike,
dibe, hela bixwîne*

*Ez eskerê Romê me, halê
ewladê min çî ye, çî nîne.*

*Ax eman eman eman eman,
te rûreşê, te bi xwe kir.*

*Te çima bavê Kerem, kekê
Fexrî, ji eskerê dewletê re bê
bextî kir?*

*Te çima herdu destê xwe ve
rûyê xwe tenî kir?*

*Wextê yuzbaşî nameya Mis-
to dixwîne,*

*Dibê, kuro Misto here ji
cebilxanê enbîrê tevê sed
fişenga hilîne,*

*Here lêxê lawo, heyfa xwe
derxîne,*

Eger te heyfa xwe dernexist

*Were carkê dinê yuzbaşiyê
xwe bibîne.*

Misto diçe depoyê sed fişengan tevê enbîrê hildide. Peyatî dikeve rê, berê xwe dide Qerekasê. Diçe Êla Sirdo, jî Çemê Çeto derbas dibe, xwe digihîne gundê Seîd axa. Misto du ro û du şev e di rê de ye, loma hin pirr birçî, hin jî pirr tî bûye. Pirr westiyaye û ji hal de ketiye. Di ber xanîki re derbas dibe, bala xwe didê, jineke pîr meşkê dikile. Diçe cem jinikê dibêje: "Lê lê pîrê!" Pîrê dizîvire, bala xwe didê merivekî ji haldeketî, lê dizivirîne dibêje: "Çî ye kurê min?" "Cî ji min re nanekî werîne, ez du roj e di rê de me ji nêza bê taqet mame. Pîrê dev ji karê xwe berdide, jê re kûzek av tîne. Berê sifte Misto ser û çavên xwe dişo, derbasî ser sewkiyê dibe. Pîrê jê re mast hazir dike, çend nanên germ jî tîne. Misto ewqas birçî ye eyb çî ye nizane, mast dide ber kevçiyên. Hinekî zikê xwe têr dike,

çend parî nan dixwe, dîsa dêya wî û kurên wî têne ber çavên wî, êdî nan di qirika wî re naçe. Razîbûna xwe elamê pîrê dike, destê wê maç dike û di şûn de dikeve ser rêya xwe. Di sê rojan de digihêje Qerekosê. Misto hema diçe Darebiya Jêrîn. Li feza gund bala xwe didê, birek pez diçêre. Dîsa gelek rê çûbû û gelekî birçî bûbû loma biryara xwe dide, dibêje: "Ezê berê sifte herime cem vî şivanî, ger xwarina wî hebe helbet dê hinekî bide min jî." Paşê ezê salixê Qasoyê Çadircî jê hildim û paşê herim heyfa xwe hilînim. Misto hêdî hêdî nêzî pêz dibe. Bi şansê Misto, Hiso ye li ber pêz û Hiso fêhm dike ku ew kesê nêzî wî tê Misto ye.

Dibêje: "Gelo va çalima Mistoyê birayê min e gelo, Misto nîne?"

Xwedê vê yekê bike, Misto bê heyfa xwe hilîne."

Hiso şivanekî belengaz e, feqîr e. Çî qasî ber kulfetên Misto dikeve jî ne dikarî tiştêkî ji bo wan bike ne jî dikarî Cemo ji destê Qasoyê Çadircî xilas bike. Dua dike ku ewê ji wir de tê bila Mistoyê birayê wî be û bê heyfa xwe hilîne. Misto gelek nêzî birê pêz tê, li Hiso dinêre rast e ev Misto ye, ji şabûnê nizane çî bike. Hevdu hembêz dikin. Sefaxweşî didin hev, lêbelê kêr devê Hiso venake. Misto meraq dike, dibêje:

-Kuro Hiso lawo, te ji min re nameyek nivîsîbû, gelo ew name rast e yan derew e?

Misto dîsa bawer dike û di dilê xwe de dixwaze ew name derew derkeve. Hiso dibêje:

-Welleh Misto birayê min, ez çawa bêjim, hema tiştên min nivîsîne hemû rast in, ne derew in.

Aqilê Misto careke din ji serî diçe. Sê rojan peya hatiye, westiyayî ye, guman dikir ku tiştêkî wisa tunebe û serê xwe neke belayê. Nigê wî di ber rê werimîne. Bêxew e. Misto dibêje: "Hiso birayo ez hem birçî me, hem jî westiyayî me. Halê min tunîne, ez bêxew im. Berê sifte gerek ez zikê xwe têr bikim." Misto bala xwe didê ji jêr ve du erebe ji êş tên dibêje: "Tu dê herî pêşiya wan gerîndeya ji min re hinek nan bînî. Heya ez zikê xwe têr nekim, ez nikarim ji cihe xwe bilivim. Paşê jî ezê piçekî razê, xewa xwe hildim. Paşê têkevim rê û herim heyfa xwe hildim. Ezê şev herim cerdê bidim ser konê Qaso, bikujim û heyfa xwe hildim."

Lêbelê serçekê Hiso, rûyê wî, porê wî tevlihev e, wekî pejmûrdeyan tê xanêkirin. Hiso naxwaze bi wî halê xwe yê mirdar ve here pêşiya erebeciyan, loma dibêje, "Misto lawo kincên te yên eskeriyê ne, rewşa te baş tê xanê, ger tu herî pêşiya erebeciyan, dê hema nan bidin te, ger ez herim, kî zane belkî nedin min."

Dibêje: "Misto birayo dilê'm kînekîn e,

Kuro lawo welleh min nan wan alaya dîtiye,

Taqeta min nagire, ji vî çavê min tunîne,

Kuro birayo, kincê eskeriyê li ser te ne,

Tivinga eskeriyê li milê te ye, terfiya çawîşa li milê te ye,

Here bi Tirkî bişêwire,

Ji wan nan tu bistîne."

"Hay hay" dibêjê Misto "ezê herim." Tifinga xwe hildide, ji jor de berjêr dadikeve. Misto berjêr dadikeve, bala xwe didê, çi bibîne! Xwediyê erebê Qasoyê Çadircî ye!

Yên li kelekê jî pismamên wî ne, ji êş tên. Pismamê Qaso bala xwe didê ji jor de ber bi wan ve merivek tê. Dişibîne Misto, pismamê Qaso dibêje: "Qaso lawo, ewê hanê tê dişibe çalima Misto." Lêbelê qet telaşa Qaso nîne û ji pismamê xwe re dibêje:

*Kuro lawo, dilê'm kînekîn e,
Minê poz û gepê bavê Misto gavo,*

*Misto Tapê Qersê ders û talîm e, di nîzamê de dibîne,
Ew çi zane ara min û kewa gozel de kêf û henek û laqirdî ne.*

*Kuro lawo tu metirse sibe,
dusibe kewa gozel yê razê,
Ji min re lawekî bîne,
Ewê mezin be, lêxe Mistoyê Tofan bikuje,*

Dîsa heyfa giran yê erdê bimîne.

Wextê Qaso wan qisan bi pismamê xwere dikir, Misto jî gelekî nêzikî wan hatibû. Misto bala xwe dide wî teresî. Em binêrin jê re çi dibêje:

Dibê, kuro Qaso lawo dilê'm kînekîn e

*Kuro lawo te nego ev esker e,
Yê sibê bêne lêre bavê min pêş çavê min bibîne.*

*Misto milê xwe davêje ustuyê Qaso, qasatûrê ber xwe dikişîne,
Lê dixê serê Qasoyê Çadircî jêdike,*

Wê ecêbê erebeciyên din ditirsîn, direvin.

*Misto dibê, lawo nerevin,
şixulê min we tunîne,*

Serê Qaso jêdike, pûlika wî de digrê, li ber bi jor, birayê xwe yê Hiso re hildide tîne.

Hiso bala xwe didê, Misto ji jêr ve tê, serîk li dest e,

Hiso hêrsa xwe tîne,

Dibê, kuro Misto lawo dilê'm kînekîn e,

*Kuro lawo digotin Mistoyê Tofan mêr e,
Meger hunerên wî tunîne,
Bira lawo heyfa me ya giran li erdê bimîne,
Ax eman eman eman eman,
Te çima ji bavê Kerem, li kekê Fexrî,
Li eskerê dewletê re bêbextî kir,
Te çima herdu destê xwe tenî kir?*

Misto dibêje: "Bira hêrsa xwe neyne, ev seriyê heram yê Qasoyê Çadircî ye. Ma ez dîn im, bêşeref im, ku ji bo nanekî rabim serê xelkê jêkim? Tu çima ji min re van pirsan dikî?" Misto serê Qaso hildide, dike binê nigê xwe. Dibêje: "Hiso lawo gerek ez bizîvirim, çawa be min heyfa xwe derxist. Berê ez herim hinekî rakevim." Hiso kulavê şivaniyê li ser xwe datîne davêje ser hevalê xwe. Misto vedilize û hema bi xew ve diçe. Hiso li cem Misto rûniştî sekiniye, ji nişka ve bala xwe didê li jor komek qîz û bûk pincar berhev dikin, berjêr tên. Hin pincar berhev dikin, hin jî kilaman dibêjin, distrên. Hiso bala xwe dide koma qîz û bûkan ku tê ber bi wî ve, şaş dibe. Cemo daye pêşiya koma qîz û bûkan ser wan da dikişîne, tîne. Kêf û laqirdiyên Cemo pîrr in. Henekan dike, bi dengê bilind dikene. Serê komê de distre jî.

Hiso wî halî dibîne, pîrr hêrs dibe. Mejiyê wî dikele. Wekî biteqe. Diponije dibêje: "Welleh ezê gazî Misto bikim, hema çi dibe bila bibe." Hiso hedîka Misto diniçîne.

Dibê: "Misto lawo, dilê'm kînekîn e,

Kuro hela rabe, şixulê Xaliqê elemê çiqas rind in,

*Cemo daye pêşiya qîz û bûkan li ser me
de hildide tîne,*

*Qet hajê bayê dunê tunîne,
Serê Qasoyê Çadircî qut bûye,
Cendekê wî jî çolê ça dimîne.*

Misto di xewê de ye, lêbelê guhê wî hiş-
yar e. Wextê Hiso qala Cemo dike, dibêje:
"Cemo daye pêşiya qîz û bûkan ser me de
tîne." Hêdîka radibe, bala xwe didê, rast e,
Cemo tevê koma qîz û bûkan ber bi wan ve
tê, kêfa Cemo di dewsê de ye. Misto hema
dest davêje tifinga xwe, qîz û bûk jî gelekî
nêzî wan bûn, hema tivinga destê wî bala
wan dikişîne. Koma wan belawela dibe, her
yek dike ku ji ber tivinga Misto xwe biparêze.
Misto banga wan dike "Nerevin hûn hemû
dê û xuşkên min in. Layê şixulê min ji we
tunîne, bi tenê nerevin, bisekinin û me te-
maşe bikin wê gelo çi biqewime." Koma qîz
û bûkan herçiqasî belawela bûye jî di cihê
xwe de dimînin, ji tirsra Mistoyê Tofan ji cihê
xwe nalivin. Misto destê Cemo digire, ber
bi xwe ve dikişîne. Hiso dibêje: "Ezê Misto
biceribînim ka wicdanê wî diêşe an na?"

Dibêje: "Misto lawo dilê'm kînekîn e

Tu were Cemo nekuje,

*Te bi Cemo ve gelek qeremetê wê dunê
dîtine,*

Bila Cemo dîsa mala xwe bizîvirîne,

Kerem û Fexrî bila êtîm nemînin.

Gava Mistoyê Tofan van gotinan dibîze,

*Çavê wî wekî gamêşa dizîvire, hacê
qafê xwe tunîne,*

*Her du milê Cemo girtiye, qasatûrê jî
ber xwe dikişîne,*

*Xwe re hindik, hindik lê dixê milê Cemo
li jor de hûr dike tîne,*

Şixulê Xaliqe elemê, rebbê jorînê,

Heyfa kesî tu caran kesî re namîne,

Ax eman eman eman eman,

Te çima ji bavê Kerem, Kekê Fexrî,

Li eskerê dewletê re bêbextî kir? ❁

Bacoya Alanqozî

Recep Yigitbay

Bî pancês serre, kerd veyvi.
Amê vîst, bî sêkur, pîyek merd.
Mêrde sêkur, a sêkur, kaşê Alanqozî.
Ban çin bî, va ma ban virazê.
Bi virara sîy kirriştîy, mîyane bi seqet
Ci rê nê banî ra fitiqê mîyanî mend.
Ban kerrayin bî, va ma bidawê.
Dawitenda herra sipê ra ci rê
kulê qesberi mend.
Rojêk ban veşa, dewan ra asa.
May va, hawar banê kê veşa?
Nêzana kili kê keyna ra weriştî
Kê keyneya ci veşa
Ban veşa, mendî cila sîya ser
O ki Ellay dabi, sebrê qulî yo
Alanqoz koy û kaşîy bî
Pîze mird nêkerd, kewtî xurbetey
Bi Bursa' o vejîyay
Xerîbey çetin, karê şarî çetin
Bêqeçey barî sero bar bî, bêqeçey çetin!
Gencey şî, pîrey amê nezdî
Nêweşîya xo gencey ra ardibî
Ci ser bî gran, ci rê kerd tehdâ
Kişte ra nêvijîyayê boy, kişte ra tewayê mîyane
'Emir hinî şî, gencey qedîna
Mêrde bî nêweş, qergûn şî rehmet
A zî tena mend, wayîrê bêkesan Ellah
Bira kerd ci rê embaz, ci rê bî dest û doşî
Ban viraşt biray, fina bî sükij
Baco ya Alanqozî bibî Nene ya sükij
Tam nêdîbi gencey di, tayêk sûki dî
Çend darîy hewşê xo di karritîy bî
Rojî kalan û awdan a ravîyarnay
Bi no hesaba qedînay pancês serrî
Gencey di tam nêdîbi, pîrey di huya
Ey zî bol nêramit, nêweşîya xirabi fek eştbi ci
Meramê Ellay bî Baco sero, ma se kerê
Nêşa ling xo verşano, lingî bîy kûtîy
Doş bîyê çorşmeyê banê xo,
Kewt cayan, kewt destan, bî mihtaca însanan
Bî zê qeçekan, Ellay dabi, aye zî sebir kerd
Boya xo teng nêkerd, tim tewekkul kerd
Dayîş Ey ra, girewtîş Ey ra
Sebir bidî ma Rebbê ma



Berve nenasiyê rêwîtiya mamostekê

Ali Karadeniz

Romana Filiz Aygunduz, *Kaç Zil Kaldı Ortmenim?* (Çend Zengil Man Mamoste?) yek ji van cûre kitêban e ku xwendevên xwe bi xwe re derdixe rêwîtiyeke berve nenasiyê. Lê tevdiira xwe kiriye, çi tiştê ji meraqê û sawê re pêwîst, ji serî de amade kiriye. Lê serencam dê çi be, ne kifş e.

Balkêşiyek din jî ew e ku Aygunduz, an lehenga romanê, ne ji kêf û eşqê derketiye vê rêwîtiyê; şert û mercan ew naçar kiriye...

Di vê serguzeştê de, nûmamosteyeke ciwan, di salên 1990î de, berê xwe dide bajarekî mîna Diyarbekirê ku navê wî di fikra wê de bi tirsê, bi kuştinên failê meçhûl re bûye yek. Li bajaran mirin daketibû qiraxa jiyane, roj û şevan li kolanên bajaran digeriya. Xelkê xwecih ji warê xwe bêzar bû, îcar xerîban dê bikirana. Lê serguzeştîyê, qinyatekê belkî jî cesaretekê dide mamosteyê, jê re dibêje; "Madem ev rê li ber te vebûye, bide ser, jê venegere." Meriv dibîne ku ev rêwîti jî aliyekî ve 'xwebidestveberdan e'.

Baş e ku ji vê rêyê negeriyaye. Ev romana ku pirsan ji jiyane dixe, ewê nehataya hebûnê. Ev bajarê ku di hişê wê û mirovê dinyaya wê

de dûr, ewê nehataya naskirin. Lehenga Aygunduz, hem jî yên dinyaya wê, ewê nizanibûna ku dilekî vî bajarî heye, destan û evînên wî yên efsanewî hene. Gundên şewitî, ferhengeke şemirandî heye, ferhengeke bi çolê de diçû... Ewê nizanibûya ku mirovên van deran kesên 'biserîhatî' ne. Aygunduz vê peyva 'biserîhatî' bi taybetî dide ber çavan. Kesên ku gellek tişt hatine serê wan, gellek karesat û bobelatên giran didîtin û dibuhartin... Vanên biserîhatî, nikarin qala êşa xwe jî bikin.

Lehenga romanê li Diyarbekirê peya dibe, mirov bi zimanekî ku ne ji zimanê wê bûn dipeyivin, deng dikin. Piştî buhurandina erê nayê, ji ber pêjna ku ji bajêr dibihîze, biryara manê dide. Fikra nêrîna bi çavê biserîhatiyan li axê, li avê, li bajêr binêre diniquite dilê wê. Her ku temaşeya dora xwe dike, dibîne ku ev bajarê birîndar dixwaze birîna xwe rê wê bide. Herçendî hilgirtina êşên wer giran zêdeyî quweta yeke mîna wê bû jî. Lewra ew li bajarekî wek Stenbolê, pêşketî, xweş hatibû dinê. Li semtekî kubarî û şareza, bi delalî û nazdarî mezin bibû. Dêûbav ew ji tu tiştî kêr

Lehenga romanê li Diyarbekirê peya dibe, mirov bi zimanekî ku ne ji zimanê wê bûn dipeyivin, deng dikin. Piştî buhurandina erê nayê, ji ber pêjna ku ji bajêr dibihîze, biryara manê dide. Fikra nêrîna bi çavê biserîhatiyan li axê, li avê, li bajêr binêre diniquite dilê wê.

nehiştibûn. Niha hatibû cihekî ku jiyân lê şîp dibû, dilê mirovan lê nasir girtibû.

Tevî pêlên erê nayan, wê pejnek wer di dilê xwe de dikir ku wê dixwest vê jiyânê bibîne û bibuhêre, bibe şahidê vî rûyê jiyânê. Ji bajarekî wek Stenbolê rabe were li navçeyêke biçûk weke Silîvanê mamostetiyê bike.

Dilê wê û hişê wê têkilhev bibû. Ne mecbûrê dîtina vî rûyê jiyânê bû, kîjan bajarê xweş ê dunyê hebûya dikarîbû biçûya, şixulên însanên ji sinifa bilind bikira. Belê vê axa ku jiyana wê rûyên mirov dibirî, aliyekî wê yî razdar hebû, vî aliyê razdar meraqa wê dikişand. Heta ku zarokên vê axê, zarokên ku ewê bibana telebeyên wê nedîtibûn, nedizanî çî ye ev raz.

Zarok tên dora wê, xwe davêjin lingê wê û bi çavên xwe yên wek pencereyên li hezkirinê vedibin, li mamosteya xwe dinêrin û dibêjin, "Tu yê me nehêlî ne wer ortmenim." Wê çaxê ew perdeya ser wê razê rabibû. 'Ortmen' bi dilekî xurt qerara xwe ji bo manê dide.

Mamosteke ku nû hatibû, zarokan beriya xêrhatinê, bi tirs xwe li lingê wê digerin û jê re dibêjin, "Tê me nehêlî ne wer ortmenim!"

Mamoste qerara xwe dide. Lê zû jî dibîne ku zehmetiyên çer li pêşiya wê ne. Zimanê zarokan û zimanê mamosteyê ne ji hev bû. Ne wê zanîbû bi zimanê wan, ne zarokan rind zanîbû bi zimanê wê. De were mamoste û telebeyên xwe bi zimanê hevdu nizanibin, her yekê bi zimanekî cuda bipeyive û bi zorê duzimaniyê daxê zimanekî. Zarokan her sibeh dê sond bixwara û bigotana: "Ez Tirk im, ez rast im, ez jêhatî me." Tirkên bi tirkî nizanîbûn...

Aygunduz, di
romana xwe de meriv
derdixe rêwitiya pirsan,
rêwîtiyeke ku meriv
bigihîne, bikemilîne.
Lêbelê meşaqetê wê
zêde. Dilekî xurt û
ramaneke azad
pêwist e

Ev çawa Tirk bûn ku bi Tirkî nizanîbûn. Mamoste li vê rewşê dimîne heyirî. Dê çawa ji zarokan re bigota, zimanê hûn dizanin nepeyivin, pê nebêjin, biewisin zimanekî ku hûn pê nizanin. Çima?

Roman li ser van dudilî, pirs û fikaran hatiye hûnandin. Pirsan dike. Meriv xwe têke şûna yekî din dê çawa be, mumkin e? Bi çavê wî meriv li xwe û li wî binêre, bi çavê yê hember xwe meriv li wî binêre, gelo ewê çawa be? Ku ji meriv re were gotin filan tiştî bike, filan tiştî neke, xwe bi vî navî nas bike, gelo hestekî çawa ye?

Aygunduz, di romana xwe de meriv derdixe rêwitiya pirsan, rêwîtiyeke ku meriv bigihîne, bikemilîne. Lêbelê meşaqetê wê zêde. Dilekî xurt û ramaneke azad pêwist e. Lê meriv li dilxurtiya mamosteyê şaş dimîne, ew di rêwîtiya xwe de serkevtî dibe. Bêguman mamoste ne tenê ye, zarok jê re dibin arîkar ku pirsgirêkan bibîne û fahm bike. Wek nimûne, resmên ku zarokan çêdikirin hişê wê tevlihev dike. Di xeyala wan zorakên taze de, li şûna ku resmên gul, tav, rûgeşî, xaniyên bi hezkirin û kamran çêkin, balafir, bombe, panzer dikêşandin. Li bendê bû kaniyan, mêrgan, bikêşin, lê wan tirs, kuştin, bombe dikêşandin.

Aygunduz, bi serkeftî vê nakokiyê dide ber çavan. Kê ev xeyalên sar û hişk dabûn zarokan? Fêhm dikir ku zarokan çî didîtin ew dinivîsandin, ew dikêşandin. Jiyanê ku mezinan dida wan, wan jî dida ber çavê mamosteya xwe.

Zarokên xoşewîst, bi çavên xwe dikenyan, bi bedena xwe depeyivîn. Dilê wan di kefa destê wan de li mamosteya xwe dinêrin. Mamosteya ciwan li ber vê rewşê, matmayî û heyirî dima. Ew zarokên ku çavekî bi dilovanî li wan bineriyay, destekî ku serê wan mist bidaya, payan ji şahiya wan re nedima.

Mamosteya ciwan, mana xwe ya wira, nema da ber pirsan, negot ez li vira çî digirim. Êdî li wira bû, di nav wan de bû, di xaniyekî ji xaniyên wan de dima, ji xwarinên wan hez dikir, tevgerên wan hêdî hêdî nas dikir. Zarok, tenê ne telebeyên wê, zarokên wê bûn, ew ji wan re dê bû. Tenê wê nebaya mamosteya xwendin û nivîsandinê, wê jiyân nîşanî wan bidaya. Hinekî ji dilnermîyê, hinekî şewata dil, wê ev kar bikiraya.

Her ku roj dibihurîn êdî tiştê ku mamosteyê li vê Silîvanê dihişt tenê ew raza veşartî, tenê hezkirin û lavaya çavê zarokan nebû. Li vê navçeya biçûk ku ne baxçekî rûniştinê, ne çûna geştê, ne sînema hebû, tiştê wê li vira dihişt, tenê meraqa serguzestiyê nebû. Vê navçeya xwediyê dîrokeke kevnare, çîrok û efsaneyên evîne, bi sebebeke din wê li nav xwe digirt; yekî esrarengîz nas kiribû, yekî ku di nav mirovan de derhal dihat ferqkirin, mirovekî ku bi mirovên din nedima...

Kî bû? Gotinên wî, zanebûna wî, xatirê wî yê li ser mirovan derhalê li ber çavan diket. Bi xwe bawer û di çav xwe de bû, ewqasî jî lihevhatî û keşxe...

Evî kesê bi nav Mehmed e, pîrr zû bandorê li ser mamosteya ciwan çêkir. Êdî parçeyekî bingehîn bû yê jiyana wê yî rojane. Bandora wî ji hişê wê hêdî hêdî dadiket dilê wê, evînek di dilê wê de şên dibû, hem hişê hem dilê dagirtibû.

Mamosteya ciwan, sirf ji bo ku bala wî bikîşîne rojekê li civata ku gellek kes lê bû, dibêje; "Ezê dîroka Silîvanê binivîsim."


Gava vê gotinê dike, Mamoste Mehmed bi tinazî dibêje; "Binivîse mamoste xan, binivîse, jixwe dîroka gelê min timî hinekan nivîsiye."

Mamosteyê bi niyetek saf gotibû, lê li gotina xwe poşman bibû. Bi rastî Silîvan çi qas nas dikir, di heqê wî de çi dizanî?

Mamosteyê dîroka Silîvanê nenivîsand, lê romaneke ku di bin navê Silîvan de firseta naskirin û fêhmkirina rewşa herêmê û însanê wê bide mirovên bajarên rojava nivîsand, ew mirovên ji aloziyan dûr, di jiyana xwe de ne.

Bi vê pertûkê ve, bala wan kesan kişand yên ku tu meraqeke wan li ser zimanê Kurdî tunebû. Li vira jiyaneke çawa hebû, mirov çawa dijyan, çawa ji vê mamosteya Stenbolî hez kiribûn, çawa deriyê mal û dilê xwe tev de jê re vekiribûn, wê ji serma herêma xwe çawa bi lihêfên xwe yên hirî germ kiribûn...

Mamosteyê fêhm dikir ku "navê henûniyê û zimanê germahiya dil tuneye", ev rastî raxist ber çavê mirovan. "Mirov li ser axê tenê li pey jiyînê ye" ev rastî anî bîra mirovên ku nizanin. Li sîndekê dimîne 'ecêbmayî' ku Kurd sozê didin ewê girêdayî Tirkbûnê bimînin, xebat û berxwedana zarokên Silîvan dikir ji bo hînbûnê.



Filiz Aygunduz

Yeke mîna xaltiya Sara ku mamosteyê, heta yeke weke wê nas nekiribû, nizanîbû hezkirina bêyî berdêl çawa ye. Dît ku berpirsiyarê asayîşê miameleke çawa li xelkê dikir, serê gavê qontrola nasnameyan, zêdebûna rengê qeşûfî/xakî. Çima zarokan li şûna resmên mîrgan, çeman bikêşin, resmê tîrsê dikêşandin...

Mamosteyê, ji Stenbolê re qala Silîvan dikir û ji Silîvan re qala Stenbolê dikir. Qala kilamên evîndariyê yên Kurdî û xortekî esmer î Kurd dikir ku çawa dilê wê ketibûyê. Mirovan çawa amadeyiya zivistanê dikirin, çer sebze hişk dikirin, çerezên ji bo şevên zivistanî hazir dikirin, eva hemû dinivîsand.

Ji aliyekî jî ditirse ku Silîvan û Stenbol hevdu li ber nexin, hevdu fêhm nekin. Welhasil mamosteyê, geh bi çavê rojnamevanekê, geh bi çavê civatnasekê, geh bi çavê dilşewatekê, geh jî bi çavê evîndarekê li jiyana Silîvanê û li têgihîştina Stenbolê dinêre û wer nivîsiye.

Her cihek, ku li gor xwe neyê nixandî, hêjayiya wê nayê fêhmkirin. Mirov wek dixwaze li

gor xwe nirxa tiştan dike, yanî timî bi alî xwe ve bikolin, loma gellek caran rastiyê derbas dike.

Gava dev ji vê pêşînhukmiyê berdide, dibîne ku hem xwe hem jî yê hember xwe azad dihêle. Karê rind, fikra paqij û samimiyet pê re çêdibe. Li ku derê be, dixwaze wira zêde bike, ronî bike, tişteki bide wê derê. Dilê paqij, mirovan teşwîq dike ser dayinê.

Mamoste li Silîvanê vî aliyê jiyane nas dike. Ji zarokên Silîvanê, ji Mamoste Mehmed, ji Xaltiya Sara, ji dîwaneyê bajarê Mehmed ders û îbretên ecêb digire. Vê serpehatiya xwe di vê romanê de radixe ber çavan û xîtabî hişmendiyê dike. Ji vî alî ve, romana *Kaç Zil Kaldı Ortmenim (Çend zengil man mamoste)*, darizandineke civakî ye, muhakeme û tehlîlkirina bûyeran, tegihîştinan, nêrînan û pêşînhukmiyan e.

Her tişt divê li gor xwe, di cihê xwe de nixê xwe bibîne. Evîndariya mamosteyê û Mehmed jî meriv dikare bêje ku ji ber vê fikrê negihaştîye mirada xwe. Ji hevdu hez kirin, dil ketin hevdu, lê her yek ji wan xwe girêdayî cihekî din dibîne. Mehmed li Silîvan giran bû, xatirê wî dihat zanîn, nasnameya xwe didît, lê mamosteya Stenbolî jî encax karîbû li dunyaya xwe li bajarê xwe bigihîştî aramiya dilê xwe. Stenbol di Silîvan de hilnedihat, lê mamosteyê didît Silîvan, yanî Mehmed, di hundir Stenbolê de wenda dibe. Ji ber vê Mehmed û mamosteyê, evîna xwe di dilê xwe de vekuştin, an jî veşartin. Tiştê veşartî, wenda nayê hesêb, tenê ne li ber çava ye. Aqil wer xwest, du dilan ji hev hez kir, lê bedenên her yekê bajarê xwe xwest. ❁

Pîvan û kîlo

Seyda Ronahî

"Peya biqeh re kane kêlek xwê bixwe." Ev gotineke pêşyan e. Gotineke gelek balkêş û li ser qehra Kurdan hatiye gotin û fitreta wan aniye ziman. Di ve gotinê de ez dixwazim li ser peyva "giranî"yê bisekinim. Di vê gotina bav û kalkan de yê ku giraniyê bi me dide nasîn, kel e. Genim û hemî zad berê bi kelê dihatin pîvan.

Kelek heyşt timin in. Her timin li gor welat û hereman giraniya wan tê guherandin. Timina Sêregê, timina Ruhayê û wekî din. Kelek 8 timin in. Pîvana tena bi nîv timinê dihate pîvan.

Nîvtiminek genim li mabena 20 û 22 kîloyan tê hesabandin. Nîvtimin ceh li mabena 21 û 22 kîloyan tê guherandin. Gotina ribik, ji ribekî an ji çara yekî derketiye, ribik ji çar paran yek e. Du ribik qiratek e. Qîrat nîv timin e. Ji bo wê du qîrat dibin timinek; ev gotin ji bo giraniyê tîn gotin.

Kîlo kurtbêja Kîlogiram e. Tonek tê wateya hezar kîloyî. Li cem me ku li arasa genim kel radikirin ji wê malbatê re digotin mala xwediyê kele. Wekî din li nav me, ji hinek malbatan re dibêjin, mala qirato. Mala ribik, mala nîv tilim û wekî din.

Dibêjin rojekê dîsa meriv li hev rûniştibûne. Yekî porgewr ji yê din pîrsî gotiye tu çend salî yî, yê din jî gotiye, ez ê sala xelê me. Gotiye lê

tu, wî jî got, ez jî yê sala xelê me. Yek li wir bûye, hîn navsal rî reş bûye, gotiye, ez jî yê sala xelê me. Wanê por gewr gotine, law salê te ne tiştêk e. Vayê navsal gotiye, min hîn di emrê xwe de di mala xwe de nîvtimin genim nediye di mala me de tim xela ye

Herin 80 santîm e, nîvherin 40 santîm e, 150 herin qeydimek e; bona ku were fêmkirin qaydimek 120 metre ye, 300 qeydim qonaxek e. Rêyeke ku dûr tînin ziman dibêjin rêya du qonaxan. Ew jî bi texmîn 200 km tê zanîn.

Ez îjar werim ser bihostê. Bihost ferehbûna destekî ye. Di mabena pêçiya bi çûk û pêçiya girikê de tê hesabandin. Bi bihostan, bi giranî pîrek ku kincan didirûn dipîvîn. Sê bihost qutik, navê berjêr pênc bihost. Bihost gotinên qerfan de jî tê gotin. Bona kinikbûnê dibêjin "bejin bostik" û qerfan pê dîkin. Yek carana bi pêçiyên tiştan hesab dîkin. Du pêçî yan kin, yan çar pêçiyên dirêj, tê gotin. Ji bo kesên zarokên wan nabin, ji wan re dua dîkin û dibêjin, "qey Xwedê yê pêçiyek bi we de jî."

Ku dirêjî zêde dibe îjar meriv bi gavan dirêjiyê dipeyive. Deh gav, panzdeh gav, bîst û pênc gav. Meriv xanî û hewşan bi gavan dipîve. Hûn dizanin listîkek heye navê xwe sêgav e.

Ji îro pê ve dirêjî bi metroyê tê pîvandîn. Gav, pêk, bost ji holê rabûne.

Erd û arese pîrî caran bi gavan dihat hesabandin. Ku gav dikirin şûnda digotin, evlegek an qeydimek di qeydim. Her ewlegek deh-danzde gav in. Ferehbûna wan wirga tê gotin. Dirêjiya wan li gorê mirovan tê hesabandin...

Îjar ez dixwazim li ser "pîvanê" û li ser "dirêjiyê" çend tiştan bi bîr bixim. Pek dirêjiya nîgekî ye. Tiştên hindik meriv bi pekan dipîve. Wek pênc pek, deh pek. Îjar hinek tişt hene meriv bi gavan dihesibîne.

Hinek meriv li hevudu kom bûbûn, herkesî qala mêraniya xwe dikir. Yekî got, min li Şamê xwe sê mişar hol kir. Ê ku li wir civiyane qebûl nekirin. Got, ma Şam li wir e mişar li vir e; de were li ser sê mişaran re bi gavekê xwe holke.

Yek caran ku hinek di civînan de bê hemd peyva mezin dîkin û diaxifin; ji bona ku ew meriva xecil nebe, û jê re nebêjin derewan meke dibêjin ser re gav meke.

Li evlegekî ji çaran yekî timinek genim tê reşandin. Niva metro derket qeydim û ewlek rabûn. Dîsa jî karê hêsan bi gavan tê hesabandin. ❁

Weşanên Nûbiharê

Kitêbên Kurdî	
Adat û Rusumatnameê Ekradiye / M. M. Beyazidî	17.50
Antolojiya Çîrokên Nûbiharê/Ayhan Geverî.....	12.50
Cildên Kovara Nûbiharê (10 Cild, cildi)	30.00
Çarîn/ Sabah Kara	6.00
Çil Hedîs / Îmamê Newewî	5.50
Çîrokên Mesnewiya Şerîf.... /Sadîk Yalsızuçanlar	11.50
Destana Şerrê Kundan û Qijikan/Gernas Koçer	11.50
Dî ronîya Quranê de Dîroka Pêxemberan/Murad Celalî	9.00
Dîwan/ Seyid Eliyê Findikî (Çapa Nû)	15.00
Dîwan/Mela Zahirê Tendûrekî	15.00
Dubeytî/ Baba Tahirê Uryan (Çapa Nû)	12.50
Ebdullahê Minyeyî / Hekimoğlu İsmail	10.00
Evîna Pinhan/ Sabri Akbel.....	6.50
Feqiyê Teyran (Çapa Nû ya Berfireh) / M. Xalid Sadînî	20.00
Ferhenga Çapemeniya Kurdî.....	14.00
Ferhenga Kurdistanî/Elî Ekber Kurdistanî	12.50
Guldan/Seydayê Mela Husnî	10.00
Hebana Berxvan / Raufê Bêçare.....	10.00
Kelîle û Dimne / Beydaba	8.50
Leyla û Mecnûn/ Siwadî	7.50
Leyl-name/ Ayhan Geverî.....	6.50
Meqamat / Herîrî (Wergêr M. Ehmed Meylanî)	6.00
Mewlid / Melayê Bateyî (Latînî-Erebî, şamûa).....	8.00
Nûra Qelban-Tefsîra Qur'anê.....	30.00
Nimêj Dikim/ Komisyon.....	7.00
Peyiva Bîst û Şeyemîn/ Seidê Norsî.....	4.00
Meala Fîrûz û Şerha Qur'ana Pîroz /M.M.Garsî Farqînî	25.00
Mela Huseynê Bateyî / M. Xalid Sadînî.....	15.00
Mem û Zîn/Bi rave û şîroveyeke nû	35.00
Mem û Zîn/Amadekar: Huseyn Şemrexî.....	17.50
Melayê Cizîrî/Amadekar: Selman Dîlovan.....	17.50
Nûra Qelban-Tefsîra Qur'anê.....	30.00
Peyivên Piçûk/ Seidê Norsî	6.00
Peyxamberê Ummetê Hz. Muhammed/ Ebdilhadî Botî	8.50
Pênc Rîsaleyên Îmamê Xezalî/M. M. Garsî	8.00
Gulşenê Raz/Şêx Mahmud Şebuşteri /M. M. Garsî	8.00
Gulîstan/Şêx Sadîyê Şîrazî/M. M. Garsî.....	11.50
Rîsala Biratîyê/ Seidê Norsî.....	4.00
Riyadû's Salihîn/ Wergêr: M.Salihê Dihê	35.00
Ronahiya Qurana Pîroz/ M. Muhammed Hekkarî.....	25.00
Rubaiyat/ Omer Xeyyam.....	6.00
Seyful-Milûk û Melke Xatûn/ Siyahpoş.....	11.50
Siyerê Nebî / Milla Cimayo Babij	6.00
Tûrikê Pîrê Kal / Pîrê Kal.....	7.00
Vateyê Qijkekî / Seidê Nursî.....	4.00
Yezdan Dizane / Mezher Bozan.....	6.00
Zêna/Mezher Bozan	10.00
Bi herfên Erebî	
Rîsaleyên Eqîde û Exlaq û Edeb	15.00
Diyariya Kurdî Fiqha Şafî	6.00
Dîwana Hezîn/ Seydayê Mela Husnî	15.00
Mecmeul Mesaîl/ Xelîfe Yusuf	30.00
Mewlûda Gundî/Seyyid Bedreddin	3.00
Fiqha Şafî / S.M. Husnî Hezîn.....	15.00
Mem û Zîn/Ehmedê Xanî (Şerh: Husên Şemrexî)	17.50
Mewlûd/Ertûşî Bi cild-du reng şamûa	15.00
Nûbihar/Ehmedê Xanî (Şerh: Husên Şemrexî).....	8.50
Kulxaniya Veşartî/S. M. Husnî Hezîn	6.00
Reng û Rûyê Pêxember M. Husnî Hezîn.....	12.50
Serkanî/Mele Muhammed Mahsum	8.50
Eqîde û Tecwid/Xelîfe Yusuf.....	5.00
Tuhfetul Sibyan/Xelîfe Yusuf	7.00
Kitêbên Kurdî-Tirkî	
Diwan/ Melayê Cizîrî (Şamua-Kurdî-Tirkî).....	30.00
Ez Kurdî Hîn dibim-Pratik Kürtçe Dersleri	20.00
Gotinên Pêşyan û Botan/Abdulkadir Bingöl.....	15.00
Melayî Cizîrî Divanî'nın Şerhi/A. Septioğlu.....	9.0
Mersiyeyên Rojhilat-Doğu Ağıtları/ Sabah Kara.....	6.50
Nameyên Bêcewab-Karşılıksız Mektuplar/ Sabah Kara	6.50
Kitêbên Tirkî	
Asilerin Dönüşü / Gülîstan Çoban.....	6.50
Bediüzzaman'ın Volkan Yazıları/ Osman Resulan	4.00
Çağdaş İnan Şiiri Antolojisi/ Sabah Kara	6.50
İslam Tarihinde Kürt Kadını / Muhammed Hayr Yûsuf.....	6.50
Kürtler ve Kürdistan Tarihi	35.00
Melayê Cizîrî Divanî ve Şerhi/ Prof. Abdulkaki Turan.....	35.00
Turabidin'den Beriyye'ye / Altan Tan	25.00
LÎSTEYA PIRTÛKÊN KENTÊ	
Aşk ve Savaş / Necdet Karasevda	11.50
Babam /M. Saîd Ramazan el-Bûtî.....	12.00
Bediüzzaman'ın Hayatı/ Abdurrahman Nursi	6.00
Bütün Yönleriyle Arabkendi / M. Şerif Eroğlu	12.50
Cumhuriyet Öncesi Diyarbakir'de Maârif	12.00
Çığır Açan Şark Alimleri/Abdulahdi Timurtaş.....	8.00
Çığlığa Duran Sözcükler/ Misbah Hicri	6.00
Divan/Molla Ahmed-i Ceziri	16.50
Divan/Kiğılı Şeyh Selim	10.00
Diyarbakir Eğitim Tarihi/ Mehmet Şimşek.....	8.50
Duru Su Rüyası/ Mehmet Özer	12.00
Elma Kokusu (Yola Adanan Şiirler) Gülîstan Çoban.....	7.00
Eski Diyarbakir'de Gündelik Hayat/ M.Şefik Korkusuz.....	9.50
Eski Saîd'in Ehemiyetli Talebesi Hamza / Veysel Aydeniz	9.00
İlk Vatandan Gelen Sürgün/ Hasan Hüseyin Çevik.....	10.00
İnsanlığın Ortak Akli/ M. Halit Yalçın	30.00
İslâm'ın Anadoluya Gelişi/ Ahmet Demir.....	12.00
İtirafçı/ Gülîstan Çoban.....	6.00
Kolay Farsça/ Osman Aslanoğlu.....	25.00
Kuruluş Döneminde Eyyübiler / Ali Beyyümi	12.00
Mazideki Suruç / A. Kadir İkbâl.....	9.00
Mazlum Halepçe / Müştehir Karakaya.....	7.00
Medreseden Meclis'e Meclis'ten Medreseye/ G. Emre	15.00
Mem û Zîn /M. Saîd Ramazan el-Bûtî.....	8.50
Muhafazakar Kürt Yoksullar, Mehmet Bozgan	6.00
Molla Muhammed Zıvıngî/ Abdulahdi Timurtaş	7.00
Seyahatnamelerde Diyarbakir/ M. Şefik Korkusuz	30.00
Sırr-ı Hanımın Divanı/ M.Şefik Korkusuz	10.00
Siyamend/ M. Saîd Ramazan el-Bûtî.....	8.50
Sonsuzluk Histerisi / Mehmet Bozgan	5.00
Kon Kapı / M. Zahir Ertekin.....	8.00
Süryaniler ve Diyarbakir/Mehmet Şimşek	14.00
Tarihin Adı Urfa/Misbah Hicri	8.50
Tezkire-i Meşayih-i Amid/M. Ş.Korkusuz	30.00
Urfa ve Çevresi Eyyubiler Tarihi/ Ahmet Demir	11.00
Urfa Efsaneleri/ Mehmet Kurtoğlu	12.00
Vadedilen Günler / Taha Hüseyin	9.00
Zamana İthaf/Mehmet Bozgan.....	6.00
İslam Aleminde Vakıf Kütüphaneciliği	10.00

Naveroka Cildê Çardan

(Jîmara beriya “/” jîmara kovarê, ya dawî jî rûpela wê nîşan dide.)

Akin, Ehmed

- Selman Dilovan: Bêşik Melayê Cizîrî ji
Kurdî û welatê xwe hez kiriye 113/07
Şahidê êşên me: Min Dît 111/57

Al Ehmed, Celal (Ji farisî: Dewrêş, Evdilayê)

- Dilxuşûşî 111/83

Alakom, Rohat

- “Hêsirên Selaheddîn” di çavkaniyên
Swêdî de 112/19

Aluç, M. Ali

- dilê miştxem 113/30
evînistan 114/24

Amedî, Paşa

- Hevpeyvîn: Bi serokê Komela Nûbiharê re
hevpeyvîn 112/55
Nûbiharê li Batmanê şax da:
Nûbihar-DER 111/89

ART, Dilazad

- Ji çanda Kurdî hin navên li ber
windabûnê 112/72
Ji kaniyê çend qurt av 114/43
Zehra 111/64

Axwelat, Mehmed Emîn

- Li nêzî te 111/84

Aykaç, Harun

- Wexta ez zarok bûm 112/74

Baği, Yusuf

- Bi xatirê te 113/62

Banûkî, Xelîl Îbrahîm

- Şîretên pîrka min 114/81

Barnas, Rojen

- Bê xêlî 114/11
Her cara hûrbaranek 111/17

Basneyî, M. Nezir

- 8ê adarê roja jinên kedkar ên cîhanê
di ola îslamê de mafê jinan 111/85
Serpêhatiyekek balkêş û secdeyek dilsoz .. 113/59

Bêçare, Raîfê

- Komela Nûbiharê 111/77

Bediuzzeman Seidê Nursî

- (Açarnok: Şaban Şenates-Meymandar)
Vajeya Siftekêni 114/41
(Werger: Eminoğlu, Nevzat)
Notaya diwanzdehan -Gazî û laveya li
dergahê îlahî- 111/53

Belwanî, Îskenderê (Ji tîpên erebî: Sîpanî)

- Hemd û sena ji navê te re 111/38

Berdestî, Zafer

- Analîza çîroka dirêj a “Di xew de” ya
Cemîl Saîb 113/63

Bereh, Berken

- Hêviya di eynaya huznê de:
Sabah Kara 114/21

Bêrkevanî, Mela Muhemmedê

- Paşeroja Rojhilata Navîn ber bi
ku ve diçe? 114/77

Beşîr, Mele

- Ev der ne qada şer e/ Ev der 111/78

Bîngol, Abdulkadîr

- Pazdehemîn salvegera mirina seydayê
min Mela Suleymanê Şîrnexî 113/52

Bozarslan, M. Emin

- Qelema min 111/31

Bozkoyun, Mehmet

- Bêhna wan ji te tê 113/75
Seydayê min 114/32

Buğurcu, Kasım

- Bûka pepûk 114/57

Cankurd

- Dema bimirim 111/22

Celalî, Murad

- Adat û Rusûmatnameê Ekradiye û
çend gotin 112/50
Bîd’et û mewlid 111/35
Bûyerên dawîn û rewşa me 114/75
Li ser Dîroka Kurd û Kurdistanê 113/15

Çetinkaplan, Ö. Faruk

- Bexçey bi gulên a Medîne bi to ya weş a 112/70

Çevik, Hasan Huseyin

- Gul û bilbil 111/54
Mêr be li pêsîrtengiyên 113/60

Çevik, Süleyman

- Di meha Gulên de Nûbihar 111/5
Durûtî û qerekerê civaka me 112/5
Kî mihtacî îrşadê ye! 113/5
Ev rejîm kirasê xwe li herkesî dike 114/5

Cezawîr, Hemkoçerê

- Çîrokên gelêrî û pêkenokên serpêhatî 113/61

Cîbilgirawî, Bahaeddin

- Di sînema kurdî de hawara zarokên
Amedê: Min Dît! 111/62

Cîhanî, Perwîz

- Qesîdeyek buharî 111/11

Cirnêreş, Seydayê

Dayikê 111/90
Jina Kurd..... 113/54

Dawud, Mele

Werin em ji dil dua bikin 112/81

Deham Ebdulfettah

Têgeha demê di navbera "Pêşeroj" û
"Paşeroj" de 112/37

Delal, Yavuz

Ummeta weset û kurd 111/55

Denîz, Abdulkakî

Jiyana Mela 'Ebdullahê Firfêlî 111/69

Denlî, Cemîl

Reşika çavên te..... 112/27

Dêrikî, Xezal Meral

Dewrêşê delodîn 114/47

Dilgeş, Felat

Bî sozê mîrên berê 111/10
Li pey Apê Torî û Îsmail Goldaş 113/40

Dilovan, Selman

Delîlên ku nabin delîl 114/12
Pelda û Zehra..... 112/92

Dîlxêrî, Metîn Kewê

Serok Mistefa Barzanî 113/37

Doskî, Tehsîn İbrahim (Latînzekirin:

Ayhan Geverî) Ji çelengê şagirdên
Rîsaleyên Nûr: Şêx Tahirê Şoşî û
kitêba wî Gulzar 112/45

Dost, Jan

Dil û cil 113/6

el-Hedbî, M. Burhan

Perçeyak ji jiyana pîroz..... 112/82

Eminoğlu, Nevzat

Bulanik Kopa rengîn e 112/36
Li Kopa rengîn, dera Kurdî ya pêşîn 114/58

Erdencî, Kenan

Çerçiyê taxê..... 113/50

Ertekin, M. Zahir

em: zarokên hêviyê 111/87
Ji kaniya edebiyata Kurdî, edîbekî
nenas Mele Eliyê Baqustanî û
helbestek wî: Ey felek 112/76
Li ser demê pexşanek: Hêsirên çavê
çîroka me 113/28
Qedrican û helbestên wî yên Hawarê ... 114/67

Firat, Abdulilah (Werger: Rêbaz Şoreş)

Li ser şehadeta Şêx Bahaeddîn û wefata
Ebdulmelîk Efendî 112/48

Firat, Adnan

Teoriya "hereketa gewherî" ya Mela Sadra . 111/39
Rêgezên heyînê 112/33

Gemi, Ahmet

Azadî 1970 111/49
Nivîşt..... 113/45

Geverî, Ayhan

Leylî Mehfuz..... 113/87
Xwepeyvîn: Dr. Hussein:
"Ez Romannivîsê Jiyana Rojane me" 113/19

Gök, Abdulkadir

Berhevdana kultura devkî û
sosyolojiya dengbêjiyê 114/25
Bi esmannasiyê eşq û evîna Mela
Ehmedê Cizîrî ya tesewwîfî 111/23

gorican, sidiq

başûrgerî 114/40
çêreçîmena payîzê 113/27
na(n)..... 111/48

Hakan, Sinan

Ji Wida hetta Mele Muhemmed Gulnarê Miksî
pêwendiya helbestvan û mîrên Miksê 111/45

Hedilî, Kamran Simo

Girtî me 114/74
Keferata min û ez 111/65
Pira jîn û mirinê..... 113/26

Hefîd, Şêx Mehmûdê

Ya Resûlellah 111/68

Hêvidar, M. Êhsan

Ji çivanokên Kurdî..... 113/56
Tu ji bîr neke..... 111/91

İncekan, Abdullah

Di Kurdî de fiilên transîtîv û ergatîv 114/7

Jiyan, Mihemed

Ala li erdê nemayî! 113/88
şevname..... 113/49
Sojîna di agirê naçariyê de 111/13

Kal, Pîrê

Çima 112/63
Welat..... 113/70

Karadeniz, Ali

Berve nenasiyê rêwîtiya mamostekê 114/89

Karakaya, Rahmetullah

Biro..... 114/72
Nivîskariya malbata me 113/66

Kavûs, İskender bîn (Ji Farisî: Jiyan, Mihemed)

Çîrokek ji Kabûsname 112/69

Kuranlioğlu, Hadi

Evîn 114/82

Kurşun, Abdulkadir

Jiyana Bediuzzeman 114/34

Langstone Hughes (Ji Ingilîzî: Azad Rêbiwar)

Dîmoqrasî 114/61
Dîlokek ji bo Lucînda 113/81

Marîn

Vaje 111/56

Mela Mehmûdê Qultikî

(Tîpguhêzî: Şemrex, Huseynî)
Sebra dilê min welat dikim axîna welat 111/34

Mela, Abdusselam	
Çemê xemê	113/71
Memê, Şemoyê	
Meleka Gewre.....	112/28
Mistoyê Tofan.....	114/85
Mercan, Ergül	
Delal.....	114/45
Merdimîn, W.K	
Baro giran.....	114/80
Çi pawenî	111/38
Meretowar, Ayhan	
Şorbe û Fedî; Xela û Xeyîdî	112/88
Mollakendî, Hatîce	
Herfan nas nakim.....	111/75
Reşîkê Reşîkan.....	112/67
Teyrê bê ref.....	113/72
Zerê zer bû	114/28
Muhammed, Husein	
Kurteceribandî	112/41
Nado, Kenanê	
Bihara gulistanê	111/72
Du benîşt û pîfîkek	113/47
Ez te dibînîm	112/75
Kalamast	114/83
Narozî, Emîn	
Serfermandar Esededdîn Şêrkoh	112/7
Omerî, Hamid	
Goyîna xizokê	112/40
Ozkan, Rojbin	
Mol Axa	112/91
Pablo Nerûda (Wergêr: Jiyan, Mihemed)	
Şahbanû	112/35
Pertev, Ramazan	
Testên jîrayî û exlaqê pîşeyiyê	111/07
Polat, Hesên	
Du mamoste hatin gund	111/79
Ez mamoste	112/64
Ez zarokekî gundî me.....	113/93
Qebbanî, Nizar (Ji Erebî: Selman Dilovan)	
Dersa wêneçêkirinê	112/18
Rêbiwar, Azad Ya Xweda	113/90
Romî, Mewlana Celaleddînê	
(Wergêr ji farisî: Acar, Hayrullah)	
Nîgara ku lê digêrim ez bi can	111/12
‘Eşqa Yezdan Hêsarek Pîrr Muhkem e	114/8
Ronahî, Seyda	
Pîvan û kîlo	114/92
Rovî û dîk.....	111/82
Ronî, Peyrew	
W re	113/74
Samûr, Azîz	
Bi giştî weşangêriya Kurdî ya li Stenbolê	114/14
Dî wêjeya Kurdî ya gelêrî de çîvanok	113/31
Şanaz, Bargiran	
Hêza peyva te.....	111/81
Jiyana me ya xewn	112/73
Şemrexî, Huseynî	
Seba nefse ket hefsê	111/19
Bûkûzava	113/46
Serdar, Bamed	
Bo celebên serbixêfî	112/47
Hermentîk, xebatên li ser Melayê	
Cizîrî û bersivek	111/29
Şehîdê Kerbela	111/44
Serfiraz, Janda	
Dilopek azadî.....	112/78
Kî me ez.....	111/33
Serfiraz, Mesud	
Helbesta Helbestê	114/20
Newroziye	111/82
Şeyx Galîb (Çarnekar: Hasîp Bîngol)	
Terkîba Bend	111/18
Sîpanî	
Mela Muştâq (1936-2009)	112/79
Tizbî.....	111/78
Tîmurtaş, M. Munîr	
Eşîrên herêma Botan (I) Eşîra Harûna ...	112/59
Eşîrên herêma Botan II Welatî û Şîkakî	113/76
Eşîrên Herêma Botan III Şîlêd: Batuwa	114/62
Vural, Veli	
Umrekî ji şîrî heta pîrî di rêya ilmê de: Mela	
Hakimê Qoraxî [1939-2010]	114/48
Xecê, Bavê	
Gurê sêgiran.....	113/43
Li hêviya te me bihara hêviyan.....	111/73
Xelîkan, Mem	
Bêkes neke	113/39
Xemgîn, Yusif	
Seydayê Nemir	114/51
Xweşhêvî, Zilkîf	
Bîr.....	113/25
Du lêkerên ciyawaz û bikaranîna	
wan a çewt	113/38
Nexweşiya siyasetê û zihniyeta	
Xaricîtiyê	112/42
Xweşmêr	
Belaxeta edebiyata qlasîk.....	113/91
Yalçın, Yılmaz	
Evîn	114/31
Yigitbay, Recep	
Bacoya Alanqozî.....	114/88
Zarokname	111/92
Ziryan, Jan	
Tîr Meh	112/54
Zozanî, Wisif	
Ewliya Çelebî Çewlîg de.....	113/82
Şerefname de Mîreyê Suweydiyan	114/52

Şeta Klasikên Zurdî



Ger lu'lu'ê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
Wer şî'rê Melê bîn te bi Şîrazi çî hacet

Melayê Gîzîrî

Nûbihar

Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. Büyük Reşitpaşa Cad. Yümnî İş Merkezi No: 22/29
Vezneciler-İstanbul Tel & Faks: (0 212) 519 00 09
e-mail: nubihar@gmail.com www.nubihar.com



Foto: Mehmet Masum Siler
Berga Paş: Axtamara/Wan
Berga Pêş: Şikefêñ Heskêfê